

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

war

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ



HEJMAR-SAYI : 15 BÎHAR 2004

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

WAR

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ



KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

WAR

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ

Ji Sê Mehan Carekê Tête Weandin
Üç Ayda Bir Yayimlanir

Bûha: 6.000.000 TL

**KOR Reklamcılık Basın-Yayın
Tic. ve San. Ltd. Şti.**

Sahibi: **Turgut ERSOY**

Sorumlu Yazışleri Müdürü: **Vahdettin ATEŞ**

Redakte:

Roşan LEZGÎN
Remezan ALAN
Seîd VEROJ

Tîprêzî-Mîzampaj: WAR

e-mail: kovarawar@hotmail.com

Çapxane/Matbaa:

Baryş Matbaa Mücellit

Davutpaşa cad. Güven Sanayi Sitesi
C. Blok No: 274, 275, 276 Tel:(0212) 6748528-29

Cîyê Rêvebirinê/Yönetim Yeri:

İnönü caddesi Magül iş Merkezi No: 49
Dağkapı /DİYARBAKIR
Tel: (0412) 2287828

Naverok - İçindekiler

Hebûna Gelê Kurd Li Sûryê/ 7

Meşal Temo

Hêviyên Ji Guhertinên Li Sûryê Û

Cihê Pirsê Kurd Di Nav De/ 35

Dr. Ebdulbasit Seyda

Suriye Kürtleri İçin Umut Verici Bir Başlangıç/ 42

Ümit Fırat

Bijî Liberxwedana Kurdên Binxetê/ 46

Reşîd Battê

Kurd Du Mîlyon İn, Qewmê Diduyan e Li Sûryê/ 50

Diya Ciwan

Heştê Sale Bûyerên Wisa Li Qamîşlo Çê Nebûne,

Bêguman Ji Bilî Bûyera 12-Yê Adara Îsal/ 51

Konê Reş

Rêxistina Efûyê Ya Navneteweyî

Pêşber Hikumeta Suriyê Dest Bi Bizava Bilez Kir/ 52

Kk-Nûçe

Sakir Fethulah Xalid

Sahîdekî Bûyera Yekê Sibatê/54

Yekgirtin Dê Pêşiya Kurdan Ronahî Bike/ 57

Xelîl Cindî

Kurdistan Ne Cihê Terorîstên Bêdîn E Û Gelê Me
Çewa Di Şerê Dîktatoriyê De Bi Ser Ket, W
Elê Di Şerê Terorîzmê De Jî Dê Bi Ser Bikeve/ 59
Mesud Barzanî

Serokwezîrê Kurdistanê Balê Dikişîne Ser Terorîzma Nêvdewletî/62
Nêçîrvan Barzanî

Banga Ji Bo Azadîya Zimanê Kurdî:
Kurdî 80 Sal Berê Hat Qedexekirin!/ 68

Çend Vateyî Derheqê Ziwani, Edebîyatî û Edîbîye De/68
Roşan Lezgîn

Stalîn, Qeyrana Şoreş û Rûxîna Komara Azerbaycan û Kurdistanê/72
Dr. Emîr Hesenpûr

Etîmolojîya Zimanê Kurdî / 96
Abdurahman Uçaman

Y. Doç. Dr. Kadri Yıldırım
Werger Û Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî
(Melay-Î Cizîrî'nin Dîvan'ının Tercüme Ve Şerhi)/112

Awe / 143
Ehmedê Dirihî

Sê Dîlop Xwîn/153
Sadiq Hîdayet (Ji Farisî Werger: Roşan Lezgîn)

Pêşgotin

Xwendevanên birûmet, mizgîna derhatina hejmara nû ya WAR-ê li we be! Ev hejmara WAR-ê, li war û diyarê bav û kalan derhat, li Dîyarêbekir yanî diyarê bikevir; kevîrên reş ê nexşandî û honandî yên ku ji nivîsar, kultur, huner, ol û bûyerên hezar salan re bûne şahid û hevparê sirrên wan, rûpelê pîrr girîng ên diroka mirovayetiye têda ne. Ku armanc lêkolîn û lêgerîna dirok, ziman, kultur û huner be û bikûrtî be jî diroka Dîyarbekir û dorberê wê neyê bibîrhanîn dê kêmasîyek mezin be.

Dîyarbekir diyarê herî kevn ê mirovayeti ye. Di vê herêmê de cara yekemîn li vê diyarê, ji layê komeyên mirovayeti ve cûrbicûr çandinî hatiye kirin. Lêkolînên arkeolojî nîşan didin ku di vê herêmê de cara pêşîn digel gelek aletên destan û bikaranîna sifrê(paxir); mî, kûçik û xoz li vê derê yanî li Dîyarbekir û dorberê wê hatine kedikirin.

Her weha Dîyarbekir bûye war û navenda dîn û mezhebên cîyawaz jî. Ji van dinan ên bigiranî şopa xwe li van deran hiştiye Şemsî(Zerdûştî), Îslam, Xaçperest û Cihûdî ne.

Ev bajarê qedîm bo gelek çand û şarezayîyan bûye war û mazûbanîya wan a bêvexwendinî kiriye. Wan her yekê jî têde şop û nîşanên xwe hiştine. Nêzikê neh-deh hezar sal e ku li ser vê ax û warê pîroz kulturekê dewlemend hatiye peydakirin. Beriya Îslamiyetê Hurî, Mîtanî, Asûrî, Urartuyî, Medî, Persî, Romî, Bîzansî û piştî hatina Îslamiyetê jî ji Merwanî, Areb, Selçukî û Pezsiyîyan(Akkoyunlular) demekî mora desthilatdariya xwe li van kevîrên reş dane.

Dîyarbekir di nav pêvajoya dirokê de bûye navenda çetrayên herêmên mezin. Jiber vê yekê jî bûye navenda kultur û bazirganîya herêmê.

Di dema Merwanîyan de ji bo avedankirin û pêşxistina Dîyarbekir û Farqînê gavên mezin û girîng hatine avêtin. Xelk di nav hebûnî û aramiyê de jîyaye. Wê demê paytextê Merwanîyan ji zanyar û hunermendan re bûye cî û warê xweparastinê.

Bedenên Dîyarbekir ji Romîyan û Merwanîyan bigre heta dema Osmanîyan ji xet û xêzên gelek kulturên re bûye nivîsgeh. Sirr û nîşanên wan di nav xwe de diveşere. Bi gotina Gabrîal "bedenên Dîyarbekir bi serê xwe dikarin bibin muzeyek kîtabeyan".

Xwendevanên hêja, hun jî baş dizanin ku diroka Dîyarbekir û dewlemendiya wê ya kulturî nemimkun e ku di çend rûpelan de bête gotin û bicîkîrin. Ji bo nasandina Dîyarbekir xêz û gotinên me, dilopeke ji ava behrê ye. Biqasê bîrhanîna diroka vê herêmê, îro guhartin û ji nû ve nivîsandinê wê jî pîrr girîng e.

Ev dem, di diroka nêzik a Kurdan de pêvajoyek gelek girîng e. Bûyer û

rûdanên pirr balkêş û nû pêk tîn. Em bigîştî dikarin bêjin ku di Rojhelatanavîn de ji nûha bigre heta bîst-sî salên di pêşiya me de, wisa diyar e ku bûyer û rûdanên gelek mezin dê biqewimin. Ji ber vê yekê, mimkun e her gav rûdanên wisa pêk bên. Girîng ew e, em kûr binêrin û dûr bibînin da ku li bin xirba rejîmên dîktator de nemînin û nebin aletê siyaseta statûqoparêzîyê. Her weha nebin pêleyztoka siyaseta dagirkerîyê jî. Divê em berjewendî û yekîtiya gel û neteweya xwe li ser her tiştî de bigrin. Di vê çarçovê de ji bo ronîkirin û têgehîştina rûdan û bûyerên Hewlêr û Başûrê piçûk, me *dosyekê* amade kir. Lewra em dixwazin bikûrtî basa van bûyer û rûdanan jî bikin.

Di 1-ê Sibatê de Hewlêr bi bombeyan lerizî, di navenda PDK û malbenda YNK de bi dehan kadroyên sereke û hemwelatî hatin şehîdkirin. Hedefa vê çalakîya xwekujî, şikênandina îradeya siyasî û destkevtiyên Kurdistanê başûr bû.

Bûyera 1-ê Sibatê çiqas bêjî dilşewat bû, lêbelê encama vê bûyerê jî aliyê hemû Kurdan ve bi kî û nefretê hate şermezarkirin û bû sebebê yek dengî û yek helwestî ya gelê Kurd. Digel wê di nav hemû Kurdan de bû sebebê peydabûna fikrekê netewî yê navendî.

Rûdanên di başûrê Kurdistanê de, ji alî Kurdên rojhelat û başûrê piçûk ve bi serhildanên gelê Kurd hate pêşwazî kirin. Lê mixabin di bakur de bédengî yan jî xwe kerrîkirin serdest bû.

Her weha li Kurdistanê Sûryê jî bi çî egeran be jî, serhildanek çêbû. Ev bûyer bû destpêka pêvajoyek nû. Bêşik rûdan û destkevtiyên Kurdistanê başûr pirr tesîr li ser Kurdên Sûryeyê kir. Berîya her tiştî morala wan pirr bilind kir û bû sebebê yekgirtin û bixwe bawer bûnê. Mejiyê Baasî tehamûl bi vê nekirin, tiştê ku di radeya yekemîn de dixwestin li Iraqê pêk bête yan jî çê bikin (şerê navxwe yê Kurd û Areban), li Kurdistanê Sûryê ceribandina wê kirin. Armanca yekemîn ew e, ku bi şerê gelê Kurd û Areban fetisandin û xetimandina siyaseta Dewleta Federal a Kurdistanê Başûr e; duyemîn, şikestina moral û daxwazên gelê Kurd li Sûryê; sêyemîn, bigîştî tehdîtîkirin û tirsandina tevgera Kurd li Rojhelata navîn de.

Lêbelê her wekî bûyera Hewlêrê, Kurdên li her derê dinyayê ev êrîş û leyztika hovane ya Baasîyan bi tundî şermezar kirin û piştgirîya xwe bo tekoşîna Kurdên Sûryê diyar kirin. Bi taybetî jî xwepêşandanên xelkê Kurdistanê Başûr û dirûşmên wan pirr girîn û balkêş bû. Dirûşma "*Kurdistan yek parçe ye, Qamişlo Helepçe ye*", daxwazên Baasîyan û hevalbendên wan berûpaş kir. Her weha helwesta rêveberîya siyasî ya Kurdistanê Başûr jî hêjayê pesindanê bû.

Em bawer dikin di vê hejmara WAR-ê de hunê gelek nivîsên balkêş bixwînin. Heta biderhatina hejmareka di ya WAR-ê di nav xêr û xweşiyê de bimînin.



Hebûna Gelê Kurd Li Sûryê

Meşal TEMO

I) HEBÛN

Berî ku rûpelên dîrokê vekim, bi kurtî ez ê li ser hebûna gelê Kurd li Sûryê rawestim. Gelê Kurd, bi encama peymana Saykes-Pikot ya di sala 1916-an de hate parçekirin. Ji van parçan yek jî di nav sînoren Sûriya niha avakirî de ma. Ji bo ku gelek Kurdên me pê bizanibin parçek ji Kurdistanê, li Sûryê heye em ê hin bawernameyan ji wan re raxin:

* Bi encama gerîna paşmayên Hûrî yê di Girê Mozan de (Girê Mozan, gundekî Kurdistan e), li nêzikî bajarê Amûdê ye. Zanyarên şopemeniyê dibêjin ku ew gir "Girê Orkêş" e. Berê ew der paytexta kişwera Hûriyan bi xwe bûye di sedsala 2200-2500-ên berî zayînê de. Sînoren welatê wan ji rojhilat ve çiyayên Zaxros, ji bakur ve çiyayên Mêrdînê, ji rojava ve heta çemê Xêbûr bûye.¹

* Mîtanî jî yek ji gelên Hindî-Ewrûpî ne. Kişwera wan di serdema 16-an de ya berî zayînê berdewam bûye û paytexta wan jî "*Aşokanî (Waşokaniyê)*" bû. Ew jî zanyarê şopemeniyê dibêjin ku di "*Girê Fexariyê*" de bûye û ev cî li teniştê bajarê Serê Kaniyê ye. Li aliyê çemê Xêbûr dikeve. Çemê Xêbûr, sînore Mîtanîyan yê rojhilat bûye û çemê Ferat sînore rojava bûye.²

* Şahinşahiya Mîdya, ya ku di sala 612-an a berî zayînê de ava bûye. Çemê Dîclê ew û Babilî ji hev vediqetandin. Sînore Mîdya ji çemê Dîclê heta ber bi başûrê çiyayê Ebidilezîz(Hişîça) û ji wir jî ji çemê Ferat derbas dibû û li başûrê çiyayê Kurmênc (Efrîn) jî digihaşt Bakurê Rohilatê Derya Sipî.³

* Di dema Selahedîn Eyûbî de, jixwe ev welat tev di bin destê wî de bûn û di dema mîristanan de jî sê mîristan hebûn ku hin ji zemîna Kurdistanê rojava tevlî wan dibû:

1- *Mîristana Canbolat*: Di sala 1607-an de hebû û navenda wê bajarê Kilîsê bû. Çiyayê Kurmênc(Herêma Efrînê) tev di nav çarçova wê de bû.

2- *Mîristana Bedîrxanî*: Di sala 1812-1848-an de, ew jî li herêma Cizîrê, li bakurê rojhilatê Sûryê de bû û ew herêm tev di bin destê wan de bû.

3- *Mîristana Brahîm Paşa yê Millî*: Navenda wê bajarê Wêranşahir bû. Sînore wê jî digihaşt nêzikî bajarê Hisîça. Gava Brahîm ji aliyê Osmaniyan ve di sala 1908-an de hate bi dûrxistin, piştî mirinê, li gundê Sifeya bakurê bajarê Hisîça hate veşartin.⁴

Nivîskarê Danimarkî *Karistin Niyoboehr* li ser nexşeyek ku di sala 1764-an de, di rêwîtiya xwe ya herêma Cizîrê û teqezandina wê ya li ser hebûna hin êlên Kurdî yên wê demê tê de navê wan deveran belav kiriye û bi vî awayî rêz kiriye navên van herêman: *Deqorî, Kîkî, Milî, Aştî*.

Gerokê Feransî *Folni* jî, di pirtûka xwe ya ku di sala 1870-an de hatî weşandin de bi dorfirehî li ser Kurdên Çiyayê Kurmênc disekine. *Filip. B. Rondot* di pirtûka xwe ya bi navê *"Les kurdes de Syrie"* de dibêje ku hin êlên Kurdî di herêma Cizîrê de hene ku berî damezrandina kîşwera Eyubîyan e jî. Wekî êla Kîkan.⁵ Heta roja îro jî gelek cîwar hene ku bi navê Kîkan têtin naskirin. Wekî *Qoça Reşîd Beg* (serokê êlên wê demê), an jî bi navê *Qoça Kîkan* tete nasîn, ew jî li başûrê Dirbêsiyê bi 50 km dikeve. Kepezê Kîkan 5 km li rojavayê Dirbêsiyê dikeve. Jixwe cîwarên wisa ku êlên Kurdî hê jî lê dijîn gelek in di herêman tevan de. Dîsa Rondot, di ciyekî di yê wê pirtûkê de dibêje ku: *"Hemwelatiyên Kurd di bin desthilatdariya Fransa de li ser dirêjiya sînorê Tirkîyê ne û di sê herêmên li pey hev dijîn. Herêma yekemîn; ji Çemê Diclê heta bi Xabûr e. Bi dirêjahiya xwe 250 km ye û panbûna(ferehiya) xwe 30 km ye. Herêma duyemîn; li derdora Ferat e. Bi dirêjahiya xwe 60 km ye û firebûniya xwe 40 km ye. Herêma sêyemîn jî li Efrînê ye û ew jî nêzikî bajarê Helebê ye."*

Anî û Lorant Shabrî jî, di pirtûka xwe ya bi navê *"Siyaset û kêmneteweyên ku bûn sedemên teqandinê"* de jî, li ser hebûna kêmnetewan gelek nexşe weşandine. (Ji pirtûka *Anî û Lorant Shabrî* ya bi navê *"Siyaset û Kêmnetew"* bi zimanê Erebbî, rûpel: 473.)

Gelek jêder û pirtûkên Erebbî, çêrî êlên Kurd kirine û wan bixwe êlên Kurd ji rojhilat heta bi rojava, hejmartine û wisa rêz kirine:

- 1- **Mîran an jî Koçer:** Li herêma Dêrikê heta ber bi bajarê Rimêlanê.
- 2- **Hesinan:** Li herêma Dêrikê heta ber qiraxê çemê Diclê ber bi aliyê başûr ve.
- 3- **Aliyan:** Li derdora Rimêlan û Çilaxa dijîn.
- 4- **Hevêrka:** Li herêma Tirbe Spiyê dijîn.
- 5- **Aştan:** Li herêma Qamişlo, ber bi başûrê çemê Cerahê ve dijîn.
- 6- **Bobelan:** Li rojavayê Qamişlo ne.
- 7- **Mêrsînî:** Li rojhilatê Amûdê ne.
- 8- **Gabara:** Li başûrê Amûdê ne.
- 9- **Deqorî:** Li herêma Amûdê ne.
- 10- **Milan:** Li rojavayê Amûdê ne.
- 11- **Kîkan:** Li herêma Dirbêsiyê ne.
- 12- **Millî:** Li rojhilatê Serê Kaniyê ne.
- 13- **Berazî:** Li herêma Kobaniyê ne.
- 14- **Kîtikan:** Li Efrînê ne.
- 15- **Şêxan:** Li Bilbil û Reco ne.
- 16- **Cûmî:** Li Efrînê (Cindirêse) ne.
- 17- **Amkî:** Li Şiyê û Reco belav bûne.

Ji bilî van êlan jî, gelek ji wan ên koçer jî li kozên(parêzgeh) mezin ên Hemayê, li çiyayên Laziqiyê, Reqayê û li Şamê dijîn.⁶

Ev êlên ku me navê wan hejmartin heta roja îro jî di herêmên xwe de dijîn.

Piştî ku me hin mînakên dîrokî li ser hebûna Kurdên Sûryê li ber çavan raxistin, wekî gelekî ku xwediyê zemîn û axa xwe ye û bê ku em zêde dorfireh bikin em ê hinekî li ser dema Osmaniyan bisekinin. Ji ber ku hingê ev welat tev di bin destê wan

de bû û ne sînôr hebûn û ne jî homaniya kişweran. Ya baş ew e ku em derbasî serde-
ma sedsala bîsta bibin û em li ser wê yekê bisekinin ku çilo sînôr hatin danîn...

Piştî peymana *Saykes-Biko û Projeya Parçekirina Paşmayên Osmaniyan* ku di navbera Îngiliz û Fransa û Rûsan de çêbû û Kurdistan bi vê encamê bû çar parçe û bi encama peymana *San Rîmo* ya ku di 19-26 Avrêla sala 1920-an de pêkhatî de; Cizêra Kurdî tevli Sûryê bû û ciyên di jî di sala 1921-an de tevli bûn. Û goriya vê yekê jî sînôrê navbera Sûryê û Tirkîyê hate danîn. Ev peyman di navbera dewleta Fransa û Tirkîyê de, di 09.03.1921-an de, li Londonê hate mohrkirin. Ew peyman bi xwe du caran hate rastkirin û guhertin. Ya yekemîn li Enqerê, di 20-ê Çiriya pêşî ya sala 1921-an de çêbû.⁷ Ya duyemîn bi peymana *Covnan* a di sala 1926-an de bû. Lê sînôr forma xwe ya dawî nestand heta sala 1939-an. Gava herêma Eskenderûn tevli Tirkîyayê bû, li hember wê jî sê herêmên Kurda dane Sûryê, ew jî: Cizîrê, Kobanî û Efrînê bûn. Her sê jî dirêjahiya zemîna Kurdistanê bakur in û jixwe li seranserê sînôr êl û malbatên Kurdan hatine parçekirin. Û ya di jî ku divê mirov pê baş bizanibe ew jî ev e ku Sûryê bi navê welatê Şamê bi nav dikir û ew jî ji van welatan pêk dihat: Sûryê, Libnan, Urdin, Felestin.

Jixwe ev warên parkirî di bin kelîja Fransa de bûn. Felestin û Urdin ketibûn bin kelîja Îngilterê. Û gava mirov vegere bawernameyên nivîskarên Ereb yên li dijî Osmaniyan, wê mirov bibîne ku rojekî jî rojan herêma Cizîrê ne di nav daxwazên wan de bû. Sûryê serxwebûna xwe, di 17.04.1946-an de ji Fransayê stand.

Di roja îroj de Kurd li bakur û li rojhilata Sûryê ber bi dirêjahiya sînôrên Tirkiyayê ve û hin ji ber bi yê Iraqê de ne. Li ser zemîna xwe ya dîrokî dijîn. Vêga dewleta Sûryê bi sê parêzgeh e, ew jî: Hîsiça, Reqa û Heleb in. Ji bilî ku komên mezin ji Kurdan di parêzgehên mezin de hene. Li Şamê, di dema Selahedîn de, taxek bi navê Kurdan hebû ya ku di destpêka sala 1963-an de hate guhertin. Kurdên li Şamê bi cî û war bûne ji ber sedemên aborî û ji astengên şovenî koçî Şamê kirine û niha taxek li rojavayê Şamê çêbûye bi navê Zorava. Di vê taxê de bi sed hezaran Kurd di nav rewşeke kambax û dijwar de dijîn.

2) RÛBER

Wekî me dîyar kir ku Kurd li seranserî du sînoran dijîn, nemaze yê bakur, ew rûbera ku Kurd tê de dijîn carna pahn dibe û carna jî zirav. Lê her berdewam e ji çemê Dîclê heta bi çiyayê Kurmênc, wisa jî rûbera Kurdistanê rojava dîghêje 18300 km² yê.⁸

3) NIFÛS

Di Sûryê de tu car jimartineke taybet ji Kurdan re çênebûye ji bilî serjimêra ku di sala 1962-an de çêbûyî pê ve. Jixwe ew tenê li herêma Cizîrê çêbû û em ê paşê bi dorfirehî li ser rawestin, lê li gor hin dîroknasan ku dibêjin di vekolînek bi navê *"The Case Of Kurdistan"* ya berî şerê Cihanê yê Yekemîn hatî weşandin de, hejmara gelê Kurd li Sûryê bi hejmara 289940 hezar kesan hatibû dayîn.⁹ Goriya texmînên jêderên kurdî tev dibêjin ku li gor jimartinên fermî yên li herêman çêbûne, wekî Cizîrê û

Efrînê mirov dikare bêje ku nifûsa Kurdan li Sûryê nêzîkî 2-3 milyon kes in. Çimkî di jimartina fermî ya ku di sala 1960-an de li Cizîrê çêbûyî de hingê nifûsa herêmê 400 hezar kes bûn. Ji wan, li gor wê jimartinê %70 Kurd bûn û pê re jî hate dîyarkirin ku zêdebûna nifûsan serê % 0,32 ye. Yanî di sala 2002-an de, wê nifûsa herêmê çiqas be û li gor wê nifûsa Kurdan jî têtê jimartin. Jixwe ji hemwelatîyên li herêma Kobanê û Efrînê % 95 wan Kurd in û ji bilî her sê herêmên Kurdî, Kurd li hin bajarên Sûryê yên din jî hene, wekî Lazîqiyê, Hema, Şam û Helebê... Hin ji wan Kurdan jî zû ve li van bajaran dijîn. Û mirov dikare bêje ku gelê Kurd nifûsa wî ji tevahiya hejmara nifûsa %15 ya Sûryê ye.

4) BAJAR

Li herêma Cizîrê bajarê Kurdî yê sereke Qamişlo ye. Bajarê ku tevger û çalakiyên Kurdî di nav pêlên kolanên wê de hatine damezirandin. Dêrika ku li ser qiraxê çemê Diclê ye, heta bi Serê Kaniyê, ya ku paytexta Mîtanîyan bû û bi navê Aşokanî dihate nasîn, heta bi Tirbe Spiyê, Amûdê û bi Dirbêsiyê ve, û tevî wan li ser sînora rêz dibin. Li herêma Kobanê bajarê mezin Kobanê ye û hin bajarokên biçûk hene, wekî Girê Sipî(Tel Ebyed). Efrînê jî herêmeke mezin e, nêzîkî herêma Qamişlo ye, di vê herêmê de bajarê herî mezin Efrîn e. Cendîrs, Reco û gelek ên di jî bajarok in. Lê taybetîyeke herêma Efrînê heye ku gundên wê mezin in, mîna navçeya li ser çiyayê Kurmênc de belav bûne. Û wekî mînak em ê li ser hin bajaran bi dorfirehî bisekinin.

4. a) Dêrik:

Navê wê ji Dêra (Filan) tê. Ev dêr heta nûha jî heye û bi navê *Dêrika Hemko* têtê nasîn. Hemko jî yek ji mîrên êla Hesniyan bû. Mîrê Botan ev gund(hingê) dîyarî wî kiriye li hember xizmetên ku jê re dikir. Fransîyan ciyê wê guherîn û hinekî dûrî çemê Diclê birin. Dêrik dûrî navenda bajarê Cizîra Botan e bi 17 km an. Çawa ku gelek dîroknaş navê vê herêmê dikin (Niklê Werdekê), ji ber ku dikeve navbera sê sînoran, di sala 1929-an de tevî Sûryê hate kirin. Çiyayê Qereçox li başûrê herêmê, wê dike du beş. Bakurê Qereçox bi navê Deşta Hesniyan têtê nasîn û başûr jî bi navê herêma Koçeran dihat nasîn. Her du jî êlên Kurdî ne. Di sala 1936-an de navê wê kirin herêma Diclê û di salên 1960-1961-ê de navê Malikîyê lê kirin. Nifûsa wê 200 hezar e. Nêzîkî 30 hezarî jî gelê vê herêmê li bajêr dijîn û du melbend pê ve hatine girêdan ew jî; Çilaxa û Girê Koçer e. Û bajarê karmendên petrolê yê bi navê Rimêlan têtê nasîn.

4. b) Qamişlo:

Navê wê ji lewen(qamûş) tê, hingî lewen pirr bûne di qirexên çemê Çexçexê de, lewra bajar navê xwe ji lewenê çem standiye. Qamişlo bajarekî nû ye. Fransîyan di destpêka 1925-an de bajar hîlbijartine û kirine navenda herêmê. Bajar 2 km dûrî navenda bajarê Nisêbînê ye. Lê di roja îroj de tenê sika tirênê her du bajaran jî hev vediqetîne. Di dema Romayîyan de navê vî çemî *Mikdonîos* bûye, paşê navê vî çemî

guheriye û kirine çem Çexçex. Çexçex tê wateya ava bi xuşîn ku deng dide, nûha jî miçiqî ye. Ji ber ku Tirka berbest li ser ava kirine. Nifûsa Qamişlo îroj digêhêje 500 hezar kesî bi gundê xwe tev. Melbendên pêve girêdayî Tirbe Spî, Amûdê û Tel Hemîsê ne û ji van her sisîyan dudu Kurd in û yek Erebe.

4. c) Serê Kaniyê:

Bajarekî Mîtanî ye, bi navê *Waşokanî* tê nasîn û jê re digotin *Sîkanî*. Hingî kaniyên wê pirr in, di Baybil (Tewrat)ê de Cihûyan navê *Xozana* lê kiribûn. Romaniyan bi navê *Tiodosîolios*, Aşûriyan navê *Reşaêno* û Ereban jî navê *Re'salaîn* lê kiribûn. Hemwelatîyên wê yên bingehîn heta nûha jê re dibêjin Serê Kaniyê. Waşokanî pay-texta Mîtaniyan bû. Di sala 1350 ya berî zayînê de Mîtanî şaxek ji Hurî û Sobariyan bûn. Nifûsa wê di roja îroj de wekî bajar 35000 hezar kes e, lê tev melbend û gundên xwe digihêje 150 hezarî, çimkî bajar û gundên Dirbêsiyê pêve hatine girêdan. Ji kaniyên wê çemê Xabûr çêdibe, li ser sînore û jixwe dirêjahiya wê deşta Şingal, Nisêbînê û Heranê dide ber xwe. Bajarekî kevnare û dîrokî ye.

4. d) Efrîn:

Efrîn wekî bajar, navenda herêma xwe ya ku bi wî navî bi xwe tete nasandin. Herêm bi dirêjahî 55 km ye. Pahnûna wê 75 km ye. Jixwe çemê Reş sînore bakur e û çemê Efrînê bajar dike du beş. Hemwelatîyên Efrîn bi tevayî Kurd in û piraniya wan cotkar in. Herêma Efrîn bi çiyayê xwe bi nav û deng e, deşt lê kêr in. Herêm piranî daristan in û zêdeyê darên wê jî darên zeytûnan e. Vê yekê hiştiye ku Efrîn bi zeyta xwe awarte be û bi navê Zeyta Kurdî tê bi navkirin. Nifûsa wê nêzikî 600 hezar kesî ye û ji sedema astengiyên aborî gelek ji hemwelatîyên wê koç kirine bajarê Helebê. Vêga li dora 200 hezar Kurd li vî bajarî dijîn.

5) HELKEWT

Berî ku li ser vê mijarê bisekinim, dixwazim hinekî bi kurtî xwendevanan ronî bikim. Dîroka çêbûna Sûryê wekî kişwereke hemdem, ango di dema piştî Osmaniyan de û bi encama parçekirina paşmayên wê û li gorî benda 22-an a ku di Peymana Yekîtiya Miletan de hatibû diyarkirin de wisa dibêje: "*Hin gelên piçûk hene ku berê di bin kelîja Osmaniyan de bûn, gihastîne radeyeke pêşketinê û bi awayeke pîrensîbî danasîna wan di şewirandin û piştigirtina serdest de hatiye kirin.*" Wê demê welatê Şamê di bindestê Fransa de bû û di sala 1922-an de yekîtiyek hate ragihandin di navbera Şam, Heleb û Lazîqiyê de. Û di sala 1922-an de kişwera Sûryê hate diyarkirin di navbera du parêzgehane de; Şam û Heleb. Û cara yekemîn serokê wê çêbû, bi navê *Sibhî Berekat*. Di sala 1936-an de, du herêmen din tevî wê bûn ew jî: Lazîqiyê û çiyayê Dirûzan bû. Û dîsa di wê salê de cuda bûn. Di sala 1942-an de jî, şûnve vegeeriyên kişwera Sûryê.¹⁰ Di vî warî de divêt em bizanibin ku heta sala 1976-an, di pirtûkên dîroka Ereban de yên ku li dibistanan dihatin xwendin de, gelek nexşe

hebûn ku herêma Kurdistan di wan de bi nav cî digirt. Tev ku bi nivîsandin tiştêk tune be jî, lê ji xêzên li ser nexşeyan sînorên Kurdistan li ber çav e. (bn. *Dîroka Ereban*, Weşanên Şalyariya Perwerdiyê 1975-1976, rûpel 52, Sûriye)

Xaleke di jî ku gelek giring e û dixwazim hinekî li ser rawestim ew jî akamiya bûyerên parçê Kurdistanê bakur e. Çimkî yê rojava dirêjahiyek jê re heye, lewra di dema navbera her du şerên cihanê de girêdanek xurt di navbera her du parçan de hebû, nemaze dema ku serhildanên li dijî Tirkên vîdiketî û bi taybet jî wekî rapêrînên Kurdan ên di salên 1925-an û 1938-an... Helbet ev akamî bi hestên netewî ve girêdayî bûn. Kurdên ku ketin bin xeta trêne li aliyekî û li aliyê di jî mişixetbûna hin berpirsiyarên Kurdên bakur. Wekî Mîr Celadet û Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza û hwd... Hişmendiya netewehesîya van kesan ku Kurdên Sûryê bi hestên netewî dan hisandin, vê hisandinê bi xwe hişt ku berpirsiyarên Sûryê bêjin; "ew Kurdên ku li seranserê sînorê bakur in li hember wan, aliyê di yê sînor jî Kurd in." Mîrov dibîne millet û welatê Kurda di navbera Tirkiyê, Sûryê û Iraqê de parçe bûye. Xweh û birayên hev in, belav bûne di wê herêmê de, li benda xewna xwe ya zêrîn, Kurdistan nin."¹¹ Bi vî awayî hêja jî girêdanek di navbera Kurdên bakur û rojava de maye. Lê di sala 1957-an de ev nêzîktêdayîn hate guhertin û berê Kurdên Rojava ber bi aliyê parçê Kurdistanê Başûr ve çû. Ew jî piştî şoreşa Barzanî û vejîna PDKS û komelên Kurd ên netewî yên li Sûryê hat pê. Gelê Kurd jî li gorî hemû qonaxên pêvajoyan ku li Sûryê çêdibûn de, ew jî bi van bûyer û guhertinan ve girêdayî bûn. Bi bawerîya min temtêlên ciyakarên ji pîrsa Kurdî re li Sûryê çar xal in:

1- Parçebûna dagirkeran li Kurdistanê, xalek bi giştî ye li hemû parçeyan.

2- Mandel(înkâr) û nedanpêdana Sûryê ya fermî bi hebûna Kurdan û pêkanîna projeyên şovenîzmê li ser wan pêk dihêne.

3- Veşartin û serbiserdana hin hêzên Kurdistanê bakur û başûr bi parçê biçûk û gelek caran jî ji layê hêzên Kurdistanê bi xwe ve hatiye mandelkirin.

4- Xebata gelê Kurd li Sûryê.

Pêvajoya gelê Kurd ên li Sûryê him di bin siya aloziya van her çar xalên Kurdewar de, him jî di bin dewsa qonaxên binecîbûna Sûryê de borîn. Hinek ji wan qonaxan jî ev in:

- Dema Fransa,
- Dema serxwebûnê,
- Dema yekîtiya bi Misrê re û veqetandina ji Misrê,
- Dema kelîja Partiya Ba'as û heta roja îroj.

6- DEMA FRANSA (1920-1946)

Dema Fransa derbasî Sûryê bû, di gava destpêkê de Serleşker General *Xoro* raste rast çû ser tîrba Selaheldînê Eyubî sekinî û got: "*Va ye, em dîsa vegeyriyan..!*" û Fransîyan bi vê helwestê di gava xwe ya pêşî de projeyên xwe ava kirin ku Kurd jî bo parastina hawsenga kêmetewên Sûryê pêwîst in. Nemaze Fransa çar kişwer ragihandibûn.

Lê hingê piraniya Kurdan li hember vê yekê derketin. Lêbelê Fransîyan li gorî berjewendiyên xwe danûstendin bi Kurdan re kirin. Ew jî bêtir bi xwesteka têkeliyên Fransa ve girêdayî bûn û hedarnebûna wan têkeliyan jî heta astekê jî bi Tirkên re hebû

çimkî tim ew têkilî dilolijîn. Lê mirov dikare bêje ku tu projeyên wan tunebûn. Ne ji bo danpêdan û ne jî ji bo piştaftin û tunekirina Kurdistan.

Gelek çalakî û xebatên Kurdî yên ku wê demê di derbarê pirsra Kurdî de çêdibûn de Fransa nedigot na. Lê çalakiyên Kurdî yên li dijî Tirkên piştî sala 1925-an hatin qedexekirin ango ew çalakî li dijî berjewendiyên Fransiyê hatibûn girêdan. Tevî wî jî rewşenbîr û welatparêzên Kurd komela "*Xwoybûn*" damezrandin û kongira wê ya yekem di sala 1927-an de li Libnanê, li bajarê Behemdûn li dar xistin.

Ev komele sîyasî û çandî bû ango mirov dikare bêje ku bi tevayîya xwe li ser bingeheke jiyanê kurdewar hatibû avakirin. Lewra jî çalakiyên wê zû belav dibûn di herêmên Kurdî de û li Şamê. Bi sedema hebûna Celadet û Kamûran Bedirxan wekî du kesên bîrgeş û zanyar di serokatiya wê de ku cî girtibûn. Di bawernameyê Kurdî ya kevintirîn de jî kelîja desthilatdariya fransiyê re hatibû pêşkêşkirin. Ev bawername ji aliyê hin rewşenbîr û serokên êlên Kurdî ve bi mehna komcivîna komela bingehîn a Sûryê ve, di 23.6.1928-an de hatibû diyarkirin. Di vê bawernameyê de kesên ku îmze kiribûn gelek daxwazên xwe rêz kiribûn û pêkanîna wan xwestibûn di bin kelîja(desthilata) çarçova Sûryê de, hin jî wan daxwazan jî ev bûn:¹²

- 1- Bikanîna zimanê Kurdî, wekî zimanekî fermî di herêmên Kurdî de li tenişt zimanên fermî yên din.
- 2- Xwendin û fêrbûna zimanê Kurdî di dibistanên herêmên kurdî de.
- 3- Daxwaza guhertina karmendên Erebiyê yên Kurdî di herêmên kurdî de.

Ji bilî wan daxwazan jî, di wê demê de gelek çalakî dihatin lidarxistin û mirov dikare hin ji wan çalakiyan rêz bike:

* Komela Comerdîya Kurdî di destpêka sala 1930-î de ava bû û razgirê wê Şewket Zilfî bû.

* Çapxaneya yekemîn a Kurdî li bajarê Helebê ji aliyê wêjevanê Kurd Huseyn Mûkriyanî ve di sala 1915-an de hate avakirin. Bi destpêka vê gavavêtinê jî nivîsên kurdî, pêşî bi tîpên erebî û paşê jî bi tîpên latînî hatin çapkirin. Di wê demê de pirtûkên rêziman û pirtûkên di yên bi Kurdî hatin çapkirin û belavkirin.

* Mîr Celadet Bedirxan, di 15-ê Banemira 1932-an de, li Şamê, bi tîpên latînî kovara *HAWARê* weşand. Kovara *HAWARê* heta 15-ê Tebaxa 1942-an berdewam kir. Kovar 57 hejmar hate weşandin.

* Mîr Celadet, pirtûkxana *HAWARê* ava kir. Pirtûkxaneya *HAWARê* nêzikî 20 pirtûkan weşand.

* Kovara *RONAHÎ*, di sala 1941-î de ji aliyê Mîr Celadet ve hate weşandin. Kovara *RONAHÎ* kovareke hefteyî bû.

* Komela *HÊVÎ*, di sala 1937-an de hate avakirin.

* Tîma gogê li Şamê, di sala 1940'an de bi navê Kurdistan hate avakirin û xelata qehremaniyê stend.

* Bexşgehek li Beyrûtê, di sala 1937-an de, weşana xwe kir her roj du saet di bin berpirsiyariya Kamûran Bedirxan de. Ev sazî, di sala 1946-an de ji aliyê xuhermenda Libnanê ve hate girtin.

* Qlubeke sporê, di sala 1939-an de, li Amûdê ava bû.

*Kamûran Bedirxan li Beyrûdê, di sala 1943-an de, du kovar bi tîpên latînî der-anîn: Kovara *Roja Nû* û kovara *Stêr*.

Helbet ev kovar û çalakî tev ji ber encamên biryarên xuhermendên neteweyî yên li Sûryê û Libnanê ve hatin rawestandî û qedexekirin. Li hember wan çalakiyan kesên Erebbi yên tengbawer hebûn, dixwestin ku toven şovenîzmê biçînin. Heke mirov mîna bîrê bide; rojnameya *"Al Ayam"*, ya ku 11.07.1932-an de li Şamê belav dibû wisa nivîsandibû: *"Penaberên Kurd dixwazin welateke netewî ji xwe re li Sûryê ava bikin"* û di babetê de êrîşî Kurdan dikir. Ev gotar û hinên din ê mîna wê mirov dikare bêje ku bangehên şovîni bûn, lê hingê di bin destê desthilatdariyê de bûn û serê xwe bi şermî hildidan. Bawerim ku çalakiyên wê qonaxê gelek giring bûn, lê giringtirîn xebat pêkanîna elfabeya Kurdî ya latînî bû ku rola Mîr Celadet Bedirxan a di vî warî de qet nayê jibîrkirin. Bi encama wan hestên netewî jî gelek rewşenbîr, helbestvan û nivîskarên Kurd derketin holê. Pê re jî, di sala 1936-an de qursên zimanê Kurdî li gelek gundên Kurdan vebûn, ew jî dibû bingehek ji lêkedana rewşa Kurdî û dibistanek, ji avakirina pêşketina netewa Kurd re.

7) DEMA SERXWEBÛNÊ(1946-1958)

Di dema destpêka serxwebûna Sûryê de rewşa Suriyê bi giştî bê hedarî bû, çimkî Fransiyayê bi siyaseta xwe beşdariyek bi giştî kiribûn. Di avabûn û gurtirina hestên kêmnetewiya Sûryê de, nemaze ku kişwer ên ragihandibûn tev bi bingeha olî an kêmnetewe bûn û wê yekê jî hişt ku gelek kes ji kemberên olî derkevin û bi aliyê rewabûna netewî ve herin û kişwereke(dewleteke) netewî ava bikin. Çimkî rêyeke yekane bû ji bo ku hebûn û berdewamiya rola wan di pêşeroja Sûryê de hebe. Tevî wisa jî divê neyê jibîrkirin ku Fransa jiyaneke parlemanî di Sûryê de ava kir û di sala 1928-an de jî destûra yekem hate dayîn û ev destûr jî ya parlemenî bû. Ji wê demê ve ye ku jiyana parlemanî di Sûryê de dest pê kir. Heke berdewamiya wê girêdayî berjewendiyên Fransa bû jî, lê di dema wan de jiyana parlemanî bi hedarnebûna rewşa hundirê Sûryê ve ma girêdayî heta piştî serxwebûnê. Lewra her pênc salên, ji 1949-1954-an cîyakar bûn bi pîrbûna 'Cunta' yên li dû hev dihatin û tişteke gelek balkêş e ku her sê efserên wê jî yên bi 'Cuntayê' rabûyî, an jî kêmnetewan û an jî ji kemberên olî bûn!.. Di 1954-an de rejîma komarî vegehiya, heta sala 1958-an. Ev demeke ronî bû di dîroka Sûryê de. Ji aliyê yasayên hîlbijartinê, saziyên rîjîmê, pêşketina jiyana aborî, civakî û mirovan ve û ji aliyê nerîn û helwesta wan a li hember Kurdan ve. Mirov dikare bêje ku ew dem destpêka derketina nerîn û helwestên şovenî û nijadperestî bû. Bi taybet jî, sala 1952-an. Di baweriya min de nijadperestiyê heza xwe ji derketina kom û partiyên îdelojîk yên ku bi destê kesên bingeha xwe ji kêmnetewan, ji kemberên olî girtibûn pêk dihatin. Jixwe kêşa avakirina neteweyek Erebbi, kesên ku pê rabûn jî piraniya wan ne Erebbi bûn. Lê di wê riyê de wan kesan dixwestin ku berjewendiyên kêmbere xwe bi ser bixin. Di çarçova netewa Erebbi ya fereh de, dixwestin ku bi sirûdên hesteyî berpirsiyariyê bidest bixin û heger Tirkên xwe bi Misilmantiyê pêça bûn jî, lê li Sûryê kemberên olî bi netewa Erebbi ya mezin xwe pêçan û xwe li nêrîna olî-neteweya tekane asê kirin. Lewra ne bêhemd bû ku

damezranerên Partiya Ba'es ku *Mîşêl Eflêq û Zekî Arsozî*, her du kes avakarên bingehîn bûn ku yek ji wan ne Mîslman e û yek ji kêmbereke olî ye. Wisa jî 'Partiya Kominist'; Ermenî, Cihû û Kurdan ava kir. Bi vî awayî jî Partiya Sûryê ya netewî û civakî hate damezrandin. Her ku damezranerên wê ne Erebbûn jî, lê wê partiyê doza netewa Sûryê dikir û di bernama xwe de digot ku; "*neteweyek Erebbî di Sûryê de tune ye lê gelek kêmbetew hene û bi hev jîna tevan netewa Sûryê çêbûye*".

Helbet wê demokrasiya zayenî akamiya xwe li Kurdan jî dikir, bi giştî jî li xwendevan, rewşenbîr û welatparêzên ku xwedî bîr û bawerî bûn. Belkî di destpêkê de hindik bûn lê bi demê re zêde dibûn, mezintir û bi rûmetir dibûn. Çimkî ne tenê akamiya rewşa Sûryê li ser wan hebû, akamiya mezin jî ji aliyê Kurdistanê Başûr ve dibû û tîrêjen roniya netewî belav dikir. Di sala 1949-an de, di kongira "Ciwanên Dîmoqrata" de ku ev kongire li paytexta Macarîstanê li Bûdapeştê çêbibû de, Nûredîn Zaza wekî nûnerek, bi navê 'Nûnêriya Kurdistan' beşdarî vê kongirê bibû û axaftineke bi navê Kurdan tê de kiribû. Bi vê nasname xwe jî di kongirê de hatibû pejirandin. Wê demê Nûredîn Zaza li Lozanê dixwend û bi beşdariya çend xortên Kurd "Komela Xwendevanên Kurd" li Ewropa damezrandibûn. Nûredîn Zaza, jî serokê wê bû. Rojnameyek bi navê "Dengê Kurdistan" û bi sê zimanan; Kurdî, Fransî û Îngilîzî dihat weşandin.¹³

Helbet wekî hemû gelên li Sûryê, akamî li xortên Kurd jî dibûn bi riya nêrîn û helwestên ku belav dibûn. Ji vê demokrasiyê netewa Erebbî, ji aliyekî ve netewa Kurdî û ji layekî ve jî ramanên komonîstî sude jê wergirtin. Bi taybet jî li Qamîşlo û li hemû deverên Sûryê, navend û saziyên çandî dihatin vekirin. Hingê saziyên fermî û gelek jî yên taybet hebûn, wekî; sînema, şano, ajansên kargehên mezin, tevgera çandî û siyasî gelek xurt bûn û ji vê yekê jî Kurd ne bêpar bûn. Yek ji çalakiyên wan damezrandinan jî "*Komela Yekîtiya Ciwanên Demokratên Kurd*" bû. Ev komele ji aliyê hin xortên Kurd ve hatibû avakirin, wekî; Mihemed Mela Ahmed, Samî Namî, Derwêş Mela Suleyman û hwd... Û armancên komelê jî ev bûn:

- 1- Demokrasi rêbazek e ji bo mafên netewî.
- 2- Li hember desthilatên kevneperest û dagirkeran azadî.
- 3- Xwendina zimanê Kurdî di dibistanên Kurdî de. Û vekirina komel, navendên çandî û civakî yên Kurdî.
- 4- Mafên jinan di civatê de.

Di destpêka 1955-an de bi berpirsiyariya Osman Sebrî, komeleya "*Vejiya Çanda Kurdî*" hate damezrandin.¹⁴ Û ji bingehên xebata wê komelê, çapkirina hin pirtûkên Kurdî dest pê kir.

Bi tevayî rewşa Sûryê hişt ku pêdiviyek bi hebûna partiyeke Kurdî hebe. Çiqas diçû helwest û nerînen nijadperestên Erebbî li hember dijîtiya Kurdan zêde dibûn, lewra divabû ku saziyeke siyasî hebe ku Kurdan bike yek û xebatê di ber mafên wan ê netewî û mirovanî de bike. Bi vê helwestê çar kesên Kurd; Osman Sebrî, Abid Alhemîd Derwêş, Şêx Mihemed Îsa Mehmûd û Hemze Newêran, di Tebaxa 1956-an de bi şewra Nûredîn Zaza, civîna xwe ya yekem li dar dixin û biryarê didin ku partiyeke Kurdî ava bikin.¹⁵ Di vê civînê de biryara avakirina 'Partiyeke Kurdî' didin lê ranagihînin heta ku nivîsandina bernama û projeyên partiyê amade dikin. Hingê jî

Nûredîn Zaza di dawîya meha Cozerdana/Herzîrana 1956-an de ji Lozanê vegeyriyabû û xwendina xwe temam kiribû. Nûredîn Zaza wê demê di Zanîngeha Şamê de mamostetiya perwerdehiyê dikir. Roleke Zaza ya xurt hebû di alîkariya damezrandin û nivîsandina bernama partiyê de. Piştî demekê bername hate çapkirin û belavkirin, bi navê *"Partiya Dîmoqrata Kurdistanê li Sûryê"*.¹⁶

Bi kurtî xala bîngêhîn di vê bernamê de ev bû: *"Bervedaniya ji bo hebûna netewa Kurdî û pêkanîna mafên netewî, çandî û kargêrî di çarçova rejîmeke demokrat de li Sûryê"*.¹⁷

Ji bilî wisa jî li çiyayê Kurmênc hin xortên Kurd ji *"Partiya Kominîsta Sûryê"* veqetiyabûn. Ji wan; Reşîd Hemo, Mihemed Alî Xoce, Şewket Henan, Xelîl Mihemed ji bo ku tevî 'Partiya Kurdî' ya nû bibin gengeşe dikirin. Ev gengeşe biserket û bi encamê serketinê ew kes beşdarî civîna 14 Cozerdana 1957-an bûn û ji bo Komîta Navendî hatin hilbijartin. Komîte ji deh kesan pêk dihat û serokê wê jî Dr. Nûredîn Zaza bû. Partiya Kurdî ya li Sûryê, navê wê bû *"Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûryê"*. Ev nav piştî demeke kurt hat guhertin û bû *"Partiya Dîmoqrata Kurdî li Sûryê(PDKS)"*.

Piştî ragihandina partiya PDKS û destpêkirina xebata wê, veqetandinek din di *"Partiya Komanîst"* de li Cizîrê çêbû û bi encama wê Cegerxwîn û gelek kadroyên ku ji vê partiyê veqetiyên, partiyeke Kurdî ya dî damezrandin bi navê *"Azadî"*. Lê danûstandina her du partîyan û hestên netewî xurt hiştin ku Cegerxwîn û hevalên xwe partiya xwe ji hev bixin û bê merc tevî *"Partiya Demokrat a Kurd li Sûryê"* bibin. Wisa jî danûstandin bi berpirsiyarê *"Komela Yekîtiya Ciwanên Kurd"* re hate danîn û ew jî tevî Partiya PDKS-ê bûn. Bi vê yekê jî partiya PDKSê bû nûnêrê gelê Kurd di Sûryê de. Di demeke kurt de endam û dostên partiyê gelek pir bûn û jixwe nêrîn û baweriyên partiyê di rojnameya partiyê ya ku bi navê *"DENGÊ KURD"* de bi Kurdî û tîpên latînî dihat weşandin de dihatin belavkirin. Lê akamiya herî mezin hişt ku endamên partiya PDKS-ê pir bibin û rola wê xurt bibe. Bi vegera Mele Mistefa Barzanî di sala 1958-an de, bi Kurdistanê Îraqê re têkiliyên partiya PDKS-ê dest pê kirin. Komîta navendî, nûnêrê xwe, Şêx Mehemed Îsa şand cem Berzanî ji bo têkilî û alîkariyê.

Goriya min ew dem, dema avazayîna netewî bû. Bi hestên netewî gelê Kurd li dor partiya PDKS-ê dicivîyan, bê ku partî kadro an kesê zana amade bike, bilî serokê partiyê û çend kesên dî. Lê rewş bi çî awayî bibe jî avakirina partiya PDKS-ê rolek pêwîst hilgirtiye wê demê.

8) SALÊN (1958 -1963)

Li Sûryê di demên navbera 1958-1963-an de gelek guhertin çêbûn. Ev guhertin zêde jî li ser nexşeya siyasetî ya hundir û nakokiyên siyasî û îdeolojîk bûn. Pê re jî belav bûna homaniya netewa Erebi ya ku *Cemal Abed Alnasir* serokatiya wê dikir û ji wan beşeke mezin jî xwe li nakokiyên hêzên Erebi di Sûryê de digirtin. Û li alîyê din yê ku xwesteka mana di bin siya yekîtiya bi Misirê re daxwaz dikirin û ji wan hin ên ku dijberî vê yekê bûn û nedixwestin bimînin di bin yekîtiya Misirê pêk dihatin.

Ji wan partiyên ku dixwestin yekîti here serî yek ji Ba'es bû. Çimkî li gor agahiyên wê demê, bêçare bû ji layê akamî û rola di nav civata Sûryê de, lewma jî bi wan dûrîşman dixwest bingehek civakî li dor xwe kom bike û jixwe vê sedemê hişt ku piştî yekîtiya bi Misrê re, di Reşemiya sala 1958-an de çêbe û Komara Yekîtiya Erebi were damezrandin. Ji ber vê yekê jî partiya Ba'es biryara hilweşandina xwe stand. Bi vê encamê jî du hêz di Sûryê de man; Komonîst û Partî (PDKS).

Yên ku li hember tunekirina jiyana siyasî ya di Sûryê de sekinîn, helwesta wan hişt ku êrîşeke xurt ji layê efsêrên komarê bidin ser her du partiyên. Ev êrîş di destpêkê de birin ser Komonîstan û ji pişt re jî birin ser Kurdistan.

"Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûryê" gelek xurt bibû û endamên wê pir bibûn. Gelek weşanên nepenî bi zimanê Kurdî û Erebi belav dikirin, bi armanca danasîna rewş, xebat û helkewta Kurdistan. Û pê re jî nûçeyên welatên Erebi û Cihanê. Di nav van xebatan tev de xebata herî giring di wê demê de, lêkolîna Dr. Nûredîn Zaza ya ku li ser rewşa Sûryê ya aborî kiribû. Wê lêkolînê hişt ku endamên Partî(PDKS) sedemên tevlîkirina Sûryê bi Misrê re binasin.

Helbet roj bi roj nexweşî zêdetir dibûn û stemkariyê cî digirt. Kîdarîşên(kirinên, îcreatên) zordariyê û hilawartî dibûn nîşana yekîtiya xuhermendê. Di destpêka Tebaxa 1960-an de dewletê berê êrîşên xwe dan ser Kurdistan û 5 hezar kes zêdetir hatin girtin. Di nav wan de, zarokên 12-15 salî jî hebûn. Ji ber serveçûnên hov hin endamên partiya PDKS navên kesên ji 'Komîta Navendî' dabûn dest xuhermendê û alavên çapkirinê jî li Helebê dabûn destê parastinê. Lewra piraniya berpirsiyarên PDKS-ê hatin girtin. Di nav wan de; Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza ku wê demê serokê partiye bû tê girtin. Nûredîn Zaza di 8-ê Tebaxa 1960-an de ji kargehê girtibûn û xistibûn bin çav. Hingê berpirsiyarên parastinê digotin ku Kurdên Sûryê alîkariya Israîl dikin û ji piştê ve li miletê Erebi dixin, dixwazin ku parçekî bibirin û tevî kîşwera Kurdî bikin.

Li ser pirsê çima partî çêbûye û li ber tewîjerê parastinê, Zaza bi berevedaniyek wisa parastina netewa Kurd li hember êrîşa Erebi bersivandibû: "... Netewa Erebi bi reng û riyên bêşînor bi destê partiya Ba'es, ya ku Abed Al Nasir bi kar tîne faşîstiyek ber bi çav e! Çimkî armanca wê bişaftina kêmetewan bi xwe ye!..).¹⁸

Di 20-ê Reşemî ya 1961-an de Nûredîn Zaza û hevalên wî dertînin dadgehê bi mehna avakirina partiyek siyasî li dijî armancên şoreşa netewî ya Erebi. Wê demê sê parêzvanên Kurd û yekî Erebi, ji Helebê xwe amade dikin ji bo ku di dadgehê de parêzvanîyê bikin. Jixwe dadmend jî ji Nûredîn Zaza xwestibû ku berevedaniya xwe di raporekê de pêşkêş bike. Zaza di vê rapora berevedaniya xwe de gelek xalên girîng destnîşan kiribûn:

1- Di destpêka 1958-an de, li herêmên Kurdî karmendên xuhermendê gotinên; "Kurd; Cihû ne û xiniz û komonîst in..." ku bi lêv dikirin û pirs ji kesên sivîl dikirin, bi rengê; "tu filehî an Kurd î?" gava Kurd bûya lê dihat xistin û rezîlîkirin.

2- Ev demeke ku navên gund û bajarên Kurdî kelîjeyên herêmên Kurdî bi navên Erebi tên guhertin. Bi tevî ku gelek navên gund û bajaran ku ne bi Erebi ne di herêmên Ereban de hene jî, lê nayên erebkirin. Wekî: Doma, Heresta, Bilodan û hwd...

3- Ev demek e ku fermangehên nifûs û polîsan, tomarkirina navên kurên Kurdistan qedexa dikin û bi taybet gava navên wan bi Kurdî bin! Tev ku gelek nav tene tomarîkirin ne bi Erebi ne. Wekî: Gorg, Zohrabayan û hwd...

4- Ji sala 1958-an ve, pirtûk, wêje û elfabaya Kurdî hatiye qedexekirin û danerên wan têne girtin û lêxistin. Tev ku di herêma Cizîrê de dibistanên taybet yên ku zimanê wan bi Siryanî û Aşûrî û Ermenî hene û pê re; pirtûk û rojnameyên wan der diçin û tîn belavkirin.

5- Di 1960-an de dema Kurdan ji bo guhertina nasnameyan û ji bo tomarkirinê serî li kargehê nifûsan xistin, xwesteka wan nehat pejirandin, bi tevî ku yên Erebi û kesên din bê bawernameyan jî dihatin pejirandin.¹⁹

Wextê Dr. Nûredîn Zaza di girtîngehê de bû, Abed Al Nasir xwest ku destûreke nû ji komarê re çêke, lewra jî li ser vê yekê Zaza ji zindanê birûskek şand û tê de wiha gotibû: *"Çima ku ez Kurd im, li girtîngeha Mezê me! Çima ku min mafên rewşa ji Kurdên di Komara Yekîtiya Erebi de dijîn xwestiye! Ji bo ev nijadperestî û stemkarî neyê rahatin! Ji bo yekîtiya Kurd û Ereban di pêşerojê de xurt bibe, ji destûra nû dixwazim ku danpêdanan bi nasnameya gelê Kurd û mafên wa yên çandî bide!"*²⁰

Divê ku mirov vê xalê jî qet jibîr neke ku, ji bo wê birûskê birêz Zaza têra xwe lêdan û nexweşî ditiye. Di dadgehê de parêzvanên xebatkarên Kurd dadgerîna xwe pêşkêş kirin. Ji nav wan parêzvanan, bervedêriya ku parêzvanê amadekiribû de wiha hatibû gotin: *"... ev kesê bi rûmet daxwaza hermet û pêşxistina ziman, çand û fîtalên gelê Kurd dikin, ma gelo çima em dibistanên zimanê Kurdî qedexe dikin û bi fermî vî mafî didin Cihû, Ermen û Siryanan! Tev ku jimara Kurdan ji tevayiya wan gelek meztir e. Li bakurê welat bi rengê hevdu girtî dijîn! Çi dadî ye ku mafên çandî didin berên kêr û olî û neteweyek qedexe dikin!? Ev siyaseta ne rast e û ne vacayî ye ku berdewam bibe, piştî pazdeh salan ji serxwebûna Sûryê!"*²¹ Ji bilî wisa jî gelek nivîs û daxwazên Kurdên li Ewropayê û dostên Zaza, tevgêrek xurt gerandin ji bo azadiya girtiyan. Lewma jî dadî ji ber pestanên derve û hundir, sal û nîvek ceza li xebatkarên Partiyê(PDKS) birîn û di 8-ê Tebaxa 1961-an de jî hatin berdan.

Di 28.9.1961-an de yekîti herifî û efserên nû kelîj bi dest xwe xistin û Komara Sûryê ya Erebi ragihandin û xuhermendek sivîl damezrandin. Vê yekê jî diyarkir ku wê hîlbijartinên parlemenê di 5-ê Befranbara wê salê bi xwe de çêbin. Û jî wê rojê jî navê komarê hate guhertin û bû: "Sûriya Erebi". Û bi vê yekê re rengê siyaseta Sûryê hate diyarkirin ku; *"Çi kesê li Sûryê dijiya Erebi e!"* Di bin pestana heval û dostên partiya PDKS-ê de Dr. Nûredîn û Şêx Mihemed Îsa bûne nûnêrê Partiya PDKS di hîlbijartina yekemîn a piştî herifandina yekîtiya bi Mîsrê re. Lê efserên Sûryê, gava dîtin ku gelîriya Nûredîn Zaza, nemaze piştî ku gel li Amûdê wî bi tirinbêla wî ve rahildan ser zend û bendan pê tirseke mezin li cem efseran çêbû ku wê nûnerên PDKS-ê û hevalên lîsta wan bi serkevin. Ji ber vê yekê jî berî hîlbijartinê bi sê rojan Dr. Nûredîn û Şêx Mihemed girtin û xistin girtîngeha Qamîşlo û paşê jî hîlbijartinek sexte çêkirin. Di wê demê de, li dor 200 xortan ji Amûdê girtin bi mehna nivîsandina nivîsan a li ser diwaran. Digotin li ser diwaran wisa hatibû nivîsandin: *"Ereb ji zemîna Kurdistanê derkevin!", "Bijî Barzanî û nûnerê wî yê li Sûryê Nûredîn Zaza û gelek ên din..."*

Her roj nêrîn û helwestên şovînî yên li dijî Kurdan zêdetir dibûn û projeyên nijadperestiyê serê xwe radikirin, nemaze piştî destpêkirina şoreşa Barzanî li Kurdistanê Başûr. Lewma jî di 1962-an de berpirsiyarê parastinê siyasî li parêzgeha Cizîrê

lêkolîna yekem li ser Kurdan û pêwîstbûna bişaftina wan û riya wê bişaftinê ragihandin. Ew lêkolîn, ji wê rojê ve bû bingeha hemû proje û pîlanên şovîniya Erebi ya li Sûryê. Ji ber girîngiya vê yekê em ê hinek bi dorfirehî li ser rawestin.

Mirov dikare bêje ku vê lêkolîna bi navê; "Xwendinek li ser parêzgeha Cizîrê", sitûna nijadperestiyê ji layên netewî, civakî û siyasî ve çikand. Amedekirina efser Mihemed Teleb Hilal ku berpirsiyarê Şaxa Parastina Siyasî bû di parêzgeha Cizîrê de, ji xuhermenda Sûryê re ev proje pêşkêş kir. Di vê projê de helbet gelek nêrîn û bawerî dîyar dikirin û ji rûpela pêşî heta qapa dawî avjenî di derya nijadperestiyê de dihat kirin û jixwe kes nedihîşt, ne ol û ne êl. Tev wekî dijmînê serekî didîtin ji netewa Erebi re û bi xurtî li dijî biratiya Kurd û Ereban disekinî, û çî Erebi ê ku bawerîya xwe bi vê yekê aniye wan jî tawanbar dikir. Ango tergeza Kurdan ji ya Cihûyan mezintir kiribû bi navê Isra'îla duduyan ew binav dikir. Ne tenê wisa, lêbelê şerê çî kesê Erebi yên ku dixwestin dibistan di herêmên Kurdî de vebin dikir. Çimkî li gor nêrîna wan, bi zanebûn nîfşê xortên nûhatî jî wê bibûna Kurd. Û ji bo bêtir nivûs û projeyên vî efserî werin diyarkirin em ê xalên bingehiyên ku wekî pêşniyaran ji xuhermenda xwe re pêşkêş kiribûn, ji we re rêz bikim:

1. Divêt kişwer(dewlet) dest bi kiryarên mişxetkirina Kurdan bike û wan bi aliyê hundir ve bibe. Zêdetir jî endamên tergeze û ji bo serbixistina encamên vê projeyê, ne xem bû ku çend sala bidomiya.
2. Sîyaseta nezaniyê, anga nehiştina vekirina dibistan û zanîngehan. Ji ber ku hebûnan dibistanan encameke berevajî dida li hember tiştên dihatin xwestin.
3. Piraniya Kurdên herêmê, nasnameya hemwelatiya Tirkîyayê bi wan re heye. Lewra divêt tomarên nîfûsê bêne rastkirin û kesê nîfûsa wî neyê bicîkirin, divêt em wan vegerînin welatê wan yê pêşî.
4. Girtina derfetên kar li ber Kurdan. Di vî warî de divêt em tevgera wan teng bikin! Rewşa wan bête bê tebat û bê hedarkirin, ji bo ku di kêlîkê de koç bikin! Divê 'Komîta Belavkirina Erdan' vê yekê li ber çavan bigre û tevdîrên goriya wê yekê bistîne. Ango divêt ne bi kirîn û ne jî bi erzî erd di destê Kurdan de bimîne. Nemaze ku kesê Erebi pirr in "şikir ji xwedê re..!".
5. Êrîşek dorfireh bi vê propagandayê li dijî gelê Kurd di nav miletê Erebi de pêk bê û bi vê helwestê endamên Erebi ji bo karê wisa perwerde bibin ku nehêlin hedara Kurdan bimîne.
6. Payeyên olî ji şêxên Kurd bêne hildan û şêxên Erebi bêne şûna wan, çimkî civatên wan ne civatên olî ne! Lêbelê civatên Kurdî ne, dema ku em ji wan dixwazin birûska li dijî Barzanî rêkin, nakin, lê li dijî xwînriya misilmanan rê dîkin.
7. Lihevixistina Kurdan ya di nav xwe de, anga nakokiyên navxweyî çê bikin û ev tiştek hêsanî ye.
8. Bicîkirina nişteci kirina endamên netewa Erebi di herêma Kurdî de, li seranserê sînor! Ji ber ku ew wekî keleha pêşerojê ne û wê wisa li ser Kurdan çavdêr bin heta roja ku bêtin mişxetkirin.
9. Dirêjahiya sînorê Bakur divê ku bibe herêmeke serbaz wekî eniya Colan, anga di vê serbazê gel tê de bi cî bibin, stûbariya wan nişteci kirên Erebi mişxetiya Kurda ye.
10. Divê ku gundên nûjen ji Ereban re di herêma Kurdan de ji bo kişwerê werin

avakirin û divê li seranserê sînorê Bakur wan perwerde û çekdar bike. Bi t êkûzî û bi mîna kîbotzatên Cihûyan.

11. Kîşandina mafên nûnêriya wan kesên ku ketine hîlbijartinê di herêmên Kurdî de û bi zîmanê Erebî nîzanibe.

12. Nedan û qedexekirina hemwelatîyê û nasnameyan ji kesê ku dixwazin di wê herêmê de bi cî bibin, ji bilî Erebî!..²²

Bi rastî pêşniyarên Teleb Hilal cî girtin û hatin guhdan di hemû dem û keliyên Sûryê de bihurîn. Û dest pê hate kirin gava ku fermana Komarê nimre 93-an di 23-8-1962-an de derket. Ji bo serjimartinek taybet di herêma Cizîrê de çêkin û wê serjimara ku di roja 5-10-1962-an pêkhat. Ango di yek rojê de serjmartinê çêbû û encam jî di wê rojê de hat diyarkirin ku bi encama vê serjmartinê 120 hezar Kurd man bê nasname..! Û hemwelatîya wan ji dest wan hat girtin. Tev ku bi bawernameyan û di nîfûsan de bi qoçanan, di nîfûsa leşkeriya Fransa de hatibûn tomarkirin jî. Û ji xwe bawernameyên Osmaniyan ji aliyek dî ev yek didan der. Ango êvarê xwedî hemwelatî bûn û serê sibê çavên xwe li bê hemwelatîyê vekirin. Lê diyar bû ku projeyeke siyasî ye û ji zû ve hatibû amadekirin. Ev kesên Kurd qurbanên serjmartina taybet û nijadperestî bi du nîşan hatin tomarkirin (tev ku berî serjmartinê jî hatibûn tomarkirin di fermangehên nîfûsê de). Di nîfûsê de bi piranî bi navê *Biyanî* hatin tomarkirin. Xwedê giravî ne xwedîyê zemînekî ne! Hin ji wan, jixwe bi navê biyaniya jî nehatin pejirandin û bi navê *Mektomî* hatin tomarkirin. Çawa ku wisa b ên hesibandin kes nîzane ka ji ku ve hatine û kî ne! Lewra jî ji tomara biyanîbûniyê jî man bê par.

Li gor encamên wê hîlbijartinê, helwesta nijadperestiyê jî bingeha xwe ji rewşeke wisa re, danî:

* Bav hemwelatî ye û kur biyanî ye. An jî berevajî vê yekê!

* Mêr biyanî ye û jin hemwelatî ye. An jî berevajî vê yekê!

* Bira hemwelatî ye û ê dî biyanî ye!

Gelek ji wan kesên ku bûn biyan nemaze ku gelek xort ji wan di dema serjmartinê de leşkeriya Sûryê dikirin; gelo ew bi çi bawernamê biribûn, jixwe tenê nijadperest pê dizanin?! Hin ji Kurdên ku di saziyên bilind ên Sûryê de karmend bûn, ew jî bi wê serjmartinê bûne biyanî. Wekî mînak; Tewfîq Nizam Aldîn, Serokê Cengoşa Giştî ya Leşkerê Sûryê bû berî serjmartinê, lê di serjmartina taybet de derket ku biyanî ye. Çilo gihaştibû serokatiya leşkerên Sûryê jixwe tenê mejiyê zingarî dikare vê yekê fêm bike. Vê kesayetiyê wisa jî di 8.3.1963-an de, li ser pişta tang û topan Partiya Ba'es kelîj (desthelatî, îqtîdar) xiste dest xwe.

9) DEMA BA'ES, JI 1963-yan HETA ROJA ÎRO

Efserên Ba'es ji roja pêşî yasayên awarte li ser Sûryê pêkanîn û lista rêş bi navên kesên demokrat yê divêt b êne girtin di radyoyê de ragihandin. Jixwe efserên Ba'es dizanîbûn ku endam û dostên wan kê m in, lewra berê xwe dane çewsandinên serbazî û polîsî yê li dijî gelê Sûryê bi tevayî û bi taybet jî êrîş dibirin ser kesên demokratxwaz û geleri ku di nav mîlet de hatibûn naskirin! Helbet azadiya demokratî,

destûr û hemû mafên mirovan jî hatin qedexekirin. U bi navê pêkanîna sosyalist a Erebi projê û pîlanên xwe yên leşkerî bi cî kirin. Jixwe rewşa Sûryê di dewsa sirûd û dûrîşmên partîtiya tekane de li binê guhê hevdû ve ket, lê di vê babetê de tenê em ê li ser rewşa Kurdan ya di bin kelîja(desthelata) Ba'es de bisekinin.

Rewşa Kurdan pir bi êş û nexweşiyê dest pê kir. Nemaze ku navê Dr. Nûredîn Zaza di lista reş de bû! Demekê li Şamê, li taxa Kurda xwe ji kelîja Sûryê veşart û bi alîkariya welatparêzên Kurd reviya Libnanê û li wir di bin pestana xuhermenda Sûryê de li Beyrûtê hate girtin û dîrxistin, bi sedema xebat û çalakîyên pîrsgirêka Kurdî ku li Beyrûtê dikirin. Nemaze gotar û agahiyên di derbarê pîrsgirêka Kurdî de di roj-nameyên Libnanî û ajansên cîhanê de belav dikir. Hingê di wê demê de Dr. Nûredîn dev ji serokatîya Partî(PDKS) berdabû û heke mirov ya rastîyê bêje ji Partiyê hatibû dîrxistin. Jixwe di 15.2.1966-an de hate girtin û Libnanîyan berê wî dane Urdinê. Urdinîyan jî ew bi bayê bezê vegerandin Libnanê û di 23.4.1966-an de wî dan destê efserên Sûryê, û heft mehan di zindana tenahiyê de ma. Pişt re ew sirgûn kirin başûrê Sûryê. Parêzgeha Siwêda, di meha Banemîrê di sala 1967-an de wî veegerandin Şamê û di Tebaxa wê salê de bi alîkariya hin dostên xwe çû Tirkîyayê û ji wir vegeyeriya Lozanê.

Rewşa serokê Partiyê(PDKS) ku çî jan, derd û êş ji destê efserên Ba'es kişandibû jixwe hinekî wê rewşê diyar dike. Lê mixabin perîşaniya herî mezin ji destê hevalê wî yên wê demê pê hat kirin. Dîyar e yên ku wî dîrxistin, bi sirgûnkirina Nûredîn dilê wan hênîk bibû. Lewra jî dîrok û xebata wî tev hate veşartin. Dîyar e ku Dr. Nûredîn gelek berî dema xwe hatibû! Lewma kesî jê fêhm nedikir. Di vî warî de tenê dixwazim ji kesên perdeyek reş danîne ser helwest û jiyana xebatkerekî hişmend û zanyar, bawerim bi helwesta wê yekê tenê fereziya xwe û qitqamiyên xwe parastin e û xwe pê bilind kirine. Gotina *GOSTAV LOBON* diyarî wan kesan dikim: *"Eger kevîr karîbana bi axîfîyan wê dîrok bîba derewekî mezin."* Belkî hinekî bi dorfirehî em li ser zehmetiya ku Dr. Nûredîn Zaza dîtiye sekinîn, tev ku ji partiyê dîr ketibû, çimkî rola wî girîng û heja bû û gelek layên wê welatparêziyê hatine veşartin. Rewşa Kurda wekî mîlet, me di pêşî de ragihand ku pêvajoyeke nijadperestiyê bi hatina Ba'es re dest pê kiribû. Jixwe ya girîng ew bû ku projeya *Mihemed Teleb Hilal* hat pejirandin û ew kesê nijadperest rol û stûbariya wî mezin bû. Çimkî ji bo wê projeyê xelat dane wî û bû Parêzmend, Şalyar û Cîgirê Serokê Şalyariyê. Pêwîst e ku mirov bêje raman û helwestên efserên partiya Ba'es di dijîtiya Kurdan de bi tevayî bû. Ne tenê Kurdên di sînorê Sûryê de, heta Kurdên Başûr jî! Lewra di havîna 1963-an de, hin serbazgel ji leşkerên Sûryê bi serokatîya efser *Fehed Alşa'er* re şandin Kurdistana Başûr ji bo alîkariya xuhermenda Iraqê bikin li dijî şoreşa Barzanî. Li hember wê helwesta şênber jî, helbet amadekariyê siyasî di bîrweriya gelê Sûryê de hebû! Ango Ba'esî'yan kar ji du layan ve dikirin. Û wekî mînak ez ê hin ji gotinên rojnameya Al Ba'es ku di wê demê de hatibûn nivîsandin ji we re li ber çavan raxim ku çawa mîzgînî dabû, çawa nêzikî wê serkeftin li ser "diz û nokerên Emperyalîzma Emrîkî" bibe û heke "şer raweste, nokerên welat wê xwe bibînin".²³

Nûha jî berî ku em dest bi jimartina pîlan û projeyên nijadperestiyên dijî kudan bikin dixwazim bêjim ku tûrikê efserê wê demê bi sirûd û dûrîşimên sosyalîzm û pêşverûbûnê û her bi tiştê diçirisanî di Cîhanê de tijî bû...! Lê her dihatin guhertin li

gor nakokiyên navxwe, yên efseran û gotina sekreterê Ba'es yê berî 1963-an ku digot bawerim ku wê bêtir bikaribe vê xalê ronî bike: *"Hevbendiyên di komîta efseran de rengên seyr distîne, tu têkelîya wan bi prensîb û îdeolojiyan ve tune, tenê ew pîrensîban li dijî hevrikîn(dijberî) xwe bikar tînin! Bilî ku ew pîrensîb li gor radeya nakokiyê têne guhertin jî..."*.²⁴

9. a) PROJEYÊN BA'ES YÊN BERDEWAM

a.1) JI DESTÇÛNA HEMWELATIYÊ (ji nijadî daxistinî)

Ev proje wekî ku me di serî de jî çêra wê kir di 1962-an de pêk hat û heta roja îro jî berdewam e. Nîrê vê projeyê her gav bû jarî, astengî û alozî ji bo Kurdên ku navên biyanî li wan hatibû kirin û ew pê zêdetir belengaz û tengezar bûn. Girseya ku ev akamî li ser dijiwartir bû du nîfş bûn. Nîfşê yekemîn; bi navê biyanî dihatin nasandin û nasnameyên taybet dane wan, li ser vê nasnameyê dinivîsîn ku ev kes bê niştiman e. Û gorî serjimartina 1962-an heyîna wan wekî biyanî hatin tomar kirin, lê dîsa jî ev nasname dane wan. Bi vê nasnamê tenê dikarin di herêmên xwe de herin û werin. Nîfşê duyem; jixwe tu bawername li cem wan nîn in ji bilî kaxezek ji Mixtarê taxê distînin pêve, ku ew kes di wê taxê de, an di wî gundî de dijîn, ew kes bi navê "Mektom" têtin nasîn. Helbet her du nîfş jî pir dibin û zêdetir jî nîfşê Mektoman, çimkî çî zarokên çêdibin jî ji cûreyên van zewacên jêrîn nedihatîn tomar kirin, heta wekî biyaniyan jî. Ku bav "biyanî" be û dayik "hemwelatî" be. Ku bav û dayik her du "biyanî" bin. Ku bav û dayik her du "mektom" bin. Ev kes wekî biyaniyan jî nedihatîn jimartin û nasnameya taybet bi destê wan nediket! Wan dît ku hemwelatîbûn, di roj û şevê de hew dîtin ku hebûna wan, bi derketina rojê re nemaye! Çiqas bawernameyên wan hebin jî.

Û ji bo bêtir ev bobelata mirovantiyê were nasandin em ê hin ji encamên destçûna hemwelatiyê ji we re rêz bikin:

1. Qedexekirina ji kar û karmendiyê di hemû kargêhên xuhermendê heta ku Kurd endazyar(mihendis), bijîjîk û dermansaz bin jî.
2. Qedexekirina mafê arziyê zeminên çandiniyê û hege berê jî hebûn ji dest wan hatin derxistin.
3. Jixwe kîrîn û firotina zeminan nikarin bikin.
4. Dayîna bawernameyên(Diplome) xwendinê qedexa ye û ji xwe 'mektom' xwendina seretayî pê ve nikarin bixweynin û jixwe wê jî bê bawername dixweynin.
5. Zewaca 'biyaniyan' nayê pejirandin û divê erêbûna sê dezgehên parastinê li ser hebe. Ev li aliyekî jixwe li zewaca 'Mektoman' ne kes lê dipirse û ne ji kes qayil e ku lê bipirse. Ne zewac û ne jî mirin rewa ye. Ango dizewicin û dimrin kes bi wan nahise. Zarokên çêdibin, jixwe xuhermend danpêdanê bi wan nake, ne wekî mirov û ne jî wekî caneweran.
6. Li ber dadiyê jî ev kes bi her du nîfşên xwe tim gunehkar in.
7. Rêwîti, çûn û hatin qedexa ye ji ber ku tu carî guzername(pasport) ji wan re der-nakeve.

8. Qedexekirina razanê. Di otêlan de ilim piştî erêbûn ji parastinên otêlan bînin, nexwe qedexeyê.

9. Qedexekirina arizîbûna xaniyan, ew jî heke hebin. Tev ketin bin navên arziyên kişwerê(dewletê) û kirê ji xwediyê xaniyan tê standin.

a. 2) HEJMARA KURDÊN BÊNASNAME

Heta vêga tu carî jîmartinek fermî çênebûye. Lê li gor hin jêderan, mirov dikare bêje ku jimara wan kesan gihaştîye 250 hezarî. Şaliyariya derve ya Sûryê di bersiva li hember pirsên Komela Çavdêriya Mirovan (Humans Rights Watch) dabû di rapora xwe ya sala 1996-an digot, hejmara kesên ku bi navê 'biyanî' hatî tomarkirin 142465 kes in û yên bi navê 'mektom' jî 75 hezar kes in. Helbet ew kes zêde jî dibin..!

Mamosteyên Kurd yên ku xwendina xwe temam kirin wan avêtin parêzgehên dût û karmend jî ji kar dûrxistin, vê rewşê heta salên heştîyan berdewam kir.

Tu carî zindanên Sûryê ji Kurdan vala nebûn û her jî tawana wan jî ev bû: Endametiya Komelên veşartî, yên ku ji bo guhertina şeweyên kişwerê aborî, civakî û dijîtiya şoreşa netewa Erebi, bi mebesta tevliheviyê û xerakirina baweriyên cemawer bi armancên şoreşê..!

Ev kîdarîşên (icraat) nijadperestiyê akamiyek mezin li ser rewşa jiyan û aboriya Kurdan bi giştî kiriye, nemaze yên bê derfetê kar man, lewra jî mişextî rîyeke vekirî bû, him li hundir berîdana bajarê mezin ên wekî Şamê û him jî berê xwe dane derveyê Sûryê; Ewropa û gelek ciyên dî. Çimkî gelek toreyên parastinê çêbûbûn ji bo Kurdan ku wan bi qaçaxî derxin û wan rût bikin û ji wan bi tevî xelas bibin.

a. 3) KEMBERA EREBÎ

Rejîma Ba'es piştî projeya Teleb Hilal pejirand, xalên wê yeko yeko pêkanîn ji wan xalan yek jî, çêkirina kemberek Erebi bû li seranserê sînorê Bakur di herêma Cizîrê de (ku navê wê hate guhertin û bû Hîsiça). Helbet piştî sirgûnkirina hemwelatîyên van herêman, piyagirtina zemînên çandiniyê û anîna xelkên Erebi ji parêzgehên dût her domiya. Ev biryara ku di sala 1966-an de hate standin û pêkanîna xalên projeyê destpê kir, ji piyagirtina zemînan û pêkolên sirgûnkirina Kurdan xwe xurt kir. Ev proje li seranserê sînorê Tirkiyayê û hinek jî ber bi sînorê Iraqê ve di nav dirêjîya 375 km û pahnîbûna 10-15 km an de pêk hat. Ji Dêrikê destpê dikir û heta bi bajarê Serê Kaniyê didomîya. Ango ji çemê Diclê heta bi çemê Xêbûr dirêj dibû. Di destpêka sala 1967-an de bi awayekî fermî xelkên herêma kembere agahdar kiribûn ku ji gundên xwe bar bikin, çimkî ne zemîn û ne tiştêkî wan di herêmê de mabû û gelek ji wan jî bi zorê ji gundên wan rakirin. Lê piraniya gundiyan bi tundî neyêna xwe dîyar kirin û ji gundên xwe derneketin. Ji pişt re fermana kişwerê derket û zemîna herêma kembere tev kire arziya kişwerê û terektoyên parastî bi polîsan ve şand ji bo çandiniya wan zemînan bike û karker jî bi qeflan hatin ji bo gundên nûjen ava bikin ku Erebi werin herêmê. Di vî warî de dixwazim hin bawernameyên Ba'esi'yan ji we re wergerînim ji bo ku bête nasîn nijadperestî heta bi çi radeyê bû(helbet ev bawername ne bi tevayî ne):

- "Raporta çêkirina gundên nûjen ":

"... terkezên berhingariya gelê me yê Erebi di bakurê Iraqê de ji layê emperyalîzmê ve hat çêkirin, herşêkirina (tehdîd) me ji ji çend salekê ve ye ku di parêzgeha Hîsiça de destpê kiriye, ji xemsariya xuhermendên berê, lê îroj bi hewceyî çareserkirineke bingeî û eşkere ye."

- " ...hate xwestin ji heval NE'ÎM CIMA A ji nivîsgeha cotkaran a partiyê (Ba'es) ku here parêzgeha Hîsiça ji bo rapora ku di navbera 23-29/11/1966'an de, ji layê arastkirina binecî, netewî û di bin pirsyariya efserên parêzgehê de amadebûyî, ji bo nîgarkirina xêzên bingeî ji pêkanîna projeya avakirina werzêrên (mezraa) xuhermendî, û piştî gengeşa raporê bi heval parêzvan re diyar bû ku pêwîst e zemînên ku ji layê dewletê ve di sala 1967-1968-an de hatine piyagirtin di rûbera kembera Erebi a tete xwendin de ev der 300191 hektar e. Ji ber ku kesên di herêmê de ne Erebi in û pîrraniya wan li gor projeya Emperyalîzmê Kurd in, ku ji Iraq û Tirkîyê hatine dagirtin..!"

"... ew jî dixwazin ku welatekî netewî ji xwe re ava bikin û ji ber vê yekê jî herêm li ser sînorê Tirkîyê û Iraqê ye, emperyalîzmê Kurdan ji bo berjewendiyê xwe li vê herêmê dixwaze qene pîlan û nokeriyê dijî me Ereban pêk binin, di herêma sînora de! Pêwîst e ku em zû kîdarîşiyên xwe bikin ji bo Ereba xelas bikin! Nemaze gava bizanibin girîngiya herêmê ji layê çandiniyê, pîşesaziyê ve û bi taybetî jî piştî dîtina petrolê..."

Kîdarîşiyên (îcreatên) pêkanîna kemberê jî ev bûn:

* Parêzvanê Hîsiça haydariyek dawî ji gundiyan re şand û çandiniya zemînan qedexa kir. Piştî vê yekê endamên kîşwerê ew zemîn ajotin û çandin.

Nivîsgeha zemînan dest bi standina kîdarîşên sergûnkirinê kirin û 4 hezar malbat ji herêma kemberê deranîn. Lê ji layekî di ve 25 hezar kesên bê nasname di kemberê de di jîn divê daniştina wan bihata qedexekirin û zor li wan bihata kirin. Ji bo koç bibin welatên din û di navbera 5 salan de divabû ku ev yek biçûya serî. Yan jî bikaranîna hêzê divê tûndî li wan were kirin.

* Partiya Ba'es û nivîsgeha cotkaran dixwestin ku karmendên Erebi û çekdar di kemberê de bicî bibin û wan ciyan bikar bînin. Lê astengî ew bû ku hîn zemîn tevlihev in, mînak; di herêma kemberê de 497 gund hene û ji wan 385 gund hatin piyagirtin, ango rûbereke pir mezin e ji wê yekê jî em pêşniyaz dikin ku divê xuhermend fermaneke nû derîne ku gundên herêmê tev ji destê Kurdan derkevin.

* Divê ev proje dorfireh bibe da ku di pêşerojê de herêm bi tevayî têkeve nav çarçova vê projê.

* Divê netewa daniştîyan bête guhertin an guhezandina kesana an jî bi sirgûnkirinê ku daniştinê Erebi di herêmê de bicî bibin.

Imze

(Serokê nivîsgeha cotkarên Ba'es)²⁵.

Raportê helkewt û pêşniyazan bi vî awayî diyar kiribû ji bo guhertina demografiya herêma Kurdî li Cizîrê. Jixwe rapora çiyayê Kurmênc nêzî ya Cizîrê ye, lê li wir tu kember nikaribûn çêbikaran çimkî rûberên zemînê tev belawela ne û herêm tev çiya ye. Lewra pêşniyazên wan tenê ji bo erebkirinê hebûn.

Projeya kemberê berdewam bû û gundên nûjen li tenîştê gundên Kurdî hatin

avakirin û hêdî hêdî Erebb ji parêzgeha Heleb û Reqa tanîn, heta ku jimar gihaştin 33 gundan û proje zêdetir li ser pêkanîna qonaxa duyem ji bendên wê sekinîn û ji bo bête zanîn her gundek kengê çêbû û hejmara nifûsa Erebbên anîn çiqas bû, navê gundên nû yên Erebb û di kîjan salê de ava kirin ez ê di xîstekî de ji were dîyar bikim:

	Navê gund ê Kurdî	Navê gund ê erebkirî	Nifûs	sal
1	Gir helîq	Tel hedare	700	1972
2	Mûsa koko	Tel erqem	700	1972
3	Kednê	Tel hefare	400	1972
4	Qermaniyê	Qenêtre	500	1973
5	Bîrkinês	Qeyrewan	800	1973
6	Xezna	Deher Erebb	800	1973
7	Mişêfrê	Esediya	700	1973
8	Bab ferec	Reqa	700	1973
9	Hîmo	Hîmo	1000	1974
10	Necim	Qora	300	1974
11	Herem şêxo	Hatimiya	550	1974
12	Girê Moza	Em rebî'e	600	1974
13	Gir hemdon	Besîre	400	1974
14	Xerzê	Cabiriya	700	1974
15	Tel eylöl	Tel tişrîn	700	1974
16	Cimeyê	Em firsan	800	1975
17	Tenoriyê	Tenoriyê	800	1975
18	Hilwa	Hilwa	800	1975
19	Mizgeft	Mizgeft	800	1975
20	Tirbe sipî	Qehtaniyê	800	1975
21	Gir dêm	Nftiya	800	1975
22	Maşoq	Maşoq	800	1975
23	Tewekîl	Tewekîl	800	1975
24	Şebek	Şebek	800	1975
25	çilaxa	Ciwadiya	800	1975
26	Gûrteban	Tel ewer	800	1975
27	Mistefawî	Mistfawî	800	1976
28	Girkê	Selma	800	1976
29	Girê Fira	Tel sidiq	800	1976
30	Kêşik	Hemra	800	1976
31	Baneqesir	Eyn xedra	800	1976
32	Tel elo	Tel elo	800	1976
33	Zihêriyê	Zihêriyê	800	1977

Li piraniya rûbera zemînê, Erebbên nûhatî hatin belavkirin û hin jî ji wê zemînê bû para efserên nepenî! Û xwediya zemînê yên dîrokî bê par man. Tev wisa jî gundiyan dev ji gundên xwe bernedan û heger di bin astengên aborî de gelek cotkaran koç kiribe jî, lê hin cotkarên li gundên kirijên kevîran mayî jî ew zemîna kevîr a ku ji tiştêkî re nedibû jî nû ve bi ked û xebata xwe vejandin. Û her malek parçeyekî biçûk ji kevîran paqij kirin û ji nû ve bergirtin. Lê nijadperestan di 1997-an de, ew jî dagîr kirin bi mehna kêmbûna zemîna Erebbên derve.

a. 4) PROJA GUHERTINA NAVAN

Helbet projeyên erebkirinê li pey hev dihatin û heger destpêk ji destçûna hemwelatîyê û kembera Erebi bû jî, lê navên Kurdî jî şovînistan dîtin ku terkezek mezin e û divê ew jî bêne guhertin, çimkî gelek nav çî yê kesa û çî jî yê gund û bajarê bi hebûn û şarezaya gelê Kurd ve girêdayî ne û li ber çavên nijadperest û şovînistan rastbûneke dîrokî dîyar dikirin. Lewma jî bi rikgirtin wan navan diguherin, belkî bi salan navên Kurdî bêne jibîrkirin û dîrok jî nema karibe ji bin proje û pîlanên şoveniyan serê xwe hilde. Navên nû jî tev, an navên gundên herêmên Erebi yê di bin destê Isra'îl de ne, an jî navê bapîr û êlên Ereban yê kevnar in. Ji wan heye ku navê Colan li gundekî Kurdî bikin wê Colan azad bibe! An navê Heyfa li gundekî di quncikekî tarî de bikin, wê Heyfa rizgar bibe! Ango gundê xwe yê ji dest çûyî û navên bapîrên xwe yê ji bin axê rakirin û toz ji ser milê wan dawêşandin navên wan li herêm û gundên Kurdan belav kirin. Ji bilî vê jî navkirina zarokên Kurdan yê nûçêbûyî girêdan bi erêbûna sê dezgehên parastinê. Ango qedexekirina navên Kurdî. Lewra jî gelek kes bi giştî jî jin du navên wan hene, yek ê malbatê ye û yek jî yê fermî ye. Wisa jî guhêzkirina tomara hemwelatîyê di kîjan nivîsgehê nifûsan de be çênabe ku kesekî Kurd nifûsa xwe biguhêze Cizîrê, lê çêdibe ku here. Ji Ereban re jî nabe ku ji Cizîrê herin, lê çêdibe ku werin.

Niha jî ezê hin biryarên guhertinê navên gund û bajarên Kurdî û jimartina gundan di wê biryarê de û çendek ji wan wekî mînakên ji we re dîyar bikim (Helbet bi navê gundên kevin jî gelek nexşe û bawername hene).

Li gor nexşedana fermangeha karên teknîkî ya di 15.2.1978'an de, 136 gund û bajar li herêma Dêrikê hatin erebkirin. Ji wan navan, navê Dêrikê bi xwe jî, navê Malikiyê lê kirin.

Mînak:

Navê Kurdî	Navê Erebi	Herêm
Berabê	Xan yonis	Dêrik
Pilêsiyê	Kerbela'e	"
Girkê Legê	Me'ebede	"
Hecmetrê	Aka	"
Rikava	Heyfa	"
Swêdika	Yafa	"
Gir darê	Dêr yasîn	"
Başot	Dêr albeleh	"
Sê malika	Tunisiyê	"
Mozelan	Alhame	"
Kengilo	Alzehra	"
Hêwil	Alkofa	"
Gêrê	Murtefi'a	"
Kanî kerkê	Hesaniye	"

- Nimra biryarê, /4524/
Yihya Abo Eselî
(Şalyarê kargêriya Bineci)

- 1- Li gorî yasa rêxistinên kargêrî, nimre /496/, Sal: 21.12.1957-an.
- 2- Li gorî yasa kargêriya binecî nimre /15/, Sal 11.5.1971-ê.
- 3- Li gorî fermandariya yasadanînê, nimre /36/, Sal: 11.8.1971-ê.
- 4- Li gorî yasa nimre /56/, sal 15.7.1980-an.
- 5- Li gorî biryara nivîsgeha bicihanînê a encûmana parêzgeha Hisiça, nimre /541/, Sal: 28.10.1997-an.
- 6- Li gorî erêbûna kargêriya paşvemayan, nimre /5451/. Sal: 14.10.1997-an.

a. 6) RAGIHANDIN Û BIJANDINA EREBKIRINÊ

Çewisandin, şovînî û nijadperestiya li dijî gelê Kurd rojekê ji rojan ranewestiya - ye, lê radeya wê kêm û zêde dibû li gor rewşa Sûryê bi giştî. Di hemû salan de proje pêk dihatin, lê di van salên dawî de êdî bi awayên nerm û bêdeng pêk tên. Nema wekî salên şêstîyan bi qerebalix, halan û bi çavsooriyeke şovînî ne. Vajî wisa dihate gotin; em tev bira ne di welatekî de dijîn û di helkewtê de rejîm bi kîdarîşên bişaftinê birayê biçûk difetisand. Nûha em ê ji we re hin ragihandin û bijandinên fermî yên bi çewisandin û windakirina gelê Kurd bi giştî jî di salên nodî ku di wan salan de gelek Kurd tê de bûn pesindar ji rejîma Sûryê re ragihînin.

* Bijandina şalyarê hundir, nimre /122/, Rezbera sala 1992-an, tê de qedexa kiriye ku karmendên xuhermendê navên Kurdî li zarokên xwe yên nûçêbûyî bikin û bi van navan werin tomarkirin, ilim piştî erêbûna sê dezgehên parastinê.

* Her sal bi dehan xwendevan, şagirt û karmend ji dibistan, zanîngeh û kargehan tên dîrxistin, bi mehna terkezene li ser parastina kişwerê. Nemaze ku gelek ji wan berî azmûna duduyan an ya sisyan tene dîrxistin. Û ciyê mafê ye ku gava ew xort diçin leşkeriyê jî wan dişînin eniya Colan. Ango terkezene li dibistanan û bawerî bi wan nayêt, lê bawerî bi wan tê ku ji bo sînor hember Isra'îl biparêzin! Nizanim gelo wê mirov bikaribe vê nakokiyê çawa bi nav bike?!

....

....

Di bin siya berpirsiyariyê de...." Jixwe her, nêrîna Ba'es ji Partiyên Kurdî re yek nêrîn e, tev ku li ser nakokiyên Kurdan dilîzin, lê di raport û danûstandinên partiya Ba'es yên bi partiyên Kurdî re li Sûryê di astekî de ye. Û ji bo em vê yekê jî ronî bikin, em ê ji we re hin helwestên di raporta nivîsgeha amadekirina Partiya Ba'es, bi nimre 29/s, Sal: 9.1.1989'an de ya ku ji şaxên nivîsgehan re şandine û tê de partiyên Kurdî jimartine û helwestên wan jî diyar kirine û pê re jî erêyîna wan ji rejîma heyî nepejirandine, gava dibêje: *"Di Sûryê de komek ji partî û rêxistinên Kurdî hene, çi qas beşên wan pirr bin jî, lê tev bi yek armancê hevpar in, ew jî vejîna netewa Kurdî û damezrandina Kurdistanê serbixwe ye ku Kurdên; Îran, Îraq, Tirkîyê û Sûryê tev di çarçova wê de bin!"* Jixwe bi îmza endamê serokatîya Ba'es Dr. Ahmed Dexam hatiye belavkirin.

Diyar e ku di wê nivîsê de partiyên kurdî yên çep, Rast û yên di navberê de jî tev di selikekê de ne.

Ev çend çipikên ji lehiya şovînî û nijadprestiya li ser gelê Kurd li Sûryê bi bêdengî

pêk tîn! Helbet bê ku em mînakên ku di pirtûk û rojnameyên Ba'esi'yan de li ber çavan raxin, jixwe ew barê trênekê ne û her jî mebesta nivîsên şovînistan bîngeha bîr û baweriyên gelan diguherin, ango çî proje be, propogandeke li gor wê jê re pêwîst e. Lê tev bi yek armancê ne, ew jî bişaftin û windakirina gelên bindest e û gelê Kurd li Sûryê wekî gelekî bindest hemû binyatên miletan tê de hene û her rahatinên wî bilî wisa jî nebûne, lê siyaseta mandelîtî û projeyên bişaftinê ji layê rejîma Sûryê ve, ji serxwebûnê heta roja îroj li ser gelê Kurd tîn pêkanîn. Tev ku gelek xuhermend hatin guhertin lê tim pêvajoya nijadperestiyê kûrtir û diwartir bû. Gelê Kurd jî rojekê xebata xwe ya netewî ranewestandiye, ango bi hemû rengên xebata siyasî û demoqrasî di berxwedana xwe de bi kar aniyê û hege kûştin û wêrankirin çênebibe jî ne ji qenciya xuhermendê ye! Tenê mirov dikare bêje ku ev girêdayî bi tevgera netewa Kurdî û rêbaza aşî ya ku ji xwe re hîlbijartiye di xebata xwe de. Û heke wekî parçê din ji Kurdistanê şerê çekdarî heba, bawer im wê encama kûştin û wêrankirinê ne kêmtir bûya. Çimkî xuristiya hemû rejîman di danûstandina wê ya demoqrasî û mirovantî yê de bi gelê wê re diyar dibe. Ango gava bi Ereban re siyaseta windakirinê û hevrikiyê bi tûndî dike û bi giştî jî gava parastin û leşker desthelat bin di kişwerê de!.. Jixwe divê tu guman di xuristiya wê rejîmê de nemîne. Ji bo ku mirov çêtir bibîne ka kişwera Sûryê li hember gavên aşitîxwaz çawa disekinê ez ê mînakê li ber çavan raxim; di Newroza sala 1986-an de, qedexa kirin ku miletê Kurd li Şamê ahengan bi cejna xwe bike. Lewra jî di siba wê de xwepêşendaneke mezin ber bi xanîbera komarê ve çûn, hingê notirvana wan gûlebaran kirin û xortekî Kurd bi navê, Silêman Mihemed Emîn kuştin. Doza wê xwepêşandanê helwesta mafê mirovane, aşitî bû û tenê ji bo xwesteka nivîsekê bidin Serokkomar xwepêşandan hatibû li darxistin. Pê re jî felaketa mezin ne ji aliyê kelîja Sûryê ve hat mixabin helwesta rabeî derketinê ji aliyê partîyeke Kurdistanî ve hat. Û vê partiyê ragihandinek weşand ku ew xwepêşandan bi Emperyalîzîmê û Isra'îl ve girêdayî ye û li dijî demokrasî û azadiya Sûryê ye. Dixwazim bêjim ku gelê Kurd ên li Sûryê, ne tenê ji aliyê projeyên tune kirina dewletê ve tehdâyî dîtiye, hingî hewqasî jî ji aliyê partiyên Kurdistanê ve jî dîtiye. Ev jî yek ji encamên mejiyê tenahî û piştgiya rejîmên dagirker e, lewra emê hinekî bi kurtî li ser vê şewazê rawestin; çimkî gelê Kurd li parçê rojava gelek rastî zehmetîyan hatiye û bi birakujiya siyasî re rû bi rû maye.

10) BI DESTÊ HÊZÊN KURDISTANÎ VEŞARTINA PARÇÊ KURDISTANA ROJAVA

Helbet pêwendiyên hêzên Kurdistanî, nemaze yên Bakur û Başûr bi rejîma Sûryê re gelek caran ji neçarî çêdibûn û gava ew pêwendî sererast bin û wekheviyek tê de hebe, jixwe pêwîst û giring in! Lê gelo pêwendiyên hêzên Kurdistanî yên bi rejîmên dagirker re li ser vê bîngehê ne?! Bawer im ku na! Di roja roj de pêwendiyên wisa ne di asteke siyasî û mirovantî de ne. Mirov dikare bêje ku tenê di kevanên berjewendî û nakokiyên rojane de meşiyane. Goriya min di warê pêwendiyên Kurdî de divê mirov cudabûneke di navbera du rengên pêwendîyan de deyne:

1) Pêwendiyên bi dezgehên parastinê yên ku ji bin zemînê dernayên re û bi

encamên nakokiya sînor yan jî ji sedema daxwazên dîrokî ku di navbera rejîman de mane bêçare çêdibin. Yan jî îdeolojiyên neyeksan dertên holê, anga her ew pêwendî rojane ne wekî nakokiyên ku bi xwe re anîne.

2) Pêwendiyên siyasî yên êşkere û ev pêwendî li ser bingegehên biratî û mafên gelan têne avakirin.

Bi baweriya min, rengê yekem yê çewt ew e, yê serekî di pêwendiyên Kurdî de, bi kişwerên hawîrdor re, nemaze yên Kurd di bin destên xwe de diperçiqînin re. Ew pêwendî dighêjin dawiyê gava çareserkirina nakokiyan an lihevhatina desthilatdariyên van dewletên çêbe. Û behca wê jî ji gelê Kurd dide û her jî di dîroka Kurdî de ev şewaz ji têkiliyan dubare bûye. Gelê Kurd ên li Sûryê wekî parçekî ji Kurdistanê her di pêwendiyên nixamtî de ji Kurdistanê hatiye avêtin û qene hêzên Kurdistanê danpêdanê jî pê nakin! Ne tenê wisa jî, rejîm jî, ji gotin û helwestên berpirsên Kurdistanê dikin nîşana rastiyeke ji bo mandelkirin û tûnebûna gelê Kurd ên li Sûryê. Anga gava ev berpirsên qerase dibêjin parçê Kurdistanê li Sûryê tûneye! Ma êdî wê mirov çî ji nijadperestan re bêje?! Bila neyête bîra tu kesê ku em çêrê bernameyên partiyên Kurdistanê bakur an başûr dikin, çimkî bername ne wekî şênbera serokê wê partiyê ye, ne jî wekî helwestên mandelîtiyê û nakokiyên di bin zemînê de ne. Û gava em xebata gelê Kurd li Sûryê, ji bo her du parçan, çî wekî kes û çî jî wekî tekoşerî deynin aliyekî û li hember jî helwestên berpirsiyarên her du parçan deynin, mixabin mirov dibîne ku Şam ji wan re bûye ciyê biryarê. Hewqas çavgirtinî û firotinê mirov dihêle heyîrî. Jixwe hin berpirsiyarên Kurd dibêjin ku Kurdên Sûryê hindik in û du-sê herêmên cûda ne û pirsgirêka wan bi dewletê re tune, çimkî mafên xwe yên mirovantî bi dest xistine. Malxerabno, qey nabînin ku Erebi li Sûryê ji mafên mirovantiyê bêpar in! De îcar wê Kurd çawa xwedî maf bin? Hin jî dibêjin ku Kurdên Sûryê mişextî ne û divê em wan vegerînin Bakur ciyê jê hatine...

Bi rastî ez fêhm nakim ku rejîmek gelê xwe hewqas perîşan bike, demoqrasî perçiqandiye û mirovantî fetisandiye, gelo wê çawa bikaribe rîya şoreşê azadîxwaz veke?! An wê çilo berpirsên wê şoreşê ji vê yekê bawer bin?! Heke ew pêwendî ji dilekî zela be, gelo wê rastiya xebatkarekî çî be gava li dijî kişwera xwe ji bo azadî, demokrasî û wekîheviyê tekoşinê bike?! Û çawa dikare destê xwe bide kelîjek hemû tiştên ku mirov û mirovantiyê ditemirîne?! Ma gelo dûrîşim û prensîbên ku ji bo wan xebatê dikin, rastiya wan dimîne? Bawer nakim ku bimîne! Çimkî mirovantî li vir û li hemû derî yek e. Li ku derê be demoqrasî yek e û dijminê wê wekî hev in. Mirovantî yeksan e û neyarê wê jî yên çîn û baweriyekê ne. Ev yek jî dide nîşan ku pêwendiyên wisa ne taktîk û ne jî stratejîk in. Ji ber ku, heger taktîk bin, wê her jî berjewendiyên layê xurt bin û gava sûde ji nakokiyên rejîman neyên girtin, hingê aliyê Kurdî tê de dimîne kaxezek rojane û tê avêtin. Anga bi giştî wê li dijî berjewendiyên gelê Kurd bin ev stratejî û taktîk. Û rewşa gelê Kurd li Sûryê, mandelîtiya rejîman beranberî guhertina berê xebatê bi aliyên Kurdistanê ji derveyî sînorê parçê rojava ye. Her du helwest hev temam dikin û pêdiviyêke rejîma ne. Lewra jî hin hêzên Kurdistanê ev rol bi cî anîne û nîfşin baş ji civat û pîrsa hebûna Kurdên parçê rojavayî bingehe derxistin derveyê çarçova wê. Ji layekî di ve, ew pêwendî ne stratejîk in jî, ji ber ku dewletên ku Kurd di nav sînorên wan de ne gelê Kurd diperçiqînin û ji

tunebûnê dihesibînin, gelo wê bi çi awayî û bi çi vacayî hebûna kişwereke Kurdî li ser sînore xwe bipejirînin? Yaseke dîyar e, ku rejîmên dagirker çiqas nakokiyên wan hebin lê tim di dijîtiya pîrsa Kurdî de yek in. Û dûbarekirina vê nexweşiyê yek ji perîşaniya bîr û baweriyên mejiyê Kurdî yê siyasî ye.

11) XEBATA GELE KURD LI SÛRYÊ

Hestên netewî yên Kurd li Sûryê di destpêka şestî de dest bi avabûnê kirin. Mirov dikare xebata van helwestan di bin akamiya çar nîşandêran de rêz bike:

- 1- Şoreşên rizgarîxwazên Kurd li bakur.
- 2- Şoreşên rizgarîxwazên Kurd li başûr.
- 3- Çêbûn û gurbûna netewa Erebi.
- 4- Akamiya raman û bîrbûna siyasî û netewî ya cihanê, bi taybet jî ya marksîzmî.

Gelek komele û tevgerên di nav gelê Kurd de belabûyî, serê xwe hildidan. Vê Serîhildanê jî bi damezrandina partiyan encam dan, an jî çêbûna partiyan wekî pêdivîyeke babetî û zanistî bû ji merametên gelê Kurd re li Sûryê. Ji bo afirandina çarçoveke siyasî û rêxistinî bervedaniyê di ber hebûna gelê Kurd bike û mîsogerbûna mirovantiyê wergire, bi şeweyekî tekoşînî ji bo çesipandina mafên netewî û demokrasîyê ji gelê Kurd xebatek heye. Li hember jî siyasî û projeyên li dijî vê xebatê têne pêkanîn, ji dawîya salên pîncîyan heta roja îroj.

Mirov nikare tim bi erênî li rola Partiya Demokrat a Kurdî di Sûryê de binêre. Gava mirov destpêka wê binîrxîne, nemaze di diyarkirina nasnameya netewî de û parastina fereziya Kurdî û xebata ji bo wekhevîyê û dadiya civakî de, jixwe bo xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî û di nivîsa bi tîpên latînî de roleke wê ya payebilind hebû. Di xebata xwe de Partiya Demokrat a Kurd li Sûryê pîrensîbên mirovanti û demoqrasîyê wekî rêbazekê û şeweyeke bingeşî ji têkoşîna aşîtxwaz û cemawerî û siyasî kiriye ji bo pêkanîna daxwaz û armancên xwe wekî netewa duduyan di Sûryê de pêk bîne. Ji bo ev hebûn têkeve destûrê, pîrsgirêka gelê Kurd çareser bibe û mafên xwe yên netewî û demoqrasî wergire, bingeheke nûjen ji hevji-na Kurd û Erebi û kêmeteweyên din yên di Sûryê de dijîn deyne û bibe destpêka bingeşî ya daxwaza destxistina van heyîna, ji bo van xalan PDKS xebitiye. Helbet di vê lêkolînê de naxwazim li ser parçebûn û nakokiya di Partiya Demokrat a Kurd li Sûryê de çêbûne gelekî bisekinim, çimkî ew bi serê xwe lêkolîneke taybet jê re divê. Lê bi kurtî dikarim bêjim ku di pêvajoya tevgera azadîxwaza Kurd ya li Sûryê û li gor qonax-ên tê de derbasbûyî yên girêdayî bi xuristiya civata Kurdî û rengên pêwendiyên wê; raman, nêrîn û fereziya wan kesên berpirsiyar, li ser bingeşên bîr û bawerîya êlî danîbûn, lewma jî di dema pêşî de nikarîbûn sudeyeke mezin ji kombûna cemawerê Kurd li dûrî PDKS-ê bigrin. Tiştê ku divê em jibîr nekin nijadperestiya rejîmên Sûryê û çewisandina li hember Kurdan bû ku Kurd nikarîbûn bigihêjin encamekê. Lê destpêkirina nakokiyên nav xwe bixweyî nîşanek bû li ser tenegehiştina piraniya wan berpirsiyaran, lewma jî mirovek wekî Nûredîn Zaza bîrbîr û zana ji tevgerê hate dûr xistin. Dema mirov lê vedigere mirov dibîne ku parçebûn cara yekemîn di sala 1965-an de çêbû. Sedem jî; çepgirî û rastgirî bû. Jixwe wê demê yên

çepgîr bûn li benda Barzanî man û yêr rastgîr jî man li benda Celal Telebanî. Li vir pêwîst e ku mirov du xalan zelal bike:

1) Rojnameya *Dengê Kurd* heta wê demê bi Kurdî û bi tîpên latînî derdiket. Bi encama parçebûnê her du şaxên nû weşanên xwe bi Erebi berdewam kirin û nivîsandina Kurdî rawestiya.

2) Nekarîna sekna li hember proje û pîlanên nijadberestiya dewletê hişt ku berê nakokiyê bête guhertin û ne jî guhertinê dest da ku van nakokiyên ji holê rake. Zêdeyê caran jî pê ve man girêdayî. Sedemên guhertinê jî pirr in lê girêdayîna bi xwebera kesîtiya Kurdayetî û zanebûna wê ya siyasî, vê yekê hişt ku ev paşveger ji xebata rewşa û rasteqînî bibe û berê xebatê bête guhertin û xebat bimîne di dijîtiya xwe bi xweyî de. An jî bi rengê xwe yê Kurdistanî bimîne li piyan. Mixabin her du aliyan jî sîudeyên rejîmê xurt dikirin. Çimkî hêz û yekîtiya gelê Kurd ji hev dixist û têkoşîna wî di rîyên ne durust de bela dikir. Xaleke din di wê demê de, ku mirov dikare li ser raweste, ew jî xwesteka Barzanî bû, ku dixwest her du bendên partiye bibin yek û parçebûnê bi encam bikin. Bi vê helwestê jî lewma her du serokatî bi amadebûna hin Kurdên serbixwe û welatparêz di sala 1970-an de li hev civandin û wan di bin siwana partiyeke nû de careke dî anî ba hev. Û ji bo ew yekîti here serî Barzanî serokê her du beşan li cem xwe girtin û raste rast ji wan re got: *“Heger hûn her du vê yekîtiyê xera nekin, wê biserkeve”*. Lê mixabin gava her du berpirsên yekem hema ji nav destê Barzanî filitîn û vegeyriyan Sûryê heta dest bi danhev û (bi awayekê dî, ji bo kesîtiya serokatîya xwe xurt bikin) damizrandina beşê partiye xwe ji nû ve kirin, bi wê encamê bûne sê partî. Ji wê rojê heta vê gavê tevgera siyasî di Sûryê de bi giştî ya Kurdî tim parçebûn ji xwe re kiriye rêbaz. Û heke her partiyeke Erebi bibe pênc parçe, yêr Kurdistan bûne sêzdeh parçe! Helbet ew parçebûn hin bi wateya helwestên marksîzmê û hin bi wateya helwestên nakokiya çînî û hin jî mirov nizane ji bo çî ye ku parçebûn danîne ber xwe. Pêwîst e di vê mijarê de bêjim ku her partiyeke parçe dibe, dibe du niv, yek ji wan dûrî xebatê û partiyan dere û niv jî her du beş li hev par dikin. Ango şeweya rejîma Sûryê ev yek li ser partiye siyasî wekî şeweyeke zanistî pêk anîye û hêzên demokrat belawela kiriye û yêr bi parçebûnê neketin bin destê rejîmê, bi girtîngeh û kuştinê ji hev hatin xistin.

Bilî bobelata parçebûnê tişteke dî jî heye ku di ziyana xwe de ne kêmi ya pêşî ye. Ew jî guhertina berê xebata gelê Kurd a li dervî sînore Sûryê ye. Ango projeya rejîmê ku li Sûryê Kurd tûnene û mişixtî ne û tu mafên wan ên netewîyê tune û divê xebata xwe ji bo Kurdistanê başûr û bakur bikin. Bi vî awayî raman, bawerî û çalakiyên Kurdî yêr derveyî Sûryê dibin, ne ji bo mafên Kurdên vî parçê ne. Ji rejîmê re ne giring e ku ev xebat li bakur an li başûr be. Lê ya girîng ew e ku ev xebata netewî ne li Sûryê pêk bê û ne ji bo Kurdên parçê rojava be. Ji ber van valahiyan bi rastî jî di armanca vê helwestê de rejîm gelek bi ser ket. Ne bi hêz û karîna xwe, lêbelê bi alîkariya partiye Kurdistanî yêr di himbêza rejîmê de vezeliyabûn. Ji bo berjewendiyên xwe kudên Sûryê kirin pireke livok û diyarî rejîmê kirin. Nemaze di belavok û rojnameyên wan ên bi zimanê Erebi de derdiketin. Heta bi rengê mirovanti jî hin hêz nepejirandin. Belkî ev yek diyar dike ku bêtir li cem hêzên Kurdistanê bakur yêr bi awayekî eşkere Kurdên parçê biçûk li meydana kirin û firotinê raxistin. Gelek caran tevgera Kurd li

Sûryê xwestin ku bi awayekî fermî pirsra Kurdên Sûryê bête ragihandin di belavokên hêzên Kurdistanî de, lê mixabin kêma ji wan ev pirs pejirandin heta îroj. Ji wê yekê jî bi dilekî xemgînî dibêjim ku gelê Kurd li Sûryê bi hîrmet li berpirsiyarên hêzên Kurdistanî dinêre û hêvî dike ku kesê nikaribe alîkariya doza me bike, bila me tune neke!. Çimkî bawer im ku Şam, Enqere, Tehran û Bexda di nêrîna xwe ya li hember pirsgerêka Kurdî de yek in û yê kirîn û firotina gelê xwe bi Şamê re bike, dikare bi Enqera, Tehran û Bexda yê re jî bike!

Bawer im ku pirsgerêka Kurdan bi giştî ne pirsgerêkeke herêmî ye, pirsgerêkeke navnetewî ye. Çiqas zehmetî û pîlan hebin jî divê em pirsra xwe biçûk nekin û nexin bin siya vê rejîmê an vî sînori! Helbet her parçek rewş, helkewt, xwestek û şêweya xebata wê cuda ye, lê dimîne ku kêşa Kurd belkî wê mirov bikaribe di bin sê xalên bingehîn de binîrxîne; yek, netewî û hemwelatî ye. Yek netewa Kurdistanî ye û ya dî jî navnetewî ye. Divê girêdaneke zanistî û babetî ji her sê layan ve hebe û hevdu temam bikin û heta mirov karibe van layan bi ser lingan bisekinîne. Pêdivî bi naskirina taybetiya her parçeyekî heye. Ango her parçeyek tevgera wê ya azadîxwaz heye. Her parçe çêtir bi rewş û têkoşîna xwe dizane û dike, ne bihewceyê kesekî ji parçê din e ku hemû amadekariyan li ser parçeyekê bi navê vî parçî, lê ji bo parçê xwe bikin û parçê van baran hildigrin jê re bibin qurban. Her parçek xwedanê wê hene, ji wê yekê jî bobelateke mezin e ku ev yek nayê ditin. Çiqas cudabûn di raman û siyasetê de hebe jî, danasîna bi hebûna hev giringtir e û wê bingeha bîr û baweriyên netewî xurtir bike. Çimkî rastiyeke heye û bi çavgirtinê çareser nabe. Tu hêz çiqas dûrîşim û halanê Kurdistanî bavêje jî nikare rola hêzên parçê din bilîze û nikare bigihêje qama daxwaz û xwestekên wan ku ew ji xwe re pêwistir dibînin. Lê mixabin helwestên vê şêweyê tenê encamên pêwendiyên çewt û nerast bi rejîmên dagirker re û bêtî ku berjewendiyên gelê Kurd jî tê de hebin şopandine.

Di vê mijarê de dixwazim bêjim ku her yek meydana wî heye û bila bikêrî wê bîn, mala wan ava be! Ango bila xaniyê xwe pêşî ava bikin! Hingê wê rastî û netewetîya wan diyar bibe... Bi kurtî tu sedem tune ku Kurd bihev bikevin û şerê navxweyî ji xwe re bikin amûrê hevqelandina gelê Kurd. Ji bilî hin ramanên ezîtî û kesîti. Heke nebêjim dijîtiya cînişî ye, çimkî hêzên herêmê yên dagirker her dixwazin ji raya giştî re û miletên cîhanê re diyar bikin ku Kurd nikarin kargêriya xwe bikin û her di bin siya raman û pêvajoya Mehmûdkî û Osmankî de dijîn!.

Di roja îroj de parçê rojava piştî dît ku her hêzek bi tenahiya xwe nikare tiştêkî ji gelê Kurd re bike, nemaze radeya bêhêvîbûna ku gel gihastiye, jimarên dabeşbûnê ku hewqas pîrbûyî û di helkewtê de tişteke şênber bi dest nehatî xistin, ber bi çav dike ku rêxistinên Kurdên Sûryê mane bêçare û tu bergeh li ber wan vekirî nemane! Ji layekî ve projeyên şovenîstan pêk tên û ji layekî dî ve miletê Kurd dûrî rêxistinên diçe. Lewra gelek serpêhatî û gengeşeyên siyasî çêbûn û bi encama wan "Hevbendîya Demokrat a Kurdî Li Suriyê" di Reşemiya 1992'an de hate damezrandin. Goriya min ew gav di asteke bilind de ye hege çi sedema avabûnê hebe jî. Çimkî diyar dike ku bîrweriya tenahiye gihastiye astenga xwe ya bêçare. Êdî tu derfet namîne ji bilî kar û xebata tevahî û ev radeya yekem e ku rîya xebatê rast dike.

FERHENGOK

afrişa: Mewhibe - tiştêkî baş di kesîtiya mirov de.
akamî: Tesîr, bandor.
awêje: Form.
bervedanî: Difa'a - tiştê ku mirov pêşkêş dike ji bo ne tewanbariya xwe xuya bike.
brûsk: Berqîye-nameya misûker tê şandin.
cemawer: Ji pîrbûna kesan re tê gotin -ji gel biçûktir e.
cengoşa: Serokê artêşê.
cînişî: Wekîalet - nakokîya mirov ji dîlva xelka bi birayê xwe re dike.
çiyakar: Meyize - mimeyez.
dadgerîn: Mehkeme.
dadwer: Dadmend - a'dil.
danerên: çêkirin-afirandin.
daniştin: Kesê ku bi zor dewlet wî bi cî bike.
danpêdan: Iqrar - Îtiraf bi hebûnê.
darinan: Tiştê ne baş.
dexsî: Hesûdî.
efser: Zabit - leşkerên bi paye (stêrk).
ehram: Paşmayên Fer'on li Misrê.
erzî: Milkiye.
fitedan: Mirov hêza vîna yekî xurt bike jê re tê gotin fitedan.
gargarîn: Xelkên avê yên mirov difetisînin.
guzername: Pasport.
hawsing: Mitenasib - du tişt wekhev bin di her awayên xwe de.
hêgînî: Ji hewsa guhertinê yê di kesîtiya mirov de heye tê gotin.
helkewt: Rewş, rastî hev hatin, şens, bidestketin.
herêşkirin: Tehdîd.
heyvan: Hevîrtirş.
hilawartî: Awarte.
hoba: Ji şaxê mesture - kargêriya tiştêkî dike.
homanî: Rajorî(siyade) ango dibêjin homaniya kişwerê li ser xaka wê heye.
kelîje: Sulta, desthilatî, otorîte.
kepez: Ji gir mezintir e û ji çiya piçûktir e.
kîbotzat: Gundê nûjen bi zimanê cihûyan.
kîdarîş: Îcra'at - pêrabûn.
kişwer: Dewlet, dîgel.
lewen: Qamîş.
lolijî: Di çû û dihat.
mandel: Înkar.
maxekanî: Jêdera herî mezin û bingehtî.
mayîn: Kesê ku namire.
melbend: Nehiye, dever.
meramet: Tiştê ku di hundirê mirov de û mirov dixwaze pêk bê.
mijadî: Mewdo'l - babetî.
mişxîfî: Hicret, dûrxistina bi zorê.
munateke: Tiştê ku mirov hiltîne ji bo zivistanê an ji tiştêkî di re. Tedarek.
nakaw: Tiştê ji nişka ve çê dibe.

neyeksane: Di têkeliyan de newekhevî.
qilopanî: Xwe dernexom dike.
rahatîn: Kirina nerînan di helkewtê de.
ravekirin: Tefsîr.
razgir: Kesê kargêriya nepeniya komelek bike.
reftar: Dibêjin reftara filan kes di jiyanê de ne baş e, helwest.
rewa: Şer'î, meşrû
rewîşt: Sinc, exlaq.
seft: Dezîne- dest.
seza: Ceza.
şahînsahî: Împeretorî.
şalyar: Beqanî, di kargeriya wezaretê de qada biryarstendina wezaretê.
şanik: Xeliye.
terkeze: Xeter.
tevn: Fen û fût.
tewîjêr: Persadar - muheqiq.
tîtal: Reweşt - tiştê mirov dike ji ber berê bapêr kirine.
toltaji: Ne taji ye û ne jî kûçik e.
wagirtin: Texmînkirin.
werzêr: Mezre, mezra.
zivêr: Acizbûn.

JÊDER:

- 1- AHMED BAKASÎ, *Dîroka Kurdistan di bakurê Sûryê*, Kovara Sorgul. Hejmar 29 dem 2001. Rûpel: 26, 27, 29
- 2- Filip.P.Rondot, 1939, hejmara yekem. Rûpel 99
- 3- M. Wesfi. Zakariya, Êlên Şamê, Hurewitz, Ibid, Rûpel: 97
- 3- Abederehman Qasimlo, *'Kurd û Kurdistan'* (bi Erebi), Rûpel: 12
- 4- Bazil Nikitin. Bi Erebi, wergerandina Dr. Nûrî Talabani, Rûpel: 87
- 5- Dîroka Ereban ya Hemdem, 1975-1976, Rûpel: 3-6
- 6- M.Teleb.Hilal, xwendinek li ser herêma Cizîrê, Rûpel: 26
- 7- F. Rondot (Les kurdes de Syrie-Paris 1939).
- 8- Dr.Nûredîn Zaza, 'Jiyana min a Kurdî', bi Erebi, Rûpel: 101, 103, 108, 117
- 9- A.Hemîd Derwîş, *'Ronîyek li ser tevgera Kurd li Sûryê'* (Bi Erebi) ', Rûpel: 14
- 10- Ji çavdîtina min a bi Şêx re.
- 11- Navê partî di 196-an de hat guhertin û bû Partiya Demokrata Kurdî li Sûryê, ango gotina Kurdistanî jê hat avêtin.
- 12- Ji bervedêriya Zaza li ber dadiya parastina kişwerê ya leşkerî. Rûpel: 133, 220
- 13- M. T. Hilal, Rûpel: 46-47-48
- 14- Rojnameya AL BA'ES 14/6/1963, Rûpel 13
- 15- Monif Al Razaz pirtûka "Serpêhatiya Tal"(Bi Erebi), Rûpel 138
- 16- Kovara AL MUNADIL (Ba'es wê belav dike), Jimar 11, sal 1976, Rûpel: 12-13

Hêviyên ji Guhertinên li Sûryê û Cihê Pirsê Kurd di Nav de

Dr. Ebdulbasit Seyda

Mirovê ku li rewşa Sûryê bi detay û pirs-girêkên wê binêre, wê bighê nêrîneke ku di dema werê de wê hinek guhertin û tiştên nû bibîne, guhertinên ku bikaribin wê ji vê rewşa wê xelas bikin.

Ev goman e, ya ku bêtir hêvî jê heye, here serî. Lê li hemberî vê yekê jî, tirsek heye ku ji aliyekî din ve di navbera dezgehên fermî yên dewletê û hêza navnetewî lihevkerinek çêbibe, ya herî mezin a rojane Emerîka, ev hêza ku di roja me ya îroyîn de li herêmê bûye faktorekî herî girîng, ku hemî kilîten lîstikên Rojhilata Navîn di dest de ye û ew dikare



hêzên din ên navnetewî bidehfîne, da ku ew jî razîbûna xwe li ser proje û planê wê hêza mezin bidin xuyakirin û pêrozbahiyê lê bikin.

Ji ber ku naveroka vê nivîsê li ser rewşa hundirîn a Sûryê bi hemî alî û gomanên xwe ve ye, ez ê ne bi kûrî li ser rewşa siyasî ya herêmê yan ya navnetewî bixwazim bisekinim, bes bi tenê dema ku pewîstî pê hebe. Li hemberî vî tiştî, ez ê bixwazim rewşa Sûryê ya hundir ronî bikim û bixwazim ku karakterê tiştên ku wê di paşerojê de bibe, bidim xuyanîkirin.

Nexşeya sîyasî ya Sûryê ji gelek faktoran pêk tê, yên ku newekheviyek di navbera wan de heye, çî ji aliyê hêz û serdestiyê ve be, çî jî ji aliyê nêrîn û berjewendiyên ku dikarin bêne guhertin ve û haziriya wan ji vî yekê re be. Ev faktorên han di navbera sê aliyan de tên beşkirin. Yek jê beşê dewletê ye, yê duyem beşê opozîsyona fermî ye û yê sêyem jî beşê opozîsyona rastî ye, heger mirov bikaribe weha bêje.

Tiştê ku bi beşê dewletê ve girêdayî ye, li gor ku hûn dizanin, Partiya Ba'as e. Ev zêdeyî 40 salan e, ku Ba'as dewlet di bin desthilatdariya xwe de hiştiye, hukim li welêt girtiye destê xwe (08.03.1963).

Ew ji wê gavê û vir de bi eynî mejî û nêrînan welat bi rê ve dibe û li xwe dinêre wek ku ew "îrada pîroz a Erebî û erkê wan î nemir" e, ku divê bi xwe biparêzin. Ba'as bi xwe, xwe bi hêza polîsê xwe yê nehênî, yê ku bi gelek navan peyda dibin û gelek karê xerab dikin, ferz kiriye.

Ba'as li xwe wek rêberê civat û dewletê dinêre û opozîsyona fermî ya nêzîkî xwe jî mecbur kiriye ku razibûna xwe bide xuyakirin. Li ser xala heştan (8) di destûrê de, ev xala ku tişteki nedîtî û nebûyî tîne meydanê û digel vî yekê jî, ev 30 sal in ku berdewam e.

Partiya Ba'as di roja îro de bûye wek perdeyek ku çî kesên ku xwedî hêz in di paş wê de xwe vedişêrin. Mebesta min bi vî yekê ew e, ku ew hêzên ku xwedî desthilat in, di destê polîsên nehênî û leşkerî de nin. Ev hêzên han berhema wî mejiyî ne, yê ku Hafîz el-Essed, serokê Sûryê yê ku welat berî li dorî 30 salan bi rê ve biriye, bi xwe ye. Paşî mirina wî, gelek texmîn kirin ku rewş wê ber bi başbûnê ve biçe, li gorî berjewendiyên neteweyên li Sûryê, çî Ereb, çî Kurd an jî yên din bin.

Lê tiştê ku çêbû, ew bû, ku wan hêzên xwedî desthilat dîtin ku ji wan re baştir e, ku bihêlin rewş wek berê di bin siya serokekî nû yê bê hêz û bê tecrûbe de berdewam be. Serokekî ku jê tê xwestin, ku destek be ji bo berdewambûna weznekê di navbera yên ku hemberê hev in û yên ku bûne hêz ji lawê serok re.

Li berûvajîya vî rewşa îro, rewşa ku di dema serokê bav de ew bû, ku serok bi xwe û di dema xwe de hêz dida wan ên derdora xwe, yên ku îro xwedî hêz in.

Beşê dewletê ji bilî nakokiyên hundurîn, yên ku bi xwe xwedî desthilat in, bi du sîfetên din ên berûvajî tên naskirin. Yek jê qelsiya wan wek dewlet a li

beramberî derveyî welat e û ya din jî ew e, ku xurtbûna diravî ya li hemberî hundirê welat e.

Dewlet îro tazî ye, li hemberê derve bêpişt e. Tişt tune ye ku sûd jê bê wer-girtin, da ku karibe tevgerê taktîkî di hundirê lîstika weznê de bike, ya ku berê dihate kirin, wek nimûne di hebûna Sovyeta berê de.

Ji aliyekî dî ve, ew kertên (tişt) di dest de, yê xurt ku berê bi kar dianî, wek pîrsa Kurdî û Felestînî, êdî nema di dest de heye. Kerta Libnanî bi xwe jî îro gelekî sergêjiyan jê re çêdike.

Ji alîkî dî ve, ketina rêjîma Iraqî bi wî awayê ku pêk hat, hişt ku rêjîma Sûryê bi xwe li gorî mēzinên herêmê gējomêjo bibe. Nemaze ku vê rêjîma han gavin baş di rîya xweşkirina tēkiliyan de ji bona xurtkirin û serrastkirina tevdira bi rêjîma Iraqê ya ketî re avêtibûn.

Di rewşek weha de, du rê hatine pêşîya rêjîma Sûryê. Yek jê, ku wek berê berdewam bike û guh nede mîlet. Ev yeka han, a ku belkî di rîya organîzekirina lihevkerîneke bi derve re pêk bê.

Li gorî tiştên berdest ên niha, xuya ye ku hinek tişt di vî warî de bûne, bi taybetî di warê karên hevbeş ên parastinî-nehênî de, çî di sewiya herêmê de yan jî navnetewî de û ew civînên 3 alî ku doza wan dike û di wan de beşdar dibe. Li kêleka dewleta Tirkîyê û Îranê hinek gav di vê rîyê re tēne avêtin, bi ser de jî danûstandin û alîkariyên parastinî di navbera îstixbaratên Sûryê û Emerîkî de êdî ne tiştêkî veşartî ye.

Lê belê pîrsgirêk ew e, ku Emerîka dixwaze ku di herêmê de guhertinek nû û formekî nû bîne û ev yeka han wê bihêle ku guhertinên herêmî çêbibin, destpêk li Iraqê bû, lê ti carî nakeve serê mirovan de ku wê şopa rewşa Iraq li ser dewletên derdora wê nemêne, bi taybetî Sûryê, ya ku Iraq jê re di yek wextî de kûrbûneke Erebbî-Kurdî ye.

Rîya din ew e, ku rîya vebûna reforman li ser mîlet. Lê belê ev tişt di roja me ya îro de dûr xuya ye, di gel wan sloganên ku li vir an li wir tēn gotin, ku dibêjin "wê guhertin çêbibe û hesab bi wan berpirsiyarên xerab re bê dîtin", "wê program û plan ji nû ve werin sererast an jî durustkirin".

Lê belê hemî sînyal didin xuyakirin, ku tiştê tē gotin, ji derveyî çarçewa lîstika korbûn û şaşbûnê dernakeve, ew lîstika ku rêjîma Sûryê ji mēj ve tē de şareza ye.

Reformên ku tē xwestin, di rîya dûrkirina destên wan mîrekên veşartî ji dezgehên parastin û leşkerî re dibe, da ku ji hatina welat û jiyana xelkê dûr bikevin. Lê ev tişt pîrî zahmet e ku bibe, ji ber ku li dijî bingeha lîstika wan balansên ku li ser bingeheş berjewendiyên di navbera navendên hēzan de di rêjîma Sûryê de heye.

Tiştê ku hēviya vê rîyê bēhtir kêr dike, qelsbûna oposîsyona fermî ye, ya ku di hundirê wan partiyên ku hevbendî bi Partiya Ba'as a xwedî desthilat re

hatiye danîn. Ev partiyên han di nêrîna millet de perçeyek in ji dewletê û dûvîkek bêhêz û bêkesayetî ne.

Dewlet jî ji aliyê xwe ve wan partiyên weke destekê ji bo şaşbûnê bikar tîne, ti qîmet nade hevbendiya ku bi wan re çêkiriye û ti weznê jî nade wan, ji ber dizane ku di nav millet de biçûk û bê hêz in. Lê li gel her tiştî jî, dîsa hesabekî ji wan dike û wan li ser oposîsyonê dihejmêre.

Eger ku mirov bê ser oposîsyona rast û digel qelsbûna wê jî, em ê bibînin ku ew bi xwe ji du aliyên pêk tê: yek, ê ku di partiyên de organîzekirî ye û yê din jî, yê ku bi hemî reng, naverok û nêrînên xwe ve yê gelerî ye. Di hundirê oposîsyona organîzekirî de hinek partiyên olî, neteweyî, çep tene naskirin, lê belê tev jî westiyayî û qels tene xuyakirin, ji ber ku tim û tim ji aliyê îstixbaratan ve hatine perçiqandin û perçekirin. Ev tiştê hanê, yê ku şopa wî di belavbûn û dûrbûna wan de ji xelkê û guhdana wan ji pirsên biçûk ên ne sereke xuyanî dîkin, ên ku gelek ji hêza wan bi riyên tewş diçe û dibe kelem di pêşiya lihevkirinekê de li ser xetên stûr ên ku ji bo bingehekê ji bo programeke berfireh pêwîst in, ku bibe alternatîvek neteweyî û demokratîk, a ku wê hebûna yên din bipejirîne bîyî ku bipirse ka koka wî neteweyî, olî an siyasî çi ye û wê wekhevîyê bi wateya wê ya fereh bipejirîne, ji ber ku ew derge ji bo gihandina hevbeşbûnek medenî (sîvîl) li pêşiya civata Sûryê bi Ereba, Kurd û yên din re ye.

Dema ku em bînin ser oposîsyona gelêrî, em ê bibînin ku ew di razîbûna gelêrî ya tevayî de tê xuyakirin, ya ku di riya semîner, nivîsar û xwepêşandanên gelêrî, yên ku di şiklekî gelekî teng de çêdibin, lê gelek vê yekê jî tiştêkî pirr mezin didin nîşandan, ku mirov têxe hesabê xwe ku ew di hundirê rêjîmeke girtî û rê nade tiştêkî (totalîter) de ye.

Di vê dema dawî de, tiştê ku bala mirov dîkşîne, ew e ku îstixbarat çavê xwe ji rexneyên ku ji aliyê millet ve bi şeweyekî berfireh tene, digire. Lê gava zanibe ku hêvî heye wê karekî gelerî organîzekirî bibe, yê ku di rojên bê de wê bibe wek tîrsekê ji rêjîmê re, ew bi xurtî ber wê digrin. Di vir de, mirov dikare bibêje ku girtina profesorê ekonomî Dr. Arîf Delîlê û Riyad Sêf û Mamûn el-Humsî, ku her du yên dawî endamên parlemana Sûryê bûn, û girtina gelek kesên din ên welatparêz, çi Ereba çi Kurd, dikeve vî warî de û qedexekirina wan komîte û komeleyên ku li Sûryê bi hêz ji bo doza şiyarkirin û rakirina civateke medenî li Sûryê derketin meydanê, ew civata ku di wê rewşa ku îstixbarat bi navê xwe û dezgehên xwe yên cur bi cur hatiye dûr kirin û pelixandin, çi tiştên girêdayî bi jiyana tevayî û kesayetî kirine destê xwe.

Ev tiştên han giş didin xuyakirin, tiştê ku li Sûryê di roja îro de di warê rexne û peyvê de dibe, ji çarçewa valakirin û şaşbûnê bi mebesta berde-wamiyê ji alî rêjîmê ve dernakeve.

Pîrsên ku li vir xwe li gorî çarçewa babeta ku em li ser dipeyivin, ferz dikin, ev in: cihê pîrsa mîletê kurd li Sûryê di van bûyeran de li kû ye? Çi nêrîn û kirin jê tîn girtin û wê paşeroja wê çawa be?

Êşa Kurdan li Sûryê dualî ye. Mîletê kurd ji aliyekî ve wek mîletê ereb û yên din li Sûryê êşeke tevayî dibîne. Lê ji aliyekî dî ve, êşeke wî ya bi taybetî heye. Ew bi xwe jî tevlihev e, ku mirov dikare bêje ew çewisandinek dualî ye, ev tade lê dibe ji ber ku Kurd e.

Mebesta me ji çewisandineke dualî ew e, ku Kurd ji hêlekê ve ti mafên wan ê neteweyî û demokratîk tune, wek mafê sîyasî, civakî, kulturî, îdarî û ekonomî. Û ji aliyekî din ve hemî rengên çewisandina ku bi ser Kurdan ve tîn, ew jî bi armanca kêmkirina hebûna Kurdan li her sê heremên Kurdî, ku Kurdistana Surî ji wan pêk tê: Cizîr, Efrîn û Kobanê. Yek ji van rengên çewisandinê yên sereke jî serhijmartina awarte ye, ya ku tenê li parêzgeha Hesekê di sala 1962-ê de hat pêkanîn. Em îro berhema wê dibînin, ku çawa li dor 250 hezar Kurd bê nasname ne. Ya din kembera Erebi ye, ya ku di sala 1973-ê de li Cizîrê hate bicihkirin û li gor wê erdê kurdan li seranserî sînora jî çemê Dicle heta bi Serêkaniyê li ser panayiyê 10-15 km û dirêjahiyê 385 km ji wan hat standin.

Ya sêyem jî ew e, ku bi erebkirina bi tevayî ya navên gund, bajar, mirov, kolan û dikanan e.

Bi ser wan tiştan tevan de jî, rê tim li Kurdan tê tengkirin, deverên wan bê guhdan dimînin, xerabkirina civakî û bêkarbûn pirr dibe. Ji loma gelek xelk ji neçarî bi aliyê bajarên Sûryê yên mezin ve koç dikin, an jî derdikevin derveyî Sûryê, ber bi Emerîka, Ewropa û deverên din ve.

Destûra Sûryê hebûna kurdan li Sûryê qebûl nake, di gel ku hejmara wan zêdeyî du milyon e, ji wan milyonek û nîv li devera Kurdî ne û bêtirê nîv milyonî jî li bajarên Sûryê ne, bi taybetî Şam û Heleb.

Destûra Partiya Ba'as bi xwe jî hebûna mîletê Kurd li Sûryê dide inkarê. Ne tenê ev lêbelê ew dixwaze di riya paragrafên destûra xwe re, bi taybetî paragrafên 6, 7, 8, 11, 15 û 48, Kurdan di nav neteweya erebî de bihelînin.

Ew destûra han êşkere dide xuyakirin, ku yê dev ji girêdana xwe ya neteweyî bernede, ew dê dûrî erdê xwe bikeve, ji ber ew di nêrîna Baas de, erdek Erebi ye. Ew destûr bi xwe jî hîn şovenîzma xwe dide xuyakirin, ku yê erebbûna xwe nede îsbatkirin, nikare daxwaza ti mafê mirovan û neteweyî bike.

Nakokiya sereke ya ku di kirinên rêjîma Sûryê de li hembrî kurdan tê xuyakirin, ew e ku ew ji aliyekî ve hebûna wan wek Kurd qebûl nake, lê ji aliyekî din ve jî tadê li wan dike, ji ber ku Kurd in. Bi hemî şêweyan dixwaze hebûna Kurdan a neteweyî tune bike. Heger nikaribe vê yekê li ser erdê bike, bi kêmayî dixwaze di mejiyên mirovan de bi cih bîne.

Civata Kurd li Sûryê bi tevayî û li Kurdistan Sûryê bi taybetî civateke geş û çalak (aktîv) e, girêdana xwe ya neteweyî ji mêj de fêhm kiriye, ne mumkun e ji niha û pê de li gor tiştê ku em niha dibînin, nemaze paşî hatina şoreşa kompyutêr û internet, kesek karibe kesayetîya wê ya neteweyî tune bike.

Lêbelê şiyarbûna vê civatê li vir nasekine, lê ew ê di warê têgihiştina rewşa îro û hêviyên ku tînin de, her berdewam be. Ev bi xwe jî di dîtîna û nêrînên hêzên kurdî yên çalak de, çî li hundirê partiyan û çî li derveyî wan, tê xuyanîkirin. Ev hezên han têdighên ku girêdaneke posîtîv û aktîv di navbera girêdana bi Sûryê ve wek welat (dewlet) û bi Kurdistan ve wek netew (milet) heye.

Hevdîtîna û diyalog û karê hevbeş bi hêzên Erebb ên demokrat re pêwîst in - ji ber ku tada heyî bi giştî li ser tevayîya kesian, çî Erebb be çî Kurd be, dibê-, ji bo paşerojê baştir ji Sûryê re di çarçewa sistemeke demokratîk de, ku baweriyê bi ciyawaziyê (te'edûdî) tîne û rêzê bi bîr û bawerî jê re dike, wekhevîyê di navbera hemîyan de di warê maf û daxwaziyan de bi cih tîne bêtî ku li koka wan a neteweyî, olî û siyasî bêtîrsîn.

Hêzên Kurd kar ji bo ku wêneyekî rast ji êşa ku Kurd dikşînin, bigihînin hêzên erebbî dîkin, da ku ew jî piştgirî û alîkariya pîrsa Kurd li Sûryê bikin. Li gel zehmetiyên vî karê han, ji ber ku rêjîma Sûryê şopa xwe ya negatîv di hiş û nêrînên xelkê de bi salan bi cih kiriye, em dibînin ku gelek ên ku cihên serekî di opozîsyonê de digrin, nikarin heta roja îro jî wan bîr û baweriyên ku îdeyolojiya serdest bi kar tîne, ji ser pîrsa kurd li Sûryê bide alî.

Lê li gel vî giştî jî, em dibînin ku danûstandîna di navbera hêzên Kurd û Erebb de, yê di warê opozîsyona Sûryê de aktîv, çî wek partî û çî gelêrî be baştir bûye, û li vir divê bêtî nîşandan ku nêrîn ji pîrsa kurd li Sûryê bûye pîvanek û sînyalek ji bo naskirina rastbûna dîtîna û daxwazên guhertîna û demokratîyê li Sûryê.

Pîrs ne ew e, ku li vir an li wir nêrîneke însanî di warê xweşkirinê de bêtî nîşandan an gotin. Pîrs ji wilo bêtîr kûr e, ji ber ku îro problêma kurd li Sûryê yek ji wan problêmên serekî ye. Mîrov nikare di ser re derbas be. Ne guhdanek an çavgirtinek jê re ji alî vê hêzê yan wê hêzê hebe, ew bi xwe isbateke neciddiyetê an jî tenegehiştîna ye. Ev bi xwe jî tîrs û pîrsnîşanan di nava mîletê kurd de tîne meydane.

Tiştê ku îro tê xuyakirin, tî hêviyê nadê mîrov ku rêjîm wê reformeke rast û durust bike. Tenê mîrov sloganên ji wan dibihîze, ew sloganên ku dixwazin rewşê tîxin bin kontrola xwe.

Rêjîmê heta îro yekîtîyekê di navbera tiştê ku heye û tiştê meşrû ye çêdike. Ew rêjîm xwe xwediyê maf dibîne, ji ber ku hêzeke diravî di dest de heye, ku alîkariya wê di berdewambûna desthilatdariyê de dike. Ev hêza han a di destê

rêjîmê de, ne li ser bingehekî demokratîk hatiye damezirandin û ji ber vê yekê jî mirov nikare li Sûryê behsa parvekirina karûbar di nav dezgehên desthilatdariyê de - parleman, hukûmet û dadmendî - bike. Pirsên di vî warî de heyî dikevin nav xalên hêviyan de, nemaze dibin siya rêjîmeke îstixbaratî, ku tu tiştekî ji bilî zagonên awarte pê ve nas nake û ev zagon bi xwe qamîkek in, da ku îstixbarat çi bixwaze bike û bêyî jê were pirsyarkirin. Ev zagon bi xwe termeke modern e ji bo veşartina kirinên dezgehên îstixbaratî yên ku xwe di ser zagonan re dibînin.

Rêjîm li xwe dinêre ku ew berê jî û yan niha jî li ser rastiye ye, yekîtiya neteweyî di nêrîna wê de li ser bingehe tobekirina oposîsyonê ava dibe, bi qebûlkirina wê bi gunehê xwe.

Qebûlkirina wê bi dirustbûna xala 8-an a destûrê, ya ku me li jor behs kir, ew xala ku dibêje Partiya Ba'as rêberê dewlet û civatê ye.

Rêjîma Sûryê dibîne ku neleqandina siyasî ya ku bi zor ferz bûye, nîşaneke serketina wê rêjîmê dide xuyakirin.

Lê belê yên ku haya wan ji nêzîk ve ji van tiştan heye, dizanin ku rewşa civakî bi xwe bingeha rûniştina rewşa siyasî ye.

Ev tiştê han jî pêk nayê, ille di çarçeweyeke demokratîk de bi qîmeta insan, wek insan berî her tiştî din rûdine, maf didê yê ku bîr û baweriyên xwe bi azadî bibêje ji berhemên welatê xwe fêde bike, dûrî wan dezgehên istixbaratî yên ji bilî tirs û nerehetiyê tiştekî jê re nahêle.

Li dawî ez dixwazim bibêjim, li gel hemî tiştî jî nexş bi carekê ne tarî ye. Em tevde di wê baweriyê de ne, ku guhertinek di rê de ye, lê pirs ew e ku kengî, çawa û heta bi kû ye!

Uppsala/swêd
 abdulbasits@hotmail.com
 (SHB/amude.com)
 20.11.2004



Suriye Kürtleri İçin Umut Verici Bir Başlangıç

Ümit FIRAT

Türkiye’de hükümet, gelişmeleri “olumsuz ve tehlikeli” olarak nitelendiriyor. Irak’taki gelişmelerden duyduğu rahatsızlığı açıkça ifade eden iktidar odakları, bu konuda henüz görüş bildirmedi; ama Suriye’deki gelişmeleri asayiş sorununa ya da basit bir çatışmaya indirgemeye çalışıyorlar.

Aslında olayların, bu gün için sadece bir başlangıç olduğu, orta vadede Suriye’de geleneksel dikta rejimini sona erdireceği ve devlet yönetimini demokratikleştireceği gözüktüyor.

Çatışmalarda Kürtler, kendileri için ayrı bir devlet kurulması yönündeki taleplerle değil; üzerlerindeki baskı ve provokasyonların kalkması, normal bir yurttaş gibi yaşamak istedikleri yönünde taleplerde bulundular. Yani Ortadoğu’nun diğer haklarıyla eşit statüye kavuşmak istediklerini anlatmaya çalıştılar.

Sadece Milliyetçi Bir Kalkışma Değildi

Başbakan Erdoğan, olaylar sırasında seçim gezisi nedeniyle Urfa’da yaptığı konuşmada “üç kırmızı çizgiden” söz etti.

Birincisi, ‘bölgesel milliyetçilik’ miş. Bu güne kadar bilip öğrendiğimiz şeyler arasında böyle bir milliyetçilik türüne rastlamadık. Bölgesel dayanışmacılık, bölgesel kayırmacılık, hemşehricilik gibi kavramlar vardı ama bu yoktu.

İkincisi, ‘ırka dayalı milliyetçilik’ miş. Şimdiye kadar böyle bir milliyetçilik türüne de rastlanmadı. Mesela; Araplar ve Yahudiler aynı ırka mensup-

turlar ama birbirleri ile ne kadar iyi ilişkiler kurdukları meydanda. Keza aynı ırktan olup birbirini boğazlayan Avrupa, Afrika veya Uzak Doğu toplumları da unutulmamalı. Hitler bile Aryan kimliğini öne çıkarmakla birlikte bir Alman milliyetçisi olduğunu söylüyordu ve milliyetçilik anlayışının ırka dayalı milliyetçilik olduğunu iddia etmemişti.

Üçüncüsü de 'dine dayalı milliyetçilik' miş. Böylesi bir milliyetçilik zaten türünü de bugüne kadar ne gördük ne de işittik.

Bu sözler ayaküstü söylenmiş şeylerdi; hiçbir temeli ve ciddiyeti de yoktu. Daha doğrusu bilgisizlik sonucu söylenecek şeylerdi.

Suriye Kürtleri, diğer devletlerde yaşayan Kürtlere nazaran çok daha önceden milli bir bilince sahip olmuşlardır. Bunda, 1920 sonrası Kürdistan' da yaşanan siyasi gelişmeler ve zorunlu göçlerin büyük bir rolü vardır. Suriye'deki gelişmeler, elbette ki milli bir takım talepler içermekteydi. Ortada bir siyasi program yoktu; ayaklanmayı organize eden bir siyasi yapı yoktu. Bir provokasyon sonrasında kendiliğinden gelişen masum bir hareketti. Bu nedenle, sadece milliyetçi bir kalkışma olarak nitelendirilmemelidir. En temel insani haklarından bile yoksun insanların, normal şartlarda oldukça basit sayılabilecek talepleri söz konusuydu.

Türkiye'den Suriye'ye göç eden Kürtlere, bu zamana kadar birer kimlik belgesi ve vatandaşlık statüsü bile verilmedi. Ne varlıkları kabul edildi, ne de yoklukları?

Suriyeli Kürtler Nihayet Kendi Haklarını İstiyorlar

Suriye Kürtleri, bugüne kadar Suriye devleti karşısında siyasi bir kitlesel güç oluşturmamışlardı. Çünkü Suriye'nin dikta rejimi, bugüne kadar yalnızca Kürtlere yönelik değil, Arap nüfusa da korkunç katliamlar gerçekleştirdi.

PKK, önderlerinin ikametgahı ve rejimin toleransı nedeniyle karargahını yakın döneme kadar Bekaa ve Şam'da oluşturuyordu. PKK, bir Kürt siyasi hareketi olarak, Suriyeli Kürtler arasında büyük bir taraftar kitlesine de sahip oldu. Kürtlerin yaşadıkları ülke yönetimi yerine, kendisinin muhalefet edip savaştığı Türkiye'ye karşı örgütleyen PKK, ne yazı ki, aynı zamanda Suriye devletinin işini de kolaylaştırıyordu. Ancak buna karşılık da, Suriye yönetimi PKK faaliyetlerine tolerans gösteriyordu.

Suriye Kürtleri'nin bu gün geldikleri noktayı değerlendirdiğimizde, 1998 sonlarından itibaren PKK'nın örgütsel ve askeri ağırlığını Suriye'den çekmesi, Kürtler için yeni siyasal koşulların gelişmesine de yol açmış olduğunu gözden uzak tutamayız.

Bununla birlikte 1991 den itibaren başlayan ve 2003 Mart-Nisan Amerika



Birleşik Devletleri (ABD) müdahalesiyle daha da cazip hale gelen Irak Kürdistanı'ndaki Kürt oluşumunun da dünyadaki bütün Kürtler için olduğu gibi Suriye Kürtleri arasında büyük bir etki ve sempati yarattığı açıktır.

Bu arada henüz net olarak formüle edilmese de, ABD'nin Büyük Ortadoğu Projesi fikri açıklandı. Bölgede bir şeylerin artık eskisi gibi gitmeyeceği düşüncesi yayılmaya başladı.

Suriye yönetimi de bu değişecek şeylerin ilk sıralarında bulunmaktaydı. Zaten Suriye'nin büyük diktatörü ölmüş ve artık yerine aynı otoriteyi sağlamakta zorlanan oğlu geçmişti.

Bütün bu koşulların etkisiyle, Suriyeli Kürtler, yaşadıkları ülkede bazı haklarının olması gerektiğini düşünmeye başladılar ve birkaç gün devam eden olaylar patlak verdi.

Suriyeli Kürtler, artık seslerini yükseltiyor. Suriye devleti de, her zamanki gibi muhalefeti şiddetle karşılıyor ama daha az şiddetle.

Eylemlerinin sonuçları şimdilik biraz pahalıya mal olsa da, Suriye'nin geçmişine bakıldığında, Kürtler bakımından büyük bir ilerleme söz konusudur. Suriye'de böylesi bir olay geçmişte büyük bir katliamla da bitebilirdi.

Suriye'de de, Ortadoğu'da da Sultanlıkların Sonu

Son zamanlarda ortaya çıkan siyasi manzarayı incelediğimizde ise sonuçları görüyoruz:

*Erbil’de Geçen Kurban Bayramındaki (1 Şubat 2004) patlamaların ardından, Suriye Kürtlerinin temsilcileri Irak Kürdistanı’na taziyeye gidip, Irak Kürtleri’ne dayanışma mesajları vermişlerdir.

* Suriye Kürtlerinin gösterilerinde, eskiden PKK’nın ve Abdullah Öcalan’ın resimleri, pankartları görünürdü. Dolayısıyla da Türkiye muhalifi bir hareket olarak anlaşıldı. Bu kez artık Kürtlerin geneline hitap eden renkler, bayraklar, sloganlar göze çarpıyor.

*Suriye Kürtleri artık kendileri için eylem yapıyorlar ve kendileri için bir şeyler istiyorlar. Bu, Suriye’yi tehdit ettiği gibi, Türkiye’nin de rahatsız olduğu bir başlangıç olarak ele alınmalı.

* Büyük Ortadoğu Projesi ve ABD’nin Suriye’yi “haydut devlet” ilan edip müdahale edebileceği ülkeler listesine alması Suriye yönetimini ve Türkiye’yi de etkiliyor.

* Türkiye, Irak Kürdistanı’yla Suriye’deki Kürtlerin birlikteliğinden ve Suriye’de Irak benzeri gelişmeler yaşanmasından kaygılıdır.

* Suriye’de Irak benzeri tartışmalar yaşanması ve Türkiye’nin bundan rahatsızlık duyması, şaşırtıcı olmaz. Önce Ortadoğu’da sonra da diğer Ortadoğu ülkelerinde geleneksel yapıların, sultanlıkların ve diktatörlüklerin sona ereceği inancını güçlendiriyor.

*Bugün için Suriye’de var olan sisteme muhalefet edebilecek en önemli etken, Kürtlerdir. Suriye’deki Kürtler de ABD’nin bölgedeki varlığını Şam diktatörlüğü açısından bir baskı unsuru olarak değerlendiriyorlar Bundan sonra, Suriye Kürtlerine yönelik baskılar, zulümler artık dünyanın ilgisini çekecektir ve gündemine girecektir.

Bijî Li Berxwedana Kurdên Binxetê

Reşîd Battê
resit@yahoo.se



Îro hefteyek e ku kurdên binxetê berxwedaneke pîroz birêve dibin. Kurdên Başûr, Rohilat û Serxetê bi giştî piştigiriya birayên xwe yên wî perçeyê Kurdistanê ji dil û can dikin.

Xwepêşandanan pêk tînin, di televizyon û radyoyên cîhanê de banga yekîtiyê bi mêranî bilind dikin. Li bajarên Ewropa jî her roj çalakiyên ji bo piştigiriya kurdên binxetê tên kirin, komisyon diçin konsolosxaneyên dewletên

dost ji bo alîkariya wan peyde bikin, name tèn nivîsîn û bi hezaran di xwepêş-andanan de banga alîkariyê ji cîhanê dîkin.

Li binxetê û ji herêma Cizîrê, Kobaniyê û Efrînê jî dengê zilm û zordestîya hêza leşkerî ya dewleta Sûryê bi telefon û meyla dîghê Cîhanê û Ewropa. Bi hezaran mêr, jin û ciwanên kurd bi destê vê rejîma xwînxar tèn êsîrkirin û niha tev wînda ne. Rejîma hov dîsa di vê hefteya borî de gelek kurd birîndar kirine û gelek jî şehîd kirine. Hejmara kuştî û birindaran hê jî nedîyar e.

Rewşa wan gelekî xerab e û divê kurdên derveyê Kurdistanê ji bo alîkariya wan xebatên hêjatir bikin, berê xwe bidin FN(Yekîtiya Milletan). Heger alîkarî ne ji jor were û ne dewletên xwedî hêz dengê xwe li vê dewleta hovane bikin wê ev qirkirina ha berdewam be.

Ev dewleta ha û dewletên din yên ku Kurdistan di navbera xwe de parve kirine tev endamê Yekîtiya Milletan in. Ji ber ku pîrsgirika Kurdistan li herêmê bi van dewletên dagirker re nayê bazarkirin, pîrsgirêkeke gelek asê ye û ji ber vê yekê jî divê kurdên her çar perçeyan û bi yek dengî banga mafên xwe yên netewî bikin û doza xwe bibin ber deriyê YM.

Îro bûyara ku li binxetê rûdaye ji me kurdan re fersendeke dîrokî ye. Li Başûrê Kurdistan dewletek federatîv û bi hêz ava dibe, Emrîka bi hêz û mezinahiya xwe li rohilatê Dîcle ye û li ser sînorê herêma Cizîrê ye.

Rojên vê dewleta faşîst ya Baasî hindik mane û heger berxwedanek siyasî û organîzekirî hebe wê ev rejîma xwînxwar nêzîk û ne dûr ji hev bikeve û xwîna hevûdu bi xwe vexwe...

Lubnan li dij e, Israîl li ser serê wê bi çakûçê xwe sekiniye û Emrîka jî şûrê xwe tûj kiriye da serê wê dewleta hov jêbike.

Kurdno! Kurdên hemî perçeyên Kurdistanê û Cîhanê rabin ser xwe û pişgiriya kurdên perçeyê binxetê bikin, ev doza Kurdistana mezin e.

Kurdên binxetê, hûn jî bibin yek û daxwaza mafên "sîyasî yê netewî" bikin. Hûn perçeyek ji Kurdistana mezin in û nabe ku hûn bi mafên wek hinek dibêjin "mafên mirovî" qayil bibin û ji bo hinek mafên mirovî şehîdan pirtir bikin, gava we avêtîye mezintir e ji daxwaza "mafên mirovî" û êdî ji daxwaza mafên "netewî" kêmtir daxwaza tu mafên din nayê kirin..

We di van deh salên dawî de, ji bo Kurdistaneke mezin û serbixwe jî bi hezaran Şehîd dane. Îro jî şehîdên we yên binxetê pîrr in û xwîna wan wê bi mafên sîyasî şîn bibe rê li Kurdistana mezin veke, vekiriye...

Bila şehîdên kurd û Kurdistanê gornbehişt bin, bijî kurd û Kurdistan.

2004-03-2004

Cemal Nebez: Divê Serhildan Berdewam Bibe û Kurdên Derve Piştgiriya Bikin

NNRK



Zanyarê Kurd Dr. Cemal Nebez di hevpeyvînekê de bi NNRK re dîyar kir ku pêwîst e serhildana kurdan li Rojavayê Kurdistanê berdewam bibe û raneweste. Li ser pîrsa bi çi şeweyî serhildan divê berdewam bibe, Dr. Nebez got: “Serhildan dikare bi gelek şeweyan berdewam bibe. Dikare rojekê di şeweyê xwepêşandaneke bîdeng be, carekê bi komkirina înzeyan be. Bi her

hawî divê ev serhildan bi şeweyekî bajarvanî û aştiyane berdewam bibe. Pêwîste Kurd ji cîhanê tevî re diyar bikin ku ew mirovên aşîxwaz û demokrat in û dikarin çalakiyên protestoyê bi şeweyekî şaristanî birêve bibin.

“Rêjîmên herêmê ji kurdan ditirsin, çimkî ew ji demokratiyê ditirsin. Ew rêjîm çareserkirina pirsê Kurdî wekû dawîya desthilatdariya xwe dibînin û ev yek jî tirseke mezin dixe dilê wan e.

Pêwîst e hêzên siyasetî li dû cemawer herin û ne berevajî wilo. Derbarê serhildana dawî li Rojavayê Kurdistanê Nebez wilo axifî: “Ev serhildan ji rewşenbîriyeke gelêrî tê. Ev nîşana hestên netewî ên bilind e. Herweha ev nîşana girêdana bi Kurdistanê mezin û serbixwe ye.

Kurdên derve dikarin û divê ji gelekî bi Kurdên li Kurdistanê re alîkar bin. Ya herî girîng niha di vê rewşê de ku Kurdên dervê bê derengî dest bi alîkariya madî bikin. Gelek şehîd hene, brîndar hene û herweha hejmareke mezin ji xelkên Kurdistanê dê nema karibin karên xwe wekû berê birêve bibin, ji ber vê yekê jî wê ew raserî gelek astengiyên diravî bînin. Li vir kurdên derve dikarin alîkariyekê hêja bikin. Ez dîsa dibêjim gerek gelekî zû û bi lez alîkariya diravî (madî) ji Kurdistanê re bê danhev, eger wilo nebe, wê rewşa li welêt pir xerab bibe. Herweha pêwîst e ku Kurdên derve berdewam bin di çalakiyên protesokirinê de û vê yekê berfirehtir û organîzetir bikin”.

C. Nebez herweha diyar kir ku ew jî di wê baweriyê de ye ku ala Sûryê neyê şewitandin. Nebez bang kir ku kurd ala Kurdistanê hildin, ev yek ji şewitandina ala dewletên di girîngtir û bi nîrxtir e.

Di dawiyê de C. Nebez kêfxweşî û şanaziya xwe bi piştgiriya perçeyên di ên Kurdistanê bo serhildana Rojava diyar kir û hêvî kir ku ev şeweyê piştgirî her berdewam bimîne.

21.03.2004



Kurd Du Mîlyon in, Qewmê Diduyan e Li Sûryê

Diya Ciwan(Helbestvan-Şam)

Beriya her tiştî ez sipasiya Kurdistanê dikim, mîletê Kurdistanê Iraqê bi tevahî, xasma gel û desthilata wê û tevahî Kurdên li Awrupa, ez bi navê Kurdên Sûryê sipasiya wan dikim. Piştgirîya wan ji vê bûyera tahl re, ji me re ji bo ku em xwe xurt bikin û birê bixin. Ya dî, bi rastî ez bawer dikim nûçeyên Qamîşlo, Heskîyê, Amudê, Dêrikê û Helebê digihêne we û hûn tev li ser disekin û hemî jî wilo ne û rast in. Lê ji ber ku ez li Şamê me, ez ê behsa Şamê ji we re bikim: Bi rastî, mixabin tiştê ku bûyî bi tevayî xelkê Sûryê li hemî cihê mixabin heye û Kurdan nexwestiye tu derê vê yekê bikin û Kurd ne sebêbê wê ne. Ku ragihandinê Sûryê îro du roj e bi tevahî îsrar dikin û bi îsrar dibêjin ev tiştên ku li bajarê Qamîşlo û herêma Cizîrê çêbûyî ne sucê Kurda ye, ev destên xerîb in, kesên nenas in, destên xerîb ketine di nav me da.

Îcar pirsar ku têtê bîra meriv ev e; başe, eger dewlet vî tiştî dibêje “eve ne sucê kurda ye, destê xerîb ketine di nav me de”. Kurd du mîlyon in, qewmê diduyan e li Sûryê, gelo eger danûsendin di navbera dewletê û kurdan da hebûya, wê destê xerîb karibana biketa nav wan de yan na? Bi vî rengê ku dikin bi serê kurdan, gotina me ev e ku ti car pirsgirêka kurdî li Sûryê çareser nabê, li Şamê heta nûha 1500 xortên Kurdan li zîndanên de ne û bi rastî em nizanin ka li ku derê ne, dohî sibehî û vê sibehê çûne li ser malê kurdan de ketine, bi taybetî taxên roava, çî xortên di bin sî salî de bin ew girtine, hinek mal sê-çar xort jê girtine, ji pîr û kal û zarokan pê ve kes li malan nehiştine, hemî birine.

Tirsar me ev e, dezgehê ragihandinê Sûryê dibêjin Kurd bêguneh bûn ji bûyerê, baş e çima wan ber nadin, heta nûha bi hezaran Kurd zîndan kirine û

em nizanin ka girtîyên me ku ve birine, tirsê me ev e van girtiyan bernedin.

Êdî Kurd bi girtin û kuştinê xelas nabin.... Gotina min ji wan însanan re: Li Sûryê hebûna Kurdan rastiyeke e, heqîqetêke e, Kurd hene û bi vî rengî xilas nabin. Gotina min ya dî jî ev e: Ez ji tevahîyê dinyayê re û Sûryayê re, ji milletên ku li Sûryê cî digrin ji Kurd û Areb û her kesên din re dibêjim, em Kurd Sûryeyî ne, ew kesên ku me digrin, dikujin, malê me talan dikin em ji wan kesan bêtir xwe Sûryeyî hesab dikin, emn û parastina Sûryê, yekbûna wê ji me re mûhimtir e ji ba wana.

16.03.2004

Heştê Sale Bûyerên Wisa Li Qamişlo Çê nebûne, Bêguman ji Bilî Bûyera 12-yê Adara Îsal

Konê Reş (Nivîskar-Qamişlo)

Em sipasiya Kurdistan TV dikin ku van rojên dawî da bi firetî li ser rûdanên ku li Qamişlo û bi taybetî li bajarên Kurdan bitevayî, rawestiya û sekinî û dengê xwe bilind kir. Bi taybetî bûyerên ku li bajarê Qamişlo û bajarên din bûne, weku diyarê îro roja pêncê ye, rûdanên li Qamişloyê destpêkir û li temamê bajarê ku kurd lê rûdin belav bû. Li encama van bûyeran de bi dehan Kurd hatin kuştin û bi sedan hatin birîndarkirin ji bilî girseyek mezin ê girtîyan. Em hawar û gazîya xwe pêşkêşê tev kesên birûmet û biwijdan û dilsoz dikin, û bi taybetî jî berpirsyarên dewletê û berpirsyarên kurdan, ku aveka sar li ser vî agirî da bikin. Bi ketina alawa agir, bi hilanîna zêrê û zîyanan divê bi guftûgoyê pirsgirêk çareser bibe. Pêwîste geryan bi çareserîyê bibe, niha em girtî ne, bo guftûgoyek li asta herî bilind di navbera berpirsyar û eşîrên kurdî û nûnerên dewletê de bidarxin. Bi guftûgoyan em bi hêvî ne bo ku encamên çak û rind derkevin temenê Qamişlo li dor heştê salî ye hêj rojekî bûyerên wisa lê çênebû, bêguman ji bilî bûyera 12-yê Adara Îsal. Divê Kurd bihizrin gelo çima nûha û bi vî dijwariyê. Em hêvî û lava dikin ku bikaribin bi tevî rêxistinên xwe û bi dewleta xwe seetê ji berê seetê çareyek ji vî kêşeyê ra bibînin û kêşeya gelê kurd li Sûryeyê çareser bikin û rê nedin neyarên kurdan û neyarên dewletê bixwe, bi gurrûna vî agirî. Careke din welatîyên Qamişlo û herêmên din weka bira bi hev re bijîn. Sûrya welatê me teva ye, Qamişlo bajarê me teva ye, çî Kurd çî Erebb û Kildan û Aşûrî û Ermenî em tev birayê hev in. Ji du rojan ve aramî hin bi hin konê xwe li ber Qamişlo vedigre, lê mixabin hin tecawizên nedirust li Serê Kanî û Efrînê qewimîne. Em bi hêvî ne ku ew jî nemînin. Ji tev şehîdan re buhûşt û ji birîndaran ra selamê û tendirustîya çak û rind em dixwazin.

16.03.2004

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî Pêşber Hikumeta Suriyê Dest bi Bizava Bilez Kir

KK-Nûçe

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî li dijî kiryarên rejîma Be'esî ya Sûryê yên wekî girtin, kuştin û îşkenceya li Kurdan dike dest bi **Bizava Bilez** kir. Rêxistina Efûyê, ji bo xedariyên rejîma Be'esî li ser Kurdan bi rawestandî dest bi hewldanên lez kir û bang li hemû dilxwazên xwe yên dinyayê dike û dixwaze ew bi faks, name û teleksan ji serokê dewlata Sûryê re bişînin û nerazîbûna xwe pêşber kiriyarên dewleta Sûryê bidin diyarkirin. Rêxistin dide diyarkirin ko di 12-yê Aderê de li Qamişlo piştî maça futbolê bûyeran dest pê kiriye û di rojên dûv re ji aliyê hêzên çekdar yên dewleta Sûriye ve 25 kesên Kurd hatine kuştin bi sedan Kurdên hemwelatîyên Sûryê hatine girtin, li wan îşkence hatiye kirin û lêzimên wan ji aqîbeta wan bêhay in. Her rêxistina navhatî dide diyarkirin ko li Sûryê milyon û nîv Kurd hene û ji hemû mafên xwe yên sîvilî bêpar in.

Kurd dixwazên mafên wan yên siyasî û neteweyî bîn garantîkîrin. Ji ber vê çendê jî dixwazin rayagiştî ya dinya li pêşber dewleta Sûryê bêdeng nemîne. Li hemû cîyên dinyayê Kurd piştgiyariya xwe ji bo bira-derên xwe yên Kurdên binxetê didin diyarkirin û rejîma Be'esî ya faşîst a Sûryê şermezar dikin.

Wekî tê zanîn di 12-yê Aderê de li Qamişlo piştî maça futbolê Ereban bi serê Saddam sond xwaribûn û bi çek û daran êrîşî Kurdan kiribûn û sê zarokên Kurd hatibûn kuştin. Her di dûv vê bûyerê re, dewleta Sûryê berê hêzên xwe yên çekdar dabûn bajarên kurdan û di nava deh rojan de Kurdên sîvil bi dehan hatin kuştin, bi sedan birîndar bûn û bi hezaran Kurd hatin girtin, bajar û gundên Kurdan ji aliyê Eraban ve hatin talankirin û hêj ji aramî neketiye bajarên Kurdan.

Ji bo rawestina van êrîşên hovane Rêxistina Efûyê li her cihê dîniya yê dixwaze mirovên dilxwaz û hêzên mirovî bikevin tevgerê. Nameya ko Rixistina Efûyê dixwaze ji serokdewletê Sûryê re bête şandin an jî bête faksîkirin li jêr bi kurdî ye. Her hûn dikarin ji bo agadariyên hêj zêdetir serî li vê <http://www.amnesty-turkiye.org> siteyê jî bidin.

22/3 2004

NAVÎŞANÊN SERLÊDANÊ

His Excellency Bashar al-Assad
President
Presidential Palace
Abu Rummaneh
al-Rashid Street
Damascus
Syrian Arab Republic
Fax: + 963 11 332 3410
Hitap: Your Excellency

Suriye Elçiliði: Sedat Simavi S.40 Çankaya/Ankara
Fax:0312-4385609

Ji Ekselansan re,

... /... / 2004

Ez, ji Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî agadar bûme ko, di pevçûn û bûyerên 12-yê Adarê piştî maça futbolê re rû dayîn de, 25 kesên Kurd hatîne kuştin û bi sedan Kurdên ko hemwelatîyê Sûryê ne hatine girtin.

Hatiye dîyarkirin ko, li Qamýşloyê di 12-yê Adarê de 25 kurd ji aliyê hêzên we yê ewlekariyê ve bi çekan hatine kuştin, divê cenabê we bizane ko ji bo min ev agadarî metiresiyeke giran e.

Ji bona li ser bûyerên kuştinê bi bêterefî û bi hawayekê serbixwe bê lêkolan û kes û aliyên tevî kuştinan bûne li gor standarteke navneteweyî û adîlane bêne mehkemekirin, ez bangê we dikim.

Her divê bizanim ko kesên we girtine, ka we ji ber çi girtine û vê gavê li kû ne?

Daxwaziya min ew e ko di zûtirîn wext de, hemû kesên hatin girtin parêzer û malbatên xwe bibînin û ger pê bivê di cih de îhtiyacên wan yê tendirustî bîn pêkanîn.

Ji bo ko li gor standartên navneteweyî û bi hawayekî mirovane li gel hemû girtiyan miamele bê kirin ji we dixwazim ko hûn ewlekariyên yasayî pêk bînin.

Bir rêz û hurmet.



ŞAHIDEKÎ BÛYERA YEKÊ SIBATÊ

Sakir Fethulah Xalid

PIRS: *Kek Şakir, roja yekê Sibatê li Hewlêrê, li Leqê hûn jî birîndar bûbûn. Tu bi kerema xwe dikarî behsa wê bûyera dişwar bikî?*

Ew orj bi rastî rojek ji rojên dişwar û xedar bû. Saet li dora dehan, midûrê Plansazî ya Wezareta Darayî, Newzad Receb Botanî û Şewket Akalin hatibûn cejna min. Li Hewlêrê ofiseke min heye. Ew roj hin mêvanên min ên din jî hebûn. Yek ji wan mêvanên min Ednan Çeto bû ku ji Swêdê hatibû. Wî xwestibû ku cejna xwe li Kurdistanê bibihurîne. Min û Ednan biryar dabû ku em ê roja Cejnê çûbûna herêma Barzan û Behdînan û me dê merqeda Serokê Nemir ê Barzanî tewaf bikira, li Duhok û Zaxoyê cejna xwe biboranda. Em li ser rê bûn, hew me dît, du mêvan hatin. Yek ji wan Newzad Receb Botanî bû, yê din Şewket Akalin bû.

Piştî ku her du mêvanan cejna me pîroz kirin, Newzad xwest ku me jî digel xwe bibe pîrozbahiya Partiyê. Gava min ji Ednan pirsî ka ew jî tê pîroziya Partiyê, hema da xwe rabû û em her çar çûn li teqsiya Newzad siwar bûn û çûn.

Em pêşî çûn navçeya Rizgarî ya ku li Taxa Birayetîyê bû, serokê navçê Xisro bi civata xwe ve jî xwestin ku bi me re werin Leqê. Jimara me giha nêzî bîst kesî.

Gava em gihan ber deriyê Leqê, gorbuhîşt Xisro gote min: Kek Şakir bide pêş. Min jî, Newzad Receb da pêşiya xwe, ez li pey wî, Şewket Akalin û Ednan Çeto li pey min bûn, hevalên navçeyê jî li pey me rêz bûbûn.

Qorîdora ku me dibir salona merasima cejnê, teng û dirêj bû. Gava em ketin salonê, hol ji mêvanan tije bû. Li pêşiya salonê Wezîr û pêşkêş û rêve-

birên Partî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê bixêrhatin didane mêvanan. Me ji milê çepê ve, cejna Se'd Ebdulah, Şewket Şêxyezdîn, Ekrem Mentîq û hevalên din pîroz kir û em li rêza li pêşberê wan zivîrîn. Samî Ebdurehman, Mehmûd Xalo, Mehdî Xoşnav û gelek rêvebirên din di wê rêzê de bûn.

Newzad Receb, pêşiya min, ez wî taqîb dikim. Ji Samî Ebdurehman bihûrîm, destê min di nava destê Îcra Seîd de bû û teqîn çêbû. Dengê wê teqînê wek dengê birûskê bû. Ez dikarim ji wî dengî ra bêjim çîrpen.

Salon bi çîrpenê ra sor bû, rengêkî sor û zilûmat peyda bû, banê asmolet (qarçîk û kijûrek) bi ser serê me ve hilweşîyan. Tirpêna perçe û pariyên wî xwekujê bê dîn û bê îman, bi qarçîkan ve hevraz bûn û dîsa bi şûnde hatin li erdê ketin. Bi çîrpenê ra destê Îcra Seîd bê rih ma û ji nava destên min şeqitî û ew ket xwarê. Tiştê ku ez lê ecêbmayî mam, di wê bûyera dijwar de tu kesî ax û ox nekir, qîrîn û zarîn û nalîna kesî nehat guhên min. Tenê dengêkî fermî talîmat da û got: Rakevin, rakevin! Ewî kesî sê caran vî emrî dubare kir. Min biryara xwe da ku ez dê ranekevim û raneketim.

Ez di nava wê tofanê da li ser piyên xwe mabûm. Min xwe bi xwe got: Bo çi ez ê rakevim?

Bihneke pîs, wek bihna barûdê ketibû pozê min û guhê min ê rastê miribû. Xwîn bi ruyê min ve berjêr diherikî. Min her du destên xwe li ser û laşê xwe gerandin, ez rastî tu birînê nehatim. Tenê lingê min ê rastê birîndar bûbû. Min guman kir ku şikestiyê, lê hêj germ bû. Min biryar da ku ez zû xwe bavêjim derve. Min xwe nizm kir ka rewşa Îcra Seîd çewa ye. Îcra pal dabû ser hevalekî xwe û bê hiş bû. Min di xwe da nedît ku ez wî rakim.

Min hewl da xwe û bi piyê şikestî qesda derve kir. Hemî kes li erdê, bi ser dev dirêjkirî bûn, bêdeng û bênalîn...

Agir girtibû mafûran, gurriya agir cî-cî bilind dibû. Wî agirî tarîtiya salonê rohnî dikir.

Gava min salon xilas kir û ketim rewaqê, zabitekî emerîkî ku bi bejna xwe du metre dirêj bû, kete ber milê min û ez deranîm derve. Yekemîn kes ez bûm ku derketim der. Min ji pêşmergeyekî desmala wî xwest. Wî desmalê deranî û da min, min gotê: Piyê min li ser gozekê hişk girêbide. Wî girêda û bi lez çû telbeyê birîndaran.

Xwîn di ser pêlava min ra wek kanî diherikî. Pîqabek hat li ber min sekinî, min û çend birîndaran siwar kirin û birin nexweşxanê.

Ew nexweşxane ji Leqê bi qederê sêsed metreyî bû. Îtaliyan ew nexweşxane ji bo birîndarên acîl çêkiribû. Doktorên kurd pir zîrek û pispor bûn. Min xizmeta li wê Nexweşxanê, li devereke din nedîtiye û bi can û dil li ber birîndarên xwe diketin.

Pirs: *Gava Serok Mesûd Berzanî hat wê nexweşxanê ba birîndaran, me tu*

jî di televîzyonê de dît ku tu bi serokê birêz ra diştexilî. Gelo te hingê çi gotê Serok?

Serok, gelek xemgîn û dilbirîn bû. Ew moral û umîda hemû kurdan e. Min rêz û hurmet û taziye-yên xwe pêşkêşê wî kirin û serxweşiyê da cenabê wî. Serok, heval û hogirên xwe yên tevgera Azadî û Rizgariyê wenda kiribû. Min go:

- Bila tu her bijî. Bila canê min gorî cenabê we bî.

Pirs: *Ez ê pirseke dijwar ji we bikim. Gelo gava ku teqîn çêbû, çi hat bîra te?*

Malwêranî, malkambaxî, heşr, qiyamet, Helebçe, Hîroşîma û felaketin mezin hatin ber çavên min. Wehşet û hovîtiya terorîstan û xwekujên bê dîn, bê mejî û bê îman hatin bîra min. Rêvebir û teknokratên kurd, rewşenbîr, siyasetvan, dewletsaz û kadirên milletekî mezlûm û bermiraz li ber çavên min şehîd bûn. Ew teqîn di nava koma wan kesên hêja de hat holê. Wê çi bê bîra min? Mala min şewitîbû, konê reş li ser serê min hatibû vedan, dinya min serûbin bûbû, roja min ji mexrebê ve derket, mirin û jiyan bûbûn yek.

Ez bi xilasiya xwe xweşhal û şanaz nîn im. Dostên meriv û ezîzên dilê meriv tev herin û meriv sax bimîne, ev pirs tim di serê min de diçe û tê. Xwezî ez jî bi wî karwanê şehîdan ra çûbûma. Ew şehîd weke hemû şehîdên welêt, ezîz bûn. Şehîdên Leqê û şehîdên Malbendê ezîzên dilê hemû kurdan in. Ev cara yekemîn e ku miletê kurd bi hev re şîna wan şehîdan kir. Hêvîdar im ku xwîna wan a pîroz bibe dermanê yekîtiyê û birayetiye...



Yekgirtin dê Pêşiya Kurdan Ronahî Bike

Xelîl Cindî (Almanya)

Ev karesata mezin ne kêmtir bû ji karesata kîmyabaranîya Helepçe û Enfalê. Ev Xalekek bû ji xaleka qutkirin û xeniqandina dengê azadiya gelê Kurd. Heqet îro dê laşê wan şehîdên qehreman ji nav me rakin, dûrê kes û karê wan, heval û hogirên wan bikin. Yeka dî nûra giyanê wan wek agirê Babagurr be. Di dilê her kurdekî dilsoz û niştimanperwer de hatibe rapêşandin. Xwîna wan feda ye ligel xwîna şehîdên Kurdistanê bo azadaîya Kurdistanê. Demek zû yan dereng wê gelê Kurdistanê bigihe mafê çarenûsî-na xwe.

Ev karê tirsonek bi çêkirina du-sê grubên Ereba yan Ensarûl Îslam yan Cindûl Îslam yan bêjin Ensarûl Sûnea belkî ev karê çepel handana hêzên sîyasî yên di Iraqê ne, ew ên ku naxwazin Kurd bigehin mafê xwe. Handana wan kesan e ku berê demekê ku hemû kes zanin li Kerkuk û Bexda û derên din alayên xwe rakirin û digotin “*laîlaheîlallah Kurdistan hedmulah*”.

Ev karê çepel e, ev handana qenalên esmanî yên Ereban e, hemû şovînîstên Ereban yên ku bîaşkerayî naxwazin gelê Kurd bigehe mafên xwe yên rewê. Helbet ev kara, ez nabêjime raste rast destê wan têda ye, belkî ligel mijûl dibin. Xeterên dewletên hevpeyman jî hene, heta nûka helwestêke dirust beramberê gelê Kurd dîyar nakin. Ev karê çepel e, ev handana kenalên ezmanî yên Ereban e. Bi taybetî wek Arabîya, El Cezîra û ew ên din ... navê wan gelek in. Ango ez dikarim bêjim ev karê tirsonek pêla şovînîstî û regezperestî ya dijî gelê Kurd e. Weko tofanekê hemû rabûne ser piyan dixwazin wek berê bi qanûnên kevin Kurdan birêve bibin û gelê Kurd întiqalê wan bike. Tabî ew naxwazin gelê Kurd bigehe mafê xwe yên rewê.

Ew karê çepel û nemirovane, bi bîrûbawerîya min mîlmîlanîya di nîva ro-
nahî û tarî da, nîva xêr û şerî da ye. Weko di tarîxê da gelê Kurd wê bigehe mafê
çarenûsî ya xwe. Wê nûha weko destpêk bixwazin ko federalî bo Kurdistanê,
bo Kurdan bi awayeke aşîtî û demokratî bête cî.

Nûqtakî dî bi bîrûbawerîya min gelek girîng e, ev karesata diltezîn, dişê
pexşanê me Kurdan, gelê Kurdistanê, partiyên Kurdistanê dîyar biket. Xaleka
dî ya girîng stratejiyeta ewlekariya netewa Kurd e. Yanî em qewmê Kurd,
berpirsyarên Kurdan ku nika pênc kes in; bi taybetî rêzdar serok Mesud
Barzanî û Mam Celal nûha li ser hikûm da ne, li ser van karesatan bisekinin
û bi dirustî li ser hêzên Iraqî bi axivîn ku liser van tiştên çêbûyî lazime em
helwesta xwe rast bikin. Heta ew hêzên dibêjin muhazeza Ireqê, ew ligel
mafê çarenûsî bûn, mafê kurdan bûn, hatin Kurdistanê, mîvandariyeka baş û
bi xatir rêz girtin. Ewan hemû kesan mafê Kurdan tesdîq kirin, piştî kongireya
London.

Divê xîtaba Kurdî bi ron û aşkerayî bersîngê wan dewletan bigre, ên nûka
destên xwe dikine nav îş û karê Iraqê û îş û karê Kurdan. Naxwazin gelê Kurd
midafa mafê rewa yê çarenûsa xwe bikin. Evro her kurdekî dilsoz hebê divê
hev bigrin, bitaybetî jî rêvebirîya Hewlêr û Silêmaniyê. Ev yekîti dê pêşîya
Kurdan ronahî bike. Lewra neyarên Kurdan dixwazin planên xwe bimeşînin.
Xaleke dî jî gelek girînge bi girêdayî stratejiya ewlekariya Kurdan ve elaqe
wê ew e, divê coğrafîya Kurdistanê bête parastin û nehêlin kesekî bê daxilê
Hewlêr û Kerkuk û Silêmanî û Dihokê bin. Lazime plana wan kesan; ew ên
ku dixwazin bêne van deran tevbidin, bête pûçkirin. Ez dixwazin pirr bi aş-
kerayî bêjim, careke dî ew partiyên îslamî yên tundrew li kê dera hebin bi tay-
betî yên di nav lepê me da, dorpêçandinek bête kirin, ser îcaze pêdan. Her
kesêk hebit Îslam bit, Êzîdî bit, Xiristiyan bit divê nûka bo mesela kurdayetî
xebat bikî ne bo mesela dînî. Ya mihîmtir barê li ser milê herdu alîyan evro
divê mafê çarenûsî ya federalîya Kurdan bête çesipandin di nav destûrê Iraqî
de. Eva ji hemû tiştî girîngtir e evro. Planê ew ên digel me şer dîkin, bîaşkira
digel hev peymanên eskerî dîkin. Li hember vê divê em jî tîkiliyên xwe bi
hêzên hevpeyman re; digel Amrîka û Bîrîtanya xurt bikin, bo berjewendiya
gelê Kurdistan û emroyîna mafê gelê xwe. Nûqtakî dî ku li gor bîrûbawerîya
min gelek girîng e, divê li seranserê Kurdistanê di bin çavdêriya dewletan,
Miletetên Yekbûyî de referandomek bête kirin ku dewra nûha gelê Kurd çî
dixwaze. Daxwaziyên me çî ne?



Kurdistan ne Cihê Terorîstên Bêdîn e û Gelê Me Çewa di Şerê Dîktatoriyê de Bi Ser Ket, Welê di Şerê Terorîzmê de Jî Dê Bi Ser Bikeve

Bûyera herî nexweş di jiyana mirovan de ew e ko mirov heval û bira û hevçeperên xwe winda bike, bi tenê hedara ko jana windakirina wan jî siviktir bike ew e ko windakirina wan ji bona gel û welatî be. Şehîdên yekemîn roja cejna qurban a pêroz jî ji bona Kurdistanê delal, canê xwe da. Ev tawan mezintirîn tawan bû ko di derheqê gelê Kurdistanê û bi taybetî jî li dijî bajarê Hewlêra dêrîn û aşîxwaz de hate pêkanîn ko tê de komeke lîderên jêhatî yên gelê me û welatiyan şehîd û birîndar bûn.

Em Kurd bi dirêjîya têkoşîna xwe ya neteweyî pir caran rastî karesatên weha hatine û ev karwanê şehîdan jî ne yekemîn karwan e û belkî ne karwanê dawiyê jî be, ji ber têkoşerên gelê me her ji yekemîn roja tevlibûna xwe ya qada têkoşînê, her tim şehîdbûn ji xwe re daniye.

Tawana 1-ê Sibatê ji bo her armancekê hatibe pêkanîn, tawaneke nelêbuhûrî ya di derheqê gelekê de ye ko nû gula hêviyên wî dibişkive. Ev ne tawaneke e ko hin terorîstan biryara pêkanîna wê girtibe, lê belê planeka mezin û xeter e û ji mêj ve ye program jê re hatiye amadekirin û gelek alî tê de beşdar in û roj bi roj jî agahdariyên bêtir tene bidestxistin ka niha çi plan li dijî gelê Kurd û Kurdistanê tene amadekirin.

Em gelek baş mesaja dijmînên mirovantiyê fêm dikin, gefnameka dijmînên azadî û demokrasî û ronahiyê ye ji gelê Kurdistanê re ko dibên çenabe ev gel daxwaza mafên xwe bike, çenabe daxwaza Îraqeka federal, demokratîk, pîralî û parlamênî bike, çenabe avakirin li Kurdistanê berdewam be, çenabe dost û hevkarê cihana azad û demokratîk be.

Lêbelê welê dîyar e terorîst û reşdilên ko li pişt wan in pê nahesin têkoşerên gelê me û bi taybetî jî rêçgirên rêça Barzaniyê nemir û Partiya Demokrat ya Kurdistanê mirinê di jiyana bindestiyê de û jiyanê di qurbanîdana ji bona gel û welat de dibînin û nikarin di tariyê de li ser gîfkan bi qelereşan re bijîn, lê-

belê fêr in ko li ser çiyayên bilind ên Kurdistanê bi elhoyan re bi serbilindî û di ronahiyê de bijîn û qet jî dev ji têkoşîna xwe ya rewa bernadin.

Li vir ew çarîneya Mam Hejarî têtê bîra min ya ko dibêje:

*Zor le mêj e û ber le mêjû serbillindî û bûn û jîn im
Her hem û her çîn le duway çîn mergî dagîrker debînim
Dujminanî kurd gelêk hatûnete serim û rawniraw in
Min le meydanî xebata her çeqîw im, min Sefîn im*

Rêberên me em hîn kirine ko maneya jiyana bê prensîp nîn e û şehîdbûn jî pileya herî bilind e ko têkoşer digihîjê û xwezî li kesê ko digîje vê pileyê.

Ji gelê Kurd re serbilindî ye ko îro ji bo avakirina Îraqeka federal û demokratîk roleke aktîv dilîze, lewra jî madem ko ew piştgiriya me ji bo avakirina Îraqeka weha dikin û taybetmendiya Kurdistanê girtine ber çavan, em ê her wek hevkar û hevpeymanên hevpeymanan bimînin û ev helwêsta wan jî cihê rêz û razîbûna gelê Kurdistanê ye.

Bi dirêjîya dîrokê gelek dijminan hewl daye îradeya gelê Kurdistanê bişkênin û ê ko ev hewl jî dabe, serê xwe li çiyayên bilind ên Kurdistanê xistiye.

Bijartina bajarê Hewlêra xweragir ji bal dijminan ve ji bo ko vê tewanê tê de bikin, lewra ye ko Hewlêr paytexta herêma Kurdistanê ye û parlamento û Hukûmeta Herêma Kurdistanê lê ne û biryara siyasiya kurdan jî her li vî bajarê hêja derdikeve, tawana wan jî li dijî hemû gelê Kurdistanê ye, ne bi tenê li dijî PDK-ê û YNK-ê û ez dikarim bibêjim li dijî hemû gelê Îraqê, belkî li dijî mirovantiyê û hemû behakî pîroz e jî.

Eger ko merema terorîstan bi tenê PDK û YNK bûna, bila di rojekê din de tawana xwe pêk anîba, ne rojeke weha ya pîroz de, ji ber ko yê ne hov be, di roja cejnê de tawanên weha nake û pir kesên welatî û bêguneh şehîd û birîndar nake, xuya ye ew hov û ne mirov in.

Li vir pirsîyareka girîng derdikeve pêş, ew jî ev e: Ev tawanbar ko bi vî awayî mejiyê van xortan dişon û wan ber bi mirinê ve dişînin, eger ko rast dibêjin û buhuştê bi xelata van karên terorîstî qebûl dikin, çima ew xwe di dewsa van xortan de nateqînin ko piraniya wan salmezin in jî.

Li vir divê em rihalên hemû wan reşdilan qut bikin yê dibine sedema van hemû karesatan û heq e gelê Kurd hîsabekî tund bi wan re bike û yê ko helwestên wan yê durû jî hene beriya ko gel li wan rabe, bila dîsa helwestên xwe di ber çavan re derbas bikin û ên ko rênişandêriyê ji ji terorîstan re dikin eger bawer dikin ko nehatine nasîn, îro yan sibe, dê her êşkere bibin û dê bikevin ber nîfirîna Xwedê û gel û dê rastê çarenûseka reş bîn, ji ber bi pişt- rastî dibêjim Kurdistan ne cihê terorîstên bêdîn e û gelê me çawa di şerê dîktatoriyê de bi ser ket, welê di şerê terorîzmê de jî dê bi ser bikeve. Dikare dijmin bawer bikin ko bi karên weha terorîstî dê gelê Kurdistanê bişkînin, lê belê wan bi xwe dît çawa hemû gelê Kurdistanê li seranserê

cîhanê bûne yek deng û yek helwêst û hemû mirovdost û azadîxwaz û demokrasîxwazên cîhanê jî hevderd û hevxemên gelê me bûn û kêman caran di dîrokê de welê çê bûye ko mîna vê carê gelê Kurdistanê yekdeng û yekhelwêst li dijî dijminan rabiweste.

Gelê Kurdistanê gelek ji wan bêdînên îddîaya Îslamê dikin, misilmantir e û madem van hovan dijminatîya Kurdan bijart, bêguman çarenûsa wan dê ji çarenûsa hemû ên beriya wan ev rê bijartibûn, ne baştir be.

Niha jî ew dem e ko tev bi hev re bi dengê bilind bibêjin em hemû Kurd û hemû jî Kurdistanî ne.

Bila em tev bi hev re bêtir bi berpirsiyariya xwe ya li hember gelê welatê xwe bihesin û li vir daxwazê ji hemû partî û kesatî û mamosteyên ol û her kesekî li vê Kurdistanê dikim ko cîhada li dijî terorîstan bi erka ser milê xwe qebûl bikin û ji bo parastina gel û welat, hemû hevkarîyê bi dezgehên asayîşê re bikin.

Niha ji her demê zêdetir partiyên kurdistanî divê alîkariya hev bikin û bêtirî tevan ji PDK û YNK divê alîkarên hev bin ji bo ko pendan ji tawana 1-ê Sibatê werbigirin, ji ber derseka pir beha bû ko divê her du alî baş jê fêm bikin.

Ev ne cara pêşî ye bi belge tête selimandin ko yên têkoşer çawa di jiyana xwe de xizmetkarên gelê xwe bûne, piştî şehîdbûnê jî xizmeteka mezin ji gelê xwe re kirine ko ev yekîti û yekhelwêstiya gelê wan e.

Belê, şehîdên me pir hêja, mezin û jêhatî bûn, lê belê hêviya her têkoşerekî ye ko xwe gorî welatê xwe bike, em jî soz didin van şehîdan ko em ê riya wan bernedin û derseka welê jî bidin dijminan ko bizanibin derba pêşmergeyên Kurdistanê, çiqasî biêş e.

Dawiyê pêwîst dibînim ji bo helwêsta wî ya neteweyî, spasiya gelê Kurdistanê li her çar beşên Kurdistanê bikim, ko bi rastî jî ji xema me kêman kir û em piştrast kirin bi ti awayî rê nadin ko navê şehîdên riya rizgariyê wînda bibe, ji ber di nav dilê wan de dijîn.

Ji bo helwêsta wan ya dostî û biratî, spas ji hemû partî û kesatî û dost û birayên me re li Îraqa azad, spas ji hemû dostên gelê me re li seranserî cîhanê ko bi name û telefon û bi her awayî hevxemî û hevderdiya xwe anîn ziman, spas ji wan tevan re yên hevxemên me bûn û nikaribûn pêwendiyê bikin.

Silav li canê paqij ê şehîdên bira û dost û heval û hevçeper ko di demekê pir nazik de em hêlan.

Beriya ko sersaxiyê li kesûkarên şehîdan jî bikim, sersaxiyê li xwe dikim, ew her yek ketine bin barê xema ezîzên xwe, lê belê xema tevan di dilê me de ye.

Silav ji canê şehîdên azadiyê re.

MESÛD BARZANÎ

2004-02-03



Serokwezîrê Kurdistanê Balê Dikişîne Ser Terorîzma Nêvdewletî

Welatîyên Hêja,

Mixabin divê îro di dewsa pîrozkirina cejnê de, behîdarî û sersaxiyê li we yên hêja û serokatiya her du partiyan û kesûkarên şehîdên vê karesatê bikim, bi taybetî jî sersaxiyê li xelkê xweragirê bajarê Hewlêra hêja bikim ko yekemîn roja cejnê li wan bû matem.

Va hûn bi xwe dibînin dijmînên Kurd û Kurdistanê bi çi awayî di çi rojê de derfeta xwe dibînin, û derban li me dixin. Desteyeka navneteweyî ya tawanbar, bi alîkariya desteyeka hundir, du terorîst xistin nava rêzên welatîyan ko ji bo pîrozkirina cejnê hatibûn baregehên tayê duyê yê Partiya Demokrat a Kurdistanê û melbenda sêyê ya Yekîtiya Nîştmanî ya Kurdistanê û ji encama xweteqandinê, bêtirî 100 kesan ji welatîyan û lîderên siyasî û hukûmetî û partîti şehîd bûn û bi dehan kesên din jî birîndar bûn.

Ev kuştara bikom zincîra wan tawanên qirêj e ko bi dehan salan e li dijî gelê Kurdistanê û tevgera wî tene pêkanîn, her weha jî tawaneka mezin ya di derheqê gelê Îraqê de ye ko di vê demê de hewl dide aramî û asayîşê vegeirîne welat.

Ziyana Partiyê di vê teqîna xwekujî de ne bi tenê ji hejmara şehîd û birîndaran derdikeve, lê belê ji bilindiya payeyên lîderên nemir jî diyar e, ji ber beşeke girîng ya serokatiya hukûmeta herêma Kurdistanê kete ber vê derbê.

Şehîd Samî Ebdulrehman cîgirê serokê Hukûmeta Herêma Kurdistanê û şehîd Şewket Şêx Yezdîn wezîrê karên civata wezîran, du stûnên girîng yên hukûmetê bûn, her yekî ji wan bi awa û şarezaiya xwe, cihekî pir mezin dagirtibû, herweha şehîd Seed Ebdulla wezîrê çandin û avdêranê, şehîd Ekrem Mentik parêzgarê Hewlêrê û şehîd Mehmûd Halo şûnkarê wezaretê

darayî û aborî û berpirsiyar û kadroyên din yên hukûmetê û Partiyê ko şehîd û birîndar bûn, her yek ji wan xwedî azmûn û şarezayiyên bilind bûn.

Hukûmeta Herêma Kurdistanê sermayeyeke beşerî ya girîng wînd kir û bi tenê hêviya me bi gel û kurên wî yên dilsoz e ko bi xweragirî û lixweborînê dê bikaribin van valahiyên mezin dagirin. Em piştrast in gelê Kurdistanê dê ala têkoşîna van şehîdên serbilind, her bilind bihêle.

Welatiyên birêz,

Ez nikarim bi taybetî jî behsa rola her du şehîdan Samî Ebdulrehman û Şewket Şêx Yezdîn nekim, ji ber rojane me karên giştî yên hukûmetê û karên welatiyan bi rê ve dibir, şehîd Samî 41 sal têkoşîn û zehmeta tijî serdarî bi serbilindî gihandine encam, ji pêşmergeatî û karên partîti dest pê kir heta gihaye endametiya polîtbiroyê û wezîr û endamê şanda gotûbêjan di salên 1970-1974-ê de, pişt re sekreterê serokatiya Partî û dawiyê cîgirê serokê Hukûmeta Herêma Kurdistanê û sekreterê polîtbiroya Partiya Demokrat ya Kurdistanê.

Di van 41 salan de şehîd Samî Ebdulrehman di karên siyasî û dîplomatîk de bûbû kesatiyeke xwedî azmûn û her weha jî kesatiyekî kurd yê bernas li seranserî Îraqê û Rojhilata Navîn û cîhanê jî, ew tevî ko nesax jî bû, lêbelê her tim jî bo pêkanîna erkên mezin amade bû, cihê rêza serokatiya Partiyê û hemû xelkê Kurdistanê bû. Herweha mixabin ji bo kurê wî Selah ko wê demê li wir bû û hate şehîdkirin.

Şewket Şêx Yezdîn bêtirî 25 salan bi pêşmergeatî, karên partîti û îdarî di rewşên giran yên şoreşê de zehmet dîtiye, penaberên kurd yên li Îranê şahid in ka wî çiqasî ji bo pêkanîna karên wan, hewl dida. Heyama heşt salên dawî bû wezîrê darayî, pişt re wezîrê karên civata wezîran. Di heyameke kêma de azmûneka dewlemend ya îdarî bi dest xist û bi dilsozî karên rojane pêk dianî.

Şehîd Şewket dengê pêşmergeyan û kadroyên lêqewimî û mexdûr bû, xemxwirê malên şehîdan bû, dilsozê wefadarên Barzanîyê nemir bû. Her weha Seed Ebdulla û hemû şehîdên din yên PDK-ê û YNK-ê ji gelê me re samanekî mezin yê beşerî û manewî bûn. Di vê daxuyaniya min ya kurt de, ez dê nikaribim behsa têkoşîna yeko yeko ya wan bikim, însaella derfeteke din ezê ji kesûkarên wan yên serbilind daxwaza lêbuhrînê bikim, tenê wê yekê dibêjim ko divê em ron û vekirî bizanibin ev tawan çima di vê demê de çêbû.

Welatiyên dilsoz,

Tawanbar ji ti behayên olî, civakî û mirovatî re, girîngiyê nadin, ji ber çekiriyên eqliyeteka tarî û reş û dijminkarî ne, lewra jî mifayê ji helketineke pîroz ya weke cejna qurbanê dibînin ko tê de xelkê dilpak û olperwer û dilsozê Kurdistanê hatinçûyîna hevdu dikan.

Çendîn sal e jî li Kurdistanê bûye adet ko berpirsiyarên hukûmetê û par-

tiyan li baregehên xwe pêşwaziya rasterast li welatîyên hêja dikin, heta niha ev rêûresm azadane pêk hatine, ji ber rewîşt û tîtalên mirovdostane yên civa-ka Kurdistanê bi Kurd û Turkmen û Aşûrî û Kildan û xelkê din jî ew bûye ko hemû rêzê li helketinên pîroz bigirin, çi Îslamî, yan Xirîstîyanî, yan jî Êzidî. Heta niha ti bûyerên weha yên qirêj çênebûne, ev tawana destkirî, raspêriya terorîzma navneteweyî ye ko vekirî daxwaz kirine ziyane bidin partiyên demokratxwazên Kurdistanê, her weke ko li seranserî cîhanê dikin û ev jî di demekê de ye ko gelê Kurdistanê, partî û dezgehên siyasî û hukûmetî yên wî heta niha bi qasî misqalekê ziyane nedaye ti gel û hukûmeteka dinê.

Ev li dijî vî gelê reş û rût in ko bi hezaran derdeserî û qurbanîyan gihaye fîro, ev jî ne karesata me ya yekê ye û ne jî ya dawiyê dibe, em gelek in ji azadiya xwe re têdikoşin, ji bona armancên me yên rewa jî xwîna me li cem me erzan e. Tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê bi dehan salan ketiye ber êrîşên şovînistên neteweyî, niha jî dikeve ber heman êrîşan, lêbelê vê carê li ser navê ol, eger na çi rewa ye ji welatên dûr yên Erebbesên xwekuj jî bal rêxistinên terorîst ve ji bo Kurdistanê bêne şandin ji bo ko bi otomobêlên mayînkirî û teqînên xwekujî, kuştaren bikomên weke serdema rijêma Baas pêk bînin.

Ya ko bala mirovî jî dikişîne ew e, tawana vê carê di rewşeke taybet de çêbûye, di demekê de ye ko gelê Îraqê pêve ye serdarî û desthilata xwe ya nîştîmanî vedigêre û sîstema demokratîk, parlemênî û federal ava dike. Di demekê de ye ko gelê Kurdistanê pêve ye bidestxistiyên girîng bi dest dixe û xwesteka xwe ko federalîzma di çarçoveya dewleta federal a Îraqê de ye, bi cih bike. Di demekê de ye ko tevgera demokratxwazî û reformên siyasî û aborî û civakî li seranserî Rojhilata Navîn, bi pêş ve diçin, lewra jî em dibêjin ev tawan ne bi tenê li dijî gelê Kurdistanê, lê belê li dijî gelê Îraqê ye, çareserî jî yekbûn û hevkarî û tevayîya hemû partî û hêzên demokratxwazên Îraqê û dostên gelê me ye.

Dost û hevpeymanên gelê Îraqê û gelê Kurdistanê, helwêsta xweragiriya xelkê Kurdistanê li Hewlêr, Kerkûk, Silêmanî, Duhokê û seranserî Kurdistanê nîşana şiyariya xelkê û xeyîdîn û bêzariya wan ji vê tawanê ye, ji roja ko ev tawan çêbûye, xelkê Kurdistanê yekparçe çi bi behî û derbirrîna bêzariyê, çi bi nîşandana dilgiraniya xwe, civiyane, tevlibûna wan ya bikom li ser awayê xwenîşandên aram û bêdeng, nimayîşeka nîştmaniya bilind e ko bi vî awayî xeyîdîna xwe berçav dikin.

Li aliyê din piştgiriya xwe ji bo tevgera rizgarîxwaz a gelê xwe û mafên wî yên rewa nîşan dide, ji bo ko dijmin bizanibin baweriya gelê Kurd ji ya ko ew xeyal dikin, bilindtir e. Ev awayê pirotestokirinê, nîşana zîndîtiya xweragiriya gel û hêviya hukûmetê û dezgehên herêmê ye ji bo ko bi awayên

bilindtir têkoşîna rewa ya gelê me bigehînin encam. Rast e ziyan mezin e, lê belê xwenîşandana bêdeng û aram, yekbûna xelkê, hêz û baweriyeka mukumtir daye têkoşerên Kurdistanê da ko ji bona mafên xwe bêtirî berê hewl bidin û têbikoşin.

Dawiyê behîdariyê li welatîyên birêz dikim ko ji bo pîrozkirina cejna qurbanê çûbûne baregehê tayê duyê yê PDK-ê û melbenda YNK-ê, her weha behîdariyê li malbatên serbilindên şehîdên vê karesatê dikim ko hemû heval û hevkar û dostên me yên nêzîk bûn, her weha jî ji welatîyên hêja daxwaz dikim ji bo aramî û tenahiyê, piştgirên hukûmeta xwe bin. Ji birîndarên vê karesatê re şîfayê dixwazim û pişt bi Xwedê û dilsoziya gelê xwe, em dê mis-qalekî poşman nebin. Em we piştrast dikin ko bi dehan pispore û mirovên jêhatî û azmûndar li ber destê van şehîdên serbilind pê gihane û nahêlin pêkanîna erkan, bi paş ve bimînin.

Xwedayê mezin di rêya çakî û xizmeta gel û welat de hevkar û piştevanê me be.

Nêçîrvan Barzanî
Serokê Hukûmeta Herêma Kurdistanê

3-ê Sibata 2004-ê
HEWLÊR, 3/2 2004

BANGA JI BO AZADÎYA ZIMANÊ KURDÎ: KURDÎ 80 SAL BERÊ HAT QEDEXEKIRIN!

80 sal berê weke îroj, zimanê kurdî bi alfabeya xwe ya xweser ya 31 tîpî û bi nêzî 80 000 bêjeyên xwe ve li Tirkîyeyê resmî hat qedexekirin. Tevî heft pakêtên reformê yên havîna çûyî jî ev made hê jî di qanûna Trkîyeyê ya bingehî de mane.

Çend nimûneyên van madeyan li jêrê ne:

”Di bikaranîna azadîya hizrî û derbirînê de, tu zimanê ko qanûn wî qedexe dike, nikare bête bikaranîn.” (made:26)

”Tu weşan nikarin bi zimanê ko di qanûnê de qedexekirî ye, bêne der-xistin (made:28). Li Tirkîyeyê, di dibistan û unîversîteyan de, ji derveyî tirkî, tu ziman nikare wekî zimanê zikmakî bête fêrkirin” (made:42).

Ji ber van madeyan û rêzeqanûnên din yên ko di qanûna Tirkîyeyê ya ceza-yê de hene, gelê kurd li Tirkîyeyê ji van mafan jî bêpar hatiye hiştin ko di dibis-tanan de û di weşanên radyo û TVyê de zimanê xwe yê zikmakî bi kar bîne, bi zimanê xwe pirtûk û rojnameyan biweşîne û herweha bêtî tu şerhan navên xwe yên kurdî li xwe bike.

Raportorê YE-yê di warê rewşa demokrasîyê û mafên mirovî li Tirkîyeyê de, rapora xwe ya dawîyê di Cotmehê de dide. Daxwaza Yekîtîya Ewrûpayê, ne ew e ko Tirkîye di qanûnên xwe de bi tenê guherandinên dekoratîv çêbike, lê belê ew dixwaze ko Tirkîye soza xwe ya hem li Brukselê dabû û hem jî ya di dema îmzekirina peymanên navneteweyî de dabû bi cih bîne.

Tirkîye ji bo ko herî dereng heta Çileyê Pêşîn ya 2004an, di derheqê endametiyyê de tarîxeke diyar werbigire, li korîdorên YEyê de zextên xurt dike. Di roja îroj de, Tirkîyeyê heq nekiriye ko bibe namzedwelatê YEyê û ew jî wê stewardîne bi gelekî dûr e ko karibe têkeve nav yekîtîyê. Kengî ko Tirkîyeyê ev reformên ha pêk anîn, hingê endamîya wê ya YEyê dikare aktuel bibe:

Bi zimanê kurdî axavtin û nivîsandin û bi awayekî din xwe bi kurdî îfade-kirin

Destûr dayin kurdan ko bêtî tu şerhan, navên kurdî li xwe bikin

Navên deveran bi kurdî bi kar anîn

Bi kurdî ders dîtin û perwerde bûyin
 Dezgehên perwerdeyê, dibistan û hwd bi zimanê kurdî bi rê ve birin
 Bi kurdî weşandin an jî derxistina nivîsan
 Bi kurdî çalakîya hunerî pêk anîn
 Li Tirkîyeyê dest bi weşanên radyo û TVyê yên kurdî kirin
 Bi armanca pêşdebirina çanda kurdî komele damezrandin
 Ji bo paraztina mafên kurdan partîyên demokratîk damezrandin û beşdarî
 xebatên wan bûyin

Em yên ko vê bangê berîya manîfestoya ji bo zimanê kurdî (ku îroj saet di
 13.00 de li ABF-husetê li Stockholmê pêk tê) îmze dikin, dixwazin ko Qanûna
 dewleta Tirkîyeyê ya Bingehî weha bête guhertin ko ev daxwaz bêne bicîhkirin.

Kurdo Baksi, nivîskar

Ana L Valdes

Birgitta Stenberg

Ana Martinez, nivîskar

Theodor Kallifatides, nivîskar

Arne Ruth, weşanger

Ljiljana Dufgran, seroka PENa Swêdê

Jonas Modig, serokê Komeleya Weşangerên Swêdê

***Maria Modig, nivîskar û seroka Komîteya Nivîskarên Girtî
PEN-a Swêdê***

Sven Volter, artist

Mustafa Aydogan, nivîskar û wergêr

Jan Guillou, nivîskar

Astrid Assefa, şefa teyatroyê

Boel Unnerstad, serokê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê

Çend Vateyî Derheqê Ziwanî, Edebîyatî û Edîbîye de

Roşan Lezgîn

Manaya ziwanî a tewr verêne a ya ke însan bi sayê ziwanî fikr û hîs û waştîşanê xo dano zaneyîş; xo pê îfade keno. Hêna merdim bi sayê ziwanî yewbînan ra fam keno. Na manaya ziwanî ya tewr basîte, sade û masum a.

Labelê, rastiya xo de ne ziwan ende masum o, û ne zî manaya ziwanî wina bi asanîye yena îzahkerdiş. Çunke, heto teolojîk ne tede, ziwanê yew cematî bi areq û keda ey cematî reyde ameyo wucûd; ziwan, eserê cuwîyayena hezaran serranê yew miletî yo.

Ziwanî awa û rîtm xo, şekil û şêweya xo, dirûb û tebîetê xo şeklê cuwîyayena cematî ra girewto û hêna rengê xo dayo ra heme hetanê cuwîyayena ê miletî. Ziwan yew milko muşterek; çimento û şîrêzê pîyabîyayîşê miletî yo.

Na rey, senî ke ziwan aîdê yew şarî yo, bi no qeyde ziwanî zî qiseykerdoxê xo, şaro ke bi ey ziwanî qisey keno zî kerdo aîdê xo. Verê her çi nameyê xo dayo ra yew cematî. Dima ra nameyê xo dayo ra welatê ê cematî. Û nê hîreme çîyê ke nameyê înan maneno pê; yanî ziwan, şar û welat sey goşt û nenûkî dusyeyê pê wa û cê ra nêbenê. La her tim ziwan sere de yo. Eke ziwan dariya we, ê her diyê bînî zî mîyan ra dariyenê we. No semed ra bîyayîşê yew şarî, se milet, bi cuwîyayîşê ziwanê şarî wa beste yo.

Heto bîn ra, mîyanê ziwanî de bi rastî zî tarîxa ê şarî, her hetan ra şeklê cuwîyayîşê ê şarî, fam û ferasetê şarî, zêhn û xîyalê şarî estê. Ziwan hafizaya muştereka yew miletî yo. Merdim eşkeno yew ziwanî ra xulq û xuy û tebîet û fikr û edetanê ê şarî zî bivîno.

Her ziwan maneno qiseykerdoxanê xo û hêna her şar zî maneno ziwanê xo. Mîyanê ziwanî û qiseykerdoxanê ey de her hetan ra, çi hetê derûnîye ra û çi hetê cuwîyayena madî ra, aîdîyetêko pêt û qewîn esto. Û nasnameya millî ya cematî mîyanê ziwanî de karakterîze bena.

Hêna, zaf çîyê ke ma tira vanê, "kultur", ê zî mîyanê zemînê zîwanî ra peyda benê. Zafê tewirê hunerî zî zîwan ra zîyenê. Û merdim eşkeno bi rehetî vajo ke her zîwan yew medenîyet o.

Netîceyê ro cigêrayîşê weşkerdişê cuwîyayene de însanan hunerî şînas-nayo. Zaf tewirê hunerî estê. Huneran ra oyo tewr gird û bitesîr zî edebîyat o. Yanî şîr, hikaye, roman, ceribnayîş, ûsn.

Edebîyat, hunero tewr bitesîr û gird o, çunke, edebîyat zîwanî ra zîyeno û hêna zîwanî aver beno; zîwanî estetîze keno û paweno/sevekneno. Edebîyat, zîwanî hubrê qeleme reyde qeyd keno. Qesr û qonaxî zemanî reyde şîyenê ra, benê herrî û welî, la rêça hubrî heta bi heta manena. Hêna edebîyat ruhê zîwanî teze keno. Rengêko newe û weşîkiye dano ra zîwanî. Heml, qapasîte û potansîyelê zîwanî herater keno.

Fonksîyonê hunerê edebîyatî zaf ê; edebîyat her hetan ra cuwîyayena însanî hem qeyd keno û hem zî weş keno. Edebîyat, zîwanî ra zîyeno û eslê xo de xizmetê zîwanî de yo.

Mîyanê huneran de tewr zêde merdim eşkeno xo bi edebîyatî îfade bikero, çunke, edebîyat îmkanê xo zaf vêşî yê. Û edebîyat zî sey zîwanî wayîrê nas-nameya xo yo. Çunke malzemeyê edebîyatî tenya zîwan o; zîwan senî ke nameyê xo dano ra şaro ke bi ey qisey keno û nameyê xo dano ra welatê înan, bi no qeyde, nameyê xo dano ra hunerê edebîyatî zî.

Mavajîme, malzemayê rismî reng ê, yanî boyax o. Herçiqas nameyê rengan her zîwanî de cîya bê zî, la madeyê rengan her ca de sey pê yê.

Ma wina xeyalêk bikerîme, ke edîbêko ereb, eke yew esero edebî yo ke seraser qalê cuwîyayena ereban keno û hemeyê ê eserî bi xeml û motîfanê ereban reyde bîyo mûndîş, la eke o edîbo ereb eserê xo bi zîwanê erebî ney, bi zîwanê îtalyanî binuso, a game, o eser nêbeno malê edebîyatê ereban. Beno malê edebîyatê îtalyanîjan.

Edebîyatê miletî çin o, edebîyatê zîwanî esto. Kirîterê ke yew metno edebî û yew metno bîn yewbînan ra cîya kenê, çina vatîş nîyo, senî vatîş o!

Ma bi yew cumla wina nimûneyêke bidîme:

"Çekdarî mîyanê tarîtiya şewe de kewtî ray û şîy."

Na cumleyêka sade ya. Tenya yew îfade tede esto. Yanî, tay merdimê çekdarî şewêka tarîye de cayêk ra kewtê ray û şîyê. Endêk. Sewbîn çîyêna yan zî îfadeyêna tede çin o. Labelê, edîb eşkeno bi eynî çekuyan, la bi awayêko edebî, na cumla tewirêna saz bikero û şima zî do bivînê ke senî yew tofanê îmgeyan mîyanê xîyalê ma de qewimîyeno. Mavajîme:

"Çekdarî mîyanê şewe de kawtî ray û tarî-tarî şîy."

Eynî çeku yê, la cayê înan vurîyayo. Nika na cumla hem o îfadeyo corin bi ma dana zaneyîş, la hem zî, nê îfadeyî ra wetêr, zaf çîyanê bînan zî zêdebar ana ra vîrê (îmge) ma, ke "Gelo ê merdimê çekdarî bi xo zî merdimê tarî, yanî bi gumanî bîy? Gelo ê merdimî ver bi çarenusêka tarîye, ver bi netîceyêko tarî wa şîy? Gelo înan sîrrêk xo dima verda, yan zî sîrrêk xo reyde berd?... Û hema zaf çîyanê bînan zî ana ra vîrê merdimî. A, edebîyat -hetê zîwanî ra- wina yo.

Hêna ma yew cumleya bîne zî nimûne bidîme:

"Lewanê rojî maçî kenê koyê welatê mi."

Yanî, na cumleya edebî bi ma dana zaneyene ke koyê welatê nê edîbî zaf berz ê. La nê qiseykerdişê edebî reyde wina tabloyêko weşik û nazenîn ana ra verê çîmanê ma, ke xîyalê ma de haz û zewqêko zêdebar bi ma dana tehmkerdişî...

Edîb, subjayê edebîyatî yo. Yanî, xulîqnayoxê edebîyatî. Ez tîya de edîban û nuştoxan yewbînan ra aqîtnena. Çünke nuştoxî, her kesê ke nusênê, çi beno o zano, heme nuştox ê. Labelê edîbî, ê kes ê, ke tenya edebîyatî xulîqnenê; zîwanî biedeb kenê. Mîyanê edîban û nuştoxan de ferq o yo, ke Ziwan seba edîban amac o, la seba nuştoxan tenya arac o (wasita).

Na rey, seba ke malzemeyê edebîyatî zîwan bi xo yo, coka zî, vernîya heme çi de, lazim o ke edîb zîwano ke pê nuseno zaf hol bizano; zîwanî rê hakim bo. Çünke, yew nuştox heqîqî, rastîya xo de, wexto ke nuseno, mewzû ra vêşêrî, zîwanî estetîze keno. Qapasîte û potansîyelê zîwanî herater keno.

Wexto ke wina bo, ma eşkenê vajîme ke edîb, hostayê zîwanî yo. Û yew nuştox ganî mekanîzmaya zîwanî, mantîq û herîknayîşê zîwanî zî hol bizano.

Labelê, çi esto ke zîwanê ma beno nîzdîya se serrî ke qedexe bîyo. Sedsera vîstine, ke averşîyayîşê însanîyetî de dewreyêko zaf muhîm o; însanîyet na sedserre de cuwîyayena feodale ra derbasê cuwîyayena moderne bi. Zafê disîplînan na sedserre de sîstematîze bîy. Teknolojî aver şî. Wina dewreyêko zaf nazik, krîtîk û hessas de bi qasê 80-100 serre zîwanê ma qedexe bi.

Heto bîn ra, sersemedê yasaxkerdişê zîwanî ra, ne şar û ne zî nuştoxî zîwanê xo reyde perwerde nêbîy. Zîwanê ma nêbi zîwanî sukî û bazarî...

Labelê, heto bîn ra madem ke yew merdim wazeno binuso, lazim o, vernîya gureyê nuştîşî de, ê texrîbatê ke mîyanê zêhnê ey de virazîyayê, o

rîtmê ziwani ke mîyanê zêhnê ey de raşîyayo, binêk baş biko. Yanî, binêk zehmet bido ra xo, vernîya heme çîyan de, xo hetê ziwani ra bikemilno, nataweta xebatê ke bîyê înan ra îstifade biko û hema binuso. Yanxo, do bi yew ziwano viraşte, eklektîk, kaotîk û heta ke sexte binuso.

Helbet xebatê erjayeî zî estê, nuştox û edîbê zaf mahirî estê ke edebîyatêko hol nusenê, ziwani aver benê.

Xebatêka hole ziwani ser o zî esta. Nika hewce yo ke merdim vajo, xebata îlmî; standardkerdiş, dîsîplînekerdiş û modernkerdişê ziwani yew çî yê, la nezaniye ra xeripnayîşê ziwani sewbîn çî yo!

Rastîya ey, Ziwane Kurdî bi temame îhtîşamê xo nika vera ma de yo. Labelê sersemedê qedexekerdişî ra, ma ziwane xo ra dûr kewtê; ma keyeyê xo de, dewa xo de, kuçe û şaristanane xo de bîy xerîb û macirê ziwane xo...

Hetêko bîn zî esto ke ma hemine eleqedar keno, yanî, her merdimê ke xo rê vano, "No ziwane min o, ez zî aidê nê ziwani ya..." La terkê ziwani kerdo; hendî bi no ziwani qisey nêkeno, nêwaneno, averşîyayîşane ziwani taqîb nêkeno, o bi xo zî berpirsîyar û mesûl o.

Edîbî bi xo zî însan ê. Pêxemberî nîyê ke asmên ra melayîketî înan rê wehîy bîyarê war û çîyan bi înan bidê nuştişî. Û her merdim eserê dor û verê xo yo. Senî ke rengê merdimî maneno welatê merdimî, zêhnê merdimî zî, zaf ra tay, mîyanê dergûşa atmosfero ke merdim tede cuwîyeno ra şeklê xo gêno. Û hêna, yew edîb malzemeyane xo yê ke tira yew esero edebî ano meydan, yanî qûtê xo mîyanê heyatî ra dareno we. Çi çîyê ke dor û verê edîbî de qewimîyenê, çî sînyalanê ke nat û wetê xo ra gêno, binê hişê xo de, mîyanê zêhnê xo de, bi hîs û mantiqê xo înan amên keno, newe ra alaweno û bi no qeyde yew esero edebî xuliqeno.

Tam tîya de, rolê ziwane qewimîyayîşan vejîno meydan. Yanî, ziwane cuwîyayena dor û verê nuştoxî çî bo, zêhnê nuştoxî zî bi o ziwani yeno degirewtîş. Û wextê nuştişî de, nuştoxî keno xo dest. Bê hemdê nuştoxî, ziwane qewimîyayîşan çî bo, qeleme zî bi înad wazena ke bi ey ziwani binuso.

Problem dilete yo! Mesûliyet, ê ma hemine yo! Ziwani edebîyat malê ma hemine yo; çî şar û çî sîyasatmedar. Eke ma kuçe û kolanan de, bazar de, her cayê heyatî de bi ziwane xo qisey nêkerîme, bi ziwane xo nêwanîme, edebîyatêko hol nêvirazîyeno. Coka zî, averşîyayîşê edebîyatê ma de, ke averşîyayîşê edebîyatî, averşîyayîşê ziwane ma yo; estetîzekerdişê cuwîyayena ma yo û ziwani bi xo zî rûmetê ma yo. O semed ra, no gure de ma heme mesûl ê.

Eke yew ziwani nîyo qiseykerdiş, nêbo ziwane heme warane heyatê yew miletî, edebîyatê ey ziwani zî aver nêşino!

Stalîn, Qeyrana Şoreş û Rûxîna *Komara Azerbaijan û Kurdistanê**

Dr. Emîr Hesênûr

Belge: 4) Nameyê Stalîn bo Pişewerî
(arşîva wezareta derve yê Yekîtiya Sovyet:
U 7, d 544, p34,la. 9 û 8, rêkewtî 8-î Mayî 1946)

Bo Hevrê Pişewerî,

Bi min waye, ku we rûdanên navxo yê Îran û herweha navneteweyî jî rast nehelsengadiye.

Yekem: Hûn nûha dişên ew hemû daxwazên şoreşgerên Azerbaijan vedestbihênin. Belam(lêbelê) helumercê(rewşa) îro biwarê geyştina bicîhê-nana ew programana nadet. Lênîn daxwaza serekî ya şoreşgêranî demek hênaye kayewe ku kirîye da bedî bi rikên -destnîşan dikimeve di kîrînê da bedî(xirabî) bikîrîn- wê jî demêk ku qirîzêkî bihêz ê şoreşgerane di nava welat da û herweha sernekevîna sûpayê ligel dijminê derve da hebêt, di sala 1905 da dema ku şer ligel Japon serî negirt, herweha jî bû di wextê şerê sernekevî yê ligel Alman di sala 1917 da. Hûn gereke ji vê barî ve bahsê Lênîn bikîne ewa pîr başe û cîyê rêz lêgirtinê ye jî. Belam rûdanên îro yê Îranê biberevajî wê demê ye, nûha li Îran qeyranî(qirîza) giştî ya şoreşgêrane nîye, cotkarên Îranê heta nûha çalekîyek weha nîşan nedaye. Îran vêga ligel dijminê derve bi şer mijûl nîye, ku bişet darudesteyê kevneperestên Îran eger bête û li şer da sernekevêt, lawaz biket. Dawîyê ev e li Îranê helumercêkî weha nîye ku hûn bikin taktîkê Lênînî ya di sala 1905 û 1917 da hate bikarhênan.

Duwm: Bêguman hûn dikarin bo serkevîna xebata xwe û daxwazên şoreşgerane yê Azerbaijan hêvîdar bibûna (bo dahatu) eger sûpayê Sovyet li Îran mabaye. Belam me nedişêya ewan zêdetir li Îran bihêlane. Bi giştî ji ber ewe, mayîna sûpayên me li Îran, bineretê siyasê me yê rizgarîxwazane li Asya û Awropa da xewşdar dikir. Amrîka û Îngilîzan ji me ra got ku eger sûpayê sovyetê dişên li Îran bêtewewe bo çî dibê sûpayê Îngilîz nedikarêt li Misir û Sûrye û Endonezya û Yonan, sûpayê Amrîka jî li Çîn û Îsland û Daxark da bimênine. Liber vê me biryar da, sûpayên xwe ji Îran û Çîn bikêşin, bo ewê ku ev bînuye li destê Amrîka û Îngilîz da nehêlin û bizotneweyê rizgarîxwazî li

kolonîyan firawan bikin bi vê terzê sîyaseta rizgarîxwazane meşru û karîgertir bikin. Hûn wek şoreşgêrêk li me têdigehekin ku me ne dikarî bi şeweyekî dî hel-sukewt bikine.

Sêyem: Bi liber çavgiirtina gotina we dikirê bi vê encamê xware ve sebareti bi helumercê Îran bigeyne. Li Îran qeyranî bihêz e şoreşgêrane nîye, Îran ligel dujminên derve di haletê şer da nîye ku sernekevtina wê bibête hoyê lawazbûna kevneperestî û qûlbûna qeyran(qirîzê). Ta ku sûpayê Sovyet li Îran hebû, derfetên dirêjdan bo xebata we li Azerbaijan hebû û hûn dikarin bizot-neweyekî demokratîk bidaxwaziyekî dîrûdirêj û firawan, rêkbixin. Belam sûpayê me dibûwa ji Îran bikişêteve ku kişyaye. Êsta(nûha) jî em li Îran berev rûbirûyê çi ne? Em têkheleşûna dewleta "Qewam" divên ligel layengîrên Îngilîz ku kevneperestîrîn darudeste nin li Îran. Rabirdûya kevneperestîya Qewam herçonêk bûwe, nûha ew, neçare bo bergirîkirin li berjewendîyên xwe û her-weha parastina dewleta xwe, hindêk reformên demokratane biket û bi dawîyê piştevanî li nav hêza demokratên Îran da bigerê.

Taktîka me di vê navberê da dibê çi bê? Ez bi weha bîrpedikime ku dibê em li têkheleşûnê da kar wergerin bo ew ê ku Qewam paşegize nekit, dibê pişte-vanî li wî bête kirin ta ku layengîrên(alîgirên) Îngilîz belav bikin û bi vê terzê hindêk pêge bo demokratîzekirina Îran pêkbên. Hemû amojgarîyên(şîretên) me bo wê serçavîyê, ji vê esasê ra digirê. Belam dikarê taktîkekî dî bigrine pêş: waz li hemû tiştêk bihênrê, pêwendî ligel Qewam bipiçrê û bi vê terzê serkevtina layengîrên kevneperest ên Îngilîz mîsoger bêt, belam eve taktîk nîye belkû hemqet e, ev di rastî da xiyane bi gelê Azerbaijan û demokrasîya Îran e.

Çarem: Hûn li vana bibên ku ji sereta ve we me geyande asman, belam dawîyê me serbest kirin û me rîswa kirin. Eger wate(mana) cîyê sersembûn e. Belam di rastî da çi rûdaye? Me li vira da şeweyê dîyarkirî yê şoreşgêrane bikarhênaye ku ji layê hemû şoreşgêrêk ve ronî û aşkira ye. Bo ewê em bi xwe bişên ligel ew helumercê wek Îran biguncênin û kemtirîn daxwazên bizotnewe cîbicî bikirê, pêwîste bi daxwazên kem (mînimom/asgarî) dest pê bikirê û pêşrewê bikirê û bo dewlet metirsî dirust bibê û paşegizekirdinî dewlet bête kayewe. Belam ranehêlin bo pêşeweyî, hûn nedikarin li barodoxê êsta yê Îran bi vê daxwazîyan ku dewleta Qewam êsta neçare wan cîbicî biket, wan mîs-ogerî bikin. Eva yasaya bizotneweyê şoreşgeran e. Belam qise liser riswakiri-na we her nahê bête kayewe. Cîyê sersembûnê ye eger yên wa bîr bikineve ku me wekê dî we riswa kirîye. Biberevajî eger hûn jîrane bicûlêneve, bi pişte-wanîya manewî em dikine ew daxwazîyên ku min nasand û piranîya wan li helumercî Azerbaijan da heye. Hem Azerbaijan û hem Îran wek êşrewanî bizotneweyê pêşkevtîxwaz-demokratîk di rojhelata naverast da dawîyê xêrhatin bo we dikin.

Î. Stalîn, 8-î Mayî 1946

Têbînî: Hejmara belgenamayan ji layê "Gizing" ve hatiye danîn.

a) Sereta

Nameyê 8-ê milî 1946/ (18. 02. 1325) Stalîn bo Mîr Caferê Pêşewerî, Serekwezîrê Hikumetê Millî yê Azarbaycan (Komara Azarbayacan a 1946), ku bo cara pêşî di vê hejmarê Gizing da belav dibe, belgeyêkî herî girîng ê sebarek bi siyaseta dewleta Sovyet li ser Komara Azarbaycan û Kurdistan, bi taybetî û barî siyasî yê Îran û cîhanî yê wê serdemê bigiştî. Dewrê Yekîtiya Sovyet ji damezirandin û rûxîna du komaran ta êsta li zemînên cûrbicûr da lînêrînê dijî kominîstan (dewleta Îran, nasyonalîstên îranîyan, piraniya karbidestên û lêkolînê rojnameyan) dibê Dewleta Sovyet dewletêk dagîrker û destdirêjker û dîktator bû ku dixwest, bi xerakirina Îran, welateke dagîr bike û neft û samanên diwî birûtênê û bigîje "ava germ a kendava Fars". Yekîtiya Sovyet temahî bi nefta Îran kiribû û dawa li dewleta Îran kir ku êmtiyazî derhênan û kar wergirtin ji neftê bakurê Îranê bide wê. Ji ber vê Îranê nedixwest wê êmtiyazê bide Yekîtiya Sovyet, dawîya temambûna şerê cîhanî yê duwem, sûpayên xwe li Îran ragirt û xelkê Azarbaycan û Kurdistanê handa ku ji Îran cihê bibine. Belam serekwezîrê "lêhatuyê Îran" Ehmedê Qewamulseltene, firîn da bo Yekîtiya Sovyetê û belêni da wan ku êmtiyazê neftê didatê û Moskov razî kir ku hêzên xwe ji Îranê bibite derê. Çend mang şunda ku arteşa Şahînsahî hêriş kir ser Azarbaycan û Kurdistan, xelkê wan bi xwe xelas kir û herdu hikumetê "pûşali"yan sernixun kir. "Lêhûrbûnê" weha, ji ronîkirina tevgera rûdanan pirtir ronakî dixate ser awat û xeyal û îdyolojiya ewan ên ku dijî rizgarîya gelê Kurd û Azerî û damezirandina dewletêkî demokrat û serbixî bûn li Îranê.

Pirraniya layengirên bizotneweyê sala 1946 bi çavekî rexnegirane dinêrin li helperistî û piştberdan û bitaybetî xiyaneta Yekîtiya Sovyetê. Di vê boçûnê da jî, wergirtina êmtiyaza neftê bakur wek binçînekî siyasetê Sovyet bahs dikirê. Bo wêne, Noşîrewan Mistefa Emîn dinûse: "Bo Yekîtiya Sovyet di vê demê da ew girîng bû rêkewtinekî Pişewerî-fîruz serbigirê û hikumetê Qewam li serkar bixêne bo ewê wekî belêni dabû: êmtiyaza neftê şîmal bi Rusya bidate."¹

¹ Noşîrewan Mistefa Emîn, Hikumetî Kurdistan: *Kurd le nêw gemey Sovyet da*, 1993, la. 245

Dewletî Emrika pêş tewawbûnî şerî cîhanî, hewlî xoy bo pitewkirdinî deshelaî le Îran dest pêkirî. Yekêk lew bernamaney Emrika dananî binkey abûrî û eskerî bû. Du kompanî newtî Emrikayî le 1944 da dawayan le Îran kirde îmtiyazî newtîyan le bakurî Îran -wate leser sinorî Sovêt- bidrêtê. Dewletî Sovyet bo ewey Emrika binkey casus le ser sinurekanî dane-mezrêne, be dewletî Tehran rageyand ku eger Îran pêwîstî be dahatî newt heye, dewletî Sovêt amadeye beşert û mercêkî zor baştir le Emrikayekan newtî bakur rehemel bêne.

Dewletî Îngiliz û Emrika be pêy lêkolînewe nihênekani xoyan boyan rûn bibowe ke Yekîti Sovêt niyazî be newt niye. Raportêkî fermandekanî stadi hawbeş (Emrika) be dewletî Emrikayî rageyand ku "amancî serekî [Sovêt] parastinî nawçe heyatiyekani ploestî (Ploesti), Xarkof û Bako" ye. Dewletî Sovêt bi dirustî pêy wabû ke dirustkirdinî bingey hêzî hewayî Emrika le şehranî Erebiistan metirsîyekî serekî bo Yekîti Sovêt e.

Fred Lawson, "The Iranian crisis of 1945-1946 and spiral model of international conflict", International Journal of Middle East Studies, Vol. 21, No. 3, 1989, pp. 317,320.

Fîrçeya Dîmokrat a Azarbaycan û Hizba Demokrat a Kurdistan ta êste lêkolînekî têr û teselî liser du komaran nekirîye û ewên bahsê wan kiribê zêde li duwayî lêhûrbûna siyasetê Sovyet nekevtin. Li gor Dr. Qasimlo weha bû ku:

“Siyasetê wê demê yê Yekîtiya Sovyetê naveroka siyasetê serdema Stalîn bigiştî û li radeyî cihanî da rastê hindêk tahlûke û lêhûrbûnên çewt bû.... Nakokî û netevayîya siyasetê Yekîtiya Sovyetê li beramber bi Îran berçav dikit.... Her çewan ku bê paşkişeya Yekîtiya Sovyetê li Îran çi bi mebestî wergirtina êmtiyaza neft bû bê çi li akama şikesta siyasetê mezin mezinxwazî Baqirof (serokwezîrê Komara Sosyalîst a Sovyeta Azarbaycan), berhemê lêhûrbûnekî çewt a helûmercê wê demê yê Îranê bû.”²

Ev “lêhûrbûna(lênêrîna) çewt jî”, bi raya Dr. Qasemlo dû sebebê wê hebû: **1-** Qewam birêvebirên sovyetê “qanih kirin ku girûgiriştê Azerbaycan wek meseleyêk nêv xwe yê Îranê danên û daxilyetî têda nekin.” **2-** Yekîtiya Sovyetê ji şerêkî wêranker rizgar bibû, bîst mîlyon kûştî dabû, sedan bajar û navenda sinhetê gewreyî xapûr kirabûn”, bi berevajî, bihêz bû û piştî bi bombayê atomî jî hêztir bû û di vê şert û mercan da Sovyet amadeyê têkheleşûna ekserî ligel Amrîka nebû.³

Pirraniya lêkolînvanan bayexêkî (degerekî) temam didin bi dewrê Qewam li “firîwdanî” Yekîtiya Sovyet. Dibên Qewam “siyasetdarêkî jîr” û “lêhatû” bû û karî “destê Stalîn” bibir-rê.⁴ Ew boçûne hîç ronakayî naxîne ser kêşeya siyasetê Sovyet. Qewam li Îran, wek kevneperestêkî ser bi Îngilîz baş hatibû nasîn û Dewleta Sovyetê jî baş aga li rabirdû û kirinên wî hebû(Stalîn di nameyek da îşare bi rabirduya Qewam dike). Herweha dewleta Sovyet jî ew hende sawîlke û bê tecrebe û nefam nebû ku Qewam bikarê bîçewtî wê bixeletênê. Ewe jî diyarda Yekîtiya Sovyet zêdetir li hemû welatêk li şerê cihanî yê dûwem da wêran bibû û pitir li bîst mîlyon kes hatibû kûştin.⁵ Diyarda Amrîka jî hêrişe û dijarî dikir û dixwest şoreşgêran û gelanê rizgarîxwaz bi bomba atomî çavtirsîn bike û li Awropa û Asya û Afrîqa da desthelata xwe damezrênêt.

Nîşanêkî
qeyrana(qirîza) şoreşê ew e
ku çîna deshelatdar ku
dewlet bidestve ye nedişiya
bi şêweyê kevin yan bi
şêweyê adetî hikumet bike.

² Abdulrehman Qasimlo, *Çil salî xebat li pênavî azadî*, bergê yekem, 1980/1364, r. 90-91.

³ Abdulrehman Qasemlo, *jêdera berê*, r. 91

⁴ Newşîrewan Mistefa Emîn denûsê: "Qewam destê Stalîn ebirê" r. 251

⁵ Beaze lêkolereweyêk jimareyî kujrawan zîatir hisab deken. Sokolov, ku le çend salî rabirdû da zanyarî le arşîwekanî Sovetî kokirdotewe, delê jimareyî kujrawan 43.448.000 kes bû ku lewane 16.900.000 kes xeyrî ekserî 26.548.000 eskerî bûn.

Ne rewşa(barê) sîyasî û aborî û sext dijwarî ya Yeketiya Sovyet û ne rewşa navneteweyî dumahîya şerê cîhanî hîç yekî ji wan nedikarîn bincîne û hoyê(şertê) “analîzên çewt ên halûmercê Îranê” ronî bikine. Rêberayetîya Sovyet di wê demê da ji layê sîyasî ve paşve hilkêşya û aşbetalî bi gelê kurd û bi gelê Azerî kir ku şoreşa karkerî û tevgera rizgarîxwaz a neteweyî li Awrupa, Asya û Afrîqya da li vê perrî da berve geşbûnîyê da bû. Her wekî tevgera kominîstên cîhanî bi hoyê destkevtîyên bi xebata dijî faşîstî da -Ji Stalîngiradê bigre heta Yonan, Yugoslawîyê, Almanî, Îtalya, Feranse, Çîn û welatên din- qedr, hurmet û serberziyekî bêwêneyî bidestkevtibû. Li vê barodxê da, hêzên dagîrkerên kevn(wek Îngiliz û Franse) û ji hêza tazepêdakevtî ya Amrîka hîç yekî ji wan wejê ewan nebû bilêsey xebata rizgarîxwaz daxirêneneve. Ji vî helumercê li vê derbare da, rêberayetîya Sovyet -bi sîyaset û bername û rêbaz û têorî û kirinê- alayî serdanewandin û aşbetalî helkir û bû bi astengêkî bihêz li beramber bereyê xebat û rizgarîxwazî da. Lênihêrîna rêberayetîya Hîzba Kominîst a Sovyet tenya li derbarî siyaseta Îran da”çewt” nebû. Lênihêrîna weha bo gelek welatên din amade kira û gelek bizotneweyên din her wekî xebata rizgarîxwazî ya gelê Kurd û Azerî bûn. Analîzên çewt jî ji çavkanîya xelet û nezanînê nebû. Dewleta Sovyet baş agayî li çewanêti û çendêti ya xebata li piranîya welatên dinyayê hebû. Çavkanîya(serçaveya) ev lênihêrînê di rêbaza sîyasî û îdeolojî û têorî ya wê demê ya Hîzba Kominîst a Sovyetî da bû- rêbazêkî bi rêşkawî di nameyê Stalîn da wek amojgarî(şîret) bo Pîşewerî amade kiraye.

1- Naveroka Nameyê Stalîn

Ji nameyê Stalîn weha derdikevê ku Pîşewerî rexne li wî girtîye ji ber vederketina Sûpayê Sor li Azerbaijan û bakurê Îran. Her weha gotûbêja ku Îran, wek Rusya ya salên 1905 û 1917, rastê qeyranêkî (bohran, azme, crisis(ing)) şoreşî bûye û şertûmerc amadeye bo bicîhênana bernameyê makziyom (herî zor) ê şoreş, wateya wê sernixunkirina dewleta Îran û damezirandina dewletêkî demokrat a gel e.

Stalîn ji Pîşewerî ra dibê ku analîza we ya derbarê sîyasî Îran û nêvneteweyî da çewt derketiye/bûwe. Qiseya Stalîn, Dewleta Sovyet nedikare êdî sûpayî xwe yê li Îranê rabigrê, çunke eger sûpayê wê ji Îran ve derneketiba, Îngiliz sûpayê xwe li Misir û Sûrya û Endonêzya û Yonan, Amrîka jî sûpayê xwe ji Çîn û Îslanda û Daxark radigirt û eve jî zîyanî dibû bo bizotneweyê rizgarîxwazî li Asya û Ewropa.

Herweha Stalîn dibêje ku li Îranê qeyranêkî bihêz ê şoreşî nîye, çunke dewleta Îran (bibervajî dewleta Rusya ku di 1905 da ligel Japon bişer hat û li

1916-17 ligel Alman xerîkê/pêgirtî şer bû) ligel dewletêkî derve tûşî(rastê) şer nebûye heta bi vê şerê kiz bûbê. Herweha cotkarên Îran xebatêk berîn û berçav nekiriye. Ku weha bû nûha dijmîn (dewleta Îran) bihêz e û xebata çîna bindestan negeyîştîye şoreş kirin bo gorîna nîzama sîyasî û komelayetî ya çewt. Lebatê sernixunkirina dewlet, Firqeyê Demokrat dibê piştevanî li taqimêkî di nav vê dewletê da bike(deste û deyareyî Qewam) bo wê bi yarmetî ew taqim û handana bo demokratkirina welat, bereyê domokrasî-xwaz bihêz bikirê. Bikurtî gotina Stalîn ev e: Qeyrana(qirîza) bihêz e şoreş li meydanê da nîye, xelk lipey azadî û demokrasî nekevîne, beşek ji çîna deshelatdaran dêmokrasî divê, faydeyê şoreş nîye, bi piştevaniya beşek ji çîna deshelatdar, dêmokrasî pêşbixin û çaverê bin li dahatû da qeyran pêkbê.

2- Qeyrana(bohran, qirîz) Şoreşî

Pêdaçûnek bi rûdanên salên 1941-1946 vê aşkira dike ku analîza (lênî-hêrîna) Pişewerî li derbarî sîyasî Îran û cîhan da dirûst bû û boçûnê Stalîn “çewt” bû. Belam li pêş da dabizana derbarê şoreşê(revolutionary situation) qeyrana şoreş a ku Stalîn û Pişewerî herduyan basa wan kirîye çî ye. Lênî di sala 1915 da, salêk berîya destpêkirina şerê cîhanî yê yekem, nûsî:

“Bo Marksîstan hîç cîyê munaqeşe nîye ku şoreş bi bê barî şoreş îmkani nîye; zêdetir ji wê, her rewşekî şoreşî jî(ji xweve) nabête şoreş, bikurtî nîşanên derbarê (rewşa) şoreşê çî ne? Em bê şik rastê çewtî nabin eger dest rabikêşin bo ew sê nîşanên serekîyane: **1)** Dema çîna desthelatdaran îmkane wan nebêt hikumetê xo dirêje pêbidinbibê gorîna şeweyê hikumet kirina wan; hinek li nêv “çîna serîyekan” qeyran cext, bi her formêk bê, qeyranêk li siyasetê çîna hakim e, ku bigate qelşînêkî weha ku nerezayî û tûreyî ya çîna zulim lêkirî biteqêteve. Bo ewê şoreş bibê ew hende bes nîye ku <çîna jêrdest jî nedikarî> bi şeweyî kevn bijîn; bécige ji vê jî pêwîste ku <çîna desthelat jî netiwane> bi şeweyê kevn jîyana xwe bibine serî; **2)** Dema derd û niyazê çîna zulm lê têkirin ji radeyê adetî pirr tundtir bûbe; **3)** Demêk, li akamî ew şertên min baskira, çalakîya cemaweran ta radeyêkî pir pitir bib, ew cemawerê ku bi bê sklakin dihêlin di <zemanê aşî> da bîyan rûtênineve, belam di <zemanê serhildan> da, bi destê temamê helûmercê qeyran û bi destê xwedî <çîna serdest> dikêşrêne nav karê mêjûyî serbixwe.

Bi bê ev goraniyên objektîvane, ku serbixwe yê ji îradeyê grup û hîzban û bitaybetî çînên komelayetîyan, şoreş, wek qaîdeyekî giştî îmkani nîye, temamê ev gorînên objektîvane bi tevde ji wî ra dibên qeyrana şoreş.”⁶

⁶ Biruane nûsrawey Lênî. “*Rûxanî Înternasyonalî Dûwem*”. V.I. Lenin, “The collapse of the second International” K. Marx, F. Engels, V.I. Lenin, *On Historical Materialism*. Moscow, ProgressPuplishers, 1972, p. 345.

Ji van qiseyên Lênîn weha derdikevê ku, bibervajî bawerîya Stalîn, bo pêkhatina qeyrana şoreşî pêwîst nîye ku dewlet ligel welatêkî dî bişer hatibê û rastê şikest bûbê û pê kiz bûbê. Bo wêne, dewleta Heme Reza Şah li 1978-79 bê ku ew ê rastê şerê derve bûbê, girîftarê qeyranêk giştî bû ku temamê ew nîşanên ku Lênîn basa wan kirîye têda tête dîtin. Ca da bizanbin di sala 1946 da li Îran qeyrana(qirîza/rewşa) şoreşî hebû yan na?

b) Qeyrana Şoreşî Li Îran di Sala 1946-an da

1) Şêweyê Hikumeta Çîna Desthelatdaran:

Ligel wê jî da şerê derve bo pêkhatina qeyran pêwîst nîye, dewleta Îranê bi bervajî lînêrîna Stalîn, li sala 1941-ê da rastê şerê ligel dû welatê derve -Yekîtiya Sovyet û Îngiliz- bû. Sûpayê ew du dewletan li meha Abî 1941-ê Îran dagîr kir. Eger dewleta Rûsyayê têzarî ew hende bihêz bû ku di 1905 da ligel Japon û di sala 1914-17 da ligel Alman bi şer bê, arteşa dewleta Riza Şah, hejar ketibû, "bi belavkirina du rûperr agahî" ji teyareyên Sovyet pirş û belav bûye.⁷ Xakê(erdê) Îran bo mawey pênc salan li nevbera Sovyet û Îngilizan da hatibû dabeşkirin û di sala 1942 da hêza xeyrî şerkerê areteşa Amrîka jî hate Îran.

Nîşanekî qeyrana şoreşî ew e, çîna desthelatdar ku dewlet bidest wê da ye nekarî bi şêweyê kevn yan bi şêweyê adetî hikumet bike. Dewleta Îran bo maweyê duwanzde sal, ji 1941 heta 1953(helhatina Heme Reza Şah li Îran û vegeirîna Amrîkayê) netiwani bi şêweyê kevn hikumet bika. Her ewên dî, hêzên Sovyet û Îngiliz Îranê dagîr kir, Riza Şah ji textê selteneî hênaye xwarê û ji Îran ve deranî û kurrê wî Heme Reza bi bê deshelatî li text dana.

Di şêweyê kevn ê hikumeta Pehlewî da, dewlet xwedî Şah bû, Şah jî bi arteş û cendirme û polis pişt hestûr bû. Parlamen(meclîs şûrayî mayî) dezgayê dadperwerî û îdarî jî giştî kutekê destê Şah bûn. Li derveyê welat da "li komelên medenî" da, hiç bingehezêkî siyasî wek hîzib, sendîka û rêkxistinên serbixwe li meydanê da nemabûn. Herçî hêzên xeyrî dewletê ye- ji mizgeftan bigre heta rojname û kovarên serbixwe- serkut û bêdeng kiribûn. Dewlet -hernebê bi roala xwe- Şah û parlamen û kabîne û bûrokrasîya ekserî û îdarî li ser rêbaza siyasî û îdeolojî yê hikumetê paşayî-eskerî dewrbûn.

⁷ Hejar le honrawey "eqil û bext" da ew çend beyte be nawbangî gotûe:
"Hat be girme firok le layî meskew bo Ecem wek şehên deçê bo kew
helmetêkî geyande textî cem têkî da şewket û celalî Ecem
be belawbûnî dû perr agahî bû belaw artêşî Şahensahî
Şak e şêr bû le rawî miskên da dîm ke mişke le jêr Stalîn da."

Ku Heme Riza Şah bû bi Şahê Îran, nekarî bi şêweyê caran -şêweyê bavê xwe û paşayên pêşî yê Qaçar- hikumet bike. Arteşa 127 hezar kesî ya Reza Şah weha liber yek teraza ku tenya 65 hezar kes jê maye û ew jî bi bê îcazeyê Dewleta Sovyet û Îngiliz nediwêra pel bibizêwê.

Parlaman jî(meclîs xulî 1944 li heta 1946) wek caran bi temamî li jêr deshelata Şah da nemabû. Ligel wê da jî piraniya nûnerên wê meclîsê kevneperest û ser bi derbarê Şah bûn, ji hewt fraksiyonên serekî pêkhatibû ku ji wan yek fraksiyona hîzba Tudeh bû ku wêrayî çend nûnerêk libîral û serbixwe berengarî siyaset û kirdeweyê derbar û kabîne dibûn. Di pênc salan da -li rakirina Riza Şah heta têkçûna du komar- duwazde car serekwezîr û kabîne goran. Kabîne weha bû ku çend hefte zêdetir dewam nedihêna.⁸

Hemû qirîzên siyasetî di qirîza eskerî da rengê xwe baş dabûwe. Dewleta Amrîka û Îngiliz herdu jî ditirsyan ku arteşa Şahînşah di maweyê şerê cihanî û dawîya şerî da netiwani(neşê) şoreşa gelên Îran serkut bika. Bo wê dewleta Amrîka ji 1942 bi vir ve dest bi yarmetîdana hêzên serkutkerên dewleta Îran dike. Amrîka ji sala 1942 heta 1946 nizîkê bîst hezar cendirmeyê wan bi talîm da, wan çekdar kirin û birêxistin. Di Kanuna (Desembara) sala 1944 da, ataşeyê eskerî yê sefareta Amrîka li Tehran bi dewleta xwe ragihand ku arteş û cendirme yên hatine rêxistinkirinê dikarin "hemû serhildanên eşîrî û hes-tên wan serkut bikin" û arteş sengerê serekî yê hikumeta navendî û bitaybetî yê Şahî" Îran e.⁹ Belam serbaqî ew hemû yarmetîyên Amrîka, ew arteş dîsan li axirî(dawîya) 1945-ê nekarî pêşîya raperîna Azerbaycan û Kurdistanê bigire.

Qeyrana(qirîza) eskerî tenya liber şepirêwî arteş nebû. Şer û çewtî li ser birêvebirayetiya siyasetî û hêza eskerî jî tund û tîj bû. Heme Riza Şah, wek bavê xwe, xwe bi fermanderê herî bilind ê arteş dadena, belam li meclîsê 14 da hinde nûneran bi aşkera digot ku heqê wî nîye Şah fermanderê hêzên çekdar bî. Bitaybetî Qewan wextê di 1943 da xwe kir wezîrê şer û bi meclîs ragihand ku li dahatû da Reîs Stad li jêr fermanê wezîrê şer da dibê û bi vê terzê bo ewelcar di 1941-î da, beş xeyrî eskerê dewlet hereşê dikir ku dezgayê arteş kontrol dika.¹⁰ Suheyayê serekwezîr di Awrêla 1943 da, serbaqî berbestê (astengê) Şah, dixwest ji ber qirîza aborî, arteş ji 65 hezar kes biketa 30 hezar kes, belam Şah dixwest arteş pirr hêztir bike û bigate 108 hezar kes, dawiyê bi nêwbijî Amrîkayê bi 86 hezar kes razî kira.¹¹ Qewamî jî, Hesenî

⁸ Hejar, *Alekok*, Tewrêz , 1324-1945, la. 8.

⁹ Thomas Ricks, "U. S. Military missions to Iran, 1943-1973: The political economy of military assistance," in L. Meo(ed), *U.S. Strategy in the Gulf: Intervention against Liberation*, Belmont, Massachusette, pp. 38,40

¹⁰ Ervand Abrahamian, *Iran Between Two Revolutions*. Princeton University Pres, 1982, pp. 209, 182.

¹¹ Abrahamian, p. 185.

Arfeh(Reîsê Stadê Artes) ku nokerê Şah bû girt û zîndan kir û "Rezm Ara"yî ku nehezê Şah bû li cîyê wî dana.¹² Di Kanuna 1943-ê da nakokîya di navbera Qewam û Şah weha teqîya ku gehîşte nêv xeyabanên Tehran û tahlûkeyêke gewre saz bû. Çeqokêşan hêrişîyan bire ser meclîs û mala Qewam û dûkan û bazaran talan kir û taybetê jî bi hatina ceyşî Îngiliz serhildan temam bû.¹³ Di meha Gulan a 1946-ê da, Qewam hereşeyê Şah kir ku xwe ji sîyaset wernede.¹⁴ Di Oktibira 1946-ê da, qorêkî ji artes û qorêkî muhafîzekar li Tehran bi sefaretê Îngilîzan ragehand ku tevgeradijî Qewam bidawî bînin.¹⁵ Eger çîna desthelatdaran rastê qirîzekê bihêz nebûban, ew nakokîya wan îmkane teqênayî nedibû.

Hemû qirîzên sîyasî herweha di nakokîyên nêv artes da bidîde kira. Li van salan da bereyê şoreşgêrî û azadîxaziyê hende bihêz bû ku bitaybetî efserên artes û cendîrme û polîsan jî hatibûne nêv rêza xebatê û dijî dewlet qîyamîyan dikir. Bo mînak,

**Dewleta Îngiliz, ji tîrsa
helemetî karkerên neft ê
Xozîstan, di mangî Cewlayê da
bingehê deryayî yê xwe li besra
pitir kir û dû keştîyan berve
Abadan birêkir û amade bûn bo
birêkirina sipayan bo**

di havîna 1945 da, beşek ji efserên azadîxwazên artesê raperîn dan destpêkirin belam Sûpayên Sor pêşî bi wan girtin û nehêşt perebestênê. Piştî damezirandina Komara Azerbaycan, ew efseran çûne Azarbaycan û çend kes ji wan bo yarmetî bi Komara Kurdistan di rojên dawî yê jîyana komar da çûne berve şerê Saqiz.¹⁶ Herweha çend efserên aza û azadîxwazê hêza hewayî çend teyareyên artêşa wan revand û ligel hêza fîdayî yê Azarbaycan kevtin.¹⁷ Li barodoxî ew qirîza sîyasî û eskerî da Partîya Demokrat a Azarbaycan û Partîya Demokrat a Kurdistan karîn hêza çekdar a dewleta Îran çek bikin. Aşkiraye ku hebûna Sûpayên Sor ê Sovyet li welat, bo ew raperîn gelek şertûmerc pêkhênabû.

2) Renc(ked) û Nîyazên Çîna Zulim Bi Wê Hatî Kirin:

Şertûmercêkî di yê pêkhatina derbarî şoreş ew e ku derd û renc û nîyaza xelk bitaybetî çîna zulm bi wê hatî kirin ewqas pirr bûbû ku zulim helnegirin

¹² Abrahamian, p. 229.

¹³ Abrahamian, p. 183. Mecîd Tifreş, "Squt quam alsatne", Giftugo, jimare: 2, di 1372, sa. 135.

¹⁴ Abrahamian, p. 229.

¹⁵ Abrahamian, p. 236.

¹⁶ Abuahsin Tifreşîyan, Qîam Afsiran xirasan(1324), çapa duwem, Kitêb Kanun Ayran, suud 1985.

¹⁷ Cibhe, Azadî Mirdim Ayran(camî), Ginişte, çiraxrae ayinde ast, 1355(Arupa), sa. 358.

û bêne nêv meydana xebat bo gorîna barê jîyana wan, amade bûn bo ewê bigij hikumetê çîna deshelatdaran da biçin. Xelkê Îran di salên şerê cihanî da, bitaybetî piştî dagîrkirina welat ji layê Îngilîzan û Sovyetê ve, ji barê aborûyê ve rastê sextî û çermeseriyêkî zor bûn. Dagîrkirin tesîrêk temamî li hemû beşên aborî kir. Li beşê kiştûkal (ku birîtî ji %75 hêza karê Îran û %50 hasilatê nexalîs ê xomalî GDP), berhemhênanê dext û dan û ajel da şikan. Bo wêne, hasilatê genim û ceh %25, birinc %10, titûn %7, mewe %20-%30, reşe welax %9 kêmbûye. Pêdivistê têrkirina hêza havpeymanan (Îngilîz, Sovyet û Amrîka) û birêkirina yarmetî bo Sûpayê Sor li hember şerê dijî faşistî ew hende yê dî xwastina tiştê xwarin û sotinê û cilûbergê pitir kir. Bêcige li Azarbaycan û neçeyê deryaya Xezar, gelek malbendê din di Îran da qatî hebû û xelk li Tehran û li bajarên din şalawîya dihêna bo nan û xwarinê.¹⁸

Di hêlengandina derbarî aborî da, banka millî ya Îran rageyand ku îndeksê xercê berêçûn(cost-of-living index) ji 100 ra li sala 1939 geyîste 269 di sala 1942 da, 65 li 1943 û 757 li 1944. Li navçeyêkî dî yê Îran xercê birêçûn ji wê jî zêdetir bû.¹⁹ Birçîtî(birsîtî) û qatî ew hende zor bû ku dewleta Sovyet 20 hezar ton gexî, wek yarmetî, da bi Îran.²⁰

3) Kirdarî Mêjûyî Serbixoyê:

Gelek dîyar dibû eger di barudoxê pirr meynetî salên 1941-46 da karkeran û cotkaran û xelkê zahmetkêş ê dî amade nebibûwan û bo dahênanî mêjûyî bi xwe dest bi kîrînên serbixoyê nedikira. Rojnameyê wê serdemê wêneyê nerezayî û xebata xelkê zahmetkêş tomar kiriye. Sefaret û konsolê Îngilîz û Amrîka li raporta bo dewleta xwe da dinûsê basê nerezayîya çîna jêrdestan li bajar û layê dî dikir. Ji yekêk di vê raporta nehênî da nûsiye ku nerezayî jiber tunebûna xûrekê û bê cilûbergî û nebûna derman û medrese û xwendin wê biteqete û bibete "şoreşekê bigujm-tund(violent revolution) li dijî çîna deshelatdar a nûha" û "eger hêza havpeyman(Allied) zû ji Îran biçine der wan rêga bikete bo serhildana giştî wek şoreş ku nerezayî bi her awê xelk li hikumet û nîzama komelayetî ya nûha derbibirê."²¹

Lêkolînekê mêjûyî bizûtîrewe komeleyên Îran dibê ku bihar û havîna 1946 bi taybetî bo "bizotnewyê komelayetîya pêşkevînxwazan yekcar libar bû."²² Rêxistina "Şûrayî Yekgirtû yê Navendî yê sendîkayên karkeran û zah

¹⁸ John Foran, *Fragile Resistance: Social Transformation in Iran from 1500 to the Revolution*, Boulder, Westview Press, 1993, pp. 265-266

¹⁹ Nikki Keddi, *Roost of Revolution: An Interpretive History of Modern Iran*. Yale University Press, 1981, p.116

²⁰ Cebhe Azadî Merdim Ayran, r. 216

²¹ Bo serçaweyî ew raportane biruane: Abrahamian. p. 172.

²² Foran, p. 280.

metkêşan"ê Îran ku ser bi Hîzbê Tudeh bû piraniya karkerên Îranê birêx-
istibû û 186 yekêtiyên karkeran endam bû(ji karkerên neft bigre heta
pîtçinên(tîprêzên) çapxaneyan, mêkanîkan, tevngeran, necaran, mehdênçî-
yan û hwd.). Hejmara karkerên endamê wê Şûrayê digeyîşte 330 hezar kes ku
dikir %70 hêza karkerên senhetî. Di piraniya 346 karxaneyên modern ê Îran
da, rêxistina karkeran hatibû damezirandin, ku ji destpêka sala 1946 heta
mangî nehemîn a wê salê, zêdetir ji 160 mangirtinê serkevtî yê li seranserê
Îran da birêvebir.²³ Di nava mangî Gulan û Culayê da(ew dema ku Stalîn
nameyêk nûsîye) "karkerên neft yekêk ji mangirtinê senhetî yê herî girîng ê
mêjûyê rojhelata naverasta ew wextan verêxist û serketin.... Di roja destpêka
mangî Gulan(roja cîhanî ya karkeran) 1946 da, heştê hezar karker li Abdan,
cîyê palavtina neft xwepêşandanan kir.... Di 10-ê mangî Gulan, ji deh
hezaran zêdetir karker, bo pitir kirina mûçe li kangayê(çavîya) neftê
Axacarî[Xozîstan] barîqat danîn. Şîrket[ê neftê Îran û Îngiliz] ava wê
nawçeyê birî, belam dawîya sê heftan ku şûra(komîta) hereşe yê mangirtin ê
giştî li Abadan kir, şîrketê lihember karkeran serî danî... Di nava meha Juên
da, Hîzba Tudeh bi şeweyêk karî, bi ser piraniya ustayên [ê Xozîstan] da
hikum dikir, nîrxî xûrakê dadena, amrazî rageyandin û hatûçûn bidestve girt-
bû, xeyabanekane li ber dest da û çavdêrî dezga û amrazên neftê dikir.." Li
pêda helçûnêkî berîn di mangî Culayî da, nizîkê sed hezar karker berengarî
şîrketî neft ê Îngiliz-Îran bûn û paşvekişyan dest pêkir.²⁴ Dewleta Îngiliz, ji
tirs helametî karkerên neftê Xozîstan, li mangî Culayî da binkeyê deryayî yê
xwe li Besre pitir kir û du keştiyên xwe berve Abadan şand(nard) û amade bûn
ji şandina sûpayan ra bo Xozîstan.²⁵ Ba birwanîne helbîjardeyêk di raportê
nehênî yê nûnerên Îngiliz sebarek bi derbarî xebata sîyasî li Îranê da:

* Destpêka 1944(sefirê Îngiliz): "Li Îranê em bi aşkira li seretayê
serdemêkî nû da ne û serhildana bizotneweyêkî komelayetî yê nû (new social
movment) dibînin."²⁶

* 10-ê Juên 1946(ataşeyê ekserî yê Îngiliz li Îran): "Hîzba Tudeh kontrolê
temamê karkerên li palavtinga[ê neft] bi destve ye û li meydana neftê jî mijûlê pel-
hawîstin e... ji nû de dibite nûnerê defakto yê hêza(de facto) karkeran li Îran da."²⁷

* 3-yê Juên 1946(konsolê Îngiliz li Ehwez): "Hikumetê karê ustayan [ê
Xozîstan] keve dest Hîzba Tudeh."²⁸

²³ Abrahamian. pp. 353-54

²⁴ Foran, p. 280.

²⁵ Abrahamian, p. 237

²⁶ Abrahamian, p. 357

²⁷ Abrahamian, p. 362

²⁸ Abrahamian, p. 361-62.

* Axirî Culaî(ataşeyê ekserî yê Îngiliz): "Tudeh ne tenya bajarê Îsfehan bidest da bû, belku piraniya Gîlan û Maznederan û Xozîstan di bin deshelata wê da bû."²⁹

* Gotî 1946(konsolê Îngiliz li Îsfehan): "Xwedîyê karxaneyan [li Îsfehan] ew hende ji hîzba Tûdeh tirsyan ku newêrin serî li karxaneyan bidin. Îdareyê piraniya navçe û temamê karxaneyê qumaşçînî bidest Hîzba Tdeh ve ye."³⁰

Her li wê nameyê da konsolê Îsfehan nûsî ku Hîzba Tudeh "li Îsfehan amadeye deshelata[sîyasî] temamî bidestbixe, her wekî ku demokratan li Tewrêzê kiribû." Stalîn di nameyekê xwe da dibêje hêşt cotkarên Îranê amade nîn in. Ew qise jî dirust nîye çûnke, ligel wê jî da rêkxirawên sîyayî yê çepgirî kemtir tixûnî gundan dibûn û fêodal xwedî deshelatek temamî bûn. Bi goreyê raportê konsolê Îngiliz di 1946 da, cotkar li gundên Meşhed, Hemedan, Yezd, Erdekan, Bem, Kirman û Mazinderan raperîbûn û bac û sûrsatîyan nedida bi derebegan. Cotkarên dorûberê dêhatî Tehran wek: Weramîn, Germesar, Şehrîyar jî her vava kir û Qewam bo serkutkirina hikumetê eskerî li van navçeyan dana. Belam dawîyê neçar bû waadê îslahî (reforma) zevî bide. Li handana ew xebatan da rolekê serekî yê Hîzba Tudeh hebû.³¹

Ligel vê da jî propagandaya Îngiliz û Amrîka damezirandina komara Azarbaycan û Kurdistanê wek pîlanêkî Sovyet, pêşkêşî bîr û raya giştî ya Îran û dinyayê dikir. Nûnerên dîplomatên ew du welatan di nameyê xwe yên nihênî da bi wan didan agadarkirin ku binçîneyê ew du komaran bizotneweyêkî komelayetî yê xomalî û xorrisk e. Bo wêne, konsolê Îngiliz li Tewrêz li serubendê damezirandina komara Azarbaycan geryanek navçeyî kir û bi dewleta xwe ragehand:

"Evana bi raya min ew nîye ku Rûsan temamê ew bizotneweyan [Azerebaycan] dataşîwe: Evana bi min waye ew [Rûsekan] ji barêkî şoreşî yê resen(genuine revolutionary situation) kar werdigrin."³²

Bikurtî bêjime we, ew pêdaçûnên xêrayî yê rûdanên salên 1941 heta 1942 ronî diketeve ku temamê şertûmercê "qeyrana şoreş" ku Lênîn anîye ziman li Îran da pêkhatibû. Bi damezirandina du komar, qeyrana sîyasî weha bihêz û qûll bû ku dewleta Îran û Amrîka û Îngiliz hîvîya wan nebû ku bi saxî jî vê derbazbin. Li vê baredoxê da dariştina nameyê Stalîn, hênana ser meydanî ya trajedîyêk diltezen e ku di wê da ewlad bi destê bab dihête kujtin, şoreş bi destê pêşewa serkut dikirê³³, dostê rasteqîne dibête dijmin, qestaser û xwîn li fir-mêsk da nuqim dibê.

²⁹ Abrahamian, p. 234.

³⁰ Abrahamian, p. 359

³¹ Abrahamian, p. 381

³² Abrahamian, p. 218

³³ Îşarem bew mîsrewê şehreye ku le zemanî komarda carubar wêray srûdî "niştîmanan rengîne, beheştî serzemîne" degutra: "Stalîn pêşewa ye, bo Kurdan wek bab waye."

C) Diramaya Rûxîna Du Komaran

1) Bi Belubûna Yek Rûperr Agahî:

Eger arteşa Şahînşah di sala 1941-ê da, bi belubûna du rûperr agahî ji teyareyên Sovyet liber yek teraza(beranber, rêkûpêk), dewleta Îran çar sal piştî belubûna yek rûperr agahî damezirîna "Hikûmetê Millî yê Azerbaycan" kevte gîyanelaye. Bi dewletê weha bû hêza Fidayî yê Azerbaycan, wek çil sal pêştir(şoreş meşrûte), berve Tehran verêdikevê û paytext rizgar dike. Şah weha toqîbû dixwest paytext ji Tehran biguhezête bo Îsfahan. Murey(Murrey), sefirê Amrîka li Tehran, di birûskeyêk da bo wezîrê derve yê Amrîka(28-î Niwanbira 1945) nûsî:

Şwartzkov[musteşarê eskerî yê Amrîka li Îran] xeber dida ku Zexban bi yeqîn kevtîye bidest şoreşgerên[Azerbaycan] ku nûha gehîştine Tacikistan û berve Qezwîn diherin. Li Zexban cendirmeyên me û 30 serbaz amade bûn bergirîya bajar bikin, belam Rûsan destûr da wan ku dest biçekê nekine û çekên xwe dabinên û ewan jî vaway kir. "Şûraya Cengî" ya Îran çaverêye ku 2000 şoreşgerên çekdar piştî kevtina (fall) Qezwîn berve Tehranê ve rêbîkevin û texmîn dikira (tê derdixist) ku deh hezar sempat li nav bajarê [Tehran] heldestin û li dema xwe da yarmetî hêrişkeran didin... Raportêk li cabon nîzik Fîruzkuh dibê ku xelkê ew navçe û Mazinderan kombûne û amadene ji wê ra verêkevin.

General Arfay, reisê stadê arteş, kiriye berpirsê temamê hêzên çekdar ên Îran wêrayî polîs û cendirme û nexşe bo bergirîyê li bajar[ê Tehran] dandirawe û bername bo demekê kurt tenya emeliyet xafîlêner(delaying actions) ta wekû hêzî parêzgarê pêgirtî paytext bê. Ferman daye ku rêya Tehran -qum bi her bûhayêk bê, nebestirê heta hêza yarmetîder ji başûr ve bihênderê û eger pêwîst bê paytext betal bikirê û biguhezrête bo Îsfahan.... Hêza xafîlêner birêkiriye (şandiye) Hesên Abad û Elî Abad ku nîzikê bîst kolometrê başûrê Tehran e....

... Emeliyatê nûha[ê Azerbaycan] wê diçe du hêlî serekî verêketinî hebê, yek ji wan li astara (ku girtuyane) berew [bender] Pehlewî û ew ên di li Zexban bo Qezwîn û Tehran. Ta nûha hîç raportêk sebarêt bi çalakî ji Meraxe ve berve Senendac li rojava negeyîştîye û navçeyê hikûmetê eskerî(martial law) ji şeş mail dewrûberê bajarê Tehranê kirîye 40 mail.

Arteşa Îran nexşe wê heye ku eger şoreşgeran bi Şemenfer bigehin [bi Tehran] di dema çuyînê da rêya asin biteqînête. Bêşik wezîh pirr cidî ye û serlêşewayî û toqîn (panic) li qorê (rêzeyê) berz ê arteş hîç rê nade bi dilnîyayî(confidence).

**Bi hîç rêkewtinname
yê dewlet û Azerbaycan,
hikûmetê Tewrêz biqerar bû
Zincanê bidate dest dewlet û
dewlet jî Serdeşt û Tekan
bidate dest hikûmetê
Azerbaycan.**

³⁴ Foreign Relations of the United States Diplomatic Papers, 1945, vol. VIII, Washington, Government Printing Office, 1969, pp. 464-65

Belam ligel wê da jî dewleta Îran zû têgeyîşt ku Firqeyê Demokrat û Dewleta Sovyet, tu yek jî xwedî bernameyê sernixûnkirina rijîmê paşayeti nîye, rizgarbûna Azerbaijan û beşêk ji Kurdistan, derbarê Şahî weha rawestand ku umêdêkî bi ragirtina text û tacê wî nema. Kevneperestan û piştewanên wan -dewleta Îngiliz û Amrîka- bo çareserkirina wê qirîza(qeyrana) siyasî pirr hewil dan. Li gorî Qewam yekêk vê teqelayane hênanyê Serokwezîr bû, bi hêvîya wê ku bi "karzanî" û "îrade" û "jêhatî"ya xwe dewleta Îranê ji vê qirîzê derbaz bike.

2) Biyava Dîplomasîya Sovyet:

Qewam li 17-yê Sibata sala 1946 (28.11.1324) carekî dî bû serekwezîr û roja piştî bipele berve Moskov verêket û ligel Stalîn û karbidestên dî yên Sovyetê hevdiştin kir. Di 4-ê Avrêlê da Qewam û Sadçikof(sefirê Sovyet li Îran) peymanêkî îmtiza kirin ku ev xalan têda bû:

- 1) Beşekê Arteşa Sor ji tarîxê 24-ê Adara 1946 ve heta yekşemê çarê Ferwerdînê 1325 li mawey mang û nîvekê temamê xakî(axa) Îran çol deken.
- 2) Rêkevtnameya damezirana şirketa têkelawî neftê Îran û Sovyet û mercên di tarîxê 24-ê Avdarê da ta temambûna maweyê heft mang bo pesindkirina meclîsê pazdehîm pêşniyar dikirê.
- 3) Sebareti bi Azerbaijan liber ew emrêkî navxo yê Îran, tertîbêkî hêminane bo îslahat bi pê qewanînî mewcûd û bi Gîlanî xêrxwazî beranber bi xelkê Azerbaijan li nêwan dewlet û xelkê Azerbaijan dedirê.”³⁵

Ew rêkevtnê, rêya hêrişa dewletê bo Azerbaijan û Kurdistan xoş kir. Dîyare Sûpayê Sor her dibû ji Îran biçê der. Dewletêk Sosyalîst ku xwe bi nûnerê çîna karkeran dibînê, heqê wê nîye welatê dî dagîr bike. Belam bi pê ew rêkevtna û beranber bi "qewanînî mewcûd" damezirandina şirketa neft pêwîstî bi pesendkirina meclîsê hebû; bo pêkhênanê divîya helbijardin bikirê; bo helbijardin divîya Azerbaijan û Kurdistan di bin kontrola dewletê da bin; ji bo ku kontrola dewletê hebê divîya arteş çavdêrî helbijardin bikira û ji bo vê mebestê(armancê) jî divîya arteş vegeyaya Azerbaijanê û Kurdistanê.

Li dawîyê Sûpayê Sor di 9-ê Gulanê da, rojek li piştê nûsîna nameyê Stalîn, ji Îran vederket. Dewleta Îran ku ji bo vedernana Sûpayê Sor bi handanî Amrîka û Îngiliz li "şûrayê emniyet"ê neteweyên yekgirtî kiribû, şikayeteke wergirte lêbelê Amrîka û Îngiliz destûra karê xwe da rabigrê.³⁶

Ji bo cîbicîkirina xala 3 ya rêkevtnameyê, hevdiştinên navbera dewlet û nûneranên Azerbaijan ligel nûnerê Komora Kurdistanê jî têda bû dest pê kir

³⁵ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 353

³⁶ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 352

û piştî du xula di 13.06.1946(23.03.1360) da rêkevtnameyêk di navbera dewleta Qewam û Azerbaijan da ji aliyê Mizafer Fîruz û Pîşewerî ve hate înzakirin. Ew peyman behsa daxwazîyêke Azerbaijan û Kurdistan di çarçoveyê otonomîyek li sere şaxêk piçûk da pesend kiribû belam rêgryî dida bi dewleta nevendî heta desthelata xwe li herdû komar da dabimezrênê. Di gotûbêjan da sefirê Sovyet li Tehran beşdarî û nêwbijî dikir û nûnerên Azerbaijanê han dida ku ligel dewlet bisazên. Piştî înzaya peymanek, Pîşewerî gotî eger em bi rêya ev rêkevtnnameyê negehin bi armanca xwe, “bê çare em dê çek helgirên û bi rêya şerkirinê bigihin armanca xwe.”³⁷

3- Rûxîna Dû Komaran:

Herwekî ku min li pêşta bahs kir, li vê serubende da, li seretayî mangî havîn a yekem, bizotneweyê karkeran li Îran da teqya. Qewam bo ku pêşîya lehîya/pêla şoreşê bigrê, paşekêşeyî kir heta li fîrsetekî dî da dest biweşênê. Pêşîyê ji azadîxwazî û demokrasî ra xwedî derket. Qanunê karêkî ku ta radeyêk bi qezencê karkeran bû rageyand. Ji malîkan ra got ku dibê ji %15 hasilat bidine cotkaran(her qise bû kes ciwabê wî nedaye). Fişarê ser hîzba Tudeh û rêkxistinên pêşkevîxwaz kêmkirê û hêrîşê li kesayetî û rojnameyên nêzîkê kevneperestan kir û bitaybetî li serê meha heftan da sê endamê Hîzba Tudeh hêna nêv kabîneyê xwe û du kesên dî jî ji lîberalan bûn wezîrê edalet û kar. Êdî Hîzba Tudeh li dawîya deshelata hîzbayetî û sîyasî ya xwe da bû.³⁸

Lêbelê Hîzba Tudeh lebatê(tevger) rêçavkirina sîyasetêk şoreşgêrane li ser wê rêbazê da ronîstin ku Stalîn di namekê xwe da wek amojgarî(şîret, tawsiye) bo Pêşewerî nûsîye. Hîzb dixwest ji Qewam ra piştevanî bike, ew "demokrasîya kem û kurte"yê(di kirasî nequs) ku bi ketina Rîza Şah pêkhati-bû biparêzê. Di rêbaza hîzb da dawayê temambûna şerê cihanî erkî herî girîn ew bû ku şer li serayê nehelawîstêtebe. Ku weha bû dibû xebat bigrî bo ragirtina "aşîya cihanî" û "parastina Yekîtiya Sovyet" wek bingehe aşîti û sosyalîzm. Di vê rêbazê da, dest pê kirin li beranber arteşa Şahîşahî aşîti li Îran û cihan da li metirsî dixist, çûnke ji wê neba Îngilîz û Amrîka jî dê têkveçûban û şerêk li nav wan û Yekîtiya Sovyetê da geşbûba. Di vê boçûne da xebatkirin û şoreş wek kangayêkî şer gîjgijandin çavî lê dikirê.

Li demekê ku Hîzba Tudeh li mawey du heftan beşdarî li deshelata dewletê da kir hindê hewl da awirê xebata karkerî dabirênê(bo ku ew deshelata xwe û dewleta nevendî biparêzê). Qewam xwedî pîlanên li dijî Hîzba Tudeh û du komaran bû. Li dawîya Stemberê da, eşîrên Xozistan û Fars

³⁷ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 373

³⁸ Foran, p. 280

û navçeyên dî yê başûrê Îranê nerehetî xiste welat û dawa xudmuxtariya wekî Azerbaycaniyan kir. Qewamî serhildana eşîran kir behane û di nivê Oktobirê da wezîrê tudehiyan ji kabîneyê derxist û di demekê kurt da ew ên layengirên(alîgirên) Tudeh bûn, birin û daxwazên eşayîrî pesind kir. Piştî çend heftan dest bi serkutkirinê kir, Hîzba Tudeh û yekîtiya karkeran û rojnameyên azadîxwaz û çepgir; li heman demê da, di demekê kurt da hikumeta eskerî damezirand. Çend rêvebirê dijî kominîstî li ser kar dana û rageyand ku helbijardina meclîs di meha Çirîya Pêşîn da dest pêdike û li pênc rojan da -heta 16-yê Adar (7-ê Çirîya Pêşîn a 1946)- dibê tamam bê û arteş bo çavdêriya helbijardin birêdikire Azerbaycan û Kurdistanê.³⁹

Bi pey rêvevêname ya dewlet û Azerbaycanê, hikumetê Tewrêz biqerar bû ku Zexbanê bidate dest dewlet û dewlet jî serdest û tikab bidate dest hikumeta Azerbaycan. Li roja yekê Sermawez(22-yê Niwembir) hêza Firqe ji Zexban ve derket, arteş hêriş hêna û dest bi kuştina layengirên Firqe û cotkaran kir. Qewam roja 10-ê Çirîya Pêşîn bi Azerbaycanê rageyan ku arteş ji Zexban ra verêdikevê bo çavdêrîkirina helbijardinê. Hêza Fîdayî her li wê rojê da hêrişê arteşê li Xelxal û Heruabad şikand û Pişewerî gotî Azerbaycan dest dikateve.⁴⁰

Pişewerî hem bi qîse û hem bi kirin dixwest hêza Fedayî dest bikateve û wek serdemê şoreşê meşrute Tehranê jî bigrin û azad bikin. Roja 11-yê Sermawez, rojnameyê Azerbaycan Dengê Firqe nûsî: "mirina bi şeref ji jîyana koletî û bi minet baştî". Roja 12, rojnamê rageyand ku ev car bi yekcarî dijberê dagîrkeran dibin û "qîseya dawî" ya xelkê Azerbaycan ev e: "mirin heye, veger[bo jêr deshelatê dewlet] nîye". Pişewerî di mêtîngêk gewre da li Tewrêz gotî: "hikumeta Tehran hikumetêkî cînayetkar û perrpût e; em vê hikumetê nemeşru dibînin û dixwazin hikumetêk millî li cîyê wê dadenênin ... Dijmin li beranber gelê me da têkdişikê. Ji bîra we neçê Seterxan bixoy û çend kesan raperî. Belam em bo parastina azadî hêzêkî nebez(serî natewînin) û rêxistinêkî me ya berîn heye". Di wan rojan da xelkê Azerbaycan rojê bi dehan name bo Tewrêz dişand û amadebûna xwe bo despêkirinê radigeyand. Xeyn ji hêzê rêkûpêk ê Fîdayî û Qizilbaş, hêza partîzanê "Babek"ê jî damezrabû.⁴¹

Dewlet bo wê pêşî şoreş li navçeyên dî bigrê, li çend bajarê şîmal (Gîlan û Mazenderan) hikumeta eskerî damezirand û arteş roja 16-yê (7-ê Dîsembir) berve Mîanewê rêvevê. Pişewerî biryarêk bo tamamê azadîxwaz da û gotî "em hêrişên kevneperestî têkdişikênin û sifrekê heldepêçin.

³⁹ Foran, p. 281

⁴⁰ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 410.

⁴¹ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 398-411.

Temamê Îran bi serdestîya hêza xwe ya leşkerî bi ser me da were jî, fîdayîyên azadîya me zincîrên awe yê koletî dê bişkênê.... Em tolê distênîne û ew tol bi xwînavî û bêrehmane dibê. Tolek dibê ku di hîkayetan da bête gotin û însanê bişerf pê şad bê." Roja 17, ew efserên ku mamostayê "danîşkede yê efserî" yê Tehran bûn û nûha digel hêza Fîdayî ketbûn peymanêk di radyoya Tewrêzê da bo serbazan û efserên arteş şand û gotin: "Li vê memurîyeta qirêj da beşdarî mekin.... Hûn jî bizanin ku serkevtina hêza hêrişker bo Azerbaycan ji xew û xeyalêk zêdetir nîye. Hûn baş dizanin ku çek her çawa bê, ew ji destê beşer e ku dibê dikarî bîne û li Azerbaycan ew destane yekcar bihêz in". Komîteya eskerî ya Tewrêz peyderpey destûrê amadebûna şerî dida û çek û bîzînî teyare bo firokxaneyê eskerî yê Mîyane dinşand. Hêza Azerbaycan berve navçeyê Kuwêstanê qeflebiqefle verêket û bitaybetî hêza partîzan jî dest bikar kir. Roja 19, şer li Mîyane dest pêkir, berve başûr, li ber xafilbûna fermanderê hêzekî tazekar, rastê şikest bû û paşve hilkişya. Lêbelê li bereyê bakur da hêrişkeran ji Repalna û berve Zexban ve pêşkevtin. Desteyê partîzan jî geyişte nav Zexban û Tacikistan û pirdê şemenefer ê Qerebalê rûxand.⁴²

Îzetê Silêman Begî dergeleyê ku di wê rojê da li Tewrêz bû digêrêteve:

"Em komela qutabîyên kurd bûn li Tewrêz di zankoya sîyasî dema me dixwend, li vê zankoyê nizîkê bi (15)panzde qutabîyê (xwendevan) kurd têda bû, em tenê du qutabî bûn ên ku ji Kurdistana xwarû hatibûn û li ser dadayê Barzanîyê nemir hatibûn qebûlkin....

Me bi berdeyamî hest bi wê fikir ku karbidestên Azerbaycan hatûçûyê Tehranê dikin û digel dewleta Qewam alasatane dadinîşin û tiwêj dikin... Di mangî 11/1946 da gorînkariyek di bernameyê zankoya me da hate kirin û di heftê da du roj diviya em fêrî bikarhênana çek bin û meşqîyan pêdidan û car caran li zanko da bo wê civîn girêdidan û basê helumercê Azerbaycan dikira û rojane hêz bo (qeflan kuwe) beramber leşker û qeşûnê Şahîنشahê Îran dişandin. Li seretayê mangî 12/1946 bo giftugo demêk li Tehran bû, diyar bû li ser vê yekê rêkkewtbûn ku Sûpayê Sor bi navê hîlbijardinê vegeêrête Azerbaycan û li paşê karubarê îdarî bikevête dest Azerbaycanîyan.

Li zanko serê me şêlwa(şêlo) bû û em şaş bûbûn û me nedizani çî bikn, ew ên xelkê Tewrêz bûn piraniya wan çûne mala xwe. Ew komele mamostayekî me bi xwe hatne layê me û kurêkî genc ê rêkûpêk ligel da bû navê wî Mehr(Mehemed) Bira bû û serokê sendikaya karkeran bû, gotarêkî pir hîmasetî bo xwendevanan û bi dîrûdirêjî basî li wê kir ku wefdeke li Tehran xiyaretî kire û tirsênokî nîşan dawe em destberdarê komara xwe nabin û dibê em hemû bibin serbazê parastina komara xwe, me hemûye bo wî çepikan lêda û Mehr(Mehemed) gotî vêga gelek cîyê dî heye ku diçim û bo sibeyê li filan cîyê amade bin û em ta dawîyê soza piştevanî dikin. Em nizîkê (30) qutabî li

⁴² Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 413-414.

zanko mabûne, bo sibeyê ku em çûn bo layê kafî karkeran sertapa ew bajarê çol û hol bû û hemû dikanê wan galdirabûn li pêş kafî(kafeya) karkeran, li xeyabanî starxan li sinor (300) kes li wê bû çekdar û bêçek û hemû xelkê wê derê han dida ku kombibine û her nûha me çek û çol bo dê⁴³

Belam ew 300 kes û bi hezaran têkoşerên din ji bo çekxwazan dest bi belavkirina çekan kirin. Lebata çekdarkirina bêçekan, ew ên çeka wan hebû ji çek dikirî. Roja 20-an li nakaw destpêkirin bi yekcarî bipaşve kêşyan û xwe bidestve dan. "Her ew rojê ku Qewam destûra hêrişê bo Azerbaycan derkir, berpîrîsê siyasî yê Sovyet biresmî destûr da Pîşewerî ku nabê hêza çekdarên Azerbaycan li hember hêza dewleta navendî dest bi şer bikene û pêşniyar li wan kir ku tenya çend kesêk ji birêveberên Fîrqa penaber bin xakî Sovyet. Pîşewerî bi tundî dijî desthelgirtin li destkirdineve û xwe bi destvedan li beranber hêza dewletê bû. Belam bi wê perrî dîyare, ew rêya ew pêda diçû li wê baredoxê da çareyêkî xeyrî madan bi wê destûrê nebû..."⁴⁴

Pîşewerî li berçavan nema û li Tewrêz bi radyo û bi brûske peydey pey destûrê paşvekişîna hêza Fîdayî dida. Rojî 20-ê, Bîrîya û Cawîd li mîting da rayangeyandin ku partî bi vegerîna arteş razîye. Roja 21-ê, Cawîd û Şebusterî (ji birêveberên destê rast ê partî) brûskeyêk bo Qewam û Şah birêkir û tede nûsîbûn evro "bi yarmetî axayê Şebusterî me şîyan axayan(Pîşewerî û hevbirên wî) razî bikeyn dest ji dijminayetiya(dewlet) helbigrê. Ev mebset ji xizmet axayê Seyfî Qazî hate rageyandin". Her li wê birûskeyê da, qawayan li Qewam kir ku destûr bi arteş bide ku dest ji dijminatî û şer helbigrê. Belam ne Şah û ne Qewam hiç yekî agayî derbarî wê birûskeyê nedaye û arteş û çaşan, ku bibihîstina destpênedana hêza Fîdayî li perra bibûn bi şer, kuştar û qetilawbir û destdirêjiyan dirêje pêda.⁴⁵

Li Mahabad roja 14-yê Sermawez kombûnekê deh kes hate kirin ku Pêşewa û Seyfî Qazî û Serdî Qazî têda bû biryara destkirdineweyî da. Roja du wê ku xelkê bajar kombûn bo biryardan li ser destkirdinewe, Pêşewa û Serdî Qazî raya wan bi berberî kirina hêza dewlet bû, belam aşbetaliya Fîrqa û rûxîna li nakawî dewleta Tewrêz dewrêkî girîng ê gêr ali wergeranî barî siyasî

**Li Mahabadê roja 14-yê
Sermawez (5-ê Desembar)
kombûnekê deh kes ku
Pêşewa û Seyfî Qazî û Serdî
Qazî jî têda bû biryara xwe
destkirdinê da.**

⁴³ Îzetê Silêman Begî Dergeleyî, "Hefteyek ber li destgîrkirdinî pêşewayî nemirewe", Birayetî, jimare 1908, 31. 03. 1994, laper. 3.(nişaney 7 li rênûsî ew qisaney Kak Îzet zîad kirawe).

⁴⁴ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 416-417

⁴⁵ Cebhe Azadî Mirdem Ayran, s. 416-419

Kurdistan⁴⁶ biryara destkirdinewe li Kurdistanê jî bû bi "xwe bidestevedan". Roja 26-ê Sermaweza 1946-1325 arteş şîr û şîprêwî Şahinşahî temam sale wextêk paş helkirina alaya Kurdistan bajarê Mahabadê girte."⁴⁷

2) Azerbaycan: Li "sêwî rizîw"ra Heta "Stalîngiradê Rojava".

Xerabûna navbera du komaran rûdanêkî weha çaveruan nekira bû ku kes - ne dost ne dijmin- bawerî nedikir û bo wî li yek nedidirawe. Bitaybetî çar mang piştî derketina Sûpayê Sor li Îran, dewleta Îngiliz hîç umîdê wê nebû ku du hikumet sernixun bin. Allen, sefirê Amrîka li Îran di birûskeyêk da bo wezîrê derve yê Amrîka (di 28-î Siptamberî 1946 da) nûsî:

“Behza nîşaneyêk firetir weha derdixin ku Îngilîzan çav li îmkane cîyabûna Azerbaycan ji Îran dikin wek alternatîfêk li beranber dirêjêpêdana derbarê nûha, ku ewan[Îngilîzan] ditirsîn bibête hoyê ewê beşêkî pirtir ê memleket bikevête nêv navçeyê[nîfuzî] Sovyet. Weha diyarê ku bîra wan ew e ku baştire beşê rizyayî yê sêvê derbênî heta ku temamê sêvê nerizêne. Di qisekirina xwe da doynî sefirê Îngilîz gotî ku hest bi wê dike ku pêdiwîstiyekî serekî ew e, ku sinorêkî yekcarî li nêv wan Yekêtî Komarên Sosyalîst ê Sovyetê dabindirê. Ew hest bi wê dike ku hewlî dirêjedar ê hikumeta Tehran bo ew ê Azerbaycan wek beşêk ji Îran dabinê ligel waqhiyet yek nagirê û encama wezhêkî şilkepete(mushy)î weha ye ku hîç sinorêkî ronî li meydanê da niye. Sovyet dikare bi nfuzkirina xwe heta Tehranê dirêj bibe û berve başûr xwe fere bike. Wî bîr bi wê dikir ku Tehran biqethî dest li hikumeta Tewrêz helnagirê û hêza ekserî ya bihêz bidirêjayî sinorê Îran-Azerbaycan dabinê...”⁴⁸

Di belgeyê nihênî yên wê demê da weha derdikevê ku dawîyê Amrîka bo maweyêk Şah û Qewam handida ku bi piştevanîya Amrîka hêriş bibine ser Azerbaycan, dewlet û arteş şîprêwekê pênc mang piştî vederketina Sûpayê Sor ji Îran hêştayî wirrey şerkirina wê nebû. Allan di birûskeyê 8-ê Niwember da bo wezîrê derve yê Amrîka nûsî ku li dîdara xwe yê ligel Qewam da di wê rojê da ji wî ra gotîye ku:

“Amrîka di siyaseta xwe ya bo parastina temametîya xaka Îran da hîç şel nebûye, belam dibê Îran jî wek Amrîka şelgîr bê di vê meseleyê da. Li ser wê Qewam ji sefir ra got ku divê em heta deh rojê di Zexban bigirê, eger pêwîst be bi şer. Sefirê Amrîka jî pêxoşbûna xwe derbirê. Ji qewam ra got ku girtina Zexban bes niye, belam belanî dikim ev destpêkirinêk e. Qewam gotî mebesta mi ev e ku “kêm kêm” berve pêş bibime.”⁴⁹

⁴⁶ Ebdehrehman Qasemlu, la 66-67; Hêmin, Tarîk û Rona,bingey pêşewa, 1974, la. 26-28

⁴⁷ Hêmin, ... la. 28.

⁴⁸ Foreign Relations of the United States. 1946. Volume VII. Washington, Government Printing Office, 1969, p. 517.

⁴⁹ Foreign..., p. 545.

Bi qiseyên sefirê Amrîka, ku bi temamî agadarê hêrîşa arteşê bû, “bernameyê eskerê dewleta Îran li pêş da ev bû ku bitaybetî Mîyanê dagîr bikin. Eger tiştêk weha kiraba, bernameyê Îraniyan ew bû ku sebir bikin û bizanin çi dikê. Rûxîna pir û rayê bizotnewê Tewrêzê, bi aşkirayî zor pirsêkî gewre bû ji bo Qewam û Şah û hemû kesên din.”⁵⁰

Li vê name û birûskeyên ku sefirên Amrîka ji Tehran û Moskov û Parîs û cîyên din da ji bo dewleta Amrîka şandibû, hewlêkî pirr dîyare ku hoyên rûxîna du komar û piştevanî nekirina dewleta Sovyet rave dike. Ligor Dewleta Fransa weha bû ku Moskov li gel Qewam sazabû li ser ewê ku meclîs peymana neftê bakur pesend bike û Yekîtiya Sovyet dest ji piştevanîya Azerbaycan helbigrê. Allen di birûskeyê 23-yê Desembir da, bersîva pîrsa armanca Dewleta Frensa daye û nûsî ku hem Şah û hem Qewam bo wan weha bû ku Sovyet bi şeweyê pirr xurt yarmetî bi Azerbaycan dide. Sefîr li dirêjîya qiseyên xwe da dinûse: “bi wê belgeyên li ber dest da ne dikarim bêjim ku karbidestên Sovyet li vê derê temamê meseleyan pir xirap birêvebir. Ew yarmetiya ku Sovyetê di salên rabirdu da daye Azerbaycan ta radeyêk rezîlane bû û bi çenelêkdanêkî zor kiribûn. Ewan Azerbaycaniyan neçar kir genim û ceh û kelûpel û pêdivîstiya bi nîrxekî pirr ji wan bikirrin. Li demek da mîqdarêkî berçav tîfîngên otomatîk û fişek û kelûpelê sûkî danê, hîç çekê gird têda nebû. Serkonsolê Sovyet li Tewrêz li Batê rênuyênî- kirina rêjîmê[Azerbaycan] bi bê piştewaniyê, kontrola xwe bi şeweyê bêşermane û xohelkêşan pê şan dida û bi wê terzê Pîşewerî ji vê piştîvanîya xomalî ya berçav ê ku li ewela rojên rijî yê xwe da hebû bêbeş dikir.”⁵¹

Smît(Smith), sefirê Amrîka li Sovyet, di birûskeyê 27-ê Desembir da bo wezîrê derve yê Amrîka dinûse: “Bila wê dabinênin ku rêjîm [ê Tewrêz] xelkê dilsar kiribûwe, hêştayê seyre ku Yekîtiya Komarên Sosyalîst ê Sovyet di vê demekê kurt da hêzêkî weha rêknexistbû, ku eger pêwîst bê zêdetir ji Azerbaycan[pêkhatiba], dest bikineve li beranber bervepêşçûnê ceribandina û tirsonekên Îraniyan.”⁵² Allen di birûskeyê 23-ê Desembir da nûsiye: Sovyet hêzên xwe yê çekdar bo Azerbaycan birênekir ji ber ewê ku “hêza Azerbaycan pirr zû rûxa, ji ber berjewendîya navxweyî li Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyet, ji ber kêşeyê berî tîrî siyasetê derve yê[Sovyet] li asta Awrupa, ji tîrs rexne û lomeyê şuraya amnîyet û bîr û raya cîhanî, yan jiber temamê ewhoyan bi yekcarî.”⁵³

⁵⁰ Birûskey 23-yê Dîsembirî Allen le serçawey pêşû. la. 565.

⁵¹ Serçawey pêşû, ja. 464-65.

⁵² Birûskey Smith le 27-î Desembir, serçawey pêşû, la564.

⁵³ Serçawey pêşû, la. 565.

Eger dijminên azadî li Azerbaijan û Kurdistanê da serê wan mat mabû, layengirên rizgarî jî, ku aga wan li hêza gel bû, sed ewhende bi rûxîna du komar rastê sersemî bûn. Mamosta Hêmin ku têkoşerêkî hikumetê Kurdistan bû, di sala 1973 da nûsî:

“Azerbaijan hikumetêkî gewretir, bihêztir û pirr teyaretir û pirrçektir bû ji Kurdistan... Azerbaijanê wan teyare û parçek ji leşkerê saz û perdax û fermande ji yê zanayî yê wan zû teslîm bûn? Pişewerî karamê û şoreşgêr û kevnepîyaw û aza û rêberên di yê Azerbaijan bo wa bi pele rayan kir? Pirsyarêke kes bi temamî ciwabê nedaye û min jî ciwabê xwe bo wê nadirêteve. Lêbelê dilnîyam eger Fîdayî destî kiribawe û eger Fîrçe berberekanî bikirawe, leşkerê şerûşiprêwî Tehran netenya pê li Tewrêz nedenawe û ew hemû kuştarî nedikir, belke Tehranê jî dişêwa û li wa nebû li sertaserî Îran da nifuzê împeryalizm li rojhelata naverast da zûtir binebir bê...

Rast e Kurdistan û paşve girtina Azerbaijan û di destdana ew hevpeymanê bi hêzî ji hemû layekê ve gemaro dirabû, raste beşêkî eşayîr giwê yan silaw birandbû û bi çavê xirabîyê lê dinihêrt, raste xezîneya komar betala û hetala bû û hemû yê dirabû bi tûtîn û hêştî nefirotbû û di ambar da mabû, rastî li hemû yarmetîyekî derve hîwabiraw kirabû, belam min beş behalî xom li wê birwaye dam eger destwekerî kiraba û me ezmûnê şoreşgêrîyê heba mêtûyî Komara Mahabad bi wê cûre dawî nedihat ku hat.”⁵⁴

Di birûskeyêk di 17-yê Desembir(26-ê Sermawez) da, Allen dinûse ku li meclîsêk şahî ku di 16-ê Desembirê da li Tehran pêkhat,

“Şah bi pesindanekî(tribute) temam û bitaybetî derbarê ew ê yarmetîya me kirîye tehrîf kir (embarrassing)⁵⁵. Behsa ew kesên gotîye Azerbaijan "Stalîngiradê demokrasiya rojava ye" û wergerand pêla(şepole) li dijî destdirêjîya Sovyet li seranserê dinyayê”.⁵⁶

Sefîr herweha dinivîsîne ku endamên kabîne û karbidestên dewletê wek wezîrê şer, wezîrê darayî, reîsê Banka Millî, reîsê dawî yê meclîs û htd. peyta peyta serî li sefaret didin bo sipasê Amrîkayê ku wê “Azerbaijan dayete bi Îranê.”⁵⁷

d) Du Rêbaz û Du Çarenûs

Nameyê Stalîn çi ronahîyê dixîne ser kêşeya du komaran? Azerbaijan bo çi teslîm bû? Pişewerî bo çi birê kir bo Sovyetê? Kurdistan bo çi bidest kir?

⁵⁴ .Hêmin, la. 26,27,28.

⁵⁵ Mebestî Allen eweye ke Şah ewwendey be Emrîka helgot ke Allen terîq bowe.

⁵⁶ Birûskey Allen le 17-yî Desembir, Foreign Relations, la 563.

⁵⁷ Serçaweyê pêşû.

komar Hem pênce sal berîya wê dîyar bû û hem nûha ronîye ku şertê rûxîna du bi hêzbûna dijmin nebû. Rêjî Şahînsah ligel wê jî da, bi berûvajîbûna (sernixunbûna) du komaran, xwe girteve, qirîzeke sîyasî ya weha peyda bibû ku nedikarî deshelata xwe pête(bihêz) bike. Ligel wê jî da Amrîka di 1946 da bernamayê bihêzkirina arteşa Şahenşahî dirêjepêda, Şah ji tirsaraperîna xelkê û bo parastina gîyanê xwe, tac û textê xwe serbest kir û li wexta 1953 helhate Bexda û li wê derê jî gîr nebû û wî rêkirin bo Îtalya. Girîngiya wê rûdanê di wê da ye ku serkirdeyê rejîma paşayetî, bi pêşevaniya boçûnê Stalîn, bi bê şer kirin ligel welatê derve û bitaybetî bi raperîna xelk di barodoxî qeyran(qirîzê) da, li wê Qewam derkirin.⁵⁸ Herweha vegerîna Şah bi kudîtayêk Amrîkayî, sîyasetê reformîst ê Hîzba Tudeh li dûrxist ew sîyaseta ku piştra bo mawey 12 sal xebata gelên Îranê tûşî(rastê) şikest kir.

Pênce sal li piştê wê karesatê weha dîyare, ku faktorên zeynî (subjektîvî) ji faktorên eynî (objektîvî) pitir li wê tesîr kiriye.

Pêdaçûna rûdanan(bûyeran) û belgeyan aşkira dike ku şertê herî girîng ê rûxîna herdu komaran ew bû ku Yekîtiya Sovyet fermana aşbetalî bi rêberayetiya Firqeyê Demokrat da û ewan jî bi gotina wan kir. Di vê aşbetalî da şertê derveyî(sîyaseta Sovyet) û şertê navxo (qebûlkirina aşbetalî) bi hev va têkildarin ku yek ji yekê nayêteveqetandin. Kê berpirs e? Kîjan hoyê serekî ye? Bi ya min li pêşda hoyê devreyî ne. Stalîn di nameya xwe da lome ji Pişewerî dike û ji wî ra dibê ku bi raya min bîzor û lezgînî û nabê, divê bi hêdîtî têbikoşe û bi "piştevanîya manewî" ya dewleta Sovyet piştêstûr bê. Piştevanîya manewî ya dewletêk sosyalîst ku xwe bi "bingeyê şoreşa cîhanî" dadena çi bû? Stalîn bi raşkawî dibê ku eger Pişewerî û Azerbaycan jîrane bicûlênewe, bi piştevanîya Yekîtiya Sovyet dikarin bi daxwaza xwe ya herî kêr bigeyn. Lêbelê ev piştevanîya manewî ya dewletêkî sosyalîstî nîye. Stalîn basê tîoriya qirîza sîyasî ya Lênîn dike, lêbelê xalêkî girîng ê wê tîoriyê welê nabê. Lênîn gotbûyî serbaqî wê qirîza sîyasî li Rûsya û li welatên di yên rojava da pîrr bûn belam şoreş zor kem bûye:

⁵⁸ Hêmin duay rakirdinî Şah li kobûneweyêk le şarî Mahabad(26.06.1332) da şehîr "Bexda nêwey rê bet bê"yî xwêndewe ku le bendî hewelî da gotî:

"Xaîn, xwêrî, diron, bedfer, şeranî, serşor!
Pişawkuj, tawanbar, rûreş, nakes, mil hur, diktator
Xelkî Îran be dest tokrabûn zinde be gor
Ewe toy lêt qewmaw, derîyan perandûy, her gor
Debro ew Şahê xain Bexda nîwey rê yet bê."

Hêmin, *Tarîk û Ron*. La. 127.

“Bo çi weha bû? Ji ber wê ku her rewşekî şoreşî nabêt bi şoreş; şoreş li rewşekî weha da serhildida ku gorankariyên objektîv ên jê têtê baskirin [bi ya min qiseyên Lênîn li cî da ye] bi hev ra têkeldar in, ligel gorankariyekî zeynî (subjektîv), wê wextê kariye çîna şoreşgêr bo ew karêkî civakî şoreşgêrane yê ew hende bihêz bike ku bikare hikumetê kevn têkbişkênê (yan cîyê pê lej bike), ew hikumetê ku qet, bitaybetî di zemanê qirîzê da, "nakevê" megîn ew ê sernixun bikirê.”⁵⁹

Pîşewerî dixwest ew kar bike ku Lênîn virada bas kirîye: derbarê objektîvî (kizbûna dujmin û bihêzbûna rêza xebat) û derbarê zeynî (raberayetî şoreş) nabê weha paş bikevê û dibê bernamêyê herî zor (makzîom) bête gorê û têbikoşê bo bicîhênana wê. Belam Stalîn rêya şoreşê li Pîşewerî girt û ji wê jî xirabtir, pênc mang dawîyê, ku beranberîkirina meseleyê man û neman bû, cemawerê Azerî û Kurd û rêberên wan çek kir.

Pîrsyarêkî di ew e: Axa Pîşewerî û rêberayetiya Hîzbê Demokrat neçar bûn bi qiseya Yekîtiya Sovyet bikin? Nûha ku Sûpayê Sor li Îran nemabû û nedikarî vegeştê Azerbaijan û Kurdistan, bo wê diviya Pîşewerî li qursê manewî yê Yekîtiya Sovyet bisilemê? Ew Yekîtiya Sovyet ku hêza wê ya manewî li nav xebatgêrên dinya hebû, manewiyata şoreş, têkoşan, kolnedan û xebat wê bo rizgarîya çîna karker û zehmetkêşan bû nek manewiyata bernamêyê mînimom (asgarî) û reformîzm. Nûha ku ew hêza manewî li dijî şoreşkirin bikardihat, bo çi Pîşewerî li dijî wî nerawesta?

Ew pîrsyar li dinya paş şerê cîhanî, bitaybetî di 1945-46 da bo gelek bizotneweyê karkeran û rizgarîxwazî hatibiwe meydanê. Rêberayetiya ew bizotnewan du agadariyên cîyawaz dane. Rêbaza ku Hîzba Tudeh, beşekî zêde yê rêberayetî yê Firqê yî Hîzba Kominîst a Yonan û Îtalya û Franse û Amrîka û gelek welatên din jî rêçaviya wê kir, ew bû ku di namêyê Stalîn da hatibû amade kirin: Sazan ligel ewan ê deshelata dewletê bidest wan da ye bo reform û hewldan, bo parastina aştiya cîhanî bi rêya parastina berjewendîya sîyasî û aborî ya Yekîtiya Sovyet. Bo mînak Hîzba Kominîst a Yonan ku li proseya şerêkî dijî faşîstî da welatê xwe rizgar kiribû, li cîyatî damezirandina dewletêkî demokrat û şoreşgêr, welat pêşkeşê Îngilîzan kir û wê jî bi şeweyêkî dirindane xelk û şoreş û rêberên wê serkut kir. Dewrê Yekîtiya Sovyet li vê karesatê da bo Azerbaijan û Kurdistan weha bû. Rawêjkerên Sovyet li Atîna hêzên çekdar ê bizotnewe yê dijî faşîzmê neçar kir ku çek dabinên.

Di wan salan da çend hîzbên kominîst û karkeran li dû vî rêbazê ser netewandin, nekevtin belam berberekanîyêkî weha şîyan -di biwarê teorî û îdeolojî da- li dijî rêbaza reformîstî nekir. Bo mînak Hîzba Kominîst a Çîn,

⁵⁹ V.Ý. Lenin, pp. 464-465, We nebê Stalîn agayî lew basane nebûbê. Stalîn dewrêkî girîngî gorawe le lêkdanewe û şikirdinewey Lênîniзм da. Ew xoy ew basey le zor cîyan hênawete gorê (bo wêne li salî 1934 le: î. Stalîn, Mesalî Lênîniзм, cild:2, Moskov, adare nişrîyat bizbanhayî xarcî, 1949, sa. 685-686). piştî

temambûna şerê dijî faşîstî, xebata xwe dirêje pêda û di sala 1949 da serket. Di mangî 1946 da, ew dema ku Hîzba Tudeh dixwest "aşîya cîhanî" biparêze û sefirê Sovyet li Tehran rêya aşbetalî xweş kiribû, rojnamenûsêk Amrîkayî "çi dibê eger Amrîka bombayê etomî dikarbênê û di bingeyên xwe yên li Îsland û Okînawa û Çîn da Yekîtiya Sovyet bombebaran bike?" Mao di bersîv da gotî: Bombayê atomî bibirê kaxezî ye ku kevneperestên Amrîka bo tirsandina însanan bikardênin ... Helbet bombayê etomî çekê kuştar ê têkrazî ye, belam gel xwe bi encamî şer dadihênê ne yek yan du çekê nûyê, Temamê kevneperestan bibirê kaxez in."⁶⁰ Ev qiseyên Mao rexneyêkî nerastewxo li rêbaza reformîstî li bizotnewê kominîstî yê wê serdemê. Ligel wê jî da hêza çekdar a Amrîka li xaka Çîn da hebû û yarmetiyêk yekcar berîni dida arteşa Çîn, hîzb û dawîya rêbaza reformîstî nekevî karî kangayêkî girîng ê şer helayîsandin (dewleta Çîn û hevpeymanan) li xaka Çîn pak bikate. Dîyare firqeyê hîzbêkî bi ezmûn û qayîm wek hîzba Çîn nebû. Pişewerî, wek rêberek, di dirêjayîya jîyana xwe ya siyasî da bitaybetî di 1946 da rêbazêkî wê yê şoreşgerane hebû. Belam nekarî partî bike rêkxirawêkî weha ku li barî siyasî ve ji Yekîti Sovyet û rêbaza reformîstan bibîçirê û serbixî bê.

Şikîna herdû komaran şikînek eskerî nebû, têkşikîna siyasî bû, fîdayî û pêşmerge û cemawerê gel bi destê rêberên xwe û rêberan bi xwe rêbaza xwe ya siyasî û birênişandana Yekîtiya Sovyet çek kirin û têkda çûn. Weha dîyare pênce sal li paş wê karesatê, faktorê subjektîv ji faktorê objektîv pitir li caran li pêş da ye. Nûha di salroja <şoreşa Eylul> da, piştî sî û pênc sal şer li Kurdistanê Iraqê, welatek wêran û qelaçokirî û bîrsî û rûxîn liber çav e ku ligel wê da jî qet li xebatkirin û xwebextkirin şil nebûne, hergîz wa kole û jêr çepok nebûn -hem bi destê dijminê derve û hem li jêr alaya xomalî da. Bi boçûna min, komara Kurdistan, serbaqî nebûna parlamen û jîyana firehîzbî, ji gelek cîhetê ve ji hikumetê herêm pêştetir bû, ew jî ta radeyêk peywendîya wê bi rêberayetiya komarê ve hebû, herweha hebûna hevpeymanêk wek "hikumetê millî yê Azerbaycan" û Yekîtiya Sovyet- serbaqî wê siyaseta helperistane ya ku di nameyê Stalîn da tomar kiraye.

⁶⁰ "misahbe ba xeberingar Amrîkayî Ana Luyiz Astirang(awt 1946)". Mautsedun, mintexib ajar, cad çîharim, sa. 141.

Etîmolojîya Zimanê Kurdî

Abdurrahman UÇAMAN

W-w

wa: 1. Demîra ravedana tiştêkî dûr ê xuyanî. *Sura Dîyarbekirê *wa* ye. *Ew merivê ku te wî ji min pirsî, *wa* ye ji wê da tê. * Ew îş *wa* ye berbihev tê. ...

2. **Wa:** Di Dimilî da navê "xûşk"(xweng) e. Herçî gotina ku di serê wê da "xw" hebe, "x" dikeve, "w" dimîne û gotin bi "w" dest pê dike. Wek: Eva keçika *xwa* min e.(K)/ Ena keyneka *wa* min a....

wadî: ve+day>vadî>wadî: Ew erdê ku hatiye vedan, li gora dora xwe kûr û dirêj e. Bi pirranî jibo averêja çemên mezin ra tête gotin; wadiya Dicle: Ew ciyê ku çemê Dicle wê vedaye. ... Em ketin wadiya ava li bûhûrê (navê newaleka kûr û dûr û dirêj e di pişta gundê "resulan" dest pê dike, li ber deşta muşê, nêzî ava reş diqede, li vî seriyê jî gundekî heye, navê wî jî "avdilbûwar" e. Ev wadiya bi nav û deng e, di kilam û serhewayên serhedê da gelek cî girtîye). Ev wadî, navê wê; "avlêbûhûr" e, bi zeman bûye "avdilbûwar". ...

wan: 1. Paşeka hinkî nav û mesdara ye, bi paşîya kîja kelîme ve bikele, ew di wê kelîmê da mana hevgirêdan û xwedîtiyê çêdike. Mîsal: Çadir**wan:** Ew firehiya çaraliyê çadirê. Dî**wan:** Xwedîyê dîtina kar û barê lihevdanîna xelkê(dîwanê dewlet û mîr û şêx û axayan, ciyê dîtina riya rast e?). Kar**wan:** Xwedîyê kar û xebatê. Sî**wan:** Ew tiştê ku sî dide(şemsîye). Hespê re**wan:** Ew hespê ku karê wî xweş rêveçûyin e. ...

2. **Dîwan:** Edebiyata ku bi aruz hatiye nivîsandin. Jibo ku ew edebiyat, bi devê dengbêj û sazbandan, di dîwanan da dihatin xwendin, navê wê "dîwan" hatiye danîn.

3. **Wan:** Piraniya zemîra "a wî, a wê" ye, ... Tu wan merivan bibîne, vî hespî bide wan. ...

wane: ev kelîme; ji "xwane" ye û tête mana "menzere". * Ev xanî wana wî xweş

e, ya nxweş e. ... Li hinkî cîyan, gundî ji zevîyên ber malan ra dibêjin "bêwane", yanî ew erdê ku ji malê xuya ye, menzera malê ye.

war: ev gotin dema ku navê warê zozanî be yan jî navê "xanî" be, wê gavê, divê em di werbûn û werkirin û werdanê bifikirin. ... Însanê ku bi zozanan da hildikişyan, hingî ku diwestiyan, dema ku digihan cî, ji kêfan û ji reht bûnê xwe tê werdikin. Wekî bîye "xanî" jî, jibo ku însan, her îş û karî bi dest û pişt dikirin, êvaran gava ku digihîştin malê, bi ser û çavê xwe tê wer dikirin, ... filan kes bê war e, yanî cîyekê wî yê ku tê wer be, tune ye. ...

-warî: ... Filankes Hitler**warî** zûlm dike, yanî zûlma wî jî wekî zûlma Hitler e, ew jî xwe wer dike. **War:** Ew "war" e, ku dema yek tiştek bibêje û em jî bibêjin "wera ye", yanî "we+ra": Xuya ye. bn. wera.

we: 1. Zemîra pirranîya wan ê hazir, jibo fi'ila derbasî, di zemanê çûyû da. Wekî: We got, we hanî, we xwar, we da, ...

2. Jibo diruvrastinîyê, jibo tesdîqê tête gotin: Ma eva ha ne zevîya min e, ... Belê we'ye; yanî ew zevîya te ye; yanî ev gotina te raste e, ez tesdîq dikim. Li hinkî herêman tête gotin "wusa", li hinkî di jî tête gotin "we", werge, wera, ... bn. werge, wera.

Tiştê ku rastê tiştêkî di bê, dirûvê wî pêkeve, tête gotin: Evîya wey wî ye, ev herdu wey hev in.(ev di hinkî devokan da ye)... bn. wek.

wek: we+k>wek: Jibo rastiye ye, jibo dirûv pêketinê ye. Gava em bixwazin ku tiştêkî bi rastî, békêmanî bibêjin, em senaryoya wî bi tiştêkî siviktir, vekirîtir rava didin; mîsal nola, bîna, fena, ... Ev her sê jî di cîyê wek da têtin gotin. Bi tenê; di van her sêyan da nêr û mê tune ye, di "wek"ê da heye. Mîsal: *Ev ga, nola, bîna, fena, wekî gayê me ye. *Ev çêlek, nola, bîna, fena, wekî gayê me ye. Jibo tiştê mê "weka", jibo tiştê nêr "wekî" tête karanîn.

wekal,wekîl: wek+al>wekal: Ew kesê ku wekîti jêre hatiye dayîn, jibo çi îş û karî ew wekîti jêra hatibe dayîn, we jî di dayîn û sendina wî îş û karî da, nola xwedîyê wî ye. Jibo ku dayîn û sendin, du aliyê wê hene, ji wan herdu aliyan; kîja ji dêla yekî di ve wî îşî bike, ew ne aliyê rast e, ew wek aliyê rast e, wê gavê ew dibe "wekal." Belkî bi rasthatin, belkî jî bi jihev girtin, Kurdî û Arebî jihev digirin. Bitenê di Kurdî da kelîmekê hevkêl (mûrekkep) e, di Arebî da yekrû(basît) ye.

welat: we+lat(ve+lat)>welat. Lat: Parçekî erdê piçûk. **Ve(we):** ters, bervaj, ye. Li vê derê "we-ve" hatiye serê "lat"ê û "lat" bûye tersê xwe. ... "Lat", erdê piçûk e, "welat", tersê wî ye wî ye; erdê mezin ê fire ye.

wer: we+ra>wera>wer. We: dirûv pêkhatin, **Ra:** dîtin(ravedayin). **Wera:** Ew tiştê ku tiştêkî ravay meriv bide, di bîra meriv bîne, bi refleksa tiştêkî di bi bîra meriv bixe. Her wekî semawer. **Sema:** Navê govendekî ye, ew zerfa ku navê wê semawer e, gava ku av têda dikele, ew dilerize, diheje, ew lertz û heja wê, hawayê govendê di bîra meriv tîne û ravayê meriv dide. Ev paşek dibe **"-warî"(we+ra+î).** Gava ku em dibêjin ev îş, filankes**warî** ye, yanî ev îş, wî merivî tîne bîra me.

Wer, gava ku bibe pêşekê fi'lê ew mana wê fi'lê digûhêre: Kirin-**wer**kirin, bûn(bûyin)-**wer**bûn, dan(dayin)-**wer**dan, ... Eger berîya wê da daçekekî hebe, ew jî manekî dide wê fi'lê, ... Kirin, **wer**kirin, **têwer**kirin, **pêwer**kirin, bûn-**wer**bûn, **tewer**bûn, **pêwer**bûn,

wera: **we+ra>wera**. **We**: rast; ra: dîtîn. **Wera**: rastdîtîn. "Wera ye", yanî rast xuya ye.

werdek: **wer+dike>werdek**: Jibo ku xwe di avê da wer dike, û avê li xwe wer dike. ...

were: **we+he+re(ve+he+re>wehere(vehere)>were**. **He**: Jibo îsbat û qebûlê ye(filan tişt ha ye); **re-ra**: hereket e. **Here**: Hereketa te qebûl e. **Were-vehere**: Hereketa te, çûyina te ne maqul e, yanî tersê "here" bike ku, ew jî "were" ye, yanî tersê "gerê" bike ku ew jî "veger" e.

werêz: **wer+rêz>werêz**. **Wer**: Berdan û pêşîvekirina avê ye. **Rêz**: Li vê derê navê xeta ku tiştêkî têda hatiye çandin. **Werêz**: Ew kesê ku avê di wan xetan wer dike, bostan av dide.

werivtin: **wer+av+tin>weravtin>werivtin**: Ew tiştê ku avgîr e û av têda belabûyî ye, ji derketina wê avê ra "weravtin" têtê gotin, yanî werhatina avê. ... * Mast di kîss da ava xwe diwerêve. ...

werîs: **wer+rîs>werîs**: Ew rîsê ku lihev hatiye werkirin, honandin, pêçandin, badan, ... Ew tiştê ku ji wî hatiye rastê, navê wî werîs e; rîsê wergirtî....

wesar(D): **ve+sar>vesar>wesar**: Vebûna sermayê; bûhar. Jibo ku sermaya zivistanê radibe, dipîşkîfe, vedibe ji bûharê ra têtê gotin "wesar".

weş-meş: **weş**: Liv û ketina şaqulî, daketin, weşandin, daxistin. **Meş**: Liv û tevgera berane(sathî), birêda çûyin, meşandin; birêda birin.

weyl: **wey+lê>weylê>weyl**. **Wey**: Di zaravaya Hewremanî û Senendajî da bela, zera û nepakî ye. **Lê**: Biserhatin, lêbûn. Dema ku têtê gotin "weylê li te": yanî bela û nepakî bi teta were. ... "Weylê/weyla li min": Ev çi bela û nepakî bû bi ser min da hat? Jibo ku "weyl" bûye gotineka hevkel, "weylê li min" têtê gotin. ...

wey: gotineka veciniqandinê ye jî. Mîsal: Wey! Ev çi ye? ...

werze(D): **ve+raze>veraze>werze**: Tersê razanê, yanî "rabe".

wêra: ev gotin, ji zimanê kurdî, bitenê di lehceya Kurmancî da heye, di wan zimanên dî jî, bi qandî ku ez lê geryam min, gotineka yekrû(basît) ku şûna wê bigre, nedît, bitenê di Arebî da; "cûret", şûna wê tijî dike...

Ez wêrame vî îşî bikim. ... Ez newêrame vî îşî bikim, yanî ez ji kirina vî îşî natirsim. ... Ditirsim. ... Ev kelîma "wêra" ji "werkirin"ê têt. ...Ez wêra me, yanî ez di vî îşî werdibim, ez xwe tê verdikim.... Xwe tê wernakim. ...

wêran: wêran bûn: Tersê avabûnê ye. Di Kurmancî da, malavatî û malwêranî, di pey her dilxweşî û dilêşîyê da têtê gotin. ... Ev kelîma "wêran" ji "werbûn"ê ye. Dema ku em dibêjin "mala filankesî wêran bibe", yanî "mala wî di erdê wer bibe". Li vê derê "wer" bûye piranî; wer-weran-wêran. ... Yek ji wan gotinan e, ku pirranî têda hatiye jibîrkirin û di hev da kelyaye. Em dibêjin; werbûn, wêranbûn, werkirin, wêrankirin,... Mal û avayîyê ku jihev bikevin û bibin xûrb, ji wan ra jî têtê gotin "wêran".

wîyarye: mîde. Bn. vêre.

xabûr/m: **xwar+bihûr>xwarbihûr>xabûr.** Jibo ku cihê derbasbûn yan jî bihûra di wî çemî da xwar e, ji wî çemî ra hatiye gotin Xabûr.

xag/m: ... Xa dengêkî tabîî ye, bê daxwaza meriv bi refleksekî li hember tiştê ku ji qirik û realîtê ra xidug tê, paştta tê avêtinê. Dema ku li dawîya **xa'yê g** were navê fêkîyê negihîştî tê fêmkirin. Wek: "Ev sêv xag e." Jibo tiştê ku bar û giranî hilde, em di cihê **g** yê da **m** tînin. Wek: "Ev ben *xam* e. Ev hesp *xam* e." Eger di şuna **g** yê da **p** were, wê demê mana zîyan, lê nehayîyê dide. Wekî ku tê gotin: "Ez di vî îşî da *xapiyam*." Ku di cihê **g'yê** da **v** were danîn, wê demê xwarina kêmpijayî tête famkirin. Wek: "Ev goşt *xav* e. Ev savar *xav* e."

Ji van mîsalan jî tê dîtin ku xa bi gûhartina dengê ku li dawîya wî tête, mana wî digûhêre û her neyînîyê dide zanîn. Xa-: Xag, xam, xap, xav, xafila.

xa1 1/n: **xwe+a1>xal:** Ev jinika ku diya meriv e, birayê wê xalê meriv e. Yanî ew mêrikê ku bi xweha xwe merivatîkî di navbera wî û kesekî dî de çê dibe; ew bi alî xwenga xwe merivatîkî dide vî kesî ku jibo vê yekê ji wî ra tê gotin xal.

xa1 2/rn : **xwiya+a1>xal:** Ewan nûqteyên ku li ser canê însan bi rengekî ji can cihêtir têne xuyakirin, ji ber vê hawayê ji wan ra tête gotin xwiya+al> xal.

xama/m: Ew keçika ku gehîştîye nêzikê bûkîtiyê, yanî hatiye wexta zewacê, ji ber ku pirr gûh nade dê, bav û malbata xwe, vî navî digre. Wek dewara nûbar ku serkêşîya dike. Ev gotin bi xwe sifet e (xam). Bi zêdekirina a (xam+a)di dawîya wê da, bûye sifetekî tengtir.

xamur/n: **hem+hûr-hêr>xemur>xamur:** Ew tiştê hurên ku hev girtine. Ev gotin ji zimanê Arî derbasê zimanê Arebî bûye, tevî ku di zimanê Arî da ev kelîme hatiye çêkirin (hev+hêr-hûr) di zimanê Areb da bûye kok. Bi mana tiştê mayakirî. Ku ji vî xemir(ew tiştê ku însan serxweş dike) çê bûye. Bn. Hevîr.

xan/m: **xew+în>xewîn>xan:** Cihê razanê. Bi pirranî li serê rêyên aborî û bazirganî avahîyên ku jibo xwe parastina ji şêlandina keleş, dizan, sar û serma û berf û baranê dihatin çêkirin. Di nava bajaran da jî ji van avahiyan hebûn. Ji ber ku însanê karwan ji her tiştî bêtir hewcê xewê bûn, navê van avahiya *xewîn>xan* hatiye danîn.

xana ceber/m: **xan+ceber>xanceber:** Navê xanekî li ser kenarê Dijleyê û nêzikê birqlînê ye. Bi navê şeter derbasê zimanê Areba bûye.

xane/m: **xew+in+e>xewine>xane:** Cihê ku tiştêkî têde hatiya bi cih kirin. Xane bi xwe sifet e, ji navê xaniyê hatiye çêkirin.

xax/n: **xwe+ax>xwax>xax:** Ew kesê ku bêkesiyên pirr giran bi ser da tîn ku ew dikeve dereca axê. Xwebûna xwe wenda dike.

xazmik/n: **xwar+zimên+ik>xazmik:** Azmanê dev ku ziman têda bicî dibe ji

didanan tê parastin.

xeberojek/m: **xeber+roj+ik>xeberojk:** Xebera ku di rojekî derbasbûyî da hatiye gotin.

xebîs : **xwe+pîs>xwepîs>xepîs:** Ew tiştê ku nefsa wî bi xwe pîs be, ne ku pîsîtiyê ji ciyekî di girtiye. Ev gotin bi tevî mana xwe derbasê zimanê Arebî bûye û di wê derê da bûye kelîmeka yekrû.

xel: **xû+a1>xel:** Ew heywana ku rengê wî yê vekiriyê belîkirî tune ye. Di rengê xweliyê da ye. Wekî ku tê gotin marê xel, yanî ew marê ku di rengê xweliyê da ye. Li hin herêman jibo van heywanê ku purtê wan yan jî çermê wan bi nûqte bin, ji wan ra jî tê gotin *xel*.

xel1a/m : **xûr+hil+a>xûrhila>xela:** Wan demên ku di wan da xwarin tê hilanîn, yanî radibe, nangiranî çê dibe, gelek caran ev tişt bi destê hinkî însanê sermayedarê çavbirçî têtê çêkirin. Ew *xelaya* ku di Dimilî da bi mana mizgînê tê xebitandin, dibe ku ew ji xelatê hatibe piçûk kirin.

xele/n: **xûr+hil+e>xûrhile>xele:** Ji ber ku genim li serê xûrekê welatê me da ci digre, navê xûrekê ku tê hilanîn jibo sal û mehên pêşîn ra, li genim hatiye danîn û navê genim bûye xele.

xelbur/m: **xwelî+bihûr>xwelbûr>xelbûr:** Ew bêjînga ku zad têda tê werdan, jibo ku xwelî têda bibûhûre here binî û tene li jor bimîne. Ev kelîme derbasê Tirkî jî bûye. Bn. Moxil.

xelmaş/m: **xew+li+maş>xewlimaş>xelmaş:** (di Kurdî ya kevin da navê *çav e*): Ew kesê ku xew di çavê wî da ye, ji bêxewêtiyê diponije.

xem/m : **xwe+hem>xem:** xwe kişandina serhev, xwe tewandin.

xeml: **xama+hil>xamahil>xaml:** Keçika xama ya ku cil û xişrê jibo xemlê û xwe ravadanê werdigre. Di nava pêvajokê da bûye navê li hevdanîn û sûs kirinê. Ev gotin dema ku jibo bûkan were xebitandin, dibe xeml û xêz. *Xêz*, li vê derê sûsa can û bedenê ye. Çewa ku *xeml*, sûsa xişir û wergirtinê ye.

xençer/m: **xun+çir>xençer:** Ew tiştê ku xunê diçirîne.

xerçeng/m: **xwar+çeng>xwarçeng>xerçeng:** Ji ber ku dest û pêyên wê xwar in, vî navî girtiye. Bi Dimilî jî wî ra tê gotin Kerekûnc. Bn. Kevcal.

xerat: navê pişekarê daran e. Ji ber ku di xebata wî da dengê “xirr” dertîne vî navî digre.

xestexane/m: tişteki ganî dema ku nexweşîkî lê peyda bibe, ew nexweşî wî ji wî halê wî yê xweş û hêsa derdixîne, weka ku wî ji bilind da bixîne, ew tiştê ganî dibe xistî (xeste). Ew cîyê ku ev nexweş û xeste têda jibo derman kirinê tê razandin, ew cî navê wî xestexane ye. Yanî xaniyê xistiyan û nexweşan e.

xew/m: **xu+hew>xew:** Însanê ku radikeve bivê nevê ji qirika wî/wê dengêki tê. Jiber ku ew deng bêdaxwaz û haya wî ji qirika wî tê, navê wî dengî li razana wî hatiye danîn.: Bn. hew.

xewn/m: **xew+în>xewn:** Ew tiştê ku di xewê da tê dîtin.

xewger: Ew merivê ku di xew da bêhayî û bayî radibe digre, çavê wî vekirî ne, lê ew di xew da ye.

xewlî/m: **xwey+hil+î>xweyhilî>xewlî:** Ew tiştê ku însan xweydanê bi wî paqîş, zuha dike û hiltîne. Ji wî ra tê gotin xewlî. Ji bo ku xweydanê di xwe da wenda bike, rûyê wî bi pirç tê çêkirin. Ji ber ku hinkî cîrax jî rûyê wan bi pirç in, ji wan ra hatiye gotin *xalî*. Hate zanîn ku xewlî di beriya xaliyê da hatiye dîtin.

xwûrîn/m: **xew+ra+în>xewûrîn:** Em dibêjin filan kes *xewirî*, ji hiş çû, jibo ku însanê xewirî dibe wek însanê razayî, em ji wî kesî ra dibêjin xewirî ye.

xewre/m: **xew+ra> xewre:** Hevîrê patîle ku qelî, penîr û toraq di nava qatê wî têne raxistin, di binê terafa agir da tê veşartin. Ji ber vê hawayê navê wê hatiye danîn *xewre*. Di hin herêman da ji xewre ra tê gotin *kade*. Di zaravaya Dimilî da ji xewre ra dibêjin *binadir* yan jî *heşe*.

xewîre/m: **xewîn+ar+e>xewîre:** Şewata bi dizî, nexûyayî, şewata kîmyayî. Wek şewata sergo û çopan ku carna ji xweber vêdikevin, alav didin.

xêlî/m: **xûya+hil+î>xûyahilî>xêlî:** Hilanîna xûyabûn û dîtina tiştêkî bi perdekirinê. Wek bûkê xêlî dikin, jibo ku çavînekî nebe.

xêz/m: Dengêkî tabîî ye. Wekî ku em serê mîxekî li ser kevîrê yan jî textekî bikşînin, ew dengê ku der dikeve bûye navê şopa serê mîxê ku li ser wê tehtê çêbûye.

xidê/m: **xwedî>xidê:** Ew kelîme ji xwedî hatiye sivik kirin. Ev tiştê ku jibo kesekî yan di herêmekî da dibe adet û ewan kesan li wî hawayê xwedî derkevin, ew hawa jibo wan *xidê* ye.

xil/m: çildana di ser valayîkî da. Bn. çil, pil, pildan.

xilîsik/m: **xûr+lê+zîk>xûrlêzîk>xilîsik:** Ew zîkê ku xwarin lê dimîne. Bi pir-ranî viya di teyrana de heye, di gelekî herêman da ji wê ra tê gotin *çîqanek*. Bi tevayî heywanê bi nûkil di dawîya qirika wan da turîkekî heye, tiştê ku ew dixûn berê li wê derê dicive ji ber vê yekê, ji wî ra têtê gotin xilîsik.

xinamî/n: **xun+hem (hev)+î>xunhemî>xinamî:** Ewan malbatê ku keçan didin hev; di nava wan da nêzikayî û merivatîkî bi vî têkiliyê çê dibe. Lewra, ewan zarokên ku ji vî merivatîyê çê bûne, xwîna wan dibe sedemê pevgirêdana du malbatan, bi xwînê.

xincîk/m: **xewn+cî+k>xewncîk>xincîk:** Di nava bexçe, bostan û rezan da ew malika ku bi çîrpî û perjika tê çêkirin jibo ewan însanên ku dixebitin, diwestin herin li wê derê bîna xwe bidin û razin. Li gelekî herêman ewan xincîkan jibo ciyê havînge têne xebitandin.

xincis/m: **xan+cis>xincis:** Navê taxekî Licê ye. Jibo ku li wê derê cis (nîşkekî kilsê) hatiye çêkirin û firotin.

xir/n: ev kelîme ji xwarê (xwarinê) hatiye sivik kirin. Tiştêkî nêr û yeka mê; wekî "somin û vîde" dema ku dindanê wan yekî evê di bixwe û hev negrin, tê gotin; ev vîde *xir* bûye. Xir, di nava zeman da bûye navê kîr (di lîteratora pêxwasan da). Jibo ku, ji adab û toreya der û dorê ra ters nekevin, di şûna kîr da xir dibêjin. Çawa ku em dibêjin mî ya beranxwarî, çêleka gaxwarî, bizîna nêrxwarî û her wekî dî. Ji ber ku di nava gel da xweş nayête dîtin, em nabêjin

- mîya kîrxwarî, çêleka kîrxwarî, bizina kîrxwarî, ...û her wekî dî. Bn. xwarin.
- xirar/m:** **xwar+ar>xirar:** Ew çîwalê ku bi qandê sê çar çîwalan bar û qût, digre. Di axlêfê da bi wan ka têtê kişandin. Ji ber vê yekê navê xirarê gelek caran bi "ka"yê ra têtê gotin. Di Dimilî da wî ra dibêjin *xeyşa*. Bn. xwarin û ar.
- xirê/m:** **xwe+rû>xîrê:** Ev kelîme ji "xwerû"yê hatiye sivik kirin; ev tiştê ku bi cûtinê, bi kutanê, bi pehtinê yan jî bi jendinê gend û gemara wî jê were avêtin, ew li xweser bimîne, ji wî ra têtê gotin; wî xirê daye, yanî ewan tiştên biyanî ku ji nava wî derketine, ew li xweser bi tenê maye. Sade û xwerû ye.
- xirêf/m:** **xirê+ve>xirêf:** Her wekî me li jor di kelîma xirê da got; tiştêkî ku ji xweser û sade bimîne, yanî gend û gemar jê veqete, ew tişt ji wî ra têtê gotin ew *xirê* ye, yanî li *xwerû* ye. Ew tiştê ku ji wî hatiye pak kirin, ji wî tiştî ra têtê gotin xirêf. Her wekî, xirêfa hingiv, xirêfa şîrê, xirêfa rûn,...
- xirtik/m:** ew merivên ku kûxika dîko (dîfterî) di wan da kar bike, dema ku ew dikûxûn dengêkî bi xirîn derdixin, ji ber vê awayê ji vê nexweşiyê ra bi devê gel têtê gotin xirtik. Dibe ku evî navî ji xeritandina porê ser nermika serî hatibe girtin. Lewra, ewan zarokên ku bi vê nexweşiyê biketana, bi ceribandînen gel hatibû dîtin ku divê tav li nermika serê wan da bide.
- xirxa1/n:** bazinê zendê lîngan. Ji ber ku hinek şîrik bi wan ve hebûn, dema ku ew kesê bi xirxa1 bi rê ve biçûya ew dengê ku ji wan şîrik û rîşikan dihat, ji wî dengî ra dihat gotin xirxa1. Ew deng, bûye navê bazinê zendê lîngan. Evan xirxalan bi tenê di lîngên hinkî malên serbêjîng da hebûn.
- xiste:** **xistî>xeste:** Ev gotin ji xistinê bûye têrker (îsmê meful). Wekî ketî, mirî, kuştî ku ji ketin, mirin û kuştinê têne çê kirin. Bi tenê xistî dema ku bibe wesfa yekî belî, dibe *xeste*. Ew tiştê zindiyê ku bi giranî û bi serda girtina hinkî tiştê ji dervayê wî, di hêza wî û şêklê wî da kêmanîkî çê bibe, têtê gotin ku ew tiştî ji ciyê xwe yê berê hatiye xistin. Lewra, ji wî tiştî ra têtê gotin *xistî*.
- xistin/m:** li gora qertafa alîkar ku li pêşîya wê têtê mana digre. Wekî, lêxistin, têxistin, pêxistin, jêxistin û vêxistin.
- xistî:** bn. Xiste.
- xişir ¹/n :** navekî ji dengê tabîî hatiye girtin. Ewan pelik û pûlikên metal ku keç û bûk bi serê xwe, kezî û gewriya xwe ve dîkin û bi vî hawayê dema ku dilivin dengêkî derdixin, ku ew bûye navê wan.
- xişir ²/n:** koma zinarê ku li hev siwarin. Ji "xişin+kerre" hatiye sivik kirin.
- xişik/m:** bn. Xîç.
- xişin:** **xîç+în>xişin.** Ev tiştê ku li gora hevalê (denkê) xwe mezintir be. Bn. Xîç.
- xişol/m:** **xîç+şo+ley>xişol:** Leya(lehî) ku qumê dişo, axê ji nava wê dibe û ewan tiştên ku sivik in, bi ser avê dikevin. Dema ku leyî dadikeve ewan tiştan di şûna leyê da li ser erdê dimînin.
- xişrûk/m:** **xiş+rû+k>xişrûk.** Ew zivîrbûna ku di rûyê zarokan da dertê, jibo ku di merivan da wek quma hûr têtê dîtin, vê navê girtî ye. Bn. xiş.
- xişt/m:** van tîrên piçukên ku bi pirranî bêkevan yanî bi dest têtê avêtin. Dema ku ew tîr têtê avêtin, di hawa da dengêkî derdixe ku ev nav jî ji wî dengî

hatiye girtin û li tîrê hatiye danîn.

xîya1/m: **xûya+al>xûya1>xîya1.** Xûya: dîtîn. Xûyayî: Ew tiştê ku bi çav têtê dîtîn. Ew tiştê ku însan bê mêzekirina bi çav, yanî mêzekirin lêgerandina bi fikrê û ew tiştê ku bi fikrê tê dîtîn, xûyakirin, ji wî tiştî ra tê gotin; aliye xûya (xûya+al > xîya1). Bn. xûya.

xizan: ev kelîme ji xwazanê wergera ye, yanî ew kesê ku karê wî xwestin be yan jî bi dîtîn û tevgerê xwe wekî însanê feqîr ê ku tişt dixwaze, bête dîtîn.

xîç (xîş)/m: navê qumê ye. Ev nav ji dengê rijandin û rêveçûna di qumê da dertê ku ev deng ji qumê ra bûye nav.

xîş /rn: qedandin û dawî anîna karekî, xebatekî. Bn. bexş, bexşîş.

xîzar/m: birreka dirangira ku bi wê qotê (qospê) mezin têne birrîn û kerî kirin. Ev nav ji dengê birrîna wê, lê hatiye danîn.

xopan/m: **xirb+ban>xopan:** Dema meriv bivê ku nepakîkî bi serê yekî da were û meriv vê daxwaza xwe bi dev bibêje, meriv dibêje: Mala te xopan (wêran) be; yanî mala te xirab be.

xort/n: *xort* û *xurt* ji xwarinê hatine çêkirin. Însanê ku xûrek be, bi pirranî ew zexm û bi hêz e, însanê genc jî bo ku zexm û bihêz e, ji wî ra jî têtê gotin *xort*. Jibo ku jihev bêtin belî kirin, “u”ya “xurt”ê dibe “o”. Xurt ku bi mana xwe gelekî fire ye; heywanê xurt, însanê xurt (serdest), dewleta xurt,...Piştî ku “u” dibe “o”, “xurt” jî dibe “xort”. Xort, di zaravayê Kurmancî da jibo gedeyên lawîn yên gihiştî tê karanîn. Bn. xwar , xwarin.

xorxor: **xwar+xûr>xorxor:** Ew kesê ku her malekî di ciyê wî da xerc neke di ciyê beyhude da xerc bike bixwe, ew wî malî di rêya xwar da dixwe. Evan kesên weha, malê wan xûrê pêxwas û serseriya ne. Ji ber vê yekê pêşiyar gotine: Malê xorxoran, xûrê çixsoran.

xu(xo-xwe): Jibo ku însan xwe bipana, bivênevê li ciyê penî û tarî digeriyan, hem ji lawiran hem jî ji vanê ku li wî serdestî û zordestî bikin xwe ji wan vedişart. Bivênevê di xew da diçûn, ew dengê ku ji qirika wî derdiket, ew kesê ku bibihîsta, ew deng jibo wan wek “xu, xo” dihate fêmkirin. Jibo ku em vî dengî baş nas bikin û bizanibin ku ev deng bi çi hawayê bûye cînavk (demîr), divê li van vekokan kûr binêrin û bifikrin: *Ez bi xo hatim. *Tû vî tiştî ji xo bipirse. *Her kes li xweser kar dike. *Fîlan kes ji xwe da çû. *Divê her kes ji keda xo bixwe. *Min xo wenda kir. *Min malê xo firot. Ev gotin di Tirkî da bi “özü, kendi”, di Arabî da bi “zat, nefis” têtê karanînê.

xur/m: du tiştên nîvsert dema ku di hev da bêne hesikandin, wek nûkuk û çerm; dema ku nûkuk di ser çerm da dihesike dengekî derdixe, ji wî dengî însan kelîma “xur”ê derdixe.

xurt/n: bn. xwar, xwarin.

xuya/m: **xu (xo)+ha>xuya:** Ew tiştê ku bi çav bête dîtîn, li ber çav be, ji wî ra têtê gotin: Xuya ye, yanî ew bi xwe “ha” (li berçav e) ye. Bn. xu (xo), ha.

xûdest: **xû+dest>xûdest:** Ew tiştê ku bi dest hatiye çêkirin (sunî ye), ne sitandart û tabîî ye, bê pîr e.

xûdî: xû+dî>xûdî: Her tiştêkî di bin navekî û şiklekî da xûkî ye, hebûneka sade û azad e. Di wê hebûna wî da nîvekar û nîfşekar û mêzekarekî wî tûne ye. Wekî ku yek bibêje: "Ev çem, Dîjle bi xwe ye." Yanî ev kelîma Dîjle, navê vê ava ku di vê wadiyê da ye, Dîjle ew bi xwe ye. Tû jî bibêjî: "Xwediyê wî kî ye?" Wekî ku tû bibêjî xûkî ew e, xû yê di kî ye? Ew jî bibêje: "Xû yê di yê wî, ev gelê ku li der û dora wî ye." Evan herdu gotinên hanê; yanî *xûyî* û *dî*, di hev da keliyane, bûne **xûdî**. Bn. xû, dî.

xûger:xû+ger>xûger: Ew tiştê ku ji xûber(xweber) bigere (otomatîk).

xûjîn: xû+jîn>xûjîn: Ew kesê ku her li pey nan, nav û karê xwe yê taybetî dibeze. Ji vî kesî ra xweperest (egoîst) jî têtê gotin.

xû1maj: xew+li+mij>xû1maj: Ew kesê ku xew zor bide wî ku mijangên wî yên jêr û jor ji hev nebin, ji wî ra têtê gotin *xûlmaj*, yanî mijangên li xewê ne.

xûratî(qûretî): xû+ra+ti>xûratî: Ew kesê ku bi gotin û tevgerên xwe, xwe mezin rava bide û bibîne.

xûrb/m: avayî ya ku hilweşe. Însanên berê bi pirranî ji kevirên ne çêkirî û ne lihev dîwar dadanyan, dema ku ev dîwar hildiweşyan, ew dengê ku di dema hilweşînê da derdiket, însan ji wî dengî kelîma *xûrbê* (*xirbê*) derdixist. Di nava zeman da tiştê ku ne rast, çewt û xwar bête dîtin, ji wî ra *xirab* têtê gotin, ku ew jî wek avayîya ku hilweşya ye, bi kêrê kar nayê. ..

xûrc/m: xûr+cî>xûrc: Bi pirranî însanê ku derdiket rêyeka dûr, hinekî xwerin û pêxwarin digel xwe digirt. Ew tura ku xwarina xwe têde bicî dikir, ji wî ra dihat gotin "xûrc", yanî ciyê xûrekê.

xûrcilîn: ev lêker ji xûrcê hatiye çêkirin. Dema ku yekî ji rêwîkî-karwankî xûrek bixwesta, ew jî ber bi xûrca xwe diçû û bi wî xûrcilya dawê ku xûrek bîne. Ji vê hawayê ra têtê gotin xûrcilîn. Bi zeman ev gotin fire bûye û di gelek îşan da têtê karanîn.

xûrifîn: xû+revin>xûrivîn>xûrifîn: Ew kesê ku xû birevîne yanî ew hawayê ku divê ew di nava wî da be, ji wî hawayê derkeve bikeve hawakî anormal; jiber gotin û tevgerên wî yên di wê rewşa anormal de, ji wî ra têtê gotin xûrifî. Ev gotin ji Kurdî derbasê Arabî bûye. Lewra, di kurdî da ev gotin, gotineka hev-dudanî (mûrekep) ye.

xûma1: xû+ma1>xûmal: Tiştê taybetî, xûsusî, li xû ser. *"Filan kes di vî malî da xûmal e", yanî bê nîvekar û nîfşekar e.

xûrû: xû+rû>xûrû: Sade. Dema ku em bixwazin bibêjin; "ev tişt bi xwe ser e, tiştê têda tune ye", wê gavê em dibêjin ev tişt xûrû ye.

xûvîn: xû+vîn>xûvîn: Ew kesê ku xwe bi der û dora xwe bide qebûlîkirin, ji wî ra têtê gotin "ew xûvîn e".

xûy/n: xû+î>xûy: Ew tiştê ku di xûzayîya (tabîîata) tiştê ganî da hebe û di nava zeman da ne gûhere, ji wî ra têtê gotin xûy. Bi kûrtî xûy, "gen" e. Bn. xo (xwe).

xûyanî/m: xû+a+hanî>xûyanî: Tiştê ku bi çav bête dîtin û bête nîşandan. *Roj di binê hewrê da vaye xûyanî ye(xûya ye jî têtê gotin).

xwar: însanê beriya medeniyetê jibo ku xûrekê bêpahtin dixwar, di dema cûtina

wan xwarinên sert da bivê nevê dengêkî ji devê wan derdiket (dengê şikandina xwarinê), ew deng bûye navê wê cûtinê û ew tiştê ku têt cûtin. Hem jî piştî cûtinê ku ew tiştê cûti di qirikê da dadiketin vêre (mîde). Ji ber ku dev li jor e û vêre jî li jêr e, navê daketina wê xwarinê li aliyê jêrîn hatiye danîn. Wekî: *Ev xwarin, di qirika min da dakete xwar. *Ji ser banê were xwar.

Ji vê xwar hatinê, ji tiştê tersê rast ra jî têtê gotin xwar. Ji ber ku, di herduyan da jî ber bi jêrî heye.

xwarin/m: **xwar+in>xwarin.** Bn. xwar.

xwelî/m: **xwe+hi1+î>xwelî:** Ew tiştê ku jixweber bi hawa da hildibe, bi pirranî ji agirê ku alaw têda hebe ew xwelî ji nava wî agirî bi rabûna germê ra bi hawa dikeve. Di nava zeman da kelîma xwelîyê fire bûye; çawa ku navê ariyê e, bûya navê axa ziwa. Bn. arî.

xwendî: ewan mêvanên ku di bûk xwestin û guhestinê de ji aliyê mala zava ve diçin mala bavê bûkê. Ji ber ku di çûyin û hatina xwe da xort û keç hinkî serhawayê govend û dîlanê dibêjin, bi tevayî ji wan ra têtê gotin xwendî. Di zaravayê Dimilî da tenê ji hemû vexwendîyan ra têtê gotin "xwendî".

xweydan/m: **xwey+dan>xweydan:** Ew xwê ya ku di can da ye dema ku av di kêzînê (çavikê) çermê can da bi derve da bikêze (bizîpîke), xwêya can jî bi wê avê ra têtê der, ji ber vê yekê, di nava can da kêmanîya xwey çêdibe. Ji vê avê ra têtê gotin "xweydan".

xwezî/m: **xwaz>xwezî:** Ev kelîme ji xwestinê ye. Xwezî, ew tiştê ku têtê pêşniyaz kirin (temenî kirin), bi dest xistina wî, zor têtê dîtin. Xwestin, ew tiştê ku bi dest xistina wî ber bi çav e. Xwezî, di nava zeman da bûye navê tukê-gilêz. Hinkî tişt hene ku bi mijulbûna ji wan û bi bîrhanîna wan, di devê însan da şilayîkî zêde çêdibe; wekî bîrhanîn yan jî dîtina tişteki tîrş. Ji wê şilayîya zêde ra têtê gotin xwezî, yanî bêdaxwaz û hayî (bi refleks) însan wî divê. Dîsa di nava zeman da ev xwezî bûye navê bêrî kirina tişteki yan jî însanekî, di şuna xwezî da xwezîla/xwezîka jî têtê karanîn.

Y-y

ya: jibo gazî daxistina li Xûdê û pêxember û herçî mezinê nedîtî: Ya Allah, ya xûdanê şev û rojan, ya xocê xizir, ya babê kal, ... Ew "yabo"ya ku kurdê cîranê Areban dibêjin; ew ji(ya ebî) ya Areban hatiye. Eger "ya" jibo "bivê-nevê"ti be, wê gavê, ji diduyan kêmtir nabe: Vî barî ya ez hildidim ya tû. ... Ya rast e, ya derew e. ... Eger "ya"ya pêşîn bikeve, "a"ya pêşîn dibe "ya" jî. Ya: Jibo pîrskirin û famkirinê ye: Tû vî îşî fam dikî ya na?

Ya û yê, gava ku di cîyê zamîra mê û nêr de werin nivîsandin, divê bi "a" û "ê" bêtin nivîsandin. Mîsal: Ev bizin ya min e/(Ev bizin a min). Ev beran yê te ye/(ev beran ê te ye).

yahî: **ya+heyî>yahî:** Teşekur kirina li hember qencyê. Jibo ku li hember qen-

ciyê bêdeng mayin, bêhawatî û nankorîye, qencîrê dangan; daxwaziya zêde-bûna serkaniya wê qencyê ye, ew daxwazî jî; gazî daxistina li hebûnê ye ku têtê gotin: Ya heyî-yahî ... her wekî têtê gotin "me kêr kir Xûdê zêde bike, ... her hebî!"

yanî-yanê: **ya+hanê-a+hanê>yahanê>yanê>yanî.** "a", demîr e. "Hanî"(D): ha+enî: Ha ev. Ev gotina ku mana wê girîft be, neye zanîn, yan jî çend maneyê wê hene, lêbelê naye zanîn ku ji wan manan kîjan hatiye girtin. Wekî ku ji te bête pirsîn; "ev kelîma Arganî û kelîma Dîyarbekir pîr girîft in, nayêtin zanîn, gelo mana wan çi ye?" Tu jî bibêjî: "Arganî: 'ar+kan+î', yanî têtê mana 'kanîya agir', lewra di wî herêmê da, jibo paxir derxistin bi hezaran sal, bi hezaran kûreyê agir hatine vexistin. Dîyarbekir: 'dîyar+bi+kir' yanî welatê bi kevir, kevirên çiyayê qerac daxê, vî navî daye wê...." Yan jî ji te bête pirsîn kelîma "dîyar", li vê derê bi çi mana ye? Tu jî bibêjî: "Dîyar", welat, anko ciyê bilind e. ...

yar-yardim: Yar: Dost. **Yardim:** **yar+ê+dem>yarêdem>yardem:** Yarê dema îdîtiyacê, alîkarî.

yarî: **yar+î>yarî:** Jibo ku di nava dost û heval û yaran da, tore û protoqol nabihûrin, hinkî gotin û tevger têne kirin ku, eger wan gotinan ji hinkî di ra bêne gotin, dê dilmayinîkî çêbe. ... Wê gavê dibe ttevz, qeşmerî. ... Ew yarîya ku ji hevaltîyê were, bi serê xwe têtê gotin. Em dibêjin: Min yarî kir. ... Ew yarîya ku ttevz be, qeşmerî be, ew bi kelîma "xwe" ra têtê gotin: "Min yarîyê xwe bi te kir."

yekane: tiştê ji hevalê xwe gelek girtir, bi hev da kelandî, yekpare. Wek kevirê hîm. Berazê kuvî jî, vî navî girtîye, jibo ku ew ji wanê kedî girtir e û xurt-tir e.

yenî: **yê+nû-nûw-new>yênû(nûw)>yenî.** Ev kelîma di zarava Dimilî da wekî "new-newe(a)" di Soranî de "nwê" têtê gotin û di gelek zimanên Hind-Awropayî da jî: new(îng.), neu(lat.), nevas(banskr.), neos(îtl.), nuevo(alm.), navah(far.), ...

yew: hejmara pêşîn ku bi Kurmanî jêra têtê gotin "yek". Ev kelîma ji "yew"ê bûye "yewik:yew+ik" û "yek". Li hinkî herêman "êk" têtê gotin, eger em qenc bifikirin, em vî dibînin ku em ji hejmara "deh û yekê" ra dibêjin "yanzdeh". Piştî ku em kelîmeya **yanzdeh:** **yew+zê+deh** jî dipişkêfin, em dibînin ku ew hatiye çêkirin ku bûye ji dehê yek zêde, yanî hejmara tek hece bi "yek" dest pê dike, di "deh" da diqede. Ji vî ev jî têtê zanîn ku, xelkê Kurd ji mêj ve li hejmarê yek reqem tek hece nav daniye.

Z-z

za: di Dimilî da têtê mana gedeyê lawîn: "Xalîza"; kûrê xal, "datîza"; kûrê ap, "biraza"; kûrê bira.... **Teyze:** **da+za>daza>teyze:** Merivatiya ji alîyê dayikê da. "Têze", xûşka dîya meriv e, ev kelîme ji Kurdî derbasê Tirkî bûye. Ewan

kelîmeyên ku merivatiyê didin zanîn û di serê wan da yan jî di dawîya wan "z" hebe, ewana bi kelîma "zê" û "zî"yê ve girêdayî ye. Mîrza: Kûrê mîr. **Za:** Jibo ravedana dereca merivatî ye bn. zê, zî.

zacil: **za+çil>zaçil>zacil:** Ew jinika ku hê çilê geda hanîna wê neqediyaya. "Çilî" jî têtê gotin. Lahosa...

zad: **za+da>zada>zad:** **1.** Ew tiştê ku bi zayîn têtê dayîn; ha bi çandin ha bi gayîn. Ew gotina ku ji Fransizî hatiye, di Tirkî de bûye "organîk madde", jibo ku bi zayînê xwe dipê, navê wê bûye "zad". ... **2.** Begzade, mîrzade, şehzade, şêxzade, ... "Zade"ya ku di dawîya navên weha da têtê, ew jî ji "za" û "da" hatine çêkirin. "Zade" û "yezîdu" ya ku di Arebî da ye, ew jî ji "za" û "da" hatine çêkirin.

zafran: **zer+av+ran>zeravran>zafran.** *Ran:* ajotin, derxistin, belavkirin. *Zafiran:* Ew tiştê ku ava zer dajo, derdixe bela dike. ... Jibo ku ew ava wî pirr tahl e, kelîma "zafiranê" bûya pîvana tahlîyê. ... Tahl e, wekî zahfiran. Bn. zirrav.

zahf: **za+hev>zahev>zahf:** Ew tiştê zahf û zêde, yanî bi hev da zaye, piranîkî têda heye, gelek e.

Zalê zer: navê bavê ristem e. Dema ku ji diya xwe bûye, por û mijank û birûyên wî zer bûne, ji ber vî, jêre gotine "zalê zer"; yanî bi rengê zer zaye. Ev sîfet; "Zalêzer", bûye navê wî. Paşê jibo sivik kirinê, "zer" hatiye avêtin maye "zal". Şêx *Sadiyê Şirazî* di kitaba *Gulîstan* da jibo "Zal" bi Farisî ev du malikan dinivîsîne:

*"Ne şûnîdî kî çî gûftî Zalî ba Rûstemî Kurd,
Dûşmûn ne tûwan haqîr û bêçarî şûmûrd."*

Kurdîya van herdu malikan:

*Zal, ji Ristemê Kurd ra çî gotîye qey tû nabînî.
Ne diriste ku tû dijmin piçûk û bêçare bibînî.*

zanpara: ... Ew kesê ku peyrevê "zî"yan e; xwarde. Bn. zî, zê.

zar: **1.** hawayê xebêrdanê. ... Filan kes zarxweş e, yanî şeklê xebêrdana wî xweş e, însan bi godarîkirina wî nayêşe. Zar, jibo "lehce" jî têtê gotin, lê divê em firetir bifikirin. ... **2. Zar:** Kirasê tenik ê tabîî. Wekî: Zara hêkê, zara kezêbê, zara mar, zara sîr û pîvazê. ...

zarava: **zar+ava>zarava:** Avabûna çend lehceyan ji yek zarî; dîyalekta zimanê kurdî.

zarîn: **zar+în>zarîn:** Zariya bigirîn; ew jî zarekî ye, zimanekî ye, bê kelîme û bêgotin e, lê jibo alîkarî xwestine.

zarok: **zar+ok>zarok:** Ew gedeyê ku hêj nû bi zar ketiye, xwe li zar dike xwedî, lê baş pêk naye. ...

zava: **za+ze+hev+a>zaheva>zava:** Ew keçika ku li dervayê mala bavê xwe bi mêr be; malîyê mala bavê wê dibêjin "zeyîyeka me li filan ciyê ye, yan jî di mala filankesî da ye..." Ve: Li vê derê tersîtiyê dide zanîn. Zava: tersê "zayî"yê ye, "zayî" jin e, tersê wî jî mêr e. Bi vî hawayê têtê zanîn ku "zava"

- ji "zayî+ve" hatiye sivikkirin. Bn. zî, zê, ve.
- zê-zî:** Navê wî tiştê ku mê, bi wî ji nêr vediqete. ... Vê çêlekê zîya xwe kirîye, ... Zê berdaye. ... Zîya wê dahatiye. ... Yanî di zemanekî nêz da ewê bizê. ...
- Zê-zî:** Navê wî ciyê ku çêlika manga di wî da tête der. ... Qey ev negelek tûhav e, hela binihêre! Jibo ku ew "zê-zî" ciyê hatina zêdebûna tiştên giyan-dar e, bi kelîmetî jî bûye mak. .. Zik, zayîn, zêde, zeyî, zava, zevî, zîl, ...
- zebeş: zer+beş>zerbeş>zebeş:** Ew tiştê belekê ku beşekî wî zer e. Di zaravayê Senedajî de "lorasî", "loranî", "henî" ye; di Hewramanî da henî û di Dimilî da jî "hindî" ye.
- zenbûr: zên+buhûr>zenbûr:** Mozbeş, dema ku bi tişteki vede ew ziya xwe dibuhûrîne wî tiştî, yanî ziya xwe têra dike. *Zenburê bi pêçîya min veda, ziya wê têda ma.
- zencir: zend+gir>zengir>zencir:** Ew tiştê ku zendan girê dide, jibo ku dîl û girtî nikanibin birevin....
- zeng-zenk: zê+nûk>zenûk>zeng:** Ewan nûkên ku bi hesin ve dizên, ... Zeng girtiye. ... Bn. zê. nûk.
- zengar: zê+nûk+ar>zenûkar>zengar:** Ew zenga pirr a ku şûna xwe xwariye. Filan tişt zengarî bûye, yanî êdî îş nabîne. Bn. zû, nûk, ar.
- zengîn: zêyîn+gihîn>zengihîn>zengîn.** Zêyîn: Pîranîya "zê" û "zî" ye. Gin, gihîn, gihîştin; bi ser hev da berhevbûna tiştan. ... Zengîn: Ew kesê ku gihîştîye tiştên ku dizên. ...
- zengurî: zengu+rê>zengurî:** Ew kesê ku tim linga wî di zenguyan da ye, û ew di rêyan da ye. Bi zeman bûye navê wî kesê ku beradayî, serserî, bê îş û kar di kuçan da bigere. Xoco ji zarokan ra dibêje: "Divê hun di vî saya(fesla) navbirê da(tatîl) zengurîti nekin." ...
- Zerdûşt** : min vê kelîmê nepîşkavtiye, jibo ku ev navê ha bi gelek şeklan di nava mîtoloji da cî girtiye, ji berîya mîladê bi sê hezar salî bigre were nêzikê mîladê. ... Yanî ji Hz. Îbrahîm dest pê dibe. ... Ew Zerdûştê ku nivîskarê Zend-Avesta ye. Îbnû-Haçerê asqelanî(nivîskarê kitaba Êbnû-hacer, şaffî) di vê kitêbê da (-mesela markirina ehlê kîtab-) dibêje ku; Zerdûşt, pêxember e, kitaba wî jî semawî ye. ... Zewicandina bi alê wê kîtabê ra dûrûst e....
- zerçik-zerçînik: zer+çînik>zerçînik>zerçik:** Ew gîyayê ku zîx dide, pele pele ye, zerik e, li kenarê kanîyên çolan da bi tevahî heye. Payîzan jî, piştî ku baran dibare, ew gîyayê yekdayê rengzerikê bejin kinik, ji binê axê zîx dide dîyar, komik bi komik.... Zerçînik: Ew gîyayê rengzerê ku rûyê zemîn dineqîşîne.
- zeraq: zerik:** Zeraqê rojê; tava zer, dema ku ro nû ji hêsuyê(ûfûq) xuya dike, yan jî diçe ava, tava wê zer dibe. ... Zeraqê rojê nû avêt, bi zeraqê rojê ra ez hatim. Ez hatim hê zeraqê rojê ji derve bû.
- zeraqe: zeraq+e>zeraqe:** Ewan pencereyên piçûkê ku di nava jorê dîwar û sivnikê qatî da dihatin çêkirin. Wan ê malan jibo roj û ronahîyê bûn, wan ê

dêr û mizgeftan jî jîbo xeml û xêzê bûn.

zerf: **zere+ve>zerv>zerf:** Di Dimilî da "zere" nava tişt e; zerey mi deceno(nava min dêşe); ez şîya zerey dewe(ez çûm nava gund). **Ve:** pêşek e, jîbo guhartina hinkî navan; **vekirin, vedan, vebûn, ...** Paşek e jîbo hinkî daçekan; **pêve, têve, ...** Zerf: tiştê nav vekirî; çiyê danîna tişt; zerfê mekan; dema bûyina îş û kar; zerfê zeman. Bn. ve.

zerûn: **zê+rû-rûyin>zerûn:** Ew çandîyê ku jî bin axê zaye hatiye rûyê axê. Çandîyê me zerun bûye. ... Eger baran bibare dê ajotî zerun bibin.

zevî: **zê+hev+î>zevî:** Şuva tovkirî, ku tovê wê jî axê zaye û hev girtiye, ew dibe "zayî û hevî". ... Zevî. Bn. devî, kevî.

zexîre: **zê+xûr+e>zêxûre>zexîre.** Zê: Ew tiştê ku bi zayîn û mirinê hebûna xwe dipê(Bn. za, ze, zi, zî, zê). Xûr: Tiştê tête xwarin. Zexîre: Ew tiştê ku dizê û tête xwarin. ...

zey: şitila mêşa hingiv hingiv piştî ku jî kewarê derdikeve. ... Em dibêjin filan kewarê "zey" daye(yanî zaye), em binêrin, li ku dêlî girêdaye.

zeyî: **zê+î>zêî>zeyî:** Wesfa keçikê ye. Ev kelîme; jî hevkela "zê" û "î"yê çêbûye û bûye navê wê, lê li gora mala bavê wê, ... Meta wê yan jî xaltîya wê dibêje "zeyî- ka" me li filan gundî heye, yanî keçika me li filan gundî bimêr e.... Ew jinika ku bi serdanî yan jî bi mêvanî here mala bavê xwe, tête gotin "ew jinika çûye zeyî". ... Bn. zê, zî.

zêlî-zelu: ew kûrmika ku jî layê dizê, jî layê çê dibe.

zêw: **zê+hev>zêhev>zêw:** Ewan çiyên ku di nava salê da çend rojê belîkirî hatine danîn jîbo hevdîtin, kêf û şênîyê.

zik: **zê+îk>zêyîk>zik:** Ew çiyê ku gede jî wî dizê, bi zeman hatiye firekirin bûye navê "zik"êş, "nav"êş. ...

zilut: **zê+rût>zêrût>zêlut>zilut:** Wekî tiştê nûzayî yê rût e. *Filan kesî malê xwe wenda kirîye, zilut bûye.

zin: cûrekî maran e.

zinpere: **zêyîn+bir+e>zinpere:** Ew aletê ku ewan tiştên zêyî (zêde) yê bi tiştêkî dî ve dibire. ...

zirav-zerav: **zer+av>zerav>zirav:** Ew kîsika ku bi kezaban ve ye û nava wî tije ava zer e. ...

zirê: **zî+ru>zirê:** Enerjîya kîmyayî. ... Bikelîne heta ku zirê bide, yanî ew tiştê ku di nava wî da weddaye; derkeve rû. Xuya bike, jî gend û gelaşê ku wî veşartine veqete. ... Carna em vî jî dibînin ku tête gotin "zirîya filan kesî çû", yanî ew dawaza ku têda hebû nema, êdî ew naxwaze.

.... Ev erdê ha; zirê têda nemaye, yanî ewan maddeyên ku çandî xwedî dikin, pêşda dixin, digihînin, ... Di vî erdî da nemane. ... Ji zirîyê ra "xirê"(xû+rû) jî tête gotin.

zirr: ev kelîme jî bazarîkirina dengê kerê hatiye girtin. Dengê kerê jî; gaz û pîvan e jîbo dengê nexweş. Ji ber vî hawayî, hinkî gotinê nerast, ne xweş, "zirr" têta pêşekiya wan; wek "zirrbab": ligor zarokên ji bavê berê, mêrê

duyemîn ê dê. Gelo kî dikare merivekî peyda bike ku ji wî ra, navê bavîtiya mêrê diya wî, ji dengê zirrîna kerê nexweştir nebe? Lê min bala xwe daye wan kesê ku zirrbavê wan hene. Zirrxesu, zirrxezur, ... Zur-zir: Di zarava Dimilî da "derew" e. Gelo zirrîna kerê û ji godarîkirina derewê kîjan hindik pîs e? ...

zîrx: ser+xû>zîrx: Ew cilê ku di şer da têtê wergirtin jibo ku can ji tîr û reman bête pan. Evan cilan bi pirranî ji hesin û ji pola têtin honan. ...

zivartin: ji+para+tin>zivartin: Ev lêker bi devê diyalekta Kurdî; zîvartin, zivirandin e. ...

zivêl: sivî+hil>sivhil>zivêl: Sênîya darîn a piçûk a nava wê vatt. ("qetek" jî têtê gotin). **Sivî:** Ew zara zad, wek genim, çelduk, ... Piştî ku di dingê yan jî cirmê da têtê kûtandin, bi zivêlê têtê dawêşandin. **Sivî;** jibo ku sivik e, hildipeke xwarê, dan dimîne li ser zivêlê. Bn. qetek.

zivir: zê+ve+rû>zêverû>zivir: Tersê hûlu, ew tiştê ku bi rûyê wî ve hinkî piruzik hebin. ... Ew qumaş zivir e, yanî rûyê wî ne duz e, zêverû ye, ... Ne hûlu ye.

zixt: zîx+tê>zîxt>zixt. Zîx(zî+ax): Ew tiştê tuj ê ku ji axê dizê, tiştê serê wî tuj, ew tiştê weha ku di cîyekî da têtê çikandin, jêre têtê gotin zixt; tê çikyayî ye.

zîndan: jîn+dan>zîndan: Ciyê danîna însanên ku hê dijîn, ne mirin e. ... Berê însanê ku suc bikira, bi piranî dihatin kuştin, tek tukê ku nehatana kuştin, bi çaleka binerd a bê kûlek û pencere da dihatin avêtin, navê wî ciyî; "jîndan-zîndan bû. Yanî ciyê danîna wan kesên ku qenciya jiyanê li wan hatiye kirin.

...

zîl: zê+hil>zêhil>zîl: Ew tiştê ku ji axê zaye û hil hatîye, bi ser dora xwe ketîye. *Hewa pirr hêwî ye, pîvazan di malê da zîl daye.

zîna: (dizî)>zî+ni>zîna: Ew nîyana ku di nava adetên gelê der û dorê da ciyê wê tûne ye, bihîstin û mijulîya wê jî, ji dîtina wî gelî ra ters dikeve. **Zîna:** dizî+ni(nîyan); nîyana bi dizî. Li vê derê "xweş-rast", meşrûneditîna gelînî ye, ne veşartin bi tenê ye. **Zîna,** ji Kurdî derbasê Arebî bûye, lewra di Arebî da ev kelîme yekrû(basîd) ye, di Kurdî da hevkel(mûrekkeb) e, hem jî di Arebî da "î" "y" têtê nivîsîn, jibo kurdîya wê "î" ye.

zîpik-zêpik: zê+pêk(bi+êk)>zêpik>zîpik: Tiştê zayî yê hevgirtî. ... Em dibêjin, "zîpikê xweydanê di enîya wî da avêtin", yanî ew ava ku ji enîya wî za bû. **Zîpik:** Ava zayî ya pêkhatî, hevgirtî.

zîrç: pîsîya heywanê yekqûl. Herçî heywanê yekqûl; ciyê ku ew têtê dizên, hêk dîkin ew di wî ciyê da dirîn jî. Ji ber vî hawayê, ji pîsîya wan ra hatiye gotin "zîrç", yanî rîtin(rîca: Cîyê rîtinê).

zîrek-jîrek: zîr+ek>jîrek>zîrek: Însanê jîr, zana û bîrhatî. ...

zîval: ji+hev+al>jiheval>zîval: Ew cilê ku her aliyê wî jihev ketîye. **Mînak:** Cilê min qetyane zîval zîval bûne.

zîx: zî+ax>zîx: Ew tiştê ku ji axê za ye. Ajotîyan zîx dane. ...

zîwan: **zî+wan>zîwan:** Navê gîyakî ye, tovê wî ji genim piçûktir e, serîkî wî binîçik e, jibo ku evan nîçikan biserê wî ve dizên, navê wî zîvan-zîwan e, yanî xwedîyê zêyîyê, zêdeyîyê. Di nîfîran da têtê gotin "tu genim bajoyî, zîwana reş hilînî."

zîyan: **zêyî+an>zîyan:** Ewan tiştên çandinî yê ku ji axê za ne, ji bin axê zîx dane, derketine jor. ... Jibo ku qut û put bi çandinî ve girêdayî bûye, çandin jî bi paleyîya mil û baskê însan û dewarên wan bûye, dema ku ew çandî bihata çêrandin yan jî bi hawakî bihata xesirandin, xwedîyê wî perîşan û şerpeze dibû. Di rewşekî wisa da dihate gotin "wî zîyan kir" yanî zîyana wî çû. ... Di nav zeman da, "zîyan" bûye navê xesarkirina di her tiştî da.

zîz: **zu+zu>zuz>zîz:** Bê firîşkî ye. *Fîlan kes zîz e, yanî zu bi zu digirî, nikane xwe ragire.

zol: Parça çermê ku zirav û dirêj e. * Min zolekî çerm peyda kirîye ez dê bikim çarox.

zul: **1.** Erdê zirav û dirêj, dîlima zirav a zebeş, xiyar, petêx û wd. **2.** Navê gîyakî yek ta yê zirav û dirêj ê bi jehr e. Gelek car heywan ku dixun pê dimirin.

zula: **zu+hil+a>zuhila>zula:** Dizîya di nav geremolê da; wekî ku çend însan dayin û sendina nava xwe jihev diqetînin, di wê navê da tişteki wenda ye, kes nizane ku kî ji wan wî tiştî hildaye. Ji vî tiştî ra têtê gotin: "Ew zula bû", yanî zu hil bû ku kesekî nedît bi ku da çû, kî hilanî, bi çi hawayê wenda bû.

zur: direw. ... bn. zirr.

WERGER Û ŞÎROVEYA DÎWANA MELAYÊ CİZÎRÎ (MELAY-İ CİZÎRÎ DÎVAN'ININ TERCÜME VE ŞERHİ)

Mamoste Qedri

DESTPÊK

Hinek helbestvanên Kurd ên dema klasik digel ku ji her alî ve mîna Kurdî di zimanê Erebi û Farisî de pîspor bûne, helbestên xwe bi zimanê xwe gotine û berhemên xwe bi zimanê xwe nivîsandine. Yek ji wan helbestvanan Cizîrî ye û yek ji wan berhemên jî Dîwana wî ye. Li gor ku seydayên me yê medresan ji me re dibêjin, di eslê xwe de helbestên ku Cizîrî gotine bi qasî 40 cildan bûne. Lê gelek heyf ku ji wan helbestan -li gor jihev cudatiya nusxeyên Dîwanê- bi tenê bi qasî 2000 malikan (125 qesîde) gihaştine roja me.

Cizîrî di Dîwana xwe de Kurdîyek pir wêjeyî bi kar anîye û cih daye gelek bêje, term û malikên Erebi û Farisî. Ji bo wî, yekê ku digel Kurdî di Erebi û Farisî de jî ne pîspor be, jê re fêmkirina Dîwanê û wergerandîna û şîrovekirina helbestên Dîwanê ne mimkûn e. Heta zanîna van zimanan jî bi serê xwe bes nîn e. Divê mirov wêjeya tesewifê, peyv û termên wê wêjeyê nas bike û digel wateyên zahirî, wateyên wan ên batîni jî fêm bike. Ji ber wî qasî ye ku heke em xebata Mela Ehmedê Zivingî jê derxînin heta niha werger û şîroveyeke têrker li ser vê

GİRİŞ

Bazî klasik dönem Kürt şairleri Kürtçe gibi Arapça ve Farsçada da her açıdan uzman olmalarına rağmen şiirlerini kendi dilleriyle söylemiş ve eserlerini kendi dilleriyle yazmışlardır. Bu şâirlerden biri Melay-i Cizîrî ve bu eserlerden biri de onun Dîvan'ıdır. Medrese alimleimizin bize dediklerine göre aslında Cizîrî'nin söylediği şiirler 40 cilt tutacak kadarmış. Fakat ne yazık ki bu şiirlerden -Dîvan nushalarındaki farklılıklara göre- sadece yaklaşık 2000 beyit (125 kaside) günümüze ulaşmıştır.

Cizîrî Dîvan'ında çok edebî bir Kürtçe kullanmış, birçok Arapça ve Farsça kelime, terim ve beyitlere yer vermiştir. Bundan dolayı, Kürtçe ile birlikte Arapça ve Farsça'da da uzman olmayanın Dîvan'ı anlaması ve şiirlerini tercüme edip şerh etmesi mümkün değildir. Hatta bu dilleri bilmek de tek başına yeterli değildir. Tasavvuf edebiyatını bu edebiyatın kelime ve terimlerini de bilmek ve zahirî anlamlarıyla birlikte bunların batîni anlamlarını da anlamak gerekir. Bunun için, Mela Ahmed-i Zivingî'ninkini hariç tutacak olursak, şimdiye kadar Dîvan'la ilgili tatminkar bir tercüme ve şerh yapılmamış diyebiliriz, ya da yapılmışsa da bilmiy-

Dîwanê derneketiye holê, an jî em pê nizanin. Ji bo tijekirina vê valayiyê me xwest ku em werger û şîroveya Dîwanê bi şiklekî hûrgilî bikin û navê xebata xwe deynin "Werger û Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî". Xebat hê devam dike. Dema ku biqede em zan dikin ku ewê bigihîje 3 cildên mezin an jî 4 cildên navincî. Beriya ku em dest bi werger û şîroveya Dîwanê bikin, em dixwazin derbarê Melayê Cizîrî, Dîwana wî, xebatên li ser Dîwanê û çend taybetiyên xebata xwe de hinek agahiyên gelemperî bidin.

Bêjeyên "Dîwan", "Mela" û "Cizîrî"

Dîwan bêjeyeke Farisî ye. Ji Farisî derbasî Erebî û hinek zimanên din bûye. Wateya vê bêjeyê ya ferhengî "şeytan" an jî "dîn" e. Li gor van her du wateyan ev bêje beriya Îslamê di dewra Sasanîyan de wekî navê katibên dewletê û cihê ku katip lê xebat dikin hatiye bikaranîn. Vê bêjeyê piştî Îslamê çend wateyên din jî kesb kirine. Yek jê defterên ku katip di wan de hesab û agahiyên fermî qeyd dikin, yek jî "pirtûka ku tevê helbestên helbestvanekî tê de tîr qeyd-kin" e. Jixwe di nav wêjekaran de gava dîwan tê gotin, ev pirtûka helbestan tê fêmkirin. Em dixwazin li jêr bi kurtî bidin diyarkirin ku gelo ji bo çi beriya Îslamê ji katibên dewletê û ji cihê xebata wan re, piştî Îslamê jî ji pirtûka helbestan re "dîwan" hatiye gotin û çi munasebet di navbera pirtûkên helbestan û defterên katiban de heye.

1) *Katibên dewletê*: Ji bo ku katib karên nivîsandinê, hesab û qeydkirinê pir xweş dizanin, ev kar çiqas zor dibin bila bibin wan bi hêsanî hal dikin, Sasanîyan ji wan re gotine "dîwan" (şeytan, cin). Paşê ev navê han ji bo defterên katiban bi kar anîne.

Bu boşluğu doldurmak için ayrıntılı bir şekilde Dîvan'ın tercüme ve şerhini yapmak ve bu çalışmamıza "Melay-i Cizîrî" Dîvan'ının Tercüme ve Şerhi" adını vermek istedik. Çalışma henüz devam etmektedir. Bittiği zaman büyük hacimli 3 veya orta hacimli 4 cildi bulacağımızı tahmin ediyoruz. Dîvan'ın tercüme ve şerhine başlamadan önce Mela- y-i Cizîrî, Dîvan'ı, Dîvan'ı ile ilgili çalışmalar ve çalışmamızın bazı özellikleri hakkında bazı genel bilgiler vermek istiyoruz.

"Dîvan", "Mela" ve "Cizîrî" Kelimeleri

Dîwan Farsça bir kelimedir. Farsçadan Arapçaya ve diğer bazı dillere geçmiştir. Bu sözcüğün sözlüksel anlamı "şeytan" veya "deli" dir. Bu iki anlama göre bu sözcük İslam'dan önce Sasanîler döneminde devlet katipleri ve çalıştıkları yerin adı olarak kullanılmıştır. Bu kelime İslam'dan sonra birkaç anlam daha kazanmıştır. Bunlardan biri katiplerin resmî hesap ve bilgileri kaydettikleri defterler, biri de "bir şairin bütün şiirlerinin kaydedildiği kitap"tır. Zaten edebiyatçılar arasında dîvan denildiği zaman bu şiir kitabı anlaşılır. Aşağıda İslam'dan önce devlet katiplerine ve çalıştıkları yere, İslam'dan sonra da şiir kitaplarına neden "dîvan" denildiğini ve katiplerin defterleri ile şiir kitapları arasında nasıl bir münasebetin bulunduğunu özetle belirtmek istiyoruz.

1) *Devlet katipleri*: Kâtipler yazı, hesap ve kayıt işlerini çok iyi bildikleri için, bu işler ne kadar zor olursa olsun onları kolayca hallettikleri için Sasanîler onlara şeytan anlamında dîvan demişlerdir. Sonra bu ismi katiplerin defterleri için kullanmışlardır.

2) *Cihê xebata katiban*: Femandarê Sasanî Kisra Enoşîrwan rojekê çûye ba katibên xwe û dîtiye ku ew xwe bi wxwe xeber didin û hinek hesaban dikin. Ji bo vî, ji wan re "dîvane" (dîn) gotiye. Bi derbasbûna zeman tîpa "e"yê ji dawîya vê bêjeyê ketiye û bi şiklê "dîwan" bûye nav ji bo cihê ku katib tê de xebat dikin.

3) *Defterê katiban*: Wekî beriya Yslamê, Piştî Yslamê ji Hizreti Emer û pêva jî di karên fermî de katib hatine wezîfedarkirin û van katiban li gor wezîfeyên xwe agahiyên aborî, civakî, siyasî, leşkerî, dîrokî û olî di hinek defteran de qeyd kirine. Ji van defteran re dîwan hatiye gotin .

4) *Pirtûka helbestan*: Ji bo ku helbestên her helbestvanekî jî wekî defterên katiban agahiyên dema xwe ya aborî, siyasî, leşkerî, dîrokî, civakî û olî mînak didin nîşandan, ji pirtûkên ku van helbestan îhtîwa dikin re dîwan hatiye gotin .

Mela Rengdêrekî Erebî ye. Derbareyê wateya wê de du ray hene: Yek jê "tîjî" ye. Lewra tê bawerkirin ku 'alim bi ilmê tîjî ne. Wateya duyemîn "efendî" an jî "rêber" e. Li gor vî, eslê bêjeyê "mewla" ye. Di derbasbûna Kurdî de tîpa "w"yê ketiye û bûye *mela*. Ji aliyê Kurdan ve ev her du wate jî pêketî ne. Çiku Kurd hem bawer dikin ku melayê wan bi ilmê tîjî ne, hem jî wan ji xwe re wekî rêber qebûl dikin. Ev bêje ku Kurd wekî "mela" bi kar tînin, di Farisî û Tirkî de bi şiklê "molla" tê nivîsandin û bilêvkin.

Bêjeya *Cizîrî* jî du qîsman pêk tê: Yek jê "Cizîr" e ku iro navçeyekî Şîrnaxê ye. Ya duyemîn jî qertafa pêwendiyê "î" ye ku ev qertaf pêwendîya ba li vê navçeyê dide diyarkirin. Eslê vî navî "Cezîre" ye. Wateya Cezîreyê di Erebî de "girav" e. Ji bo ku ji aliyê Dicle û Fîratê ve dor lê hatiye girtin, jê re bi wateya giravê hatiye

2) *Katîplerin çalîştiklari yer*: Sasanî hûkûmdarî Kisra Enûşîrwan bir gün katîplerinin yanına gitmiş ve onların kendi kendilerine konuşup birtakım hesaplar yaptıklarını görmüştür. Bunun için kendilerine "dîvane" (deli) demiştir. Zamanla "e" harfî bu kelime-nin sonundan düşmüş ve "dîvan" şeklinde, katîplerin çalîştiklari yerin adı olmuştur.

3) *Katîplerin defterleri*: İslam öncesi gibi, Hz. Ömer'den itibaren İslam'dan sonra da resmî işlerde katîpler görevlendirilmiş ve bu katîpler görevlerine göre ekonomik, sosyal, siyasal, askerî, ta- rihsel ve dinsel bilgileri bazı defterlerde kaydetmişlerdir. Bu defterlere dîvan denilmiştir.

4) *Şiir kitabı*: Her şairin şiirleri de katîplerin defterleri gibi kendi dönemlerinin ekonomik, sosyal, siyasal, askerî, tarihsel ve dinsel bilgilerini yansıttıkları için bu tür şiirleri içeren kitaplara dîvan adı verilmiştir.

Mela Arapça asıllı bir sıfattır. Anlamı ile ilgili iki görüş vardır: Birincisi "dolu" dur. Zira alimlerin ilimle dolu olduklarına inanılır. İkinci anlam "efendi" veya "rehber"dir. Buna göre kelimenin aslı "Mevla"dır. Kürtçeye geçişte "v" harfî düşmüş ve "mela" olmuştur. Kürtler açısından bu her iki anlam da uygundur. Zira Kürtler hem alimlerinin ilimle dolu olduklarına inanır, hem de onları kendilerine rehber kabul ederler. Kürtçede "mela" olarak geçen bu kelime, Farsça ve Türkçeye "molla" şeklinde geçmiştir.

Cizîrî kelimesi iki kısımdan oluşmaktadır: Biri bugün Şîrnak'ın bir ilçesi olan "Cizîr"dir. İkincisi nispet eki olan "î"dir ki, bu ek bu ilçeye mensup olmayı ifade etmektedir. Bu ismin aslı "Cezîre"dir. Cezîre Arapça'daki anlamı "ada"dır. Dicle ve Fîrat ile çevrili olmasından dolayı ki kendisine ada anlamında Cezîre

gotin Cezîre. Di eslê xwe de li gor rêzimanê Erebi navdêrên ku qalibê wan "feîle" nin, pêwendiyê wan bi şiklê "feilî" tîn. Li gor vî, kesên ku pêwendiya wan ba li "Cezîre"yê ve hatiye kirin ji wan re "Cezerî" hatiye gotin. Nivîskarên Erebi îro jî viya wekî "Cezerî" bi kar tînin. Lê nivîskarên Kurd li gorî bilêvkirina Kurdan bi şiklê "Cizîrî" bi kar tînin.

Derbarê Melayê Cizîrî

Navê Mela yê rasteqînî Ehmed, navê bavê wî Mihemed e. Du leqebê wî yê navdar hene: Yek jê "Mela" ye ku me wateya vê bêjeyê da diyarkirin. Helbestvanê me di nav Kurdan de bêtir bi vê leqebê tê naskirin. Jixwe ew jî di Dîwana xwe de bi piranî vê leqebê bi kar tîne. Ev leqeb carina bi şiklê "Melê" jî tê dîtin. Leqeba wî ya din "Nişanî" ye. Bo nimûne di malika dawîn ji qesîdeya xwe ya bi beşavenda "b" ku bi "Destê qudret.." dest pê dike wiha dibêje:

*Were nişanê Nişanî de wxu bê perde
seher.*

Tîpa "î"yê ya di dawîya Nişanî de qertafa pêwendiyê ye. Wateya "nişan"ê di Kurdî de hedef û dawer e. Li gor vî, helbestvanê me ya jibo ku xwe hedefa tîrên îşqê hesab kiriye, yan jî xwe wekî sembola îşqê ditiye vê leqeba han bi kar anîye.

Ciyê jidayikbûn û mirina Mela Cizîr e. Li gor raya ku tê tercîhkirin, nêzikî di sala 1564-an de hatiye dinê û di sala 1640-an de miriye.

Cizîrî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û xwendina xwe di medreseyan herêmê de domandiye. Wekî feqîyê din berê wî jî di medresan de îlmê Erebi û Îslamî xwendiyê. Yêcizeta xwe

denilmiştir. Aslında Arapça gramerine göre "Feîle" kalıbındaki isimlerin nispetleri "Feilî" şeklinde olur. Buna göre, "Cezîre" ye nispet edilenlere hep "Cezerî" denilmiştir. Arap yazarlar bugün de bunu "Cezerî" olarak kullanırlar. Fakat Kürt yazarlar Kürtler arasındaki telaffuza göre bu kelimeyi "Cizîrî" şeklinde kullanmaktadırlar.

Melay-i Cizîrî Hakkında

Mela'nın asıl adı Ahmed, babasının adı Muhammed'dir. İki meşhur lakabı vardır: Biri "Mela"dır ki biz bu kelimenin anlamını açıkladık. Şairimiz Kürtler arasında daha çok bu lakap ile tanınır. Zaten kendisi de Dîwan'ında çoğunlukla bu lakabı kullanır. Bu lakap bazen "Melê" şeklinde de görülür. Diğer lakabı "Nişanî" dir. Örneğin "Destê qudret.." (Kudret eli) ile başlayan "b" kafiyeyle kasidesinin son beytinde şöyle demektedir:

*Gel seher vakti Nişanî'ye perdesiz
görün.*

Nişanî kelimesinin sonundaki "î" harfî nispet ekidir. "Nişan"ın Kürtçedeki anlamı hedef ve semboldür. Buna göre şairimiz ya kendini aşk oklarının hedefi saydığı veya aşta bir sembol haline geldiğine inandığı için bu lakabı kullanmıştır.

Mela'nın doğum ve ölüm yeri Cizre'dir. Tercih edilen görüşe göre, yaklaşık 1564 yılında doğmuş ve 1640 yılında ölmüştür.

Cizîrî babasının yanında okumaya başlamış ve eğitimini yörenin medreselerinde sürdürmüştür. Diğer talebeler gibi o da medreselerde Arapça ve İslamî ilimler okumuştur. İlmî icazetini Diyarbakır çevresinde "Setrabas" adında bir köyde Molla Taha'nın yanında almış ve o yörede

ya îlmê li gundekî dora Diyarbekir bi navê "Setrabas" li cem Mela Taha girtiye û demekê li vê herêmê li gundê "Serba" melatî kiriye. Piştî melatiya xwe ya li vî gundî, çûye Heskîfê, li wê derê bi dersdanê mijûl bûye û icazet daye gelek mela. Melayê Cizîrî jî boy tehsîla edebiyatê, felsefe û stêrmasiyê çûye Bexdayê. Li wê derê jî aliyekî ve berhemên helbestî û wêjeyî yên nivîskarên Erebi û Farisan nas kiriye, jî aliyekî ve jî Erebi û Farisiya xwe pêşva biriye û gihîştîye wê derecê ku van her du zimanan jî wekî Kurdî bi pîşporî hîn bûye û êdî karîbiye wekî Kurdî bi van her du zimanan jî helbestan bibêje û berheman binivîse. Jixwe yekê ku jî serî heta dawîn li Dîwana wî binêre ew ê bi hêsanî pîşporiya wî di van her du zimanan de bibîne.

Derbarê Dîwanê

1) Ji aliyê ziman û huner ve

Di Dîwanê de diyalekta Kurmancî û bi giranî şêweya Botanî hatiye bikaranîn. Di dîroka helbesta Erebi de niqteyeke balkêş ev e, ku helbestvanên Erebi diyalekta wan çî dibe bila bibe, helbestên xwe bi diyalekta "Kureyşî" gotine. Ango xwestine di helbestê de diyalekta Qureyşî bibe diyalektekê mûsterek. Lewra beriya Îslâmê hakimiyeta aborî, bazirganî û olî di destê Kureyşîyan de bû. Em dibînin ku wêjekar û helbestvanên Kurd mîna Elîyê Herîrî, Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran jî xwestine ku Kurmanciya Botan bibe zimanê wêjeyî û helbestî. Çikû di qimên ku van helbestvanan tê de jiyanê Cizîra Botan, bi taybetî Cizîr hem jî aliyê aborî, bazirganî û civakî; hem jî ji aliyê zanistî û wêjeyî ve navendekî pir girîng bû.

Di Dîwanê de Zimanekî pir wêjeyî hatiye bikaranîn. Dîwan bi Kurdî ye lê gelek bêje û termên Erebi û Farisî jî tê de hene. Heta hinek malik bi tevayî Erebi an jî Farisî ne.

Çawa ku emê di cihê wî de jî diyar bikin, di Dîwanê de hema hema hemûyê

bulunan "Serba" köyünde imamlik yapmıştır. Bu köydeki imamlığından sonra Hasankeyf'e gitmiş, orada ders vermek ile meşgul olmuş ve birçok hocaya icazet vermiştir. Melay-i Cizîrî edebiyat, felsefe ve astroloji tahsili için Bağdat'a gitmiştir. Orada bir yandan Arap ve Fars yazarların şiir ve edebiyatla ilgili eserlerini tanımış, bir yandan da Arapça ve Farsça'sını ilerleterek bu iki dili de Kürtçe gibi uzmanca öğrenmiş, Kürtçe gibi bu iki dilde de şiirler söyleyip eserler verebilecek dereceye gelmiştir. Zaten onun Dîvan'ına baştan sona bakan kişi onun bu iki dildeki uzmanlığını rahat bir şekilde görecektir.

Dîwan Hakkında

1) Dil ve sanat açısından

Dîwan'da Kurmancî lehçesi ve ağırlıklı olarak Botan şivesi kullanılmıştır. Arap şiiri tarihinde dikkat çeken bir nokta şudur ki, lehçeleri ne olursa olsun Arap şairler şiirlerini Kureyş lehçesiyle yazmışlardır. Yani onlar Kureyş lehçesinin şiirde mûsterek bir lehçe olmasını arzulamışlardır. Çünkü İslam'dan önce iktisadî, ticarî ve dinî hakimiyet Kureyş'in elindeydi. Aliy-i Harîrî, Melay-i Cizîrî ve Fakîy-i Tayran gibi Kürt edip ve şairleri de Botan Kurmancîsinin mûsterek şiir ve edebiyat dili olmasını istemişlerdir. Çünkü bu şairlerin yaşadıkları yüzyıllarda Botan bölgesi, özellikle Cizre hem iktisadî, ticarî ve sosyal açıdan, hem de ilim ve edebiyat açısından çok önemli bir merkez idi.

Dîwan'da oldukça edebî bir dil kullanılmıştır. Dîwan Kürtçedir fakat içinde Arapça ve Farsça birçok kelime ve terim vardır. Hatta bazı beyitler tamamen Arapça veya Farsçadır.

Yeri geldiğinde de belirteceğimiz gibi Dîwan'da teşbîh, istiare, tevriye, tanasüp,

hunerên wêjeyî yên mîna teşbîh, istiare, tewriye, tenasub, intaq... bi pisporiyeke mezin hatine bikaranîn.

intak... gibi hemen hemen bütün edebî sanatlar büyük bir ustalikle kullanılmıştır.

2) Ji aliye naverokê ve:

a) *Evîn*: Helbestên Dîwanê bi giranî li ser evînê ne. Der barê ku evîna Cizîrî li ku derê dest pê kiriye û ev evîn bi tevayî mecazî ye an rebanî ye, nêrînên ji hev cûda hene. Li gor ku Zivingî ji edîbê Kurd Aladîn Secadî, ew jî ji Ebdilqadir el-Ûmadî neqil dike, dema ku Cizîrî li Heskîfê bi dersdan û perwerdekirina feqîyan mijûl bûye îşqa rebanî lê peyda bûye û vegeyriyaye Cizîrê. Li gorî Zivingî riwayetên ku di wan de tê gotin, Mela aşîqê hinek keçikan bûye û navê wan keçikan jî wekî Selma (keça mîrê Heskîfê) û Sitê (keça mîrê Cizîrê) tên dayin, ne rast in (Binêrin: Zivingî, *el-Ûqdu'l-cewherî fî şerhi Dîwani's-Şeyh el-Cezerî*, I, Destpêk). Lê li gorî me ev mimkûn e. Çikû ji ehlê tesewîfê gelek kes berê rastî îşqa mecazî bûne, paşê jî vê îşqê derbasî îşqa heqîqî bûne. Ango îşqa mecazî wan ji boy îşqa heqîqî amade kiriye. Ji evîndarên bi vî rengî re evîna mecazî bûye mîna pirê, ew di ser vî pirê re derbasî îşqa rebanî bûne. (Türk Ansiklopedisi, IV, 60).

b) *Tesewîf*: Mela yek ji ehlê tesewîfê ye. Lê ev ne tesewîfeke xwespêr û pasîfî bûye. Jixwe çawa ku Qanatê Kurdo jî neqil dike, sofîtiya berê ne mîna sofîtiya niha bûye. Sofîtiya berê bawer û tekoşîn bû, hêşyarkirina gel bû û li dijî zordestan cîgirtina li cem gel bû. (Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, rp. 92). Çawa ku em ê di cîhê wî de diyar bikin, di warê tesewîfê ya ma'newî de Mela jî mîna gelek mezinên tesewîfê felsefa "Wehdetu'l-wicûd"ê parastîye.

c) *Hestên xwebawerî*: Mela di hinek helbestên xwe de bala Kurdan kişandiye ser hebûn û dewlemendiya wan a madî û ma'newî, bi vî şiklî nexwestîye ku Kurd ji

2) İçerik açısından

a) *Aşk*: Dîvan şiirleri ağırlıklı olarak aşk üzerinedir. Cizîrî'nin aşkının nerede başladığı ve bu aşkın tamamen mecazî mi yoksa ilahî mi olduğu hususunda farklı görüşler vardır. Zivingî'nin Kürt edîp Aladîn Secadî'den, onun da Abdulkadir el-Imadî'den naklettiğine göre Cizîrî Hasankeyf'te ders vermek ve talebe yetiştirmekle meşgul olduğu sırada ilahî aşka tutulmuş ve Cizre'ye dönmüştür. Zivingî'ye göre Mela'nın bazı kızlara aşık olduğu ve bu kızların isimlerinin Selma (Hasankeyf emirinin kızı) ve Sitê (Cizre emirinin kızı) olarak geçtiği rivayetler doğru değildir. (Bakınız: Zivingî, *el-Ûqdu'l-cewherî fî şerhi Dîwani's-Şeyh el-Cezerî*, I, Giriş).

Fakat bize göre bu mümkündür. Çünkü birçok tasavvuf ehlinde aşk önce mecazî olarak başlamış, sonra bu aşktan hakîkî aşka geçilmiştir. Yani mecazî aşk onları hakîkî aşka hazırlamıştır. Bu tür aşıklar için mecazî aşk âdeti bir köprü olmuş, onlar bu köprü'nün üstünden ilahî aşka geçmişlerdir. (Türk Ansiklopedisi, IV, 60).

b) *Tasavvuf*: Mela tasavvuf ehlinden biridir. Fakat bu teslimiyetçi ve pasif bir tasavvuf değildir. Zaten Qanatê Kurdo'nun da naklettiği gibi, eski tasavvuf bugünkü tasavvuf gibi değildi. Eski sofuluk inanç ve mücadele idi, halkı bilinçlendirmek idi ve zorbalara karşı ve halkın yanında yer almak idi. (Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, s. 92). Yerinde belirteceğimiz gibi ma'nevî tasavvuf alanında diğer bir çok tasavvuf büyüğü gibi Mela da "Vahdetu'l-vücûd" felsefesini savunmuştur.

c) *Özgüven duyguları*: Mela bazı şiir-

dewlemendiyên xwe xafil bibin, hinekên
din teqlîd bikin û bikevin bin bandoran
wan. Di vê kontekstê de em dixwazin du
nimûneyan ji helbestên wî bidin:

*Ger lu'luê mensûr ji nezmê tu
dixwazî,*

*Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazê çi
hacet?*

Gulê baxê îremê Bohtan im.

Xebatên Li Ser Dîwanê

1) *Seyda û feqiyên medresan*: Li gor
ku me ji seydayên xwe yên medresa
bihîstîye helbestên ku Melayê Cizîrî
gotine nêzîke 40 cild bûye. Lê ji van
helbestan bi tenê nêzîkî 2000 malik îro di
destê me de ne ku ev jî bi saya seyda û
feqiyên me yên medresan gihastine vê
rojê. Ango beriya her kesî seyda û feqiyên
me van helbestan nivîsandine, bi dengê
we yên xweş xwendine, di nav gel de
belav kirine, bi şîklê destnivîsarî civan-
dine û piştî demeke dirêj teslîmî hinek
rojhilatzan û rewşenbîrên ku xwestine li
ser helbestên Mela û Dîwana wî xebat
bikin, kirine. Ji ber vî qasî îro rewşen-
bîrên Kurd jî wan seyda û feqiyên xwe re
çiqas sipas bikin û deyndariya xwe jî wan
re nişan bidin dîsa hindik e. Di vê kontek-
stê de li gorî me xebata yekemîn û bîngeh
li ser helbestên Cizîrî, destnivîsarên seyda
û feqiyên Kurd ên medresa û şîroveyên
wan in.

Piştî ku me ev got, em dixwazin der-
basî hinek xebatên li ser Dîwana Cizîrî
bibin.

2) *Wezîrê Nadîrî (m. 1946)*: Çawa ku
Qanatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê
"Tarîxa Edebiyatê Kurdî" de jî bal di-
kişîne ser, lêkolîn û lêgerînên li ser
Melayê Cizîrî û Dîwana wî di van salên
paşîn de dest pê kiriye. Wezîrê Nadîrî li

lerinde Kürtler'in dikkatini kendi varlık-
larına ve maddî manevî zenginliklerine
çekmiş; bu şekilde Kürtler'in kendi
zenginliklerinden gafil olmalarını ve
başkalarını taklit edip onların etkisinde
kalmalarını istememiştir. Bu bağlamda
şîirlerinden iki örnek vermek istiyoruz:

*İnci gibi dizilmiş şîirleri görmek istiyor-
san,*

*Gel Mela'nın şîirlerine bak, Şîraz'a ne
hacet?*

Botan'ın cennet bahçesinin gülüyüm.

Dîwan İle İlgili Çalışmalar

1) *Medrese hocaları ve talebeleri*:
Medrese hocalarımızdan duyduğumuza
göre Melay-i Cizîrî'nin söylediği şîirler
yaklaşık 40 cilt tutarındaymış. Fakat bu
şîirlerden sadece 2000 civarında beyit
elimizde vardır ki bunlar da medrese
hocalarımız ve talebelerimiz sayesinde
günümüze ulaşmıştır. Yani her kesten önce
bu hoca ve talebelerimiz bu şîirleri
yazmış, güzel sesleriyle okumuş, halk
arasında yaymış, el yazmaları şeklinde
derlemiş ve uzun bir süre sonra bunları
Mela ve Dîwan'ı ile ilgili çalışma yapmak
isteyen bazı oryantalist ve aydınlar teslim
etmişlerdir. Bundan dolayıdır ki bugün
Kürt aydınlar bu hoca ve talebelerine ne
kadar teşekkür etseler ve onlara karşı ne
kadar borçlu olduklarını gösterebilirler yine
azdır. Bu bağlamda bize göre Cizîrî'nin
şîirleriyle ilgili ilk ve temel çalışma, Kürt
medrese hocaları ve talebelerinin el yaz-
maları ve yorumlarıdır.

Bunu söyledikten sonra Cizîrî'nin
Dîwan'ı ile ilgili bazı çalışmalara geçmek
istiyoruz.

2) *Wezîrê Nadîrî (ö.1946)*: Qanatê
Kurdo'nun "Kürt Edebiyatı Tarihi" adlı
kitabında da dikkat çektiği gibi, Melay-i

Sovyetê di sala 1945 de li Dîwan û helbestên Cizîrî geriyaye, destnivîseke Dîwanê bi dest xistiye û hem wî hem jî hinekên ku ev destnivîsar ji xwe re wekî bingeh qebûl kirine di gotarên xwe de van helbestan bi şiklê nimûneyî wergerandine.

3) *Sadiq Bahadîn Amedî* (m. 1982): Di sala 1978 de zanyarê Kurd Sadiq Bahadîn Amedî piştî beramberkirina tekstên Dîwanê yên dema xwe nusxeyek pir hêja û orijinal derxistiye holê û çap kiriye. Sadiq Bahadîn beramberkirina xwe di navbera van nusxeyên çapkirî û destnivîsarên Dîwanê de kiriye:

- Fotokopiya Fon Hartman: Berlîn, 1904.
- Nusxeya li Stembolê, 1924.
- Dîwana ku ji aliyê Gîvî Mukriyanî ve hatiye çapkirin: Hewlêr, 1964.
- Dîwana ku di "Hawar"ê de (NN 35-58) hatiye çapkirin: Şam, 1941-1943.
- Destnivîsara Mele Tabî Bekir, Elî Wanî: Zaxo.
- Destnivîsara Enwer Mam Zaxoyî.
- Destnivîsara Mihemed Ewnî.
- Destnivîsara Mele Mihemed Botî Bizêvkî. (Binêrin: Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, çapa duyemîn, Enqere, 1992, rp. 91-93).

4) *Hejar Ebdurrehman*: "Dîwana Arifê Rebanî Şêx Ehmed Cizîrî", Tehran, 1982.

5) *Zeynelabidîn ZINAR*: Nivîskar, Dîwana Melayê Cizîrî ji tipên Erebi wergerandiye tipên Latîni; ango xebateke transkripî kiriye. Me di vê xebata xwe de ji transkripa wî jî istifade kiriye. Dîwan di nav weşanên "Fîrat"ê de der ketiye. Zinar di hinek rûpelên Dîwanê de wateya hinek bêjeyan jî diyar dike. Li gor me nivîskar hem di warê xwe yê transkripî de, hem jî di watedana hinek bêjeyên

Cizîrî ve Dîwan'ı ile ilgili araştırma ve incelemeler bu son yıllarda başlamıştır. Wezîrê Nadîrê 1945 yılında Sovyetler'de Cizîrî'nin şiirlerini ve Dîwan'ını aramış, el yazması bir nushayı bulmuş ve hem kendisi hem de bu nushayı temel alan diğer bazı kimseler makalelerinde bu şiirleri nûmûne kabilinden tercüme etmişlerdir.

3) *Sadiq Bahadîn Amedî* (ö. 1982): 1978 yılında Kürt bilgin Sadiq Bahadîn Amedî kendi dönemindeki Dîwan nüshalarını karşılaştırdıktan sonra oldukça değerli ve orijinal bir nüsha ortaya çıkarmış ve bastırmıştır. Sadiq Bahadîn karşılaştırmasını şu basılmış ve el yazması Dîvan nüshaları arasında yapmıştır:

- Fon Hartman'ın fotokopisi: Berlin, 1904.
- Istanbul'daki nüsha: 1924.
- Gîvî Muqriyanî tarafından bastırılan Dîvan: Hewlêr, 1964.
- Hawar dergisinde yayımlanan Dîwan (NN 35-58): Şam, 1941-1943.
- Molla Tabî Bekir, Ali Wanî'nin el yazması: Zaxo.
- Enwer Mam Zaxoyî'nin el yazması
- Muhammed Avnî'nin el yazması.
- Molla Muhammed Botî Bizêvkî'nin el yazması. (Bakınız: Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, ikinci baskı, Ankara, 1992, s. 91-93).

4) *Hejar Abdurrahman*: "Dîwana Arifê Rabbanî Şeyh Ahmed Cizîrî", Tahran, 1982.

5) *Zeynelabidîn ZINAR*: Yazar Melayî Cizîrî'nin Dîwan'ını Arap harflerinden Latin harflerine çevirmiştir. Yani transkripsiyona dayalı bir çalışma yapmıştır. Biz bu çalışmamızda onun transkripsiyonundan da yararlandık. Dîvan "Fîrat" yayınları arasında çıkmıştır. Zinar Dîvan'ın bazı sayfalarında bazı

Kurdî û Erebi de serfirazî nişan daye. Lê bi taybetî di watedana bêjeyên Farisî de em nikarin bêjin ku ev serfirazî hatiye nişandan.

6) *Mela Ehmedê Zivingî*: Miftiyê Qamişlo Mela Ehmedê Zivingî li ser Dîwana Cizîrî şerheke bi navê "*el-ÿqdu'l-cevherî fî şerhi Dîwani'ş-Şeyh el-Cezerî*" bi zimanê Erebi nivîsandîye. Ev xebata Zivingî ku îro di destê me de ye jî û em jî jê gelek istifade dikin, ji du cildan pêk tê. Helbestên Dîwanê di vê berhemê de li gorî Alfabe ya Erebi hatine rêz kirin. Ango Dîwan bi qesîdeyên bi qafîya "elif"ê dest pê dike û bi qesîdeyên bi qafîya "y" yê bi dawî dibe. Zivingî berê wateya bêjeyan dide, paşê jî carina bi sernava "Hasilu'l-me'na" bi kurtasî, carina jî bi sernava "*Tafsîlu'l-me'na*" bi hûngilî wateya malikan diyar dike. Lê şîrove ya Zivingî bi tenê şîrove ye zahirî ye. Ango li ser şîrove yê tesewîfî an jî batîni nasekine. Nivîskar di vî warî de wiha dibêje: "Min wate û şîrove ya bêje û malikan li gorî zahirî kiriye. Lewra kesên ku wate û şîrove ya batîni dizanin ez ne ji wan im".

7) *Mehmet EKMEN*: Ev zat ku li Farqînê wekî midurê nifûsê teqawid bûye, 80 qesîde ji Dîwana Cizîrî bi navê "Şeyh Ahmed-i el-Cezerî Dîwanî" bi şiklekî menzûmî û di qalibê "mesnevî" de wergerandiye Tirkî. Zeynelabidin ÇİÇEK, ku yek ji melayên me yê medresan e û bi xebatên xwe yê berhevî li ser helbest û berhemên Kurdî yê klasîk tê naskirin, wergera Mehmet EKMEN tashîh kiriye û di teqrîza xwe ya ku di bin de tarîxa 2003 hatiye nivîsandin wiha gotiye: "Birayê me yê mezin Mehmet Ekmen bê ku wateyê bigewurîne, Dîwan bêje bi bêje û rêz bi rêz bi şiklekî menzûmî û bi hewleke raserîn wergerandiye Tirkî". Lê em dibêjin qey Seyda ev medhên ku di teqrîza xwe de derbareyê vê wergerê

kelimelerin anlamlarını da belirtmektedir. Bize göre yazar hem transkripsiyon alanında, hem de bazı Kürtçe ve Arapça kelimelere anlam vermede başarı göstermiştir. Fakat özellikle Farsça kelimeleri anlamlandırmada bu başarı-nın gösterildiğini söyleyemeyiz.

6) *Molla Ahmed-i Zivingî*: Kamışlı müftüsü Molla Ahmed-i Zivingî, Cizîrî'nin Dîwan'ı üzerine "*el-Iqdu'l-cevherî fî şerhi Dîwani'ş-Şeyh el-Cezerî*" adıyla Arapça bir şerh yazmıştır. Zivingî'nin bugün bizim de elimizde olan ve kendisinden oldukça yararlandığımız bu şerh iki ciltten oluşur. Dîwan'ın şiirleri bu eserde Arap alfabesine göre sıralanmıştır. Yani Dîwan "elif" kafiye li kasidelerle başlamakta ve "y" kafiye li kasidelerle sona ermektedir. Zivingî önce kelimelerin anlamlarını vermekte, sonra da bazen "*Hasilu'l-me'na*" başlığıyla özet bir şekilde, bazen de "*Tafsîlu'l-me'na*" başlığıyla ayrıntılı bir şekilde beyitlerin anlamlarını belirtmektedir. Fakat Zivingî'nin şerhi sadece zahirîdir. Yani tasavvufî ve batîni şerhler üzerinde durmamaktadır. Yazar bu alanda şunları söylemektedir: "Ben kelime ve beyitlerin anlam ve şerhlerini zahire göre yaptım. Çünkü ben batîni anlam ve şerhleri bilenlerden değilim".

7) *Mehmet EKMEN*: Silvan'da nüfus müdürü olarak emekliye ayrılan bu zat, Cizîrî'nin Dîwan'ından 80 beyti "Şeyh Ahmed-i el-Cezerî Dîwanî" adıyla manzûm bir şekilde ve "mesnevî" kalıbında Türkçe'ye çevirmiştir. Merdese alimlerimizden biri olan ve klasîk Kürt şiirleri ve eserleri ile ilgili derleme çalışmalarıyla tanınan Zeynelabidin ÇİÇEK, Mehmet EKMEN'in çevirisini tashîh etmiş ve altında 2003 tarihi yazılı olan takrîzinde şunları söylemiştir: Ağabeyimiz Mehmet Ekmen anlamı değiştirmeksizin Dîwan'ı kelimesi kelimesine ve satırı satırına üstün bir gayretle Türkçeye çevirmiştir". Fakat biz Seyda'nın

dike, ji ber niyetbaşıya wî ye. Lewra her çend Kekê Mihemed di warê wezn û qafiyyê de gelek serfîraz bûye, lê ji wateya bêje û termên malikan pir dûr ketiye û hinek bêje û wateyên ku tu pêwestiyeke wan bi bêje û termên malikan tuneke sîrf ji boy wezn û qafiyyê bi kar anîne. Ji bilî şaşiyên transkripî û rêzimanîyên di orijînalê Dîwanê de tîn dîtî, di wergerê de jî gelek çewtiyên wateyî hene. Li gor me, yek ji sedemên van çewtiyan nehakimbûna Birayê Mihemed li ser zimanê Erebi û Farsî ye ku ew jî di vî warî de bi kurtasî wiha dibêje: “Min çend caran Melayê Cizîrî di xewa xwe de dît. Ez çûm Cizîrê û min merqeda wî ziyaret kir. Min gohdariya helbestên wî kir, min wateya wan ji melayên Cizîrê, Diyarbekirê û Farqînê pirs kir û min vê wergera menzûmî derxist holê.

8) *Xebata me*: Piştî balkişandina ser xebatên binavkirî, em dixwazin hinek taybetiyên xebata xwe bi kurtasî wiha diyar bikin.

1) Werger û şîrove bi du zimanan hatiye kirin: Kurdî û Tirkî.

2) Di xebatê de van her du sernavan hatine bikaranîn:

a) *Wergera Serkî*: Me çend riste qeyd kiribin, di bin vê sernavê de berê me wan risteyan bi serkî, angî bi şiklê bêjeyî û zahîrî wergerandiye.

b) *Ziman û Huner*: Di bin vê sernavê de bêje û termên risteyan ji aliyê ziman û huner ve hatine şîrovekirin.

çeviri ile ilgili takrizinde yaptığı bu medihlerin onun hüsn-i niyetinden olduğunu düşünüyoruz. Çünkü Mehmet ağabey her ne kadar vezin ve kafiye alanında başarılı olmuşsa da, vezin ve kafiye uğruna kelime ve terimlerin gerçek anlamlarından oldukça uzaklaşmış ve beyitlerin kelime ve terimleriyle hiçbir ilgisi olmayan bazı kelime ve anlamları sadece vezin ve kafiye için kullanmıştır. Dîwan'ın orijinalinde görülen transkripsiyon ve dilbilgisi hatalarından başka çeviride de birçok anlamsal yanlışlıklar vardır. Bize göre bu yanlışların sebeplerinden biri Mehmet ağabeyin Arapça ve Farsçaya hakim olmamasıdır ki kendisi de bu alanda özetle şunları söyler: Ben birkaç kez Melay-i Cizîrî'yi rüyamda gördüm. Cizre'ye gittim ve türbesini ziyaret ettim. Şiirlerini dinledim, anlamlarını Cizre, Diyarbakır ve Silvan alimlerinden sordum ve bu manzûm çeviriyi ortaya koydum.

8) *Bizim çalışmamız*: Adı geçen çalışmalara dikkat çektikten sonra, çalışmamızın bazı özelliklerini kısaca şöyle belirtmek istiyoruz.

1) Çeviri ve şerh iki dilde yapılmıştır: Kürtçe ve Türkçe.

2) Çalışmada şu iki başlık kullanılmıştır:

a) *Yüzeysel Tercüme*: Kaç dize kaydetmişsek, önce bu başlık altında bu dizeleri yüzeysel, yani sözcüksel ve zahîrî bir şekilde çevirdik.

b) *Dil ve Sanat*: Bu başlık altında dizelerin kelime ve terimleri dil ve sanat açısından açıklanmıştır.

QAFIYA ELÎFÊ, QESÎDA YEKEMÎN (ELÎF KAFİYESİ, BİRİNCİ KASÎDE)

*Newâya mutrib û çengê, fixan avête Xerçengê
Were saqî heta kengê, neşoyîn dil ji vê jengê
Heyata dil meya baqî, binoşin dâ bi muştaqî
Elâ yâ eyyuhe's-saqî, edir ke'sen we nawilha*

Wergera Serkî

- 1) Dengê stranbêj û çengê, zarîn gihaşt birca Kevjalê.
- 2) Saqî were heyanî kengê, em ê dil neşon ji vê zengarê?
- 3) Jiyana dil şerava bermayî (an jî kevnesale) ye, haydê vexwin bi bijî.
- 4) Hişyar be saqiyo! Bigerîne û dirêj bike şûşeke şeravê ya tijî.

Ziman û Huner

Risteya yekemîn
Newâ deng, meqam, stran
-y tîpa kelijandinê
-a veqetandeka ravekê
mutrib stranbêj, sazband, murîd
û gihanek
çeng sazeke jîdar
-ê veqetandeka binavkirî

Wateya newâyê deng e. Lê di lîteraturê Îranî de bi wateya meqam û stran jî tê. Bo nimûne di raveka "Newâ-yi Xusrewanî" de ev bêje ji bo strana ku stranbêj Barbed di meclisa Xusrew Perwîz de strandiye tê bikaranîn.

Yüzeysel Tercüme

- 1) Şarkıcıyla harbin sesi, çılgılık ulaştı Yengeç burcuna feryattan.
- 2) Gel saqî! Daha ne zamana kadar yıkamayacağız kalbi bu pastan?
- 3) Haydi için iştah ile, kalbin hayatı arta kalmış (ya da yıllanmış) şaraptır.
- 4) Uyan sakî! Dolu bir şarap kadehini uzat ve dolaştır.

Dil ve Sanat

Birinci dize
Newâ ses, makam, şarkı
-y kaynaştırma harfî
-a tamlama eki
mutrib şarkıcı, çalgıcı, mürit
û bağlaç
çeng harbe benzeyen bir çalgı
-ê belirlilik takısı

Newânın anlamı sestir. Ancak İranî literatürde makam ve şarkı anlamına da gelir. Örneğin "Newâ-yi Husrevanî" tamlamasında bu kelime, sanatçı Barbed'in Husrev Pervîz'in meclisinde okuduğu şarkı için kullanılmaktadır.

Mela di kurdîkirina bêjeyên ku ne Kurdî ne, têra xwe pîspor e. Newâ yek ji wan bêjeyan e. Ji bo ku di Farişî de zayendî tune ye, her ravebera ku di dawîya wê de tîpek dengdêr heye her dem veqetandeka "-i"yê digire. Bo nimûne bêjeya newâ dibe "newâ-yî". Lê di Kurdî de digel jimara raveberê, nêrbûn û mêbûna wê jî endaz e. Ji bo ku newâ di Kurdî de yekeymar û mê ye, veqetandeka ravekê ya yekeymar û mê (-a) girtiye û bûye "newâya".

Mutrib di wêjeya tesewifê de gelek caran ji bo murîdê ku dikeve cizbeya eşqa xwedayî û fixan dike tê bikaranîn.

Di wêjeya tesewifê de ev çar perçeyên çengê bal dikişînin: Têlên hevrişim, dara tûyê, postê xezalê, dûvê hespê. Lewra ev çar perçe, van çar hêmanên giring yên tesewufê diqulqulînin: Şerî'et, terîqet, me'rîfet, heqîqet.

<i>fixan</i>	qîrîn, feryad, axîn
<i>avête</i>	gihaşt, çû
<i>xerçeng</i>	birca Kevjalê
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî

Fixan di wêjeya tesewifê de bi gelemperî ji bo qîrîna bi axîn tê bikaranîn. Sedema herî giring a vê axînê, negihîştina yarê ye.

Di wêjeya tesewufê de 12 meqamê muzîkê, beramber bi 12 bircan û 24 saetên rojê tîrî ramandin. Ji boy vî, divê stranên evînê li gorî her bîr û saetekê bi meqamên diyarkirî bîr xwendin.

Risteya duyemîn

<i>Were</i>	raweya fermanî
<i>saqî</i>	pêşkêşkerê şeravê; mürşid
<i>heta</i>	heyânî.. heya..
<i>kengê?</i>	çi demê? çi wextê?

Heke meyxane wekî tekya û stranbêj wekî murîd bê ramankirin, saqî jî wekî mürşid tê qebûlîrîn.

Mela Kürtçe olmayan kelimeleri Kürtçeleştirmedi oldukça uzmandır. Newâ, o kelimelerden biridir. Farsçada cinslik olmadığı için, sonunda sesli bir harf olan her tamlanan, her zaman "-i" ekini alır. Örneğin newâ kelimesi "newâ-yî" olur. Kürtçe'de ise tamlananın sayısıyla beraber, erillik ve dişillik de ölçüdür. Newâ Kürtçede tekil ve dişil kabul edildiği için, tekil ve dişillik tamlama eki olan "-a" yı almış ve "newâya" olmuştur.

Mutrib tasavvuf edebiyatında çoğu kez ilahî aşkın cezbisine kapılıp çılgılık atan "mürît" için kullanılır.

Tasavvuf edebiyatında çengin şu dört parçası dikkat çekmektedir: İpek tel, dut ağacı, ceylan derisi, at kuyruğu. Zira bu dört parça, tasavvufun şu dört önemli unsurunu çağrıştırmaktadır: Şeriat, tarikat, marîfet, hakikat.

<i>fixan</i>	çılgılık, feryat, âh çekme
<i>avête</i>	ulaştı, gitti
<i>xerçeng</i>	Yengeç burcu
<i>-ê</i>	belirlilik takısı

Figân tasavvuf edebiyatında genellikle âh çekilerek atılan çılgılık için kullanılır. Bu âh çekmenin en önemli nedeni sevgiliye kavuşamamaktır.

Tasavvuf edebiyatında mûsikînin 12 makamı, 12 burca ve günün 24 saatine karşılık olarak düşünülmektedir. Bunun için, aşk şarkılarının her burç ve saate göre belli makamlarla okunması gerekir.

ikinci dize

<i>Were</i>	emir kipi (gel)
<i>saqî</i>	içki sunan; mürşit
<i>heta</i>	-e kadar, -a kadar
<i>kengê</i>	ne zaman?

Meyhane dergâh, şarkıcı da mürît olarak düşünülürse, sakî de bir mürşit olarak kabul edilir.

neşoyîn neşon
dil dil, qelb
ji pêşdaçek
vê rengdêra îşarkî ya tewandî
jeng zengar, zeng, qirêj; guneh
-ê veqetandeka binavkirî

neşoyîn yıkamayacağız
dil kalp, gönül
ji önedat (-den, -dan)
vê bükümlü işaret sıfatı (bu)
jeng pas, kir, günâh
-ê belirlilik takısı

Dil, navenda tesîra evînê ya hem erênî hem jî neyînî ye. Yar wekî padişah, beden wekî memleket, dil jî wekî paytextê ku padişah lê fermandarî dike tê qebûlkinin. Mela her car bal dikişîne taybetiyeke dil. Em ê her taybetiyê di ciyê wê de diyar bikin. Bo nimûne li vir, ango di rista duwemîn de bal dikişîne dilê xwe yê ku ji gunehan zengar girtiye. Ji bo ku dilê xwe ji vê zengarê paqij bike, ji murşid dixwaze ku şerava evîna xwedayî pêşkêşê wî bike.

Kalp, aşkın hem olumlu hem de olumsuz etkisinin merkezidir. Sevgili padişah, vücut memleket, kalp ise padişahın hüküm sürdüğü başkent olarak kabul edilir. Mela her seferinde kalbin bir özelliğine dikkat çekmektedir. Biz her özelliği kendi yerinde açıklayacağız. Örneğin burada, yani ikinci dizede günâhlardan pas tutan kalbine dikkat çekmektedir. Kalbini bu pastan temizlemesi için mürşitten kendisine ilahî aşk şarabı sunmasını istemektedir.

Risteya sêyemîn

heyat jiyan, jîn
-a veqetandeka ravekê
dil dil, qelb
mey şerava tîrî
-a veqetandeka ravekê
baqî bermayî an jî kevnesele
binoşîn vexwin
dâ daçeka pêşniyaziyê
bi pêşdaçek
muştâq bijî, miçêz, kêf
-î qertafa hevoka rewşîn

Risteya çaremîn

Ev riste bi tevayî Erebi ye.

ela daçeka heşyarkirinê
ya daçeka banglêkirinê, baneşan
eyyuhe kesê(n)

Li gor rêzimanê Erebi hege denglêkirî nêr be û di serî de "el" (qertafa binavkirî) hebe, di navbera daçeka banglêkirinê û denglêkirî de "eyyuhe" tê bikaranîn.

Üçüncü dize

heyat yaşam, hayat
-a tamlama takısı
dil kalp, gönül
mey üzüm şarabı
-a tamlama takısı
baqî arta kalan ya da yıllanmış
binoşîn içiniz!
dâ teklif edatı
bi önedat (ile)
muştâq iştah, keyif, arzu
-î durum zarfı eki

Dördüncü dize

Bu dize tamamen Arapça'dır.

ela uyarı edatı.
ya seslenme edatı, ünlem
eyyuhe kimse(ler)

Arapça dilbilgisine göre eğer ünlenen eril olursa ve başında "el" (belirlilik takısı) bulunursa, seslenme edatı ile ünlenen arasında "eyyuhe" kullanılır.

saqî pêşkêşkerê şeravê; murşid
edir bigerîne
ke's şûşa şeravê ya tijî
-en tenwîn, bi wateya "yek"
we û (gihanek)
nawil dirêj bike, bide.
-ha wê (di Erebî de cînavkek
pêvebest yekejmar û mê)

saqî sakî, içki sunan; mürşit
edir dolaştır
ke's dolu şarap kadehi
-en "bir" anlamında tenvîn
we ve (bağlaç).
nawil uzat, ver.
-ha: onu (Arapça'da tekil ve
dişil bitişik zamir)

Hunerê tezmîn

Mela rista çaremîn ya ku bi tevayî Erebî ye ji Hafîzê Şîrâzî, wî jî ji Yezîdê kurê Muawiye girtiye. Heke helbestvanek di nav helbestek xwe de malîkek an jî risteyek helbestvanekî din bikar bîne, di wêjeyê de jê re tê gotin *tezmîn*.

Tazmîn sanatî

Mela tamamî Arapça olan dördüncü mısrayı Hâfız-i Şîrâzî'den, o da Muâviye'nin oğlu Yezid'den almıştır. Bir şâir başka bir şaire ait bir beyti veya mısrayı kendi şiiri içinde kullanırsa, edebiyatta buna *tazmîn* denir.

Hunerê tenâsub

Tenâsub, hunerê bikaranîna du an jî bêtir bêjeyên ku di navbera wan de têkilî heye ye. Di risteka yekemîn de meqam, stran, û çeng; di ristekên din de jî bêjeyên saqî, şerav, vexwarin û şûşe bi hev re hatine bikaranîn.

Tenâsüp sanatî

Tenasüp, aralarında ilgi bulunan iki veya daha fazla kelimeyi kullanma sanatıdır. Birinci dizede makam, şarkı ve çeng; diğer dizelerde de sakî, şarap, içmek ve kadeh kelimeleri birlikte kullanılmıştır.

*Ku katib dîmê cedwel kit, şikeste xet muselsel kit
Ji yek herfan mufesel kit, kî ye vê muşkilê hel kit
Dizanî rûd û ûd ewel, çi tavêtin surûd ewel
Ki îşq asân nimûd ewel, welê uftadî muşkilha*

Wergera Serkî

1) Heke katib rû (yê yarê) rastek bike, xetên şikestî yekpare bike,

Yûzeyse Tercûme

1) Eğer kâtip yarin yüzünü cetvelle çizirse, kırık hatları bitştirirse.

2) Tîpan ji hev cuda bike, kî ye ê ku vê pîrsgirêkê çareser bike?

3) Tu dizanî ku saz û ûd berê kîja stranê dibêjin?

4) (Dibêjin) "Evîn berê hêsan xwiya kir, lê paşê pîrsgirêk der ketin".

2) Harfleri birbirinden ayırırsa, kimdir bu problemi çözen kimse?

3) Biliyor musun ki saz ve ûd önce hangi şarkıyı söylüyorlar?

"Aşk önce kolay göründü, fakat sonra problemler çıktı" diyor.

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

ku heke, ger; dema ku.
katib nivîsyar, wênesaz; Xweda
dîm rû, serçav, dêm (gelpik)
-ê veqetandeka binavkirî
cedwel kit rastek bikit / bike

Katib di wêjeya tesewifê de ji bo Xwedayê ku sûretê herî rind daye tiştan tê bikaranîn. Di vê bêjeyê de rûyê yarê bi kaxezê katiban û tabloyên wênesazan tê teşbihkirin. Ji bo nişandana ku kar pêtepêdayî hatiye kirin, rastek wekî aksesuarek tê bikaranîn. Ango çawa ku katib û wênesaz gava bixwazin li ser kaxezekî an jî li ser tabloyekê nivîs û wênayên rind çêkin vî karî bi pênuş û risteyên hunerî dikin; li gor hozan Xweda jî gava yara wî afirandiye di şikildana rûyê wê de qelema xwe ya qudrêtê bikariye.

muselsel xet şikeste xet, xetên şikestî
muselsel kit yekpare bike

Ji destpêka Îslamê heta niha şeş cûre xet hatine bikaranîn. Yek ji wan şikeste, yek jî muselsel e. Xetên şikeste ku jê re "şikeste ta'lik" jî tê gotin, di sedsala XI / XVII de di dewra Sefewîyan de derketiye holê. Ji bo ku tîpên ku di xetên din de bi hev ve nayên zeliqandin jî di van xetan de bi heve tîpên zeliqandin, xwendina wan zor e. Lê xetên muselsel, yekpare û zelal in; xwendina wan hêsan e.

Dil ve Sanat

Birinci dize

ku eğer, şayet; -dığı zaman
kâtib yazar, ressam; Allah
dîm yüz, surat, yanak
-ê belirlilik takısı
cedwel kit cetvellerse

Tasavvuf edebiyatında kâtib, eşyaya en iyi şekli veren Allah için kullanılır. Bu edebiyatta yarin yüzü kâtiplerin kâğıtlarına veya ressamların tablolarına benzetilir. Işın özenli yapıldığını göstermek için cetvel bir akseuar olarak kullanılır. Yani nasıl ki katip ve ressamlar bir kâğıt veya tablo üzerinde güzel yazı veya resim yapmak istedikleri zaman bu işi sanatsal kalem ve cetvellerle yapıyorlarsa; şaire göre Allah da onun sevgilisini yarattığı zaman yüzünü şekillendirmek için kudret kalemini kullanmıştır.

muselsel xet kırık hatlar
muselsel kit yekpare yaparsa

İslam'ın başlangıcından bugüne kadar altı çeşit hat kullanılmıştır. Onlardan biri şikeste, biri de muselsel hattır. "Şikeste ta'lik" adı da verilen şikeste hat, XI / XVII. yüzyılda Safevîler döneminde ortaya çıkmıştır. Diğer hatlarda bitişmeyen harfler de bu hatlarda bitştirildiği için okunması zordur. Fakat muselsel hat yekpare ve açıktır; okunması kolaydır.

Risteya duyemîn

<i>ji yek</i>	ji hev
<i>herfan</i>	tîpan
<i>mufessel kit</i>	cuda bikit, veqetîne
<i>kî ye?</i>	çi kes e? kîja ye ?
<i>vê mûşkilê</i>	vê pirsgirêkê
<i>hel kit</i>	çareser bike

Li gor helbestvan rûyê yara wî û bisk û porê ku bi ser rûyê wê de hatine berdan mîna tîp û xetên ku xwendina wan hêsan e; lê wateya wan kûr e û şîroveya wan pirsgirêk e.

Risteya sêyemîn

<i>dizanî?</i>	tu dizanî?
<i>rûd</i>	saz
<i>û</i>	û
<i>ûd</i>	ûd
<i>ewel</i>	berê, di destpêkê de
<i>çi?</i>	kîja?
<i>tavêtin</i>	dibêjin.
<i>surûd</i>	meqam, stran, merş

Surûd di eslê xwe de navê meqamekî muzîkê ye ku ev meqam ji aliye stranbêj Nigîsa hatiye dîtin. Nigîsa bi vî meqamî gelek stran di meclîsa Xusrew Perwîz de gotine. Lê niha ev bêje bêtir bi wateya stran û merş tê bikaranîn

Bersîva pîrsa "tu dizanî ku saz û ûd kîja stranê dibêjin?", risteya jêr e:

<i>ki îşq</i>	ku evîn
<i>asan</i>	hêsan
<i>nimûd</i>	xwiya kir
<i>ewel</i>	berê, di destpêkê de
<i>welê</i>	lê, lê belê
<i>uftadî</i>	der ket holê, çê bû
<i>muşkil</i>	pirsgirêk.
<i>-ha</i>	di Farisî de qertafa pirrjimariyê

Ango saz û ûd dibêjin ku evîn di destpêkê de hêsan xwiya kir; lê paşê gelek pirsgirêk der ketin holê ku ew di hesab de tune bûn.

İkinci dize

<i>ji yek</i>	birbirinden
<i>herfan</i>	harfleri
<i>mufessel kit</i>	ayırır
<i>kî ye?</i>	kimdir? hangisi?
<i>vê mûşkilê</i>	bu problemi
<i>hel kit</i>	çözer, çözebilir

Şaire göre sevgilisinin yüzü ile yüzüne dökülen saç ve zülûfler, okunuşları kolay fakat anlamları derin ve açıklanmaları problem olan harf ve yazılar gibidir.

Üçüncü dize

<i>dizanî?</i>	biliyor musun?
<i>rûd</i>	saz
<i>û</i>	ve
<i>ûd</i>	ûd
<i>ewel</i>	önce, başlangıçta
<i>çi?</i>	ne? hangi?
<i>tavêtin</i>	diyorlar
<i>surûd</i>	makam, şarkı, marş

Surûd aslında sanatçı Nigîsa tara-fin-dan bulunan bir makam adıdır. Nigîsa bu makamla Husrev Pervîz'in meclisinde çok sayıda şarkı söylemiştir. Ancak bugün bu kelime daha çok şarkı ve marş anlamında kullanılmaktadır.

"Saz ve ûdun önce hangi şarkıyı söylediklerini biliyor musun?" sorusunun cevabı aşağıdaki dizedir:

<i>ki îşq</i>	ki aşk
<i>asan</i>	kolay
<i>nimûd</i>	göründü
<i>ewel</i>	önce, başlangıçta
<i>welê</i>	fakat, ancak
<i>uftadî</i>	ortaya çıktı
<i>muşkil</i>	problem
<i>-ha</i>	Farsçada çoğul eki

Yani saz ve ûd aşkın başlangıçta kolay görüldüğünü, ancak sonra hesapta olmayan çok sayıda problemin ortaya çıktığını söylüyorlar.

Hunerê intâq (peyvandin)

Întâq, ji peyvandina heyînên ku qabiliyeta wan a axaftinê tune re tê gotin. Lewra þair di risteya duyemîn û sêyemîn de rûd û ûd dide axaftin.

Intâk (Konuşturma) sanatı

Întâk, konuşma yeteneği olmayan varlıkları konuşturmaya denir. Zira şâir ikinci ve üçüncü mısra da rûd ve ûdu konuşturuyor.

*Ji mihra wê şefeq Se'dê, şîrîn le'la şeker we'dê
Dinalim şubhetê re'dê, ' ecîbim lê ji vê ce'dê
Ki dil ra tab-i her çîneş, bi kufre mîbured dîneþ
Ji tab-i ce'd-i muşgîneş, çi xwûn uftadi der dilha!*

Wergera Serkî

- 1) Ji evîna yara wek stêrka Se'dê ronî, lêvşêrîn û xeberxweş,
- 2) Dinalim mîna xurmîna asiman, ji ber vî porê badayî ez mame şaş.
- 3) Lewra ronahiya her tayek porê wê dil dibe kufre û der dixê ji dîn,
- 4) Ji ber ronahiya porê wê yê badayê bi misk, dikeve qelban gelek xwîn.

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

<i>ji</i>	pêşdaçek
<i>mihr</i>	evîn, şefqet
<i>-a</i>	veqetandeka ravekê
<i>wê</i>	rengdêra îşarkî ya tewandî
<i>şefeq</i>	spêde, ronî, şewq.
<i>Se'd</i>	Stêrka Biyom.
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî
<i>şîrînle'</i>	lêvşîrîn
<i>-a</i>	veqetandeka binavkirî
<i>şekerwe'd</i>	xeberşekir, xeberxweş
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî

Di stêrnasiya berê de bi çavê biyomî û bêyomî jî li stêrk û gerstêrkan hatiye nêrîn. Bo nimûne ji Gelawêjê (Venus) re

Yûzeyssel Tercüme

- 1) Sa'd yıldızı gibi parlak, tatlı dudaklı ve şeker sözlü yarin aşkından,
- 2) İnliyorum gök görüldüsü gibi, şaşırdım onun kıvrıcık saçından.
- 3) Zira saçının her telinin parlaklığı, kalbi küfre itip dinden çıkarıyor,
- 4) Misk kokulu kıvrımlı saçının parlaklığından kalplere nice kanlar giriyor!

Dil ve Sanat

Birinci dize

<i>ji</i>	önedat (-den, -dan)
<i>mihr</i>	aşk
<i>-a</i>	tamlama eki
<i>wê</i>	bükümlü işaret sıfatı (o)
<i>şefeq</i>	parlak
<i>Se'd</i>	Uğurlu Yıldız
<i>-ê</i>	belirlilik takısı
<i>şîrînle'</i>	tatlı dudaklı
<i>-a</i>	belirlilik takısı
<i>şekerwe'd</i>	şeker sözlü, hoş sözlü
<i>-ê</i>	belirlilik takısı

Eski astrolojide yıldızlara ve gezegenlere uğur ve uğursuzluk gözüyle de bakılmıştır. Örneğin Venüs'e Küçük

Biyoma Piçûk; ji Bercîsê (Jupiter) re Biyoma Mezin; ji her duya bi hev re jî Du Biyom hatiye gotin.

Stêrnasên berê hinek qarakter û taybetî jî dane stêrk û gerstêrkan. Helbestvanên tesewifê gava yarên xwe bi wan stêrk û gerstêrkan teşbîh dikin, qarakter û teybetiyê wan jî didin ber çavan. Bo nimûne "Se'da Piçûk" qarakterên rindî, nermî, tenikî, muzîk, stran û evînê temsîl dike. Zanist, şermî, hiş û xeberxweşî jî qarakterên "Se'da Mezin" in. Jixwe Cizîrî jî bi bêjeyên "mihr" (evîn) û "şekerwe'd" (xebexweş) bal dikişîne du heb qarakterên Se'dê. Ango yara wî mîna Se'dê bedew, ronî, şermîn, xwediyê hiş û zanist e; xeberxweş e.

Risteya duyemîn

<i>dinalim</i>	axîn dikim
<i>şubhetê</i>	mîna, wekî
<i>re'd</i>	xurminas asiman
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî

Nalîna helbestvanên tesewifê axîna wan e. Ev axîn jî gelek caran bi xurmîna asiman tê teşbîhkirin. Ango çawa ku xurmîna asiman pirê caran piştî çirîsk û birûskan pêk tê, her wiha axînen evîndaran jî piştî agirê evîna dilê wan pêk tên.

<i>'ecîbim</i>	şaşwaz im; heyirî me
<i>lê</i>	welê, lê belê
<i>jî</i>	pêşdaçek
<i>vê</i>	rengdêra îşarkî
<i>ce'dê</i>	porê xirpûşkî, gungilî

Di wêjeya tesewifê de gava porê yarê bi xirpûşkî û badekbûn bê vesifkirin, teşbîha wî bi lavlavkê tê kirin. Ango çawa ku lavlavk li kîjan darê bihalê wê hişk dike, her wiha porê yarê jî qelbê evîndar pûç û hişk dike.

Uğurlu; Jüpiter'e Büyük Uğurlu; ikisine İki Uğurlu denmiştir.

Eski astrologlar yıldızlara ve gezegenlere bir takım karakterler de vermişlerdir. Tasavvuf şairleri sevgilerini o tür yıldız ve gezegenlere benzettikleri zaman onların karakter ve özelliklerini de göz önünde bulundururlar. Örneğin "Küçük Uğurlu" güzellik, yumuşaklık, müzik, şarkı ve aşkı temsil eder. İlim, utangaçlık, akıl ve hoşsözlülük ise "Büyük Uğurlu"nun karakterleridir. Zaten Cizîrî de "mihr"(aşk) ve "şekerwe'd" (şeker sözlü) kelimeleri ile Se'd'ın iki karakterine dikkat çekmektedir. Yani sevgilisi de Se'd gibi güzel, parlak, utangaç, akıllı, bilgili ve hoş sözlüdür.

İkinci dize

<i>dinalim</i>	ah çekerim
<i>şubhetê</i>	gibi, misali
<i>re'd</i>	gök gürültüsü
<i>-ê</i>	belirlilik takısı

Tasavvuf şairlerinin inlemesi ah çekmeleridir. Bu ah çoğu zaman gök gürültüsüne benzetilir. Yani nasıl ki gök gürültüsü çoğu kez parıltı ve şimşek çakmasından sonra meydana geliyorsa, aşıkların ah çekmeleri de kalplerindeki aşk ateşi sonucunda meydana gelmektedir.

<i>'ecîbim</i>	şaşkınlım, hayretteyim
<i>lê</i>	ancak, fakat
<i>jî</i>	önedat (-den, -dan)
<i>vê</i>	işaret sıfatı (bu)
<i>ce'dê</i>	kıvrık saç, bükümlü saç

Tasavvuf edebiyatında sevgilinin saçını kıvrık ve bükümlü olmakla nitelendirildiği zaman, sarmaşığa benzetilmektedir. Yani nasıl ki sarmaşık hangi ağaca dolanırsa onu kurutuyorsa, sevgilinin saçını da dolandığı aşığın kalbini kurutur.

Risteya sêyemîn

Uçuncü dize

Ev riste bi tevayî Farisî ye.

Bu dize tamamen Farsça'dır

ki lewra, çimkî, çikû
dil dil, qelb
ra paşdaçeka bireserî û binavkirî
tab rewneqî, ronahî
-i veqetandeka ravekê
her her
çîn xelek, badok, fetlok
-(e)ş cînavka pêvebest (-wê)
bi kufre ber bi kufre
mî qertafa dema niha
bured dibe
dîneş dinê wî

ki çünkü
dil kalp, gönül
ra nesnel/ik ve belirlilik soneki
tab aydınlık, parlaklık
-i tamlama eki
her her
çîn halka, kıvrım, büküm
-(e)ş bitişik zamir (onun)
bi kufre küfre
mî şimdiki zaman eki
bured götürüyor
dîneş dinini

Di helbestên dîwan û tesewufê de bêjeya "Çîn" bi wateya porê bi helqe û badok tê. Lê çawa ku di risteya çaremîn de tê dîtin gava digel bêjeya "muşg" (misk) bê bikaranîn welatê "Çîn"ê jî dide xulxulandin. Lewra warê miskê Çîn e. Li gor helbestvan rewneqiya porê yara wî gihaştîye wê derecê ku qelbê evîndaran ji Xweda ber bi xwe ve dikişîne, wan ber bi kufre dibe û jî dîn derdixîne.

Divan ve tasavvuf şîirlerinde "Çîn" kelimesi halkalı ve kıvrımlı saç anlamında kullanılır. Ancak dördüncü dizede de görüldüğü gibi "muşg" (misk) kelimesiyle birlikte kullanıldığında "Çin" ülkesini de çağrıştırmaktadır. Çünkü miskin anayurdu Çin'dir. Şaire göre sevgilisinin saçının palaklığı o dereceye ulaşmış ki, aşıkların kalbini Allah'tan kendine doğru çekmekte ve onları küfre götürüp dinden çıkarmaktadır.

Risteya çaremîn

Dördüncü dize

Ev riste jî bi tevayî Farisî ye.

Bu dize de tamamen Farsçadır.

ji pêşdaçek
tab-i ronahiya, rewneqiya
ce'd-i porê xirpûşkî, gungilî
muşgîn bi misk, miskirî
-(e)ş cînavka pêvebest (-wê)
çi! çiqas!
xwûn xwîn, xûn, xweyn
uftadi ketiye
der pêşdaçek (di)
dil dil, qelb
-ha qertafa gelejmariyê (-an)

ji önedat (-den, -dan)
tab-i parlaklık, aydınlık
ce'd-i kıvrırcık saç, bükümlü saç
muşgîn misk kokulu
-(e)ş bitişik zamir (onun)
çi! nice!, ne kadar!
xwûn kan
uftadi girmiş; giriyor
der önedat (-de, -da)
dil kalp, gönül
-ha çoğul eki (-ler)

Çawa ku di vê risteyê de jî tê dîtin, di helbestên dîwan û tesewufê de pirê caran bîna porê yaran tê teşbihkirin bi bîna

Dizede de görüldüğü gibi, divan ve tasavvuf şîirlerinde sevgililerin saçlarının kokusu çoğu kez miskin kokusuna

miskan. Misk ûrekî reş e; ji navzika xeza-
lê der tê. Ev ûr di eslê xwe de xwîneke
hişkûyî ye. Heya ku ev xwîn di navzika
xezalê de be, xezal pê nerihet dibe. Lê
dema ku der dikeve û dikeve erdê, hem
ew rihet dibe hem jî bînek xweş li
hawirdor belav dibe.

benzetilmektedir. Misk siyah bir urdur;
ceylanın göbeğinden çıkar. Bu ur aslında
kurumuş bir kandır. Bu kan ceylanın
karnında kaldığı sürece onu rahatsız eder.
Fakat dışarı çıkıp yere düştüğü zaman
hem ceylan rahat eder, hem de çevreye
hoş bir koku dağılır.

*Di vê taqê di vê xanê, me 'eyş û eymenî kanê?
Kesê dest dit ji dewranê, nihalik wê gulistanê
Der axûşêş çû mîared, ki ez dil canê bîspared
Ceres firyadi mîdared, ki ber bendîdi mehmilha*

Wergera Serkî

- 1) Di vî asîman û di vê xanê de, ji bo
me jîyan û ewletî kanê?
- 2) Kesê ku di dinê de dest dirêj bike
terxekî vê gulistanê:
- 3) Dema bixwaze bi canê xwe wê
berdil û hemêz bike,
- 4) Zengil, "wextê barkirinê ye baran
bar kin" qîrîn dike.

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

<i>di</i>	pêşdaçek
<i>vê</i>	rengdêra îşarkî
<i>taq</i>	gumbet û feleka asîman
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî
<i>di</i>	pêşdaçek
<i>vê</i>	rengdêra îşarkî
<i>xan</i>	dinya ku mîna xanê ye
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî
<i>me</i>	ji me re.
<i>eyş</i>	jîn, jîyan, heyat.
<i>û</i>	gihanek.
<i>eymenî</i>	ewletî.
<i>kanê?</i>	li ku ye?

Yüzeysel Tercüme

- 1) Bu gökte ve bu handa, bizim için
hayat ve güven nerede?
- 2) Kim dünyada elini bir fîdana uzat-
sa bu gül bahçesinde:
- 3) Tam bağına basıp ona ruhuyla
sarılmak istediği sırada,
- 4) "Göç zamanıdır yükleri bağlayın"
diye çan feryat koparmakta.

Dil ve Sanat

Birinci dize

<i>di</i>	önedat (-de, -da)
<i>vê</i>	işaret sıfatı (bu)
<i>taq</i>	gök kubbesi ve feleği
<i>-ê</i>	belirticilik takısı
<i>di</i>	önedat (-de, -da)
<i>vê</i>	işaret sıfatı (bu)
<i>xan</i>	hana benzeyen dünya.
<i>-ê</i>	belirticilik takısı.
<i>me</i>	bizim için, bize.
<i>eyş</i>	yaşam, hayat.
<i>û</i>	bağlaç (ve)
<i>eymenî</i>	güven
<i>kanê</i>	nerede?

Helbestvan dibêje ku di gerdûna ku ji rûye erdê û asiman pêk tê de ew negihîştîye armanca xwe û ji bo wî li tu derê jiyanê rehet û biwle tune ye.

Şair gökyüzü ve yeryüzünden oluşan evrende amacına ulaşamadığını ve onun için hiçbir yerde rahat etmediği ve güvenli bir hayatın olmadığını söylemektedir.

Risteya duyemîn

<i>kesê</i>	mirovê..., şexsê..
<i>dest</i>	dest
<i>dît</i>	dirêj ke
<i>ji dewranê</i>	ji dinê
<i>nihalik</i>	terxek, şaxek
<i>vê</i>	rengdêra îşarkî
<i>gulistanê</i>	bexçê gulan

İkinci dize

<i>kesê</i>	kim..
<i>dest</i>	el
<i>dît</i>	uzatsa
<i>ji dewranê</i>	dünyada
<i>nihalik</i>	bir fidan
<i>vê</i>	işaret sıfatı(bu)
<i>gulistanê</i>	göl bahçesi

Risteya sêyemîn

<i>der</i>	d, li
<i>axûşêş</i>	hembêza xwe
<i>çû</i>	dema ku
<i>mîared</i>	bibe, hilgire
<i>ki ez dil</i>	ku ji dil
<i>caneş</i>	canê xwe
<i>bispared</i>	radest bike, bide

Üçüncü dize

<i>der</i>	-de, -da
<i>axûşêş</i>	kucağına
<i>çû</i>	-zaman
<i>mîared</i>	aldığı, taşıdığı
<i>ki ez dil</i>	ki gönülden
<i>caneş</i>	ruhunu
<i>bispared</i>	ısmarlasa, verse

Risteya çaremîn

<i>ceres</i>	zengil, gangoç
<i>fîryadi</i>	fixan
<i>mîdared</i>	dike
<i>ki</i>	ku
<i>berbendîdi</i>	girê bidin
<i>mehmil</i>	bar
<i>-ha</i>	-an(qertafa gelejmariyê)

Dördüncü dize

<i>ceres</i>	zil, çan
<i>fîryadi</i>	feryat, figan
<i>mîdared</i>	eder
<i>ki</i>	ki
<i>berbendîdi</i>	bağlayın
<i>mehmil</i>	yük
<i>-ha</i>	-ler(i) (çoğul takısı)

Li gor helbestvan, evîndar ji bo ku bigihîjin dilberên xwe yên mîna terxên teze, demêke dirêj li pey wan digerin. Lê dema ku digihîjin wan û dixwazin wan bipihêt hemêz bikin, vê carê ecêlê wan tê û dimirin.

Şaire göre, aşıklar fidan gibi sevgililerine kavuşmak için uzun bir süre onların peşinde dolaşırlar. Fakat onlara kavuşup sınıksız sarılmak istediklerinde bu kez de ecelleri gelir ve ölürlər.

Risteya çaremîn

Dördüncü dize

ceres zengil, gangoç
firyadi fîxan
mîdared dike
ki ku
berbendidi girê bidin
mehmil bar
-ha -an(qertafa pirhejmariyê)

ceres zil, çan
firyadi feryat, figan
mîdared eder
ki ki
berbendidi bağlayın
mehmil yük
-ha -ler(i) (çoğul takısı)

Li gor helbestvan, evîndar ji bo ku bigihîjin dilberên xwe yên mîna terxên teze, demekê dirêj li pey wan digerin. Lê dema ku digihîjin wan û dixwazin wan pihêt hemêz bikin, vê carê ecelê wan tê û dimirin.

Şaire göre, aşıklar fîdan gibi sevgililerine kavuşmak için uzun bir süre onların peşinde dolaşırlar. Fakat onlara kavuşup sımsıkı sarılmak istediklerinde bu kez de ecelleri gelir ve ölürlər.

*Bi Qur'anê bi ayatê, eger pîrê xerabatê
Bibêjît secdebin Latê, murîdên wî dibin qatê
Mûrîd er bêbeser nebwed, ji fermaneş bi der nebwed
Ki sâlik bêxeber nebwed, ji resm û rah-i menzilhâ*

Wergera Serkî

- 1) Ez sond dixwim bi Qur'an û bi ayetan eger pîrê meyxaneyê,
- 2) Bibêje "ji pûtê Lât re sujde bibin", murîd ji emrê wî der nayê.
- 3) Murîd ji emrê wî der nayê, heke bêhiş û bêbesîret nebe,
- 4) Lewra murîd ji qanûn û toreyn meqaman bêxeber nabe.

Yüzeysel Tercüme

- 1) Kur'an'a ve ayetlere yemin ederim ki eğer meyhanenin Pîri,
- 2) "Lât putuna secde edin" derse, dinler onu muritleri.
- 3) Şayet mürit anlayışsız olmazsa onun emrinden çıkmaz,
- 4) Çünkü mürit makamların yasa ve törelerinden habersiz olmaz.

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

bi daçeka sondê
Qur'an Qur'ana Pîroz
-ê veqetandeka binavkirî

Dil ve Sanat

Birinci dize

bi yemin edatı
Qur'an Kur'an-ı Kerîm
-ê belirlilik takısı

Armanca sondxwarinê xurtkirina angaştekê ye. Gel bêtir bi çi bawer bike sond bi wî tê xwarin. Di nav Kurdan de ji berê de sondxwarina bi Qur'anê heye. Wekî gelek zimanên din, di Kurdî de jî daçekên sondê hene. Yek ji wan "bi" ye. Ev di Erebi de jî daçeka sondê ye. Mînak: Billahi (Bi Xwedê).

<i>bi</i>	daçeka sondê
<i>ayat</i>	ayet
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî

Bêjeya "ayat" di Erebi de pirhejmar e. Yekejmara wê "ayet" e. Lê Cizîrî li gorî rêzimanê Kurdî "ayat" wekî yekejmar qebûl kiriye. Lewra di dawîya wê de veqetandeka "-ê" bi kar aniye. Ev veqetandek li gorî rêzimanê Kurdî dikeve dawîya navdêrên yekejmar û nêr.

Ji her hevokeke Qur'anê re tê gotin ayet. Wateya ayetê nişan û elamet e.

<i>eger</i>	ger, eger, heke, ku, hek
<i>pîr</i>	mezin, saqî; şêx, mürşid
<i>-ê</i>	veqetandeka ravekê
<i>xerabat</i>	meyxane; tekye, dergah
<i>-ê</i>	veqetandeka binavkirî

Pîr, mezin û saqiyê meyhaneyê ye. Lê di wêjeya tesewîfê de armanc jê mürşid û rêber e. *Xerabat* jî "meyxane" ye. Lê armanc jê tekye û dergeha murîdan e. Ango çawa ku saqiyê meyhaneyê şeravê dide meyhanewanan û wan serxweş dike, mürşidê tekyayê jî ji evîna ilahî feyzê dide murîdan û wan bi vê feyzê mest dike.

Risteya duyemîn

<i>bibêjit</i>	bibêje
<i>secde bin</i>	sujde bibin
<i>lâtê</i>	jî pûtê Lat re
<i>murîdên wî</i>	murîdên wî pîrî
<i>dibin</i>	dibin
<i>qatê</i>	stuxwar, îtaetkar

Yemin etmenin amacı bir iddiayı pekiştirmektir. Halk daha çok neye inanırsa onunla yemin edilir. Kürtler arasında öteden beri Kur'an ile yemin etmek vardır. Diğer birçok dil gibi Kürtçede de yemin edatları vardır. Bunlardan biri de "bi" dir. Bu, Arap dilinde de yemin edatıdır. Örnek: Billahi (Allah'a).

<i>bi</i>	yemin edatı
<i>ayat</i>	ayetler
<i>-ê</i>	belirlilik takısı

Arapçada "ayat" kelimesi çoğuldur. Tekili "ayet"tir. Ancak Cizîrî "ayat"ı Kürtçe dilbilgisine göre tekil olarak kabul etmiştir. Çünkü sonunda "-ê" takısını kullanmıştır. Bu takı Kürtçe dilbilgisine göre tekil ve eril isimlerin sonuna gelir.

Kur'an'ın her bir cümlesine ayet denir. Ayetin anlamı nişan ve alamettir

<i>eger</i>	eğer, şayet
<i>pîr</i>	büyük, sakî, şeyh, mürşit
<i>-ê</i>	taamlama takısı
<i>xerabat</i>	meyhane; tekke, dergâh
<i>-ê</i>	belirlilik takısı

Pîr, meyhanenin büyüğü ve orada içki sunan kişidir. Ancak tasavvuf edebiyatında amaç mürşit ve rehberdir. Yani nasıl ki meyhanenin sakîsi meyhanecilere şarap verip onları sarhoş ediyorsa, tekkenin mürşidi de müritlere ilahî aşktan feyiz verir ve onları bu feyizle mest eder.

İkinci dize

<i>bibêjit</i>	dese ki..
<i>secde bin</i>	secde edin
<i>lâtê</i>	Lat putuna
<i>murîdên wî</i>	o pîrin müritleri
<i>dibin</i>	olurlar
<i>qatê</i>	boyun eğen, itaat eden

Beriya Yslâmê her qebileyek 'Ereb pûtek xwe hebun. Lat, pûtê qebîla "Benû Seqîf" bu.

İslam'dan önce her Arap kabilesinin bir putu vardı. Lat, Sakifoğulları kabilesinin putu idi.

Risteya sêyemîn

<i>murîd</i>	murîd
<i>er</i>	heke, heger
<i>bêbeser</i>	bê hiş û besîret
<i>nebwed</i>	nebe
<i>ji fermaneş</i>	ji fermana murşid
<i>bi der nebwed</i>	dernakeve

Risteya çaremîn

<i>ki</i>	çimkî, çiku, lewra
<i>sâlik</i>	rêwiyê terîqetê
<i>bêxeber</i>	bêagah
<i>nebwed</i>	nabe
<i>ji resm</i>	ji qanûn
<i>û</i>	û
<i>rah-i</i>	rêzika
<i>menzil</i>	meqam
<i>-hâ</i>	-an

Wateya bêjeya murîd "viyer" (daxwazkar) e. Di tesewifê de, kesê ku girêdayê bi şêxê terîqetekê ve be jê re tê gotin murîd. Lewra dixwaze ku bi wasita terîqetê bigihîje meqamekî bilind. Wateya salik "meşvan" e. Wekî rêman- eke tesewifê salik, ew kese ku ji bo gihaştina meqamekî bilind di rêzika terîqetê de bi rêberiya murşidekî dimeşe. Gava bigihîje meqamê ku tê xwestin, êdî navê wî dibe muntehî, ango kesê ku gihaştîye dawîya rê. Li gor vê rêzîkirinê, sâlik, di navbera murîd û muntehî de, di meqamekî navîn de cih digire.

Her terîqetek hinek rêzîk û toreyên li gor xwe hene. Ji van rêzîk û toreyan re tê gotin "adab" Yek ji van jî nederketina li ber emrê murşid e. Heke di emirkirina wî de tiştêkî mixalîfê dîn hebe jî, divê dîsa murîd wî emrê han bi cih bîne.

Üçüncü dize

<i>murîd</i>	mürît
<i>er</i>	eğer
<i>bêbeser</i>	akılsız ve basiretsiz
<i>nebwed</i>	olmazsa
<i>ji fermaneş</i>	mürşidin emrinden
<i>bi der nebwed</i>	dışarı çıkmaz

Dördüncü dize

<i>ki</i>	çünkü, zira
<i>sâlik</i>	tarikat yolcusu
<i>bêxeber</i>	habersiz
<i>nebwed</i>	olmaz
<i>ji resm</i>	kanûn
<i>û</i>	ve
<i>rah-i</i>	yol, kural
<i>menzil</i>	makam
<i>-hâ</i>	lar

Mürît sözcüğünün anlamı "isteyen" dir. Bir tasavvuf terimi olarak mürît, herhangi bir tarikat şeyhine bağlı olan kişiye denir. Çünkü tarikat vasıtasıyla yüksek bir makama ulaşmak ister. Sâlikin anlamı "yürüyen"dir. Bir tasavvuf terimi olarak sâlik, bir yüksek makama ulaşmak için bir murşidin rehberliğinde tarikat çizgisinde yürüyen kişidir. İstenilen makama ulaştığında ise adı artık muntehî, yani yolun sonuna varan kişi olur. Salik bu sıralamaya göre mürît ile muntehî arasında bir orta makamda yer alır.

Her tarikatın kendine göre bazı kural ve töreleri vardır. Bu kural ve törelere "adab" denir. Bunlardan biri de murşidin emrine karşı çıkmamaktır. Onun emrettiği şeyde dine aykırı bir şey olsa bile, mürît yine onu yerine getirmelidir.

*Şevê zulmet û deryayê, ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keptiya bayê, 'ecacê wê şevê dayê
Ji herfan mahu salê ma, nehat der bîklê fa'lê ma
Kuca danendi halê ma, sibigbaran-i sahilhâ?*

Yüzeysel Tercüme

Wergera Serkî

- 1) Şevên tarî û mîna behrê, ji bilî pêlan deng û xeber nayê.
- 2) Di wê şevê de bager jî ku rabû, şikest keştiya bayê.
- 3) Ji hesabkirina herfên meh û salên me, derneket wek falê me,
- 4) Nezanên ku li qeraxên behrê digerin, çi fêh dikin ji halê me ?

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

şevê	şevên
zulmat	tarî
û	û
deryayê	mîna behrê
ji mewcan	ji pêlan
qet	qet, ji bin
xeber	xeber, deng, agahî
nayê	nayê

Bêjeya zulmat Erebi û pirehejmar e. Yekejmara wê zulmet e. Bûye rengdêra şevê. Li gor rêzimanê Kurdî divê ev rengdêr yekejmar bihata. Lê em dikarin bibêjin ku, ji bo ku helbestvan xwestiya bal bikişîne pirtarîbûnê, rengdêr pirhejmar bikar anîye. Ango tariyek jê re bûye çend tarî.

Şair di vê risteyê de ji aliyê rîska ku ji ber evîne ketiyê, xwe teşbîh dike bi wî kesê ku suwarê keştiyê bûye û ba wê keştiyê bi vir de û wê de kaş dike. Di şevên tarî de, di nav pêlên behrê de ji bilî dengê pêlan tu xeber û dengêkî nayê bihîstin.

1) Karanlık ve derya gibi geceler, ses ve haber yok dalgalardan başka.

2) Rüzgâr gemisi de kırıldı, o gecede kopunca fırtına.

3) Ay ve yıllarımızın harflerinin he-saplanmasında, çıkmadı falımız.

4) Ne anlarlar ki halimizden, denizin sahillerinde dolaşan cahiller ?

Dil ve Sanat

Birinci dize

şevê	geceler
zulmat	karanlık
û	ve
deryayê	deniz gibi
ji mewcan	dalgalardan
qet	asla
xeber	haber, ses, bilgi
nayê	gelmiyor

Zulmat kelimesi Arapça ve çoğuldur. Tekili zulmettir. Şevê kelimesinin sıfatı olmuştur. Kürtçe dilbilgisine göre bu sıfatın tekil gelmesi gerekirdi. Fakat diyebiliriz ki, şair çok karanlığa dikkat çekmek için sıfatı çoğul olarak kullanmıştır. Yani bir karanlık onun için karanlıklar olmuştur

Şair bu dizede aşk yüzünden girdiği risk açısından kendini rüzgârın o yana bu yana sürüklediği bir gemiye binen kişiye benzetmektedir. Karanlık gecelerde denizin dalgaları arasında dalgaların sesinden başka hiçbir ses ve haber duyulmamaktadır.

İkinci dize

Risteya duyemîn

şikestî	şikest
keştiya bayê	gemiya bayê
'ecacê	bahozê, bagerê
wê şevê	di wê şevê de
dayê	lê da

Şev jixwe tarî ye; bi ser de, di wê şevê de bager jî rabûye û keştî şikênandiye. Çawa yekê ku di şeveke wiha de, di behreke wiha de, suwarê keştieyeke wiha bibe tu hêviya wî ya xelasbûnê namîne, hêviya şair a xelasiyê jî ji vî evîna xeter-nak êdî hatiye birrîn.

Risteya sêyemîn

<i>ji herfan</i>	ji tîpan
<i>mah û salê ma</i>	meh û salên me
<i>nehat der</i>	der neket
<i>şiklê</i>	mîna
<i>fa'lê ma</i>	fehlê me

Şair careke dawîn hinek herfan bi kar tîne û ji bo hesabkirina meh û salên emrê xwe fahl vedike. Lê fahl jî mîna ku ew dixwaze der nayê û êdî fêm dike ku emrê wî tamam bûye.

Hinek lêkolîner li gor hinek nusxeyên Dîwanê di ciyê "şiklê fa'lê" de "şiklê xalê" bi kar tînin û li gor hesabê "ebced"ê, tarîxa jidayikbûna Mela ji malikê derdixin ku ev tarîx li gor koçî û zayînî dibe 980/1570. (Bnr. Zinar, Dîwan, rp. 12).

Risteya çaremîn

Ev riste bi tevayî Farisî ye.

<i>kuca?</i>	çawa?, Ji ku?
<i>danendi</i>	dizanın
<i>hâlê ma</i>	halê me
<i>sibikbaran</i>	barsivikên, nezanên
<i>-i</i>	veqetandeka ravekê
<i>sahil</i>	qerax
<i>-ha</i>	-an (qertafa pirhjariyê)

Helbestvan dixwaze ku derdê xwe ji hinekan re bibêje, lê dinêre ku kesek mîna wî neketiye nav kûraniya behra

<i>şikestî</i>	kırıldı
<i>keştiya bayê</i>	rüzgâr gemisi
<i>'ecacê</i>	fırtına, kasırga
<i>wê şevê</i>	o gecede
<i>dayê</i>	vurdu

Gece zaten karanlıktır; üstelik o gece fırtına da kopmuş ve gemiyi kırmıştır. Nasıl ki böyle bir gecede, böyle bir denizde, böyle bir gemiye binen kim-senin hiçbir kurtulma ümidi yoksa, şairin de artık bu tehlikeli aşktan kurtulma ümidi kesilmiştir.

Üçüncü dize

<i>ji herfan</i>	harflerden
<i>mah û salê ma</i>	ay ve yıllarımız
<i>nehat der</i>	çıkmadı
<i>şiklê</i>	gibi
<i>fa'lê ma</i>	bizim falımız

Şair son kez bazı harfler kullanarak ömrünün ay ve yıllarını hesaplamak için fal açar. Fakat fal da istediği gibi çıkmaz ve artık ömrünün tamamlandığını anlar.

Bazı araştırmacılar divanın bazı nüshalarına göre "şiklê fa'lê" yerine "şiklê xalê" ifadesini kullanıyor ve ebced hesabına göre beyitten Mela'nın doğum tarihini çıkarıyorlar ki, bu tarih hicrî ve miladiye göre 980/1570 yapar. (Bkz. Zinar, Divan, s. 12).

Dördüncü dize

Bu dize tamamen Farsçadır

<i>kuca?</i>	nasıl?, nereden?
<i>danendi</i>	bilirler
<i>hâlê ma</i>	halimizi
<i>sibikbaran</i>	hafif yüklüler, cahiller
<i>-i</i>	taamlama eki
<i>sahil</i>	sahil, kıyı
<i>-hâ</i>	-ler (çoğul eki)

Şair derdini bazı kimselere söylemek istiyor, fakat bakıyor ki kimse onun gibi aşk denizinin derinliklerine girmemiş, belki bu denizin sahillerin-de dolaşıyor

işqê, belki li qeraxên vê behrê digerin û ji ve onu anlamıyorlar.
halê wî fêm nakin.

*Me ra ji ewel çî bir xamî, kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'diyu Camî, ji şohret pê hisîn 'amî
Bi deng û bang û awazî, dibêjit naxmeya sazî
Nihan key manedan razî, kezu sazendi mehfilha*

Wergera Serkî

- 1) Qelemê ji bo min berê çî nivîsî bû ku paşê navê min bi xirabî nivîsand?
- 2) Wekî evîna Se'dî û Camî, xelq bi navdarbûna evîna min jî hisiyan.
- 3) Strana bi saz, bi dengê bilind, vê evînê tîne ziman.
- 4) Sirra(razı) ku di meclisan de bê xeberdan, çava dimîne mîna sirran?

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

<i>me ra</i>	ji min re
<i>ji ewel</i>	berê, di destpêkê de
<i>çî bir?</i>	çî nivîsand
<i>xamî</i>	qelemê, pênûsê
<i>kişand</i>	çixêz kir, nivîsand
<i>axir</i>	paşê
<i>bi bednamî</i>	bi nebaşî

Şair di vê risteyê de meraq dike û dipirse: "Gelo qelemê di heqê min de berê çî nivîsî bû?". Lê ji wî re tiştê ku girîng e, nivîsandina qelemê a berê na, a paşiyê ye. Di vê çarçovê de bersîva xwe jî ew dide û wiha dibêje:

" Dawiyê navê min bi xirabî derxist".

Yüzeysel Tercüme

- 1) Kalem önce benim için ne yazmıştı ki sonra kötü yazdı adımı?
- 2) Sa'dî ve Camî'nin aşkı gibi, halk duydu benim de ünlü aşkımı.
- 3) Sazlı şarkı yüksek sesle bu aşkı dile getiriyor.
- 4) Meclislerde konuşulan sır, artık nasıl sır olarak kalıyor?

Dil ve Sanat

Birinci dize

<i>me ra</i>	bana, benim için
<i>ji ewel</i>	önceden, başta
<i>çî bir?</i>	ne yazdı?
<i>xamî</i>	kalem
<i>kişand</i>	çizdi
<i>axir</i>	sonra, sonunda
<i>bi bednamî</i>	kötü olarak

Şair bu dizede merak edip soruyor: "Acaba kalem benim hakkımda önce ne yazmıştı?". Fakat onun için önemli olan şey, kalemin onun hakkında önce değil, sonradan ne yazdığıdır. Bu çerçevede cevabını da kendisi veriyor ve şöyle diyor: "Sonra adımı kötüye çıkardı".

Risteya duyemîn

<i>ji rengê</i>	mîna
<i>Se'dî</i>	Se'dê Şîrazî
<i>û</i>	û
<i>Camî</i>	Mela Camî
<i>ji şuhret</i>	ji navdarî
<i>pê hisin</i>	bihîstin, agahdar bûn
<i>'amî</i>	Tebeqa gel.

İkinci dize

<i>ji rengê</i>	gibi, misali
<i>Se'dî</i>	Sa'd-i Şîrazî
<i>û</i>	ve
<i>Camî</i>	Molla Camî
<i>ji şuhret</i>	şöhretten
<i>pê hisin</i>	duydular
<i>'amî</i>	halk tabakası

Xirabiya qelemê bi şair re ev e ku mîna evîna Se'dê Şîrazî û Mela Camî, evîna wî jî bi xelqê da sehkirin û sirra wî ya işqê bi gel da hisandin.

Kalemin şaire kötülügü şudur ki, Sa'd-i Şîrazî ve Molla Camî gibi onun da aşkını halka duyurdu ve aşk sırlarını onlara açıkladı.

Risteya sêyemîn

<i>bi deng</i>	Bi qîrîn
<i>û</i>	û
<i>bang</i>	fixan, hawar, gazî
<i>û</i>	û
<i>awazî</i>	meqamî
<i>dibêjit</i>	dibêje, dxwine
<i>naxmeya sazî</i>	strana bi saz

Üçüncü dize

<i>bi deng</i>	bağırarak
<i>û</i>	ve
<i>bang</i>	fığan ederek
<i>û</i>	ve
<i>awazî</i>	makamla
<i>dibêjit</i>	söylüyor, okuyor
<i>naxmeya sazî</i>	sazlı şarkı

Risteya çaremîn

<i>nihan</i>	tiştê veşartî, sîrr
<i>key?</i>	çawa?
<i>maned</i>	dimîne
<i>an</i>	ew
<i>razî</i>	bi sirîtî
<i>kezu</i>	(ki ez o) = ku ewî
<i>sazendî</i>	tîne ziman
<i>mehfl</i>	meclis
<i>-hâ</i>	qertafa gelemariyê

Dördüncü dize

<i>nihan</i>	gizli şey, sır
<i>key?</i>	nasıl?
<i>maned</i>	kalır
<i>an</i>	o
<i>razî</i>	sır olarak
<i>kezu</i>	(ki ez o) = ki onu
<i>sazendi</i>	dile getiriyor
<i>mehfil</i>	meclis
<i>-hâ</i>	-ler (çoğul eki)

Ev pêhisandina işqê di nav gel de ew çend bela û diyar bûye ku, saz û stranbêj bi dengê bilind û bi qîrîn evîna Mela terennûm dikin û sirên eşqa wî aşkera dikin. Mela piştî ku vê rewşê dibîne, qebûl dike ku sirrên wî êdî ji sirrbûnê derketine û veşartina wan gengaz nîn e. Loma wiha dibêje: "Tişteki veşartî piştî ku di meclisan de pê bê axaftin, sazû sazband behs jê bikin, êdî çawa ew ê wek sîrr bimîne?".

Aşkla ilgili bu duyum o kadar yayılmış ki, saz ve şarkıcılar meclislerde yüksek sesle Mela'nın aşkını terennüm ediyor ve onun aşk sırlarını açıklıyorlar. Mela bu durumu gördükten sonra artık sırlarının sır olmaktan çıktığını ve gizlenmelerinin mümkün olmadığını kabul ediyor. Onun için şöyle diyor: "Gizli bir şey, meclislerde konuşulup saz ve şarkıcılar ondan bahsettikten sonra artık nasıl sır olarak kalır?".

*Ji Hafiz Qutbê Şîrazê, Mela fehî er bikî razê
Bi awazê ney û sazê, bih bî ber çerxê perwazê
Tuzed min hubbihe's-sefwa, bihi ehlu'l-hewa nepwa
Meta ma telqe men tehwa, de'i'd-dunya ve ehmilha*

Wergera Serkî

- 1) Ey Mela! Heke tu ji Hafiz qutbê Şîrazê sira evînê fêm bikî;
- 2) Tu yê bi dengê ney û sazê bilind bibi ser asîman û bifirî;
- 3) Tu yê pir bigihîjî evîna yarê ya paqîj ku evîndaran serxweş dike;
- 4) Gava tu bigihîjî heskiriya xwe, dinyayê bavêje pişt go û terk bike.

Ziman û Huner

Risteya yekemîn

<i>ji</i>	pêşdaçek
<i>Hafiz</i>	
<i>qutb</i>	weliyê mezin
<i>-ê</i>	veqetandeka ravekê
<i>Şîrazê</i>	bajare Şîrazê

Navê Hafizê Şîrazî Mihemed e. Ji bo ku di piçûkiya xwe de Qur'ana Pîroz ezber kiriye jê ra leqeba "Hafiz" hatiye dayîn. Digel ku di warê tesewif û helbestên tesewufê de şexsiyetekî pir namdar ê, der barê şêx û terîqeta wî de agahiyên esehdî dest me de tune ne. Hafiz di sala 792 / 1390 de rehmet kiriye.

Qutb di Erebî de mîla ku kevirê aşê (beraş) li dora wê digere ye. Di tesewifê de armanc jê weliyê mezin e. Ango çawa ku kevirê aşê li dora mîl digere, weliyên din û alema tesewufê jî li dora wî weliyê mezin digerin. Ji Qutb re bi ferqekî hindik xews jî tê gotin. Xews bi wateya alîkar û alîkarî ye. Lewra li gor felsefa tesewif û terîqetê gava murîd têkeve tengasiyek xews bi alîkariya wî de tê.

Yûzeyssel Tercûme

- 1) Mela! Eger Şîraz Kutbu Hâfiz'dan aşkın sırrını bellesen;
- 2) Ney ve sazın sesiyle gökyüzüne yükselip uçacaksın sen;
- 3) Çok nail olacaksın yarın aşıkları sarhoş eden pâk sevgisine;
- 4) Dünyayı terkedip bir kenara at, kavuştuğun zaman sevdiğine.

Dil ve Sanat

Birinci dize

<i>ji</i>	önedit (-den, -dan)
<i>Hafiz</i>	
<i>qutb</i>	büyük veli
<i>-ê</i>	taamlama takısı
<i>Şîrazê</i>	Şîraz şehri

Hafiz-i Şîrazî'nin adı Muhammed'dir. Küçüklüğünde Kur'an-ı Kerîm'i ezberlediği için kendisine "Hafiz" lakabı verilmiştir. Tasavvuf ve tasavvuf şiirleri alanında oldukça meşhur bir kişi olmasına rağmen, şeyhi ve tarikatı hakkında elimizde net bilgiler yoktur. Hafiz 792 / 1390 yılında vefat etmiştir.

Arapçada *kutb*, etrafında değirmen taşının döndüğü mildir. Tasavvufta bundan amaç büyük velidir. Yani nasıl ki değirmen taşı milin etrafında dönüyorsa, diğer veliler ve tasavvuf dünyası da o büyük velinin etrafında dönerler. Kutba küçük bir nüansla gavs da denir. Gavs yardımcı ve yardım anlamlarına gelir. Çünkü tasavvuf ve tarikat felsefesine göre mürit bir sıkıntıya düştüğü zaman gavs onun yardımına gelir.

Mela!

ey Mela!

Mela, bernavka Cizîrî ye. Wateya wê ya ferhengî "tîjî" ye. Ji bo ku xoce bi ilmê tijî nin, ji wan re mela (tijî) tê gotin.

fehîm er bîkî
razê

ger fêh bîkî
sirê, hikmetê

Bêjeya "er", daçeka hekînî ye; ketiye navbera du perçeyê lêkera hevedudanî. Lêker bila dixwazî xwerû, dixwazî hevedudanî bin, di eslê xwe de daçekên hekînî beriya wan tên bikaranîn. Di pirtûkên li ser rêzimanê Kurdî yên ku em gihastin wan, derbarê ku daçekên hekînî di navbera du perçeyê lêkerên hevedudanî de tên an jî nayên bikaranîn em rastî agahiyek nehatin. Di vê çarçovê de mînak Cizîrî balkêş e.

Hafîz di helbestên xwe de bêjeyên mîna evîn, şerav, şûşe, meyxane û saqî bi wateyê mecazî gelek bi kar anîne. Kesên ku ji sirra vê bikaranînê bêxeber bûn, li dijî Hafîz cepe girtine û wî rexne kirine. Lê Cizîrî ji ber ku sirr û hikmetên bikaranîna van bêjeyan agahdar e, li Hafîz xwedî derdikeve û bala muxatabên xwe dikişîne ser van sir û hikmetan.

Daçekên hekînî bersivê dixwazin. Di vir de bersîva "er"ê risteya duyemîn a jêr e:

Risteya duyemîn

<i>bi awazê</i>	bi fixan û meqamê
<i>ney û sazê</i>	ney û sazê
<i>bîh bî</i>	tuyê bilind bibî
<i>ber</i>	ser
<i>çerxê</i>	asiman
<i>perwazê</i>	fîrandin, fîrîn

Ney aletekî muzîkê ye. Ji qamîş tê çêkirin. Di tesewîfê de der barê "ney"ê hikayekî wiha tê gotin: Ney zamanekî qamîşek bû. Di welatê xwe yê bi navê "Neyistan" de di nav jiyaneke rehet de

Mela!

ey Mela!

Mela, Cizîrî'nin lakabıdır. Sözlüksel anlamı "dolu"dur. Hocalar ilimle dolu oldukları için kendilerine mela (dolu) denilmektedir.

fehîm er bîkî
razê

eğer kavransan
sırrı, aşk sırrını

"Er" kelimesi şart edatıdır; bileşik fiilin iki parçası arasına girmiştir. Fiiller ister yalın olsun ister bileşik, şart edatları aslında onlardan önce kullanılır. Bizim ulaşabildiğimiz Kürtçe dilbilgisiyle ilgili kitaplarda şart edatlarının bileşik fiillerin iki parçası arasında kullanılıp kullanılmayacağı hakkında bir bilgiye rastlamadık. Cizîrî'nin örneği bu bakımdan dikkat çekicidir.

Hafîz şiirlerinde aşk, şarap, kadeh, meyhane ve sakî gibi kelimeleri mecazî anlamlarda çokça kullanmış-tır. Bu kelimelerin kullanımlarından habersiz olan kimseler Hafîz'a karşı cephe almış ve onu eleştirmişlerdir. Ancak Cizîrî bu kelimelerin kullanıldığı sır ve hikmetlerden haberdar olduğu için Hafîz'a sahip çıkmakta ve muhataplarının dikkatini bu sır ve hikmetlere çekmektedir.

Şart edatları cevap isterler. Burada "er"ın cevabı aşağıdaki ikinci dizedir:

İkinci dize

<i>bi awazê</i>	sesi ile, makamı ile
<i>ney û sazê</i>	ney ve sazın
<i>bîh bî</i>	yükseleceksin
<i>ber</i>	üstüne
<i>çerxê</i>	gökyüzü
<i>perwazê</i>	uçmak, uçuş

Ney bir müzik aletidir. Kamıştan yapılır. Tasavvufta ney hakkında şöyle bir hikaye anlatılmaktadır: Ney bir zamanlar bir kamış idi. Neyistan adlı vatanında rahat bir yaşamı vardı. Daha sonra bazı insanlar tarafından kesildi ve

bû. Paşê ji aliyê hinek insanan hat birîn û ji bo ku baş bê pijandin hindirê wê hat valakirin. Vî qamîşê han heta ku rengê xwe yê teze winda kir û rengê kir zer girt, li hember vê zehmetiyê sebir kir. Paşê insanan tê de qulik vekirin û pif kiran wan qulikan. Wê demê welatê wê yê Neyistanê hat bîra wê û bêrikirina xwe ya wî welatî bi awazeke tesîrdar hanî ziman. Ha insan jî ji welatê xwe yê heqîqî ku Cennet e dûr ketiye û di cizbeyên zikrê de bêrikirina wî welatî bi feryad û fixan tînin ziman. Lê ji bo ku bigîhîjin wî welatî, divê wekî "ney"ê hindirê xwe ji nebaşiyar paqij bikin û baş bîn pijandin.

Ango ger tu sirreke îşqê ji Hafîzê Şîrazê fêm bikî, tu yê mîna neyê deng û meqamên tesîrdar derxî û bilind bibî herî ser asiman. Ger tu vê sirê fêm bikî, tuyê tiştên ku di rîsteya jêr de hatine gotin jî qezenc bikî:

Risteya sêyemîn

Ev riste bi teyayî Erebi ye.

<i>tuzed</i>	yê ji te re pir bê dayîn
<i>min</i>	jî
<i>hubbi</i>	evîna
<i>-ha</i>	wê (cînavka pêvebest)
<i>sefwa</i>	ya pak, paqij
<i>bihi</i>	bi wê (evînê)
<i>ehlu'l-hewa</i>	kesên evîndar
<i>neşwa</i>	bikêf in, serxweş in

Risteya çaremîn

Ev riste jî bi teyayî Erebi ye.

<i>meta ma</i>	dema ku
<i>telqe</i>	tu bigîhîjî
<i>men</i>	kesa ku / kesê ku
<i>tehwa</i>	tu jê hez dikî
<i>de' i</i>	terk bike
<i>dunya</i>	dînê
<i>we</i>	û
<i>ehmil</i>	bavêje pişt guh
<i>-ha</i>	wê

iyice olgunlaşması için içi boşaltıldı. Bu kamış kendi taze rengini yitirip sarı bir renk alıncaya kadar bu zahmetlere karşı sabretti. Sonra insanlar onda delikler açtılar ve o deliklere üflediler. İşte o zaman vatani Neyistan'ı hatırladı ve o vatana ilişkin özlemini etkileyici bir sesle dile getirdi. İşte insanlar da gerçek vatanları olan Cennetten uzaklaşmış ve o vatana olan özlemlerini zikir cezvelerinde feryat ve figanla dile getirirler. Ancak bu vatana kavuşmak için ney gibi içlerini kötülüklerden temizleyip iyice pişmeleri gerekir.

Yani sen Hafız-i Şîrazî'den aşkın bir sırrını kavrarsan, neyinki gibi etkili ses ve makamlar çıkaracaksın ve yükselip gökyüzüne çıkacaksın. Eğer bu sırrı kavrarsan, aşağıdaki dizede söylenenleri de kazanacaksın:

Üçüncü dize

Bu dize tamamen Arapçadır.

<i>tuzed</i>	sana çok verilecek
<i>min</i>	-den, -dan
<i>hubbi</i>	aşk
<i>-ha</i>	onun (bitişik zamir)
<i>sefwa</i>	pak, temiz, duru.
<i>bihi</i>	onunla
<i>ehlu'l-hewa</i>	aşık olanlar
<i>neşwa</i>	keyifli, sarhoşturlar

Dördüncü dize

Bu dize de tamamen Arapçadır.

<i>meta ma</i>	ne zaman
<i>telqe</i>	kavuşursan
<i>men</i>	o kimseye ki
<i>tehwa</i>	seviyorsun
<i>de' i</i>	terk et
<i>dunya</i>	dünyayı
<i>we</i>	ve
<i>ehmil</i>	ihmal et, kulak ardı et
<i>-ha</i>	onu

AWE

Ehmedê Dirihî

Vateyê verînanê ma yê: "Awe heyat a", "Awe roşnayî ya", "Awe îman a", "Awe dîn û dinya ya". Û sek Quran de (Enbîya - 30) zî yeno vatiş, "We ce'elna minel maî kulle şey'in heyyin." Yanî, Ma her çîyo ganî, awe ra ardo ra.

Qiralêkê Seylanîyan 3500 serre Verê Îsayî, verkoleyê mezelê xo ser o wina dayo nuştişî, "Her dalpa(çilke)ya ke varena, hetanî xizmetê însanan nêkero, meverdê wa şêro behr!"

Awe, herri, hewa û adir. Nê çareme bingeyê esasînî yê heyatî yê. Şairê mayo namdar Feqîyê Teyran şîrê "Ey Avê Av" de zî wina vano:

*"Zahir kirin çar bakîre
Ba û av û ax û agir e
Heywan hemû jê çêkire
Dar û nebat û kiswetê."*

MESELEYA AWA DINYA

Ewro zafê welatê dinya kêmaneya awe rê rî bi rî yê. Zêdebîyayîşê nifusî, persê finansmanî û cîwarî, piroblemanê awe serre bi serre hêna hê zêdînenê. Na seserra peyine de nifusê dinya hîrela, gurenayîşê awe hewtla zêdîyayo.

Welatê dinya, yê ke seserra vera ma de raşt ro piroblemê awe yenî, nêşkenî tenya pê awe zêdekerdişê ci rê çare bivînê. Yew het a awe zêdekerdiş, qontrolê polîtîkaya awe waştîş û heto bîn ra zî qalîteya awe ganî bêro pawitişî.

Hemeyê dinya de qirêjayî, bedelfayîşê hewayî(atmosfer), îsraf û polîtîkaya awe bese nêkenê; qalîte û mîqdarê awa ke yena gurênayîşî bipawîyo. Awe, vera-vera ha bena kêmi û qirêjine.

Ewro goreyê MY, her serre qirêjbîyayîşê awe ra 200 mîlyon însan nêweş kuwenî û 2,2 mîlyon însanî zî mirenê. Serra 2050 de, nifusê dinya reseno 9,3 mîlyarî. 60 dewletan de 7 mîlyarî kes tenganîya awe rê rî bi rî manenê.

MY ma pê hesneno ke: Çimeyê tebîî do bikêmiyê, biginê sînorê qedîyayîşî. Mîyanê mîletan de heqê awe ser o pênekêrdîş do bireso dereceyê pêrodayîşî û şerî. Seba çareserîya na yewe, tesîsanê awe rê ganî her serre 50- 100 mîlyar & xerc bîbo.

ROJA AWA DINYA

Serra 1977 de 'Konferansê Awe' Mar Del Plata de virazîya. Na gama verêne bî. 1992 de Dublin de 'Konferansê Awe û Dorûverî ya Mîyanê Miletan' virazîya. Awerberdiş û îdareyê awe ser o pilanviraştexan, qerardayoxan û kesê ke awe gurênenê, mîyanê na xebate de cayê xo girewto. 1992 de MY 'Konferansê Aversîyayîş û Cîwarî' de, awa werî ameye rojev.

Dezgeyê Umûmîyê MY, 22 Sibata 1993 de 22 Adare, "Roj Awa Dinya" îlan kerd.

MY her serre pawitiş û averberdişê aw û çeman ser o, temayan belî keno û seba organizasyonan zî sitratejî nîşan dano ke na roje de:

- * Problemê awa werî ser o bivindirê.
- * Giraniye dayîş û pawitişê aw û çeman ser o şarê xo hîşyar bikerê.
- * Hukmat, ajansê înternasyonalî, sektorê xusûsî, dezgeyî û organizasyonê sîvilî, pêro piya tede ca bigîrêne, têdesta gureyan xo mîyan de bare bikerêne.
- * Medya de programanê perwerdeya kulturê awe bivirazêne.
- * Giraniye bidêne wendekar û ciwanan ser.
- * Awerberdiş û pawitişê aw û çeman ser o konferans, semîner û sergîyan bivirazêne.
- * Samedê pêhesnayîşê şarê xo piromosyonan vila bikerêne.

Nê serranê peyênan de roja awa dinya, konseya awa dinya, forumê awa dinya, serra awa werî ya dinya... Têdima komeleyê winayênî awan benê. Kombîyayîşî virazîyenê û qerarî yenê girewtîş ke persê awa dinya rê çareyan bivînê.

MY diqetê ma anceno ke Rojhelato Mîyanên de Dîjle û Ferat ra bigêrê, Amerîka de royê Colorado ra hetanî ma biresîme Nîlê Afrîqa, heqê aw û çeman ser o pênekêrdîşî rê, beynatê dewletan de pênekêrdîşî û dijminatî virazîyenê û roje bi roje zî hêna hê zêdîyenê. Behsê awe bîyo mewzûyêko serekê rojevê fikrêumûmîya dinya û teşkilatanê enternasyonalan de.

Na reya verên a ke ma zî waşt emser serbajarê xo Dîyarbekir de, derheqê kulturê awa xo ser o semînerêk bidîme. Ez na xebata xo de pê hesîyaya ke ferhengane Kurdî de nameyê ro, çem û golanê ma çin o. Ma hema zî nameyê aw û çemanê xo nêzanîme!

Verê cû ma awkanê xo bişinasnê, badê cû înan ser o heqanê xo bimusî û dima ra zî beşkî awkanê xo rê wayîrîye bikerî û bipawê.

AWA DINYA

Dinya de 1 360 milyon km³ awe esta. Na awe ra %95,5 awa solin a. %2,2 awa koyê cemedî ya. % 2,3 awa ke dîyena dest.

Potansîyelê awa dinya ke dîyena dest 42 hezar km³/serr a. Serê merdimî 7342 m³ awe kuwena. Brezilya wayîrê %12,3 na awe ya. Ayê diyine %10,2 yê Rusya ya.

Awe êdî bîya yew nîşaneya zengînîye. Goreyê peymeyê enternasyonalî:

Welatê ke wayîrê awe 10 000 m³/kes/serr > zêdêr bibo, 'zengînê awe' yo.

Êyê ke wayîrê 3 000 < awe < 10 000 m³/kes/serr bibo, awa înan 'besbîyaye' ya

Êyê ke wayîrê 1 000 < awe < 3000 m³/kes/serr bibo, awa înan 'bese nêkena'

Êyê ke wayîrê awe < 1 000 m³/kes/serr ra kêmiyêr bibo, sey 'feqîrê awe' name diyno.

Tirkîya de serê merdimî 1642 m³ awe kuwena. Yanî, awa Tirkîya bese nêkena.

Goreyê raporê Unescoyî, Finlandîya, wayîrê awa werî ya tewr weş a. Dima ra Kanada û Zelandaya Newîye yenê. Tirkîya rêza 45. de ca gêna. Awa tewr qirêjine zî, yê Belçika ya.

AWA ROJHELATÊ MÎYANÊNÎ

Verê cû ra hetanî ewro Rojhelato Mîyanên de meseleya awe gurenayîşî ser o şerî vejîyê meydan. Wina aseno ke demo ameyox de persê kêmanîya awe cayê petrolî gêna.

Ewro Tirkîya, Lubnan û Iraq ne tede, ê welatê bînan de kêmanîya awe esta. Hîrêgoşeyê Başurê Lubnan, Israîl û Urdunî de awe qet bese nêkena.

Aw û çeman ra tewr muhîmî royê Ferat, Dîjle û Urdunî yê. Nê hîrêheme zî sînorê dewletan ra vîyarenê.

Awê Ke Sînoran Ra Vîyarenê

Huqûqo enternasyonal de seba nê awan 4 weynayeyê(fîkrê) esasînî estê.

Her welat aw û çemî ke erdê înan ra vejîyenê, senî biwazî eşkenê wina bidê xo dest. Yanî, "Serdestîya Mutleqe"

Aw û çemî parçeyê welatî yê. Ê welatê ke serê awe de yê, nêşkenê mîqdar û wesfê awe bibedelnê. Yanî, "Temamîya Wareyî"

Wareyê aw û çeman wareyê şilayî yê. Mîqdarê awe, destdayîşê awe, hewceyê averşîyayîşî, şertê ekonomîk û sosyali, teserrufê awe û heme şertê bînî gêriyenê verê çiman. Awe barekerdişî de muhîm o yo, ke zirar nêdîyo ê welatanê bînan: Yanî, "Biheq û Maqultîye Dest Dayîş"

Sînorê dewletan nêdiyno verê çiman. Temamîya awerêjî de aw û çeman ra tewr rind feyde veynayîş esas o. Yanî, "Temamîya Awerêjî"

Tirkîya hem "Serdestîya Mutleqe" wazena, hem zî "Biheq û Maqultîye Dest Dayîş"î rê qayîl a.

Çimeyê çemê Xabûrî ke milê Feratî yo, awa xo ya binerdî deşta Serê Kanî ra gêno. Sûrîye a yewe ra nêwazena ke na awa binerdî bîyero antiş.

ÇARESERÎ

Welatê ke awa înan zaf kêmi ya, ganî;

Awa xo, bi diqet û pê randiman bidê ra xo dest (bigurênê).

Cîwarê aw û çeman û dorûverî hol bipawîyo.

Vernîyê ci bigêrê ke awe qirêj nêbo.

Awa awdayîşî de îsraf ra dûrî bivindirê.

Giranîye bidê ci ke, parawe û awrêjnî beşkî parzun bikerî û reyna bidê ra awdayîşî.

Awa behrî ser o bixebitîyê, eke ekonomîk bo, wa safî bikerê û bidê awdayîşî.

Sîstem û metodanê awdayîşî aver berê.

GURÊNAYÎŞÊ AWE

1- Awdayîş (% 70), 2- Endustrî (% 23), 3- Werdiş (% 7)

Serre bi serre gurênayîşê awa awdayîşî kêmiyena, awa werî û endustrîyî zêdiyena.

AWDAYÎŞ

Awa ke nebatan rê hewce ya, la pê rayîranê tebîyan peydakerdiş de kêmi manena; ê metod û sistemê ke ca û wareyê awdayîşî, îmkânê teknîkî û maddî gore, her parselî rê rayîrê awdayîş û awrêjnî viraştîş û ristimê nebatan resneyîş o.

Metodê Awdayîşî

Rûxarkî / Serrûkî, Reqîşandin / Pizrûkî, Dalpeyin / Çilkandin, Cêrerdî Awdayîş / Jêrerdî Avdan.

Îsrafê Awdayîşî

Eke awe bi qasê hewceyîya nebatî ra zaf bidîyo ci, nesilîyena xorî û awzê beno berz, herra rîyê erdî kirîşîyena, şîna û xafîkê herî beno de, ristimê nebatan bêhewa maneno.

Zerarê Ci:

Awe bîlasebeb bena vîndî û şîna. Awzê beno berz, berdeyîş (mehsul) kêmiyeno. Herî awe reyde herikîyena, bena vîndî û maddeyê ke seba nebatî hewce yê, kêmiyenê. Ristimê nebatî miyanê awe de bêhewa manenê û tira nêweşî peyda benê. Awa zêdî ya ke nesilîyena, wesfê herî xeripnena. Herî bena solawin û şoraxine.

Sebebê Ci:

Musayîşî ra zêde awdayîş. Topografyaya hêgayan xirab a. Hêgayî vilabîyaye yê û lete-lete yê. Heqê awe belaş o, yan zî ercan o. Awa awdayîşî, rast nêpeymewîyena. Tesîsê awe kêmi yê, yan zî bese nêkenê. Metodanê verênan ca nêverdenê. Sîstemo modern, ronayîşê ey mesrefin o, vay o.

POLÎTÎKAYA AWE

Îdareyê Awe: Îdareyê çimeyanê awe ganî entegre bo, merkezî nêbo. Êyê ke awe ra feyde vînenê, pêro pîya qerar bidê, aw û çeman pîya bigurênê.

Heqê Awe: Belaşbîyayîş, yan zî ercanbîyayîşê qîmetê awe.

Qalîteya Awe: Pakîtiye, zelaliye, bêrengîye, bêboyiniye û sn. gore: Awa qalîteyê, tay qirêjine, qirêjin û zaf qirêjine.

Tesîsê Awe: Beynatê wareyanê awe de tesîskerdiş o. Sektorê awdayîşî nika tewr zêde awe xerc keno. Labelê roj bi roj hewceyîya awa werî û ya endustrîyî hêna zêdiyena.

AWA TIRKÎYA

Varayîşê serre 642,6 mm, yan 501 milyar m³/serr a. 274 milyar m³ awe helm bena. 41 milyar m³ awe nesilîyena xorî. 186 milyar m³ awe zî herikîyena. 208 milyar m³ awe ra, serê merdimî 3126 m³ kuwena.

Awa Tirkîya ke eşkenê bidê xo dest, 98 milyar m³ awa sererdî, 12 milyar m³ zî

awa binerdî, heme 110 milyar m³ a. Serê merdimî 1642 m³ awe kuwena. 140 dewletan mîyan de ya 72'in a. 40 milyar m³ awe rê; 30 milyar m³ awdayîşî rê, 5,8 milyar m³ werî rê û 4,2 milyar m³ zî endustrî rê serf bena.

Arazîyê zîretê Tirkîya 28,05 milyon ha yê. Êyê ke bi ekonomîk awe diyenê 8,5 milyon ha ya. Înan ra 4,8 milyon ha erd, nika ho yeno awdayîşî.

PROJEYA ROJHELATÊ BAŞÛRÊ ANATOLÎ (PRA-GAP)

Projeya awa Dîjle û cêrê Feratî ya. Eke na proja temam bibo 1,7 milyon ha. erd awe diyeno û 27 milyar KWh enerjî viraziyeno. Proje de 22 bendawî û 19 SHE (Santralê Hîdro-Elektrîkî) estê. 11 bendawî û 7 SHE temam bîyê, nika pê înan 214 000 ha erd yeno awdayîşî. Projeya enerjî % 80 temam bîyê, la ê awdayîşî ra hema % 13 bîyê temam.

Enerjîyê Hîdro-Elektrîk ê bendawa Bavê Reş (1996) 10,4 milyar KWs

Tirkîya : (2002) 44,0 milyar KWs

13 bajarê ma : (2001) 11,6 milyar KWs

Badê awdayîşî, deşta Herranî de awzê zêdiyayo, herra deşte serre bi serre hêna zaf ha bena şoraxine û solawine. Çünke awrêjnê deşte tam nêherikîyeno, nêşino teberê deşte. Vera-vera cêrê deşte de beno gole. Labelê nika tay vanê ke "Cenanî nêzanîya xo ra zêde ra awe xerc kenê, coka deşte de şoraxî peyda bîya." (Nezanê ma zî nê vateyan şidênenê!...)

Deşta Dîyarbekirî de pê tesîsê awdayîşî nîzdîya 10 000 ha erd yeno awdayîşî. Tîya de erozyon hend bîyo zêde ke nêno vatiş! Goreyê peymeyan, her serre 17 000 ton herî awe reyde herikîyena û kirişiyena, şina. Deşta Çinarî de tebeqeyê herra serêne heme şîyo, tebeqeyo binên, o qaçilin, tenya mendo. Eke tebeqeyo serên şêro, a herî êdî mehsulê xo zaf kêmnena. Ma vajîme ke projeya Dîjle temam bibo, 800 000 ha erd awe diyeno. Goreyê nê hesabî her serre no ware de tenya 1 360 000 ton herî pê awa awdayîşî do bikirişîyo û şo.

Ma wazenê ke erdê ma awî bo, la herra ma zî ma dest ra ha şina, hayîya ma bin ra pê çin o! Vateyê verênan o, "Şi bigîro heyfê babî, na ser çîyê dadî."

Hîdropolitîk: Tirkîya de gurênayîşê awa royî Ferat û Dîjle ke gola bendawan ra helm bena, diyena awdayîşî, awrêjnî ra agêrena, welatê ke cêrê awe de yê, naye ra kewtê esîwaseyî mîyan.

PRA no semed ra hetê siyasî de zî bîyo problemeko sereke. Seba çareserîya na yewe Unîversîteya Hacettepe de 'Merkezê Cigêrayîşo Stratejîk û Hîdroplîtîk' nîyayo pira.

AWERÊJÊ MA

1- Awerêjê Feratî 35 milyar m³, 2-Awerêjê Dîjleyî 50 milyar m³. 3-Awerêjê Erezî 4,5 milyar m³. 4- Awerêjê Gola Wanî 2,4 milyar m³

GOLÊ MAYÊ TEBÎÎ

Gola Masî, Gola Xaçî, Gola Çildirî, Gola Arçaxî, Gola Hezarî, Gola Nazîkî, Gola Nemrûdî, Gola Wanî

AFATÊ MA

Pîrozkerdişo emserrin ê "Roja Awa Dinya" koordîasyonê dezgeyê UNISDR û WMO de viraziyeno.

Wişkayî:

Zîretê ma de, eke serre şîlî bivîyaro, hol beno. Serrê ke wişkayî bibo, mavajîme sey Çolê Dîyarbekirî, Deştê Serêkanîyî yan zî Berrîya Mêrdînî de zad heb nêgêno. Çünke ziraetê ma hema zî pabesteyê hewayî yo. Kam serre wişkayî bo, a serre şarê ma rê afat o, felaket o.

Qirêjayî:

Serra 1995 de Kargehê Awa Dewlete (DSI) waştîbî ke awa Bendawa Gola Deveyî seba awa werî bîyaro bajar. 1996 de Greenpeace Mediterraneanê, ma pê hesnayî ke şîrketê NV Turkse Shell, cîwarê Dîyarbekirî de akîferê (tebeqeyê ke awa binerdî tede esta) Mîdyad ra efareyê petrolî deşarj kerdo û pê awe qirêjnaya, herimnaya.

Na awe hetê Dîyarbekirî ra 18,7 km herikîyaya, ha yena. Goreyê peymeyan, awa hetikîyaya şîya ginaya 1 252 000 000 m³. Mîyanê na awe de hîdroclor hende bîyo zaf ke (10 ppm), êdî nêwerîyena. DSI zî bendawa Dîjle ra awe arda, resneya bajar. Awa deşarjê petrolî hema zî awa binerdî ya Dîyarbekirî ha hetiknena.

Rojêk verê cû qirêjbîyayîşê na awe ganî bêro taqîbkerdiş, qontrolbîyayîş û pakkerdiş. Xebata petrolvetîşî ya şîrketê NV Turkse Shell, mintîqaya Dîyarbekirî de qurf finena kê. Eşkera yo ke tîya de şarê ma talûkeyê zaf girdî rê rî bi rî yo.

Laser:

Zimistanê 1926-1927 de awa royê Dîjle ende bîya zafe ke bîya afat. Rojhelatê verawe de bajarê Elmedîna binê laserî de mendo û şîyayo ra. Badê cu dewa Êlîhî hêverî bîya qeza û dima ra bîya bajarê Batmanî. Labelê nika zafê şarê Batmanî bi xo zî no afat ra bêxeber o.

Çî rê? Çî heyf o, ke sey sewbîna çîyanê ma, afatê ma zî nêameyê nuştîş.

Afato tewr gird, afatê Nuh Pêxemberî yo.

Wareyê Awa Werî Qirejkerdişî Ra Pawitişî Ser o Qedexeyî

0-300 m Wareyê Mutleqî: Çi qeyde beno wa bibo, qeraxê awe ra no mesafe de avahî viraştişî rê qet destûr nêdîyeno.

300- 1000 m Wareyê Mesafeya Nêzdiye: Banê yewlayî, êyê ke seba feydeyê fikrêumûmîye yan turîzmî viraziyenê. Tîya de zîraet bê gubre û bê darû rê destûr dîyeno.

1000-2000 m Wareyê Mesafeya Orteyî: No ware de seba sanayî û îskanî destûr nêdîyeno. Avahîyê seba rez, şahî û turîzmî tenya rê destûr dîyeno.

2000 m< Wareyê Mesafeya Dûrî: Wareyê ke awa rezervuarî tede yena pêser. No ware de zî ê dezgeyê sanayî ke awe qirêj kenê, destûr nêdîyeno ci.

TARÎXÇEYA AWA WERÎ YA DÎYARBEKIRÎ

Dîyarbekir de hêverî Îdareya Waqîfan serra 1935 de şebekeyê awe viraştö. 1972 de Bankaya Bajaran çimeyê Hamrawatî ra 11 km xeta awe anta, resneya bajar. 1982 de DAD 8 birê awe ra 279 l/s, 1986 de 12 nê bîranê ra 362 l/s awe, eşta na xeta pile ser. Çimeyanê Enzele, Zereyê Bedenî, Alî Pinar û bîranê mehelleyan ra zî awe veta.

Nê çimeyanê ke besenêkerd, DAD hewcedariya serra 2030 gore, Hezîrana 2001 ra nate Bendawa Dîjle ra pê pompa nizdî 2m³/s awe dana 10 km vakurê bajarî. Na awe Qîlê Mastfiroşî de parzun bena(255 000 m³/roj) û yena Dîyarbekirî.

Cîwarê Awa Werî ya Dîyarbekirî: Gend û gemarê keyeyan û endustrî, efareyê zîretî û petrolî û parawê bajar û sukan.

Qirêjîya Dîjleyî Hetanî Dîyarbekirî: Deşarjê Dezgeyê Sifirî yê Madenî, Parawê bajarê Pîran, Gêl, Maden, Erxanî û Dîyarbekirî, deşarjê Garnîzonê Eskerî (Bilge Kışlası), deşarjê wareyê petrolî û awrêjnê ke rijênê mîyanê royê Dîjleyî. Zanayîşê mi gore, seba awa werî ya Dîyarbekirî, awa Birkleyinî ya tewr pak a. Eke na awe biresîyo ma, problemê awa werî ya ma nêmaneno.

AWE Û CÎWARÊ MA

Cuwa ver Keban, Samsat, Newala Çorî, Zeugma, Xalfetî ûsn, binê awa bendawan de mendî. Tayê bi tamam darîyey we, tay zî qismen darîyey we. Nika zî dore ameya Gelîyê Mûnzûrî, Heskîf, Gelîyê Zê... ûsn.

Beynatê Mamekiye û Pilemûrîye de 42 000 ha wareyê Gelîyê Mûnzûrî, serê 1971 de sey Parqo Millî îlan bîyo. Goreyê UNESCOyî no parq hetê îlmî ra zî estetîk û îstîsnayî yo. Gelîyê Mûnzûrî ser o projeyê 8 bendawan esto. Bendawa Uzunçayırî virazîyaya.

Dersîmijan xo mîyan de "Înisiyatîfê Dersîmî" nayo pêra. Her serre hamnanî festîval virazenê, yenê pêser û qîrenê, vanê "Dest Merzêne Mûnzûrê Mî!" Ganî ma zî têfek ra bivaci, "Dest Merzêne Mûnzûrê Ma!"

Seba mozaîkê bendawa Bêrecûgî û Zeugma, serra 2000 de nuştayêkê rojnameyê Newyork Times vejîya, dima ra eleqe û reaksiyonê enternasyonalî kewtî rojev. Femandarê Îskenderî Nîkator serê Feratî de, bajar nano pêra û pird nano ser. Qederê Zeugma êdî her tim pirdbîyayîş bi, vîyerî bi. Ê mozaîkî, hêkelî û mîmarîya ke kerreyanê Feratî ra viraşte yê, bibî pirdê kultur û hunerî. Nika zafînê nê mozaîkan, binê gola Bendawa Bêrecûgî de mendî.

Komela OMI 14 Hezîrana 2002 de, behsê "Bendawe û Cîwarî" ser o forum û panelî viraştî û pîya qerar dabi ke, "Eke ma nêwazenê ayendeyê xo de bê nasname û tarî de bicuyî, ma mecbur ê, cayanê bendawan ser o reyna bivinderî."

BENDAWÊ DINYA Û YÊ MA

Name	Ro	Dewlet	Hecimê Gol (m³)
Bratsk	Angara	Rusya	169,270
Karîba	Sambesi	Rodezya	160,368
Assuan	Nil	Mısır	157,000
Akosombo	Volta	Gana	148,000
Daniel	Manicougan	Kanada	141,851
Bavê Reş	Ferat	Tirkîya	48,700
Keban	Ferat	Tirkîya	30,000
Musul	Dijle	Iraq	12,500
Zinara Reş	Ferat	Tirkîya	9,540
Derbendixan	Zeya Corîne	Iraq	8,300
Dûkan	Zeya Cêrîne	Iraq	6,800

EDEBÎYATÊ KURDKÎ DE AWE

Feqîyê Teyran (Ey Avê Av)

Cegerxwîn û Şivan Perwer (Ey Xabûr Xabûr-Ey Ferat Ferat)

Roşan Lezgîn hîkayeya Dîyarbekir Seranser Eşq de wina vano:

"Çemê Dîjle barîk-barîk, bi naz û nazenînî Şikefta Birqlênî ra, a şikefta ke kîlîtê berê aye mîyanê lewanê Xocê Xizirî de yo, verarê koyanê berzan ra za; cenet ra za. Pê koyê Sadulkafî ra; wareyê firaranê şaristanê Deqyanosî ra fetle da xo û mîyanê baxçeyê Adenî ra lef bi lefe, fetil bi fetle gêra û ver bi germistanan wa herikîya."

Efsaneyê Awe. Şiwane û Mûnzûr, Birkleyn û Dîjle, Feqîyê Teyran û Çemê Botan...

Biwêjê û Vateyê Verînan ê Kurdkî de Awe:

Awa ma nêşina pêser (Awa me di cokekê de nare), Awe kewta şiqoqe, Awe adir ro kerdiş, Awe fek de şîyayîş, Awe pey ra çûrez (çirod) kerdiş, Awa ... qiyame (acor) şîyayîş. Awa arêyî birrîyayîş, Ave hêdî, me ecêb jê dî. Çem û çem awe de şîyayîş. Gonî awe nêbena (Xwîn nabe av). Mêr çem e, jin gol e. Royê kiçik lê herikî, ji avê mezin lê sekinî çêtir e. Xeberê vaye, vaye sera dîyena.

Şîretê Peyinî

Awa xo bişinasnê!

Heq û huqûqê awe bimusê!

Awe îsraf mekerê!

Dest bidê, projeyanê aw û çeman!

Cîwarê xo bipawê!

Wayîrê erd û awa xo bê!

AWERÊJÊ DÎJLEYÎ

çemê birkleynî - layê bermalî+wişkla+layê fetrakomî+laya boyin (berkilin çayî)

çemê madenî - layê berêmazî+layê keydanî+ layê honî+layê xizigî (maden çayî)

royê dijla / dîjle (dicle nehri) tîgris

çemê canqetranî (canketran deresi)

çemê goladeveyî - çemê qoloyî + layê boxazî+layê eysî (devegeçidi deresi)

çemê dehla sînoyî - dankiran deresi

çemê hewarî (haramsu)

çemê embarî (ambar çayî)

çemê tolazî (kuru çay)

çemê ekragî (pamuk çayî)

çemê selatî - çemê çetelê+ çemê omeran (salat çayî)

çemê sînanî (sînan çayî)

çemê reşan (göksu çayî)

çemê şêxan (bağlica çayî)

çemê sitewrî (savur çayî)

layê sarume - çemê delloy+layê entaxî (sarım çayî)

çemê qulpî - + çemê şekiran (kulp çayî)

çemê zorî - çemê sorkan+çemê balûkê (zorî çayî)

çemê sason (aydınlık çayî)

çemê ferqînî (silvan çayî)

çemê hesikan seriya pirdê malabadî (batman çayî)

çemê reşkotan biniya pirdê malabadî (batman çayı)
 çemê xerzan/bişêrîyî - çemê hezo + çemê pîsyar + çemê mêrgan (yanarsu çayı)
 çemê barave (nehir deresi)
 çemê başûrî (bitlis çayı)
 çemê kezerî (pınarca çayı)
 çemê reşan (büyük çay)
 çemê botan (uluçay)
 çemê hîzanî (büyükdere)
 çemê dijle (bahçesaray çayı)
 çemê şaxî (çatak çayı)
 çemê zorava (zarova çayı)
 çemê sor / royê sor / rûsor - royê babîsî + cowa basixirî (kızılsu)
 çemê nîrdîşî (çağlayan çayı)
 çemê hîzilî (hezil çayı)
 robozik - + çemê şêxan (ortasu çayı)
 çemê oramarî (nehil çayı)
 çemê xaburî (habur çayı)
 awaşîn (şemdinli çayı)
 zêya corîn / mezin / gewre (çığlıksuyu)
 zêya cêrîn / biçûk (küçük zap)
 çemê sûyî (adheim çayı)
 royê sırwan (diyala çayı)

AWRÊJÎ FERATÎ

serçema (baş çayı)
 çemareş / awareş (karasu nehri)
 çemê têrcan (tuzla çayı)
 çemê gulan (gülen çayı)
 çemê kêmalîye (karaçimen çayı)
 awatale (acısu)
 çemê çaltê - + awatale (çaltı çayı)
 çemê murad (murat çayı)
 çemê çetoyî (cuma çayı)
 çemê şarîyan (şerîyan çayı)
 çemê/awahewtengî (kocasu çayı)
 çemê bingolî - çemê sîsê + çemê goşgar (bingöl çayı)
 çemêreş (karasu çayı) nemrut
 royê murad - masala+ çewtla+ layê kûpar (murat nehri)
 çemê gonigî - layê sêxî + layê xêyd + layê saxyer (göynük çayı)
 çemê pêrî - layê xorxor + layê kuçîyan + layê paçik + layê pax (peri suyu)
 çemê xarçikî (pülümür çayı)
 çemê mircane (mercan çayı)
 çemê mizûrî (munzur çayı)
 çemê sunketî (hozat çayı)
 çemê xawaçûrî (ormanyolu çayı)
 royê ferat (fırat nehri) euphrates
 çemê toxmaye - + çemê sultan (tohma suyu)
 çemê sinage (çermik çayı)
 layê çamî (çam deresi)
 çemê kolike / gextê (kahta çayı)
 çemê sofrazî (değirmen çayı)
 çeyareş (göksu)
 çemê kela (karasu) araban
 çemê nîzibî (nizip çayı)

çemê sinepî (tüzel suyu)
 çemê balikî (balık çayı)
 çemê culawe (culap deresi)
 çemê xabûr (habur çayı)
 çemê şikêstûnî (buğur çayı)
 çemê zergan (gümüş çayı)
 çemê ceqceq - awareş+awasipî (çağçağ suyu)
 şetûlereb (şatül arap)
 kerhe (iran)
 kendawa / pingava besrayê (basra körfezi)

Termê awe û awdayîşî

birk' çime' hîne' dereyek' dere' newal' la' çem' ro (robar)	
ada	. (m) girav (w)
akarsu	. (m) aw û çem
ark	. (m) cihok, cok, erx, kerx, vaye
atık su	. (m) parav(w), pîsav(w)
atmosfer	. (m) av(w) û ba, atmosfer, bergeba, keş
baraj	. (m) bendav(w), berbest
bent	. (m) bent, sukirê avê
debi	. (m) birha avê, debî
dönen sular	. (n) av(w)rêjn
drenaj	. (m) zarav, dadûşin, hekoke
drene etmek	. (n) zaravnayîş, dadûşin
ekoloji	. (m) cîwar, ekoloji, şînewarî
girdap	. (m) av(w)ger, gerînek, girdav(w), pelalûk
göl	. (m) gole
gölet	. (m) golek
havza	. (m) awerêj, hewze
ırmak	. (n) ro, robar, rûbar
ilk sulama	. (n) pûs
kanal	. (m) kanal, qanal, qenel
kaplıca	. (m) germav (w)
katı atık	. (n) pap, dûrdu, efare, ting, qirşûbiring
körfez	. (m) kendawe, pingav
kuraklık	. (m) wişkayî, hişkayî, hişkî, hişkitî, sovî
mansap	. (m) biniya av(w)ê, rijaw
memba	. (m) seriya av(w)ê, makder
mükerrer sulama.	. (n) serav(w)
su bendi	. (m) avbir, benda avê, benda awe, sukirê avê
su bilimci	. (nt) avnas, awşinas, hîdrolog
su bilimi	. (m) awşinasî, hîdroloji
su kaynağı	. (m) avzê, birika avê, birkê awe, çimê awe
su ölçer	. (m) avpîv, hîdrometre
su sızıntısı	. (m) zûxav(w)
su taşkını	. (m) rabuna avê, sêlav, lehî, leyîmişt, laser
sulama	. (n) avdan, avdanî, awdayiş
sulamacı	. (nt) avdêr, cenan, covan
şebeke dışı	. (n) serdestê av(w)ê
şebeke içi	. (n) bindestê av(w)ê
şelale	. (n) avşor, çirtan, rêjav, sûlav
taban suyu	. (m) av(w)zêm
tahliye	. (n) vala kirin, şurik kirin, veng kerdîş
tav	. (m) zîr

SÊ DILOP XWÎN

Sadiq HÎDAYET
(Ji Farisî Werger: Roan LEZGÎN)

Duh odeya min cihê kirin. Gelo li ser sozê ku midûr dabû min êdî tedawiya min bi gitî çûbû serî û ez ê hefteyek paê ji vir xelas bibim? Gelo ez hîn jî nexwe im? Ev bû serê salekê min ji her kesî lava kir ku pêûs û kaxiz bidin min, lê kesî nedan min. Her tim min ji paeroja xwe guman dikir û her saeta ku pêûs û kaxiz bidest min biketa, çiqas tit hebûn ku min ê binivîsandana... Lêbelê, duh bêyî ku êdî ez bixwazim, ji min re kaxiz û pêûs anîn; ew titên ku min ew çend dixwest, ew qas çavên li riya wan bûn!.. Lê çi fêde! Ji duh ve ye ku ez li ser her titî difikirim, lê mixabin, ez nikarim tu titek jî binivîsim. Mîna ku yekî destên min girê dabe yan jî rih ji milên min derketibe. Ez bala xwe didimê, ew xetên ku min li ser kaxiz bi eletexmînî kiandine, jê titê ku tê xwendin bi tenê ev e: "Sê Dilop Xwîn!"

* * *

Asîmanê î, baxçeyê kesk û ew kulîlkên ku li ser gir vebûne, ku bayekî aram bêhna wan digihîne ta vira... Lê çi fêde! Êdî tu titek kêfa min nayîne. Ev hemû belkî ji bo helbestvanan, zarokan û ew kesên ku heta dawîya emrê xwe wekî zarok dimînin, ba be. Ev dibe serê salekê ku ez li vir im. Ji ev heta sibehê ji dengê pisîkan bêxew dimînim. Ew nalînên tirsnak, ew xencereya bi penc ku dilê min di devê min re tîne der û destê sibehan ku hîn çavên me ji xewê venebûne, her tim ew enjeksiyonên bêdawî!.. Çiqas rojên dirêj û saetên tirsnak min li vir bihurandin! Di rojên havînê de em bi kiras û derpiyên zer, li

zêrzmînê dicivîyan û zivistanê jî li baxçe, li berojkê rûdinitin. Ev bû serê salekê ku ez di nav van mirovên ecêb û seyr de dijîm. Tu titekî min û wan ê hevbe tune. Di navbera min û wan de jî erdê heta asîman ferq heye. Lêbelê, nalîn û bêdengî, fehîfî û kenîna van mirovên ecêb wê heta dawîya emrê min jî bibe kabûs û xewê li min biherimîne.

* * *

Hîn saetek maye ku em îva xwe bixwin, jî ew piçekxwarinê; orbedew, orbeîr, savar, nan û penêr... Ev hemû bi qasî ku bixwe û nemir! Hemû xwestîna Huseyn ew e, ku beroek ekene û bi tevî çar nanê sengek bixwe. Dema jî bo destûrnameya azadkirinê desteyek kaxiz tînin, divê di ûna wan de beroek ekene jê re bînin. Ew, di nav hemû mirovên li vir ewê herî bextewar e. Bi wê qama xwe ya kurt, kenê ehmeqane, gerdena wî ya stûr, serê wî yê wekî tasê û hemû gewdeyê wî ahidî dike, ku wî jî bi wan awirên xwe yên ehmeqane re diqîriya, ku ew di rastiya xwe de jî bo çêkirina afirana hatiye afirîn. Ger li wir Mihemed Elî li ser fîrawîn û îvê nesekeya, wî berê me hemûyan dida ber dîlovaniya Xwedê! Lêbelê, Mihemed Elî jî herwekî hemû mirovên vê cîhanê ye. Lê hûn dixwazin çî dibêjin bibêjin, a rastî, ev cîhaneke din e, ku her tit tê de tevlihev e.

Doktorekî me heye, bi qudreta Xwedê tu titek nakeve serî. Ger ez di ûna wî de bûma, min ê êvarekê jehr têxista nava îvê û min ê bi hemûyan bida xwarin. Serê sibehê ez ê biçûma nav baxçe, minê destê xwe biavêtana kêlekên xwe û li wan miriyên ku yeko yeko dikiandin derve, temae bikira. Li wan demên pêîn ku min anîbûn vir, her tim dilê min wasewas dikir ku wê jehrê bidin min, lewma jî min dest nedida fîrawîn û îvê, heta ku min bi Mihemed Elî dida tahmkirin, hîn min dixwar. evê ez bi tirs hildifiriyam ser xwe, min xeyal dikir ku hinek hatine min bikujin. Ev hemû çawa li dûrahiyan mane!.. Her tim heman mirov, heman xwarin, heman odayên gewr ku dîwarên wan heta nîvî bi rengê lacîwerdî boyaxkirî ne.

Du meh berê bû. Yekî dîn avêtibûn wê zindana ku li dawîya hewê dima. Bi xareke ikestî zikê xwe qelatibû, rodiyên xwe kakiribû derve û pê dilist. Digotin, ew berê qesab bûye û qelatina ûr, jî adetên wî ye! Lê, yekî din hebû ku bi neynûkan çavên xwe teqandibû. Destên wî di pey wî de girê dabûn. Hawar hawara wî bû. Xwîn li dora çavên wî hik bûbû. Ez dizanim, ev hemû jî bin serê midûrê me derdikevin.

Mirovên ku li vir in, hemû ne wisa ne. Gelek jî wan hene, ger tedawî bibin û jî vir derkevin jî, lê ev bextreiya ku li vir dîtine hey wê bi wan re bimîne û bimîne. Mesela, wekî wê Soxra Sultana ku li nav jinan dimîne. Du-sê car

xwest ji vir bireve, lê wê qefaltin. Pîrejin e, lê rûyê xwe bi kirêca dîwaran spî dike û gula emdanî jî sorahiya hinarokên wê ye. Xwe keçeke çardasalî dizane. Ger ew tedawî bibe û di eynikê de li sûretê xwe binêre, wê ji erma qelbê wê bisekine! Ji van hemûyan wêdetir jî, Taqiyekî me heye ku dixwaze dinê serûbin bike. Bi vê yekê bawer e, ev xirabiya ku li dinê ye gi jî rûyê jinan e. Ji bo selametiya dinê jî divê hemû jin bêne kutin, lê ji alî din, wî bi xwe jî dil berdaye wê Soxra Sultanê.

Ev hemû ji bin serê midûrê me derdikevin. Wî destê hemû dînan li pey wan girêdane û bi wê firnikê xwe ya mezin, bi wan çavên xwe yên piçûk ên bêekil ku diibin çavên esrarkêan, her tim li nav baxçe, li bin dara çamê peyase dike. Carinan pita xwe xûz dike û li bin darê, li erdê dinêre. Kî wî bibîne, wê ji xwe re bibêje, "Guneko! Çi mirovekî reben î bêçare ye ku ketiye nav lepê van dînan!" Lêbelê, ez wî dinasim! Ez dizanim, li wir, li bin wê dara çamê sê dilop xwîn çilkiyane ser rûyê erdê. Li pê pencereya wî qefesek daleqandiye. Qefes vala ye, pisîkê qanaryaya ku tê de bû, biriye. Wî cihê qefesê guhertiye. Hêvî dike ku pisîk cardin bi wê niyetê were ber qefesê, ew jî pisîkê biqefêle û bikûje. Duh ketibû pey pisîkek sorik. Dema pisîk ji ser dara çamê hildifiriya ber pencerê, wî emir da nobedarê li ser ban ku gule berdiyê. Ev sê dilop xwîn ên pisîk in. Ger ji wî bê pirsîn, wê bibêje, "Ew xwîn, xwîna koterê ye."

Ji van hemûyan jî ecêbtir, cîran û hevalê min Ebas heye. Hîn du hefte tuneye ku wî anîne vir, lê gelek bi germahî nêzî min dibe. Xwe pêxember û helbestvan dizane. Dibêje, "Her kar û bi taybetî jî pêxemberî, girêdayî bext û talihê ye." Li gor Ebas, her kesê ku ansê wî hebe, wê karê wî jî ba bi rê ve here, na, ger ans nîn be, ew ji ulemayên cîhanê be jî, wê karê wî bi rê ve neçe. Di ser de jî, Ebas tew xwe Tarzanekî mahir dizane, li ser texteyekî sîm kiandiye û li gor xeyalên xwe wî tembûr çêkiriye. Helbesteke wî heye, rojê hetbare ji min re dixwîne. Tê gotin ku ji ber xwendina heman helbestê ye ku wî anîne vir. Helbest, an jî ew tesnîfa xerîb, wî wiha dixwend:

*Heyf ku cardin êvar bû
Ser û binê alemê tarî bû
Her dem mexlûq aram bû
Meger renc û xem li min zêde bû*

*Nebû cîhan, li nav xwemîzac
Ji bilî mirinê jî derdê min re tune îlac
Welakîn li wê goeyê, li bin dara çamê
Çilkiyane erdê, sê dilop xwîn*

Duh dema em li nav baxçe digeriyan, ku Ebas jî heman helbestê dixwend,

ji wî alî de jin û mêrek û keçeke ciwan ji bo serdana wî dihatin. Ev dibe pênc car tîn. Ez êdî wan nas dikim. Keçikê destegulek anîbû. Keçik li min biirî, tê xuyabû ku ew ji min hez dike. A rast, ew ji bo min dihat, ne ji bo Ebasê ku rûyê wî tev bi eble ye û yekî çirkîn e. Lê dema wê jinikê bi doktor re qise dikir, min dît, Ebas keçikê kiand aliyekî û wê maç kir.

* * *

Ev dibe serê salekê ez li vir im. Heta niha ne kesî ji bo min gul anîne û ne jî kes ji bo dîtina min hatiye vir. Ew cara dawî bû ku Siyavû ji bo dîtina min hatibû. Siyavû, hevalê min î herî pê e. Em cîranê hev in. Her tim em bi hev re diçûn zanîngehê û bi hev re vedigeriyan, bi hev re li dersên xwe dixwebitîn û dema kêfa me li cih bûya, min ji Siyavû re li tembûrê dida.

Rûxsara keça apê Siyavû di heman demê de dergistiya min e, ew jî exleb dihat ba me. Siyavû jî dil dikir ku bi xwika Rûxsarê re bizewice. Bi texmîna ku mehek mabû ji daweta wan re, lê Siyavû ji nika ve nexwe ket. Ez du-sê caran ji bo pirsîna rewşa wî çûm, lêbelê digotin ku doktor qedexa kiriye ku kes pê re biaxife. Her çendî min israr kir, lê wan jî heman bersivê dan min. Ez jî êdî hew çûm.

Ba tê bîra min, nêzîkî îmtîhanan bû. Rojekê ku rojliava bû, ez vegeyriyam mal. Min kitêbên xwe û bi tevî çend kovarên dersê avêtin ser masê. Tam min cilên xwe ji xwe dikir, çend dengê sîlehan ji derve hatin. Deng ew qas ji nêz ve hat ku ez tirsîyam. Lewre mala me li pit xendeqekê bû û min bihîstibû ku li van deran diz peyda bûne. Min exwira xwe ji berkêka masê derxist û ez hatim hewê. Min guh da dengê derve, paê ez di silimê re derketim diyarê xanî, lêbelê min tu titek nedît. Tam ez ê daketama jêr, di wê navê de min ji ser xanî li mala Siyavû temae kir. Min bala xwe dayê ku Siyavû bi kirasê xwe yê evê, wa ye derketiye hewê. Bi awayekî ecêbmayî min got:

- Siyavû tu yî?

Wî ez nas kirim û got:

- Were, kes li mala me tune ye.

- Te dengê guleyan bihîst?

Tiliya xwe bir ser lêvên xwe û serê xwe ji min re wekî ku bibêje 'were' hejand. Ez zû bi zû hatim xwarê û çûm. Min li deriyê wan xist. Ew bi xwe hat ji min re derî vekir. Her serê wî berjêr bû û bi baldarî li erdê dinêrî, pirsî:

- Tu çima nedihatî serdana min?

- Ez du sê caran ji bo pirsîna halê te hatim, lê nedihitin, digotin ku doktor destûr nade.

- Guman dikin ku ez nexwe im, lê ew xeletî dikin.

Min cardin pirsî:

- Te dengê sîleh bihîst?

Li ûna ku bersiv bide, bi destê min girt û min bir bin dara çamê, titek anî min da; min ji nêz ve lê nihêrî ku sê dilop xwîna teze çilkiyabûn ser rûyê erdê.

Paê, wî ez birim odeya xwe, derî girtin. Ez li ser sendelî rûnitim, wî jî lampe vêxist û hat li ser sendeliya li pêberî min a li ber masê rûnit. Odeya wî sade bû, di rengê avê de û heta nîvî jî bi rengê lacîwerdî boyaxkirî bû. Li goeyê tembûrek spartibû dîwêr. Çend cîld kitêb bi tevî çend kovarên dibistanê avêtibûn ser masê. Paê, Siyavû destê xwe bir berkêka masê, exwirekê jê deranî û anî min da: exwireke entîke bû, qevda wê ji sedef hatibû neqiandin. exwirê kir berîka alê xwe û dest pêkir:

- Pisîkek min hebû, navê wê Nazê bû. Belkî te jî dîtibe, wiha yeka bozik bû. Ew her du çavên wê yên ku diçurusîn mîna ku kilkirî bin. Li ser pita wê nex û nîgarên sîmetrîk hebûn, her wekî ku mirov hubreke poladî birêje ser kaxiz û bike du qat, pitî ku hik bû, îcar mirov di navê de bike du felq. Dema ez ji dibistanê vedigeriyam mal, Nazê dihat pêiya min û dikir miremir, xwe di min de dida. Dema ez rûdinitim dihat ser min, zikê xwe di rûyê min de dida, eniya min dialast û israr dikir ku ez jî wê ramûsim. Meger pisîka mê ji yê nêr fêlbaztir, dilovantir û bihîstiyartir e. Nazê, ji min bêhtir nava wê û apêj xwe bû. Çimkî, ji wê re xwarin li beriya her titî dihat. Lêbelê, apêja me ya ku lîbasên spî lê bûn û nimêja xwe jî dikir, lewma jî ji mûyên pisîkê her dûr direviya û xwe jê diparast. Nazê her tim ji xwe re xeyal dikir ku mirov ji pisîkan bêhtir zîrek in; her tim xwarina xwe û ciyên germ û nerm ji bo xwe çêdikin û pisîk jî hewqas çaplûsî dikin û xwe bi wan îrîn dikin, da ku karibin bi wan re irîkatî bikin. Bitenê dema ku hîsên tabîî yên Nazê iyar dibin, ew dem e, ku bi co pencên xwe diavêje serê dîk ê jêkirî û bixwîn. Pê re wek canewereke dirinde xwe tebdîl digire; çavên wê hîn bêhtir diçurisin û çîk jê diwein. Pencên wê ji hundir ve dirêj û tûjtir dibin û heçî kesên ku wê demê nêzî wê dibûn bi pixe-pixên dirêj wan tehdît dikir. Paê, wekî ku xwe bixapîne bi xwe lîstikek li dar dixist. Çimkî, bi hemû hêza taswîrkirina xwe, wê ew serê dîk ê jêkirî wekî canewereke dirinde yî zindî dihesiband; pencên xwe diavêt, dilivand û xwe jê diveart, diket kemînê, cardin êrî dikir... Bi hemû zêhna xwe bi wê çalakiya xwe re bi pevçûn û êrîkirinan, bi bez û hemleyên xwe yên li ser hev, hemû çelengiya nîjada xwe dida xuyakirin. Paê, mîna ku ji wê xwepêandane westiya be, diket ser wî keleya bixwîn, hêdî hêdî ew dikoça. Çend deqîqe li dor wê qaqota serî get dikir. Heta çend saetan ew kedîbûna xwe ji bîra dikir û xwe bi nêzî kesî nedikir. Hingê ne naz û ne jî çaplûsî dikir. Dema Nazê li wî halê ku hezkirina xwe bi me dida nîan jî her wisa wehî û ketûm bû. Hay ji raza jiyana xwe nedibû û mala me wek mala xwe dihesiband. Ger riya pisîkên xerîb bi van deran biketa, bi taybetî jî ger ku mê bûna, wê demê ji

Nazê dengên pixînî û naleyên tehdîtwar li pey hev dihatin bihîstin. Dengê ku Nazê ji bo xwarinê derdixist, gelek ferq dikir ji wî dengê wê yî ku pê çaplûsî dikir: Nalînên ku ji zîkê birçî der diçûn, feryadên kemekêî û wan mirnaw-mir-nawên ku ji ber dilbijokiyê derdixist, tev ji hev cihêtir bûn. Ahenga dengên wê wisa diguherî: Pêî feryadeke cîgerxira, duyemîn feryadeke bibuxz û kîn, li dû wî jî nalîneke derdnak bû ku ji rûyê îhtiyacên xwezayî derdixist ku heta bigiha ber cotê(hevalê) xwe. Lêbelê, nêrînên Nazê ji her titî watedartir bûn ku hin deman hestên insanî dida nîan. Mirov bêyî îradeya xwe ji xwe dipirsî ku gelo li nav vê qaqota bimû, li pit van çavên kesk remzên kîjan raman û hes-tan pêl didin!

Par biharê bû ku ev bûyera kambax qewimî. Tu dizanî, li demsala biharê hemû candar dikevin ber taya eqê û yek dide dû yekî, wisa dibe ku hawaya biharê bi ewqeke teze û har wan radipêçe. Nazêya me jî ev yekemîn car bû ku bi taya eqê diket. Wisa dibû ku canê wê diricifî û hemû mûyên wê radibûn piya, dibûn wek derziyê. Nalînên xembar dikêand. Pisîkên nêr nalînên wê bihîstin û li derdora wê li îstîqbala xwe geriyan. Pitî çendek pevçûn û kemekeiyan Nazê yekî ji xwe re hîlbijart ku li nava wan hemûyan ê herî zor û dengê wî ji gian berztir bû. Di warê eqê de taybetiyeke heywanatan heye ku bêhna nijadî ji bo wan gelek girîng e; pisîkên kedîkirî û pakîze li hember hev zêde ne dilbijok in, lê berevajî vê yekê, li pê pisîkên ku li ser dîwaran digerin; pisîkên diz û lexe, beredayî û birçî ku bêhna nîjada wan a esîl ji wan difûre, li hember wan pisîkên mê ji alî cinsî ve bêhtir dibin dilbijok. Bi roj û bi tay-betî jî tevayî evê Nazê û hevalê xwe eqa xwe bi dengêkî bilind dan bihîstin. Postê nerm û nazik ê Nazê gij û ka dibû, postê yê din jî wekî kewan ditewiya, hevûdin diçepirandin û nalînên adî ji wan derdiçûn. Heta destê sibê ev karê wan wiha didomiya. A wê demê, Nazê bi wan pûrtên xwe yên julîde, westiyayî û erfitandî, lê wisa jî xwehal vedigeriya dihat odeyê.

Bi evan ji ber eqbaziya Nazê xew nediket çavên min. Dawiyê ji qehran îmana min ji wan çû. Rojekê li pêiya vê pencereyê ez dixebitîm. Min aîq û maûq dîtî ku wa ne, li nav baxçe bi hev a dibin. Ev exwira hanê ku tu dibînî, min hilda û bi qasî sê gavan min nêzîkî li wan kir û min di wan de vala kir. Guleyek li hevalê Nazê ket. Dibêjim qey pita wî ikestibû, xwe bilind kir û li erdê ket, bêyî ku tu deng jê derbikeve, xwe di korîdorê re ka kir çû li bin dîwarê kelpîçê li dora baxçeyê ket û mir. Li dû xwe dilopên xwînê yên tarî rêz kiribûn. Nazê demekê li pey wî geriya, heta ku dilopên xwînê dît. Xwîna ku rijiyabû bêhn kir û rasterast çû li ser sekinî. Du ev û du roj li ber serê mêrê xwe nobedar ma. Hin deman pencên xwe di wî de dida, wekî ku bibêje, "iyar be, ev serê biharê ye. Çima tu di vê heyama eqbaziye de razayî? Çima tu xwe tev nadî? Rabe, rabe!..." Nazê ji ser miriyê xwe nedîçû, çimkî nizanîbû ku aîqê

wê mirî ye.

Dotira rojê Nazê bi tevî laê hevalê xwe winda bû. Li her derê lê geriyam, min ew ji her kesî pirsî, lê bêfêde bû. Gelo Nazê ji min xeyidî, gelo ew jî mir, ji bo eqbaziye kete pey yekî din? Ma hevalê wê yî mirî pê çi bû?

evekê min dengê wî pisîkê nêr bihîst, heta serê sibê jî dinewtiya. eva pey wê jî cardin bi heman tewirî, lê ku dibû sibeh deng ji xwe dibirî. eva sêyem min cardin exwir girt û berê wê da ew dara çamê ya ku li hember pencera min e, min tê de vala kir. Çimkî, ji wê ronahiya ku di tarîtiyê de ji çavên wî diçurusî, min cihê wî dizanî. Nalînên dirêj kiand û paê dengê wî hat birrîn. Serê sibê min bala xwe dayê ku sê dilop xwîn li bin dara çamê çilkiyabûn ser rûyê erdê. Ji wê evê heta niha ew her ev tê û heman deng jê derdiçe. Evên din xewa wan giran e, nabihîsin. Ez ji kê re dibêjim, bi min dikenin. Lêbelê ez dizanîm, ez ba bawer im, ew dengê heman pisîkî ye ku min wî kutibû. Ji wê evê heta niha xew neketiye çavên min. Ez diherim her derê, li her odeyê radizê, lê ev pisîkê bêînsaf bi wê xençereya xwe ya tirsnaq dinale û gazî hevala xwe dike ku nahêle xew têkeve çavên min.

Îro kes li mal tunebû, ez hatim heman cihê ku pisîk tê li wir disekine û feriyad dikê, min da ser nîanê. Lewre, ji wê ronahiya ku di tarîtiyê de ji çavên wî diçurusî, min dizanîbû ku ew li ku disekine. Dema min gule tê de vala kirin, dengê nalîna wî jî hate min û ew sê dilopên xwînê ji diyarê dara çamê çilkiyan. Ev e te bi çavên serê xwe ew dîtî, tu niha ahidî ji min re dikî?

Di wê navê de deriyê odeyê vebû, Rûxsar û diya xwe ketin hundir. Qevdek gul di nav destên Rûxsarê de bû. Ez rabûm ser xwe û min bixêrhatin da wan, lê Siyavû bi devlikenî got:

- Helbet hûn ji min zêdetir Axayê Ehmed Xan dinasin, hewce bi nasandîna min nîn e. Niha wê ahidî bike ku wî bi çavên serê xwe sê dilop xwîn li bin dara çamê dîtine.

- Belê, min dîtî!

Lêbelê, Siyavû pê de hat û tiq tiq keniya. Destê xwe bir berîka min, exwir jê derxist, li ser masê danî û got:

- Hûn dizanin? Mîrza Ehmed Xan ne bi tenê qenc tarê dijene û xwe helbestan dixwîne, tew di ser de, ew nêçîrvanekî biqabîliyet û segman e.

Paê bi dest îaret da min û ez jî rabûm ser xwe, min dest pêkir:

- Belê, ez îro berêvarkî hatim ku kovarên darsa dibistanê ji bo xwendinê ji Siyavû bistînim, lê ji bo kêfê demekê me li dara çamê nîan girt. Lêbelê ew sê dilop xwîn ne yên pisîkê ne, yên Pepûgê ne. Hûn jî pê dizanin ku pepûgê sê hebên genim ku malê sêwî bûne xwariye. Ji wir û bi vir de ye her ev dinale, heta ku sê dilop xwîn ji qirika wê diçilkin, an jî pisîkê qanaryaya cîranan girtiye û biriye, wan jî gule berdane û ew jî di vir re bihuriye... Ka hela sebir

bikin, ew helbesta ku min hîn nuh nivîsiye ez ê ji we re bixwînim.

Min tembûr ji erdê hilda û li ber dengê tembûrê, min ev helbest ji wan re xwend:

*“Heyf ku cardin êvar bû
Ser û binê alemê tarî bû
Her dem mexlûq aram bû
Meger renc û xem li min zêde bû*

*Nebû cîhan li nav xwe-mîzac
Ji bilî mirinê ji derdê min re tune îlac
Welakî li wê goê, li bin dara çamê
Çilkiyane erdê, sê dilop xwîn”*

Çawa ku ez gihame vir, diya Rûxsarê bi hêrs ji odeyê derket. Rûxsarê jî biruyên xwe bilind kirin û got, "Ev dîn e!" Paê bi destê Siyavû girt û bi tiqe tiq kenyan, ji odeyê derketin û li ser min derî girtin.

Dema gihan hewê, li bin ronahiya fanosê, min ji pit cama pencereyê ew dîtin ku wan hevûdin hembêz dikirin û hev maç dikirin.

